



MEHMET NUR YAVUZER



**K.T.
ZANÎNGEHA YÜZÜNCÜ YILÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ**

**TEZA
LÎSANSA
BILIND**

**BABA TAHİR
DI WÊJEYA KURDÎ DE**

MEHMET NUR YAVUZER

**ŞAXA MAKEZANISTA
ZIMAN Ê ÇANDA KURDÎ**

PÛŞPER 2016

PÛŞPER 2016

T.C.
YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ EDEBİYATI VE KÜLTÜRÜ

KÜRT EDEBİYATINDA BABA TAHİR

YÜKSEK LİSANS TEZİ

Hazırlayan

Mehmet Nur YAVUZER

Tez Danışmanı

Yrd. Doç. Dr. NESİM SÖNMEZ

VAN – 2016

Bu tez Yüzüncü Yıl Üniversitesi Bilimsel Araştırma Projeleri Başkanlığı tarafından 2015-YDE-YL229 numarasıyla desteklenmiştir. Bilimsel Araştırma Projeleri Başkanlığına bu desteğinden dolayı teşekkür ederiz.






T.C.
YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
Yaşayan Diller Enstitüsü

TEZ KABUL TUTANAĞI

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Yrd. Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ danışmanlığında, Mehmet Nur YAVUZER tarafından hazırlanan “**Baba Tahir Di Wêjeya Kurdî De**” adlı bu çalışma, 03/06/2016 tarihinde aşağıdaki jüri tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı’nda Yüksek Lisans Tezi olarak kabul edilmiştir.

Başkan	: Prof. Dr. Hasan ÇİFTÇİ	İmza: 
ÜYE (Danışman)	: Yrd. Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ	İmza: 
ÜYE	: Yrd. Doç. Dr. Abdulhadi TİMURTAŞ	İmza: 
ÜYE	:	İmza:
ÜYE	:	İmza:

Yukarıdaki imzalar, adı geçen öğretim üyelerine aittir.

06/06/2016
Prof. Dr. Murat DEMİREL
Enstitü Müdürü



NAVEROK

PÊŞGOTÎN	IV
KURTEBÊJE	VII
TRANSKRÎBSİYON	VIII
1.DESTPÊK	1
1.1. WEKÎ TÊGEH WÊJE	1
1.2. WÊJEYA KURDÎ	1
1.2.1. Wêjeya Kurdî ya Devkî	2
1.2.2. Wêjeya Kurdî ya Nivîskî	5
1.2.2.1. Wêjeya Klasîk a Kurdî	6
1.2.2.1.1. Çavkaniyên Wêjeya Klasîk a Kurdî	10
1.2.2.2. Wêjeya Nûjen a Kurdî	12
2.JIYAN Û BERHEMÊN BABA TAHÎR	13
2.1. JÎYANA WÎ	13
2.2.1. Nav û Nasnava Wî	16
2.1.2. Bernavên Wî	18
2.1.3. Zimanê Wî	22
2.1.4. Nasnameya Wî	27
2.1.5. Serdema Wî	36
2.1.6. Xelwetgeha Wî	45
2.1.7. Peyrewên Wî	49
2.1.7.1. Baba Tahîr û ‘Aynu’l-Quzzat-ê Hemedanî	52
2.1.7.2. Baba Tahîr û Omer Xeyyam	55
2.1.7.3. Baba Tahîr û Îbn ‘Erebî	62
2.1.7.4. Baba Tahîr û Mewlana	64
2.1.7.5. Baba Tahîr û Yûnis Emre	67
2.1.7.6. Baba Tahîr û Melayê Cizîrî	81
2.1.7.7. Baba Tahîr û Ehmedê Xanî	84
2.2. BERHEMÊN WÎ	86
2.2.1. Helbestên Wî	87
2.2.1.1. Dubeytî	87
2.2.1.1.1. Destnivîs, Çap û Wergerên Dubeytîyan	88
2.2.1.1.2. Naveroka Dubeytîyan	102
2.2.1.1.3. Di Dubeytîyên Wî de Kîte, Serwa û Kêş	103
2.2.1.2. Xezel	104

2.2.1.3. Bend	106
2.2.2. el-Kelîmatu'l Qîşar	109
2.3. ZÎMANÊ BERHEMÊN WÎ	120
2.4. DÎ HELBESTÊN WÎ DE SEMBOLÎZM.....	143
2.4.1. Sembolên Wêjeyî	143
2.4.1.1. Sembolên di Derbarê Rûyê Dilberê de	143
2.4.1.2. Sembolên di Derbareyê Meyê de.....	149
2.4.1.3. Sembolên di Derbarê Ajalan de	152
2.4.2. Sembolên Felsefî û Tesewifî	160
2.5. KESAYETÎYA WÎ YA WÊJEYÎ	195
3. FELSEFEYA EŞQA WÎ.....	198
3.1. EŞQ.....	198
3.1.1. Eşq di Tesewifê de	200
3.1.2. Eşq di Wejeya Dîwanê de.....	201
3.2. EŞQA WÎ YA RÛT Û TAZÎ	202
4. BANDORA BAWERÎ DI BERHEMÊN WÎ DE	223
4.1. TESEWÎF	225
4.1.1. Tesewif û Mirov	227
4.1.2. Baba Tahir û Tesewif	230
4.1.3. Baba Tahir, Tesewif û Wêjeya Kurdî.....	234
4.2. WEHDETÊ WÎCÛD	237
4.2.1. Baba Tahir û Wehdetê Wîcûd	238
4.2.2. Berawirdkirina Baba Tahir bi Sofiyên Din re	249
4.3. YARSAN (EHLÊ HEQ)	259
4.3.1. Baba Tahir û Yarsan.....	271
ENCAM.....	289
ÇAVKANÎ.....	293
KURTE	303
ÖZET	304
ABSTRACT	305

PÊVEK.....	306
PÊVEK 1. Wêneyên Helbestên Wî yên Destnivîsî	306
Pêvek 2. Wêneyên Gora Baba Tahir	309



PÊŞGOTÎN

Beriya her tişfî ev xebat me kelecânî dîke ku wê me bibe derdora hezar sal beriya niha, derxe ser rêya mirovekî sofî, helbestvan û dildar, ji rojbûna wî heta mirina wî bigerîne. Her wiha me ji raman, huner û serdema wî haydar bike.

Baba Tahir her çî qas ji aliyê huner û ramana xwe ve hêja be jî mixabin ew zêde nehatiye nasîn. Ji ber van hincetan wî bala me kişand û me xwast ku em ji gelek aliyan ve li ser wî rawestîn, encamên lêkolînên xwe parvebikin. Bi vî awayî nirxa wî derxin der, wî bidin nasîn û Wêjeya Kurdî dewlemendtir bikin. Her çî qas li pişt mirina wî berhemên wî belawela û winda bûne jî dîsa ew ji hemû astengiyên dîrokê re derbas bûye û heta roja îro hatiye. Berhemên wî jî mîna berhemên gelek helbestvanên Kurd bêxwedî mane. Agahiyên derbarê wî gelek kêr in û gelek dubeytiyên wî li pişt mirina wî bi sedsalan şûnde li gund û bajaran ji devê mirovan hatine berhevkirin û tomarkirin. Baba Tahirê ku di serê sedsala 11'an de çûye li ser dilovaniya Xwedê, di dawiya sedsala 19'an û sedsala 20'an de bala hin lêkolîneran kişandiyê û derbarê wî hin xebat hatine kirin. Hin dubeytiyên wî ji aliyê Yarsanan ve devdorên rûpelên pirtûka wan a pîroz ya bi navê Serencamê hatine nivîsîn û ew dubeytî bi xêra vê pirtûkê heta roja me ya îro hatine. Hin dubeytiyên wî jî li ser keviran hatine nivîsîn ku ew ne gelek kevn in. Helbestên wî ên herî kevn di destnivîsa Qûmî de cih digirin ku ew du bend û heşt dubeytî ne û di sedsala 15'an de hatine nivîsîn. Gotinên wî ên tesewîfî bala sofîyan kişandine û li ser gotinên wî gelek şîrove hatine nivîsîn. Wî ji meya eşqê vexwariye û di wê eşqê de şewitiye. Ew ji yekem sofîyan e û di dîrokê de yekem car wî xwe wekî qelender daye nasîn. Ew bi berhemên xwe bîngeha wêjeya Îranê ya nivîskî ye û yekem helbestvanê Kurd e. Her wiha di dîrokê de ji yekem ramangêrên wehdetê wicûdê ye.

Ji bo ku em Baba Tahir baştir binasin û derbarê wî agahî berhev bikin çûne Îranê. Me li bajarê Têhran û Hemedanê lêkolîn kirin. Dema ku em ji bo serdana wî çûne li ser gora wî ya Hemedanê, me dît ku gelek kes tên li ser gora wî dia dikin û helbestên wî ên ku li ser dîwarên gora wî hatine nivîsîn dixwînin. Ji ber dîmenên gora wî em têgihîştin ku ew ji wêjewanekî zêdetir e.

Gel wî wekî mirovekî pîroz dîbîne, ji wî hez dike û rêzeke bilind ji bo wî digire.

Di destpêka amadekirina tezê de ji ber agahiyên kêma ên derbarê Baba Tahir, ji niqaşiyên ku li ser ziman, netewe û bawerîya wî û ji kêmasiya çavkaniyên Kurmancî me dijwarî kişand. Lê bi domana demê re me ev kêmasî heta ku destê me hat çareser kir. Di amadekirina tezê de me ji zimanên Îngîlîzî, Farisî, Tirkî, Erebi û Soraniya Kurdî werger kirin. Me di vê xebata xwe de wekî çavkaniyên girîng û sereke ji pirtûka destnivîsî ya Bahaudînê Qûmî, ji pirtûka “Şeddu’l-‘Izar” ya Cunejdê Şîrazî, ji pirtûka “Baba Tahir-Name” ya Perwîz Azkai her wiha di vê pirtûkê de ji lêkolînên Vladimir Minorsky, Perwîz Natil Xanlerî, Edward Browne, Karl Hedenk, Mêhrdad Behar, ji pirtûka “Şerhê Farisî ber Kelîmatu’l Qîşar Baba Tahir Uryan” ya Gunabadî, ji pirtûka “The Lament Of Baba Tahir Being The Rubaiyat Of Baba Tahir Hemedani (Uryan)” ya Edward Heron-Allen û Elizabeth Curtis Brenton, ji pirtûka “Mesnevî” ya Mewlana Celaleddînê Rûmî, ji pirtûka “Raĥetu’s-Sudûr we Ayetu’s-Surûr der Tarîx-ê Al-ê Selçûq” ya Rawendî, ji pirtûka “Mêjûy Edebî Kurdî” ya Me’rûf Xeznedar, ji pirtûka “Custucû der Tesewif-ê Îran” ya ‘Ebdulhuseynê Zerrînkûb sûd wergirtin. Herwiha helbestên Baba Tahir ên ku me di vê teza xwe de wekî mînak bi kar anîne bêtir ji pirtûka Kadrî Yıldırım wergirtin, ku wergerên helbestan ên ku ji Lorî bi Kurmancî hatine kirin gelek kêrî me hatin. Me di teza xwe de ji çavkaniyên bi tîpên Erebi û Latîni sûd wergirtin. Me dema ku ji çavkaniyên bi tîpên Erebi hatine nivîsîn sûd wergirtin, navên nivîskar û berheman (navên taybet) bi transkîrîbsiyonê nivîsîn. Her wiha ji aliyê me ve li ser dubeytiyan transkîrîbsiyon hatine kirin.

Di pêvajoya amadekirina teza min de ji bo rêberîya şêwirmendê xwe spasîyên xwe ji Yrd. Doç. Dr. Nesîm Sönmez re pêşkeş dikim. Ji bo alîkariya hevalê Îranî yê bi navê Diyako Roshanrou, hevalên min ên ji Wanê: Mehmet Ete, Zafer Açar, Yakup Aykaç, Samî Hêzil, Şehmûz Kurt, hevalê ji Kurdistana başûr Mihemed Mêrgeyî re spasîyên xwe pêşkeş dikim. Ji ber piştgirîya wan spasî ji Bilimsel Araştırma Projeleri Koordinasyon Birimi ya Zanîngeha Yüzüncü Yılê re dikim. Her wiha ji bo piştgiriyên wan, sipasî ji hevîna xwe Güler û kurê xwe Armanc re dikim.

Heke ev xebat ji bo nasîna Baba Tahir bikêr were, wêjevan, lêkolîner û xwendevan ji vê xebatê sîd wergirin ez ê gelek şad bibim.

Mehmet Nur YAVUZER

Wan-2016



KURTEBÊJE

amd:	amadekar
b:	berg
bnr:	binêrin
b.n:	berhema navborî
b.z:	beriya zayinê
ç:	çap
DÎA:	Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları
h:	hîcrî
Hz:	hezretî
j:	jimare
kd:	koça dawî
m:	mîladî
q:	qemerî
r:	rûpel
s:	sal
ss:	sedsal
vgz:	veguhêzer
wd:	wekî din
wer:	wergêr
weş:	weşan / weşanxane

TRANSKRÎBSİYON

ث	ṯ
ح	ḥ
ذ	ẓ
ض	ḍ, ẓ
ص	ṣ
ط	ṭ
ظ	ẓ
ع	‘
غ	ḡ
ء	’
ی	ê, î, y

1. DESTPÊK

1.1. WEKÎ TÊGEH WÊJE

Têgeha wêjeyê, di Îngilîziyê de wekî “literature” tê bikaranîn. Ev peyv ji peyva Latînî ” letterae”yê tê ku wateya peyvê “tîp û nivîs” in. Têgeha wêjeyê di zimanê Erebî de bi peyva “edeb”ê tê bikaranîn ku “edeb” peyveke Erebî ye. Ev têgeh di zimanê Erebî de tê wateya zerafet, nezaket û xweşikayiyê. Lê di Tirkî û Farisî de wekî “edebiyat” yanê bi awayê pirjimarî tê bikaranîn. Peyva “wêje”yê peyveke Kurdî ye û ji Kurdiya Soranî derbasî Kurdiya Kurmancî bûye. Peyva wêjeyê ji peyva “wutin”ê ye. Wutin, xêncî zaravayê Kurmanciyê, di zaravayên Soranî, Goranî û Zazakiyê de bi bilêvkirineke nêzî hev beramberî peyva “gotin”ê tê bikaranîn. Têgeha “wêje”yê jî bi “gotin”ê re têkildar e ku meriv dikare di navbera wateya wê ya ferhengî (gotin) û wateya têgehî / îstilahî ya edebê (gotina xweş û bi huner) de têkiliyekê dayne.¹

Armanca wêjeyê ew e ku, hest, raman û xeyalên mirovan bedew û xweşik bike, çêja wan bilind bike. Wêje gava ku hest, raman û xeyalan radixe li ber çavên xwendekaran di wan de heyranî, kelacanî û çêjeke estetîk peyda dike. Her wiha wêje, nîrxên kevneşopî û berhemên ku hatine hilberandin diparêze û wan nîrx û berheman ji nîfşek bi nîfşeke din vediguhêze. Amûra wêjeyê gotin e, yanê ziman e. Wêje vê amûra xwe pêşve dibe, dewlemend dike û diparêze. Wêje rewîşt, kirin û axavtinên mirovan xweşik dike û wan ji xerabiyê dûr dixê. Gelek xwediyê wêjeyê nebe, ew gel nola mirovekî lal e. Wêje di heman demê de mirovan xwebixwe û bi hev dide nasîn.²

1.2. WÊJEYA KURDÎ

Di dîroka hezar salî ya wêjeya Kurdî de gelek berhemên resen û giranbiha hatine hilberandin. Erdnîgariya Kurdan, bi sedan sal di bin bandora

¹ Abdurrahman Adak, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, weş. Nûbihar, İstanbul, 2013, r. 23-25.

² Turan Karataş, *Ansiklopedik Edebiyat Terimler Sözlüğü*, weş. Sütun, İstanbul, 2011, r. 157-159.

Împaratoriyên mezin de maye û ev jî bûye sedema guherînan li ser wêjeya Kurdî. Di serî de bandormayîna Kurdan ji netewên din, ji Kurdan û wêjeya wan re bandoreke neyînî derxistiye holê, lê bi domana demê re zaravayên Kurdî çêbûne û bi hemû zaravayên Kurdî, berhemên wêjeya Kurdî hatine hilberandin û bi vî awayî wêjeya Kurdî xurtir bûye.³

Ji ber ku Kurd bi sedsalan bi zordariyan re rû bi rû mane, ji zanîn, lêkolîn, perwerde û ilmê bêpar mane, koçerî, hêsîrî, şer û dagirkirina ku li ser axa wan qewimîne, bi her awayî rewşên neyînî ji gelê Kurd re anîne holê û di heman demê de, di dîrokê de, li pêşiya pêşveçûyina wêjeya Kurdî ya nivîskî bûne astengeke mezin. Ji ber van helwestan wêjeya devkî bûye şeweyeke esasî yê vegotinê, bihêz û pêşketîtir e. Wêjeya devkî bandor li wêjeya nivîskî kiriye, her tim xwe nû kiriye û nûjen e.⁴

Di nav zaravayên Kurdî de wêjeya Kurdî, bi zaravayê Soranî pêşketî û dewlemendtir xuya bike jî wêjeya Kurdî ya Klasîk bi zaravayên Kurmancî û Goranî dewlemend in. Her wiha roj bi roj wêjeya Kurdî bi hemû zaravayên xwe di warê wêjeyê de pêş dikevin.⁵

Wêjeya Kurdî ji berhemên Kurdî ên devkî û nivîskî pêk tên. Wêjeya Kurdî bi giştî ji beşên; “Wêjeya Kurdî ya Devkî” û “Wêjeya Kurdî ya Nivîskî” pêk hatine. Wêjeya Kurdî, xwedî dîrok û berhemên dewlemend in.

1.2.1. Wêjeya Kurdî ya Devkî

Wêjeya ku bi devkî hatiye hilberandin û bi gotinê ji nifşek derbasê nifşeke din bûye re tê gotin. Wêjeya devkî wêjeya herî kevn e. Ev wêje bi gotinê derketiye holê û pêşve çûye. Diyar e ku Kurd, ji nivîsê û xwendinê zêdetir bala xwe dane gotinê û ji gotinê bawer kirine. Ji aliyê wêjeyê ve çî hilberandine bi rêya gotinê veguhestine hevdu. Ji gelek netewên cîhanê zêdetir, bi wêjeya devkî û folklorê ve mijûl bûne. Bi rêya gotinê ji sedsalan vir ve

³ Me‘rûf Xeznedar, *Mêjûy Edebî Kurdî*, weş. Aras, 2001, r. 172.

⁴ Mehmet Uzun, *Antolojiya Edebiyata Kurdî*, weş. Aram, Stenbol, 2003, r. 29.

⁵ Qanadê Kurdo, *Tarîxa Edebiyata Kurdî*, weş. Lîs, İstanbul, 2010, r. 13.

çîrok, destan, kilam, stran wd. bi nifşên nû hatine veguhestin. Her wiha wêjeya devkî ya Kurdî xwediyê şêwe û estetîkeke taybet e.⁶

Kurdistan bi timî kaniya zargotina dewlemend e. Gelê Kurd jî, ji aliyê çandî ve gelekî dewlmend e. Ev gel, rihsivik û hilberîner e. Her çi qas di dîrokê de ji aliyê cînarên xwe ve rastî bûyerên mîna dagirkirin, şer û nefibûnê hatibin jî xweşbînî û heviya jiyanê winda nekirine. Vî gelî, dîroka xwe ya hezar salan, şabûn û keserên xwe, axîn û kulên xwe, mêrxasî û şerkariyên mirovên xwe di nav zargotina xwe de xweyî kirine. Bi çîrokan, destanan, sitranan zimanê xwe şîmşat û şîrin, xweş û bedew kirine. Zarbêjî, çîrokbêjî, dengbêjî bi jiyana gel ve girêdayîne û mîna nan, av û hewayê ji gelê Kurd re pêwistin. Dîwanên mîr û odayên gundan cihê çîrokbêj, derwêş, aşiq û dengbêjan bûne. Ne şînen Kurdan ne jî şahiyên wan bêyî zarbêjiyê bûne. Di tengasî û tunebûnê, evinî û dilxweşiyê de kilam hevalên Kurdan bûne. Dayikên Kurdan bi kilaman lorandine û bi zarokên xwe şa bûne, her wiha bi çîrokan zarokên xwe razandine. Bi kilam û sitranan bûk hatine siyarkirin, mêrxas û şervan hatine rêkirin, mirî hatine veşartin. Şivan bi bilûr û sitranan pez û berxên xwe çêrandine, cotkar bi sitran û kilaman li ser axê cotên xwe kişandine, karker di paletiyê de bi kilaman kar kirine û Kurd di nefibûnê de bi sitran û kilaman êş û bêrîkirinên dilê xwe aş kirine. Bêrîvan bi heyranok û mamikan pezan dotine. Zargotina Kurdan bi xeml û rewş in, her wiha bi xwezayî û hunerî ne.⁷

Zargotina Kurdî ji ber gelek hincetan dewlemend û cihêreng e. Ji ber ku Kurd xwediyê dîrokeke dirêj in, lewma xwediyê gelek destanan in, ku em dikarin ji rabirduyê Destana Kawayê Hesinkar û ji demeke nêzîk jî Destana Kela Dimdimê wekî mînak bidin. Çîrokên Kurdî ji ber erdnîgariya Kurda ya berfireh û ji ber zarava û devokên Kurdî him ji hêla naverokê ve him jî ji hêla şêweyên vegotinê ve dewlemend in. Gotinên pêşiyên ji ber caribandinên

⁶ Mehmet Uzun, *Destpêka Edebiyata Kurdî*, ç. 2, weş. Ithaki, Stenbol, 2010, r. 31-36.

⁷ Heciyê Cindî-Emînê Evdal, *Folklor Kurmanca*, "Pêşgotin-Eskerê Boyîk", weş. Avesta, Stenbol, 2008, r. 23-24.

Kurdan dewlemend û watedar in. Ji ber jiyana Kurdan ya rengîn Kurd xwediyê her cureyên zargotinê ne.⁸

Bi xêra wêjeya devkî mirovên Kurd xwe bi dîrok û rabirdûya xwe ve digihînin. Ji rabirdûyê ceribandinan digirin. Hemû civak beşdarî parastin, vejandin û hilberandina wêjeya devkî bûne. Jin jî, bi qasî mêran beşdarî lê kirine. Bi beşdariya jinê, ev wêje xurtir bûye. Di Kurdistanê de gelek dengbêjên jin hene. Her wiha di gelek destan û çîrokên Kurdan de jin leheng in. Zîna destana “Memê Alan”, Xeca destana “Xec û Siyabend”, Binevşa Narîn ya “Cembeliyê Hekarî” û wd. çend mînak in ku jin van destan û çîrokan xweştir û nemir kirine.⁹

Wêjeya devkî di heman demê de ji gelek hêlan ve civaka Kurdan bi me dide nasîn. Bi hatina baweriya Îslamê danûstandin, bîr û baweriyên Kurdan ber bi Îslamê ve dest bi guherînê kirin. Lê belê hêmanên wêjeya devkî mîna xwe man û bi vî awayî civaka Kurdan jî li ser kevneşopiyên xwe man. B. Nikitin diyar dike ku: Di avakirina deng û awazê wêjeya devkî ya Kurdî de azadî û serbestiyeke temam, heta mirov dikare bibêje, anarşiyeke gotin û vegotinê heye. Ew dibêje ku şêwe û rêbazên gotina Kurdî ne mîna yên Erebî û Farisî ne.¹⁰ Wêjeya Kurdî ya devkî bi dewlemendiya xwe ji bo wêjeya nivîskî û pexşana Kurdî bingeh û hîmê esasî ye. Bi destpêkirina wêjeya Kurdî ya nivîskî hingê klasîkên folklorê Kurdî mîna Memê Alan, Zembîlfiroş, Dimdim û wd. qulipîn li ser rûpelan û bûn berhemên nivîskî.¹¹

Wêjeya devkî bi şeweyên taybet malê gel e. Kurd ji aliyê ziman, çand û dîrokê ve ber bi xetereya pişavtinê ve rû bi rû mane, bi xêra wêjeya devkî xetereya pişavtinê şikandine û li ser pêyan mane. Ev berheman ên mîna; sitran, çîrok, kilam, efsane, destan, serpêhatî, heyranok, mamik, metelok û wd. bi jiyana rojane, bûyer û rastiyên dîrok û çandê ve hatine ristin. Ev berhem ji aliyê

⁸ Samî Hêzil, *Kurte Wêjeya Kurdî*, weş. Sîtav, Wan, 2015, r. 10-11.

⁹ Mehmet Uzun, *Antolojiya Edebiyata Kurdî*, r. 32-33.

¹⁰ Bazil Nikitin, *Kürtler*, weş. Ögürlük Yolu, 1986, r. 473-474, vgz. Uzun, *Antolojiya Edebiyata Kurdî*, r. 33-34.

¹¹ Uzun, *Antolojiya Edebiyata Kurdî*, r. 33-34.

gel ve hatine afirandin, ji ber vê yekê jî ev berhem gelêrî ne. Bi mêr û jinên Kurdan ve ev wêje xurt bûye û di heman demê de bi xêra wan, berhemên wêjeyî nifş bi nifş hatine veguhezandin. Bi vî awayî wêjeya Kurdî ya devkî bi awayekî xurt heta roja îro hatiye. Piştî ku yekem berhema Kurdî ji aliyê nivîskarekî hatiye nivîsîn wêjeya Kurdî ya nivîskî destpê kiriye, lê bi wêjeya nivîskî re wêjeya Kurdî ya devkî hebûna xwe domandiye.¹²

1.2.2. Wêjeya Kurdî ya Nivîskî

Wejeya nivîskî bi berhemeke ku ji aliyê nivîskarekî ve hatiye nivîsîn ve dest pê dike. Berhemên gelekî yên nivîskî çî qas kevn bin wêjeya wî gelf jî ew qas kevn e û bi wî re nirxa wê wêjeyê jî ew qas bilind dibe. Ji wêjeya nivîskî ya ku di serdema modernîzmê de di bin bandora wêjeya Ewropîyan de derketiye holê re “wêjeya nûjen” tê gotin. Rêbaz û rêzikên van beşên wêjeyê, ji hevdu cuda ne. Wêjeya klasîk û ya nûjen binbeşên wêjeya nivîskî ne.¹³

Destan û çîrokên Kurdî li ser rûpelan hatin nivîsîn û pişt re jî Ayet û şîrove-yên dînî her wiha berhemên tesewifî hatin nivîsîn. Berhemên tesewifî zêdetir bi helbestî hatin nivîsîn. Di nav pirtûkên dînî de ya herî belavbûyî û navdar Mewlûd e. Mewlûd bi şêweyeke helbestî, behsa jidayikbûna Hz. Muhammed dike û ev berhem bi her sê zaravayên Kurdî ve hatiye nivîsîn. Her wiha mewlûd berhema yekem ya nivîskî ya zaravayê dimilî (zazakî / kurmanckî) ye.¹⁴

Wêjeya Kurdî ya nûjen her çî qas gav bi gav pêşde here jî, ji ber ku ne yekgirtî ye, meriv nikare ku di bin serenavekî de rave bike. Parçebûna welat, dijarî û zehmetiyên ku astengî ji wêjeya Kurdî re derxistine, him rê li ber pêşveçûyina ziman û wêjeyê girtine, him jî li ber yekitiya wan bûne asteng. Wêjeya Kurdî heta niha yekitiya xwe bidest nexistiye. Tixûbên ku di ser dilê welêt re hatine rakêşandin, di heman demê de, wêjeya Kurdî parçe kiriye û her parçe ber bi alîkî ve ber alî kiriye. Ji ber van helwestan, wêjeya Kurdî ya Nûjen

¹² Adak, *b.n.*, r. 26

¹³ *b.n.*, r. 26.

¹⁴ Uzun, *Antolojiya Edebiyata Kurdî*, r. 35.

bi çend beşan hatine dabeşkirin. Wêjeya Kurdî ya Nûjen ji beşên Îran, Iraq, Sûrî, Tirkiye û Dîasporayê pêk tên.¹⁵

Berhemên wêjeya Kurdî ya nivîskî ji ber şer û dewan, her wiha ji ber jiyana koçeriyê ya ku 800 sal domkiriye, belewela û winda bûne ku ji wan berheman hin parçe gihîştine destê me. Zaravayê Goranî, xwediyê berhemên herî kevn ya Kurdiyê ye. Bi giştî Pehlawanî, Goranî û devokên wî xwediyê wêjê û çandêke bilind bûne. Di Kurdistanê de Goranî, helbesta lîrîk û çîroka helbestî tîne bîra mirovan. Goranî zaravayê wêjeyê bûye ku malbata Kraliyeta Erdelan ya Kurd (1168-1867) heta ku hebûne, bi zaravayê Goranî axaftine.¹⁶

1.2.2.1. Wêjeya Klasîk a Kurdî

Peyva klasîk ji zimanê Latînî û ji peyva Classicus tê. Wateyên vê peyvê esîl, bijarte, ji demên kevn, ji heyama antîk û ji taybetiyên nivîskarên heyama antîk in.¹⁷

Di wêjeya Ewropî de klasîzîm di sedsala 17'an de dest pê kir. Di wê heyamê de xebat li ser ziman û wêjeya Yewnana Antîk û Romayê, her wiha li ser ramanên filozofên Yewnan û Romayî dihatin kirin. Ev xebat li gorî pîvanên estetîk çêdibûn. Pîvanên klasîzmê ji xweşîkbûn, bedewbûn, yeksanbûn, bipîvanbûn û gerdûnîbûnê pêk dihatin.¹⁸

Berhema klasîk, di nav berhemên neteweyekî de ên ku bi her awayî dikarin wekî mînak werin girtin, ên xwediyê taybetiyên bilind û li ser wan çî qas sal derbasbin jî taybetî û nîrxên xwe winda nakin in.¹⁹

T. S. Eliot diyar dike ku, peyva ku klasîkê herî baş vedibêje, peyva gihîştî / kemilî ye. Berhemeke klasîk, hilberîna hişekî gihîştî ye. Ji bo ku berhemeke klasîk bibe berhemeke navneteweyî, bi qasî têgihîştîbûna

¹⁵b.n., r. 36.

¹⁶ Mehrdad R. Izady, *Kürtler*, ç. 4, (Wer.: Cemal Atilla), weş. Doz, 2011, İstanbul, r. 310.

¹⁷ "Klasik", *Meydan Larousse Büyük Lugat ve Ansiklopedi*, weş. Rojnameya Sabah, İstanbul, XI, r. 335.

¹⁸ Hêzil, b.n., r. 66.

¹⁹ Mahir Kalfa, "Klasik Eserler ve Klasik Eserlerin Eğitimsel İşlevi", *Türkiye Sosyal Araştırma Dergisi*, j. 17, 1 Avrêl 2011, r. 107.

helbestvan, ziman û şaristaniya ku berhem di tê de hatiye hilberandin jî girîng e. Berhema klasîk, xwediyê naverokeke dewlemend e û di heman demê de di nav neteweyê de li gorî hemû kesên civakê ye. Heke berhemeke wêjeyî, xêncî girîngiya di nav neteweya xwe de, ji bo wêjeyên biyanî jî xwedî taybatiyên hêja be, hîngê dikare were gitin ku ew berhem klasîk e. Heke em bixwazin berhemek klasîk bibînin, divê em wan berheman di nav zimanên mirî de bigerin. Mirîbûna wan zimanan girîng e ku em mîrateya dewlemendiya çanda xwe ji wan digirin. Bo mînak, hemû netewên Ewropî ji wan zimanên mirî sûd werdigirin. Her wiha em pîvana berhemên klasîk ji helbestvanên Roma û Yewnanê digirin.²⁰

Di Kurdî de dewsa peyva klasîk peyva “vetorî” jî tê bikaranîn. Di navbera taybetiyên klasîzma Ewropî û ya wêjeya klasîk a Kurdî de ciyawaziyên mezin hene. Her du wêje, ji aliyê çanda bingehîn, bawerî, raman, paşxane, naverok û şêweyê ve ji hevdu cihê ne.²¹

*“Ji wêjeya nivîskî ya ku di serdema Îslamî de di bin bandora dînê Îslamê, zimanên Erebî û Farsî û çanda Îranê de li gorî hinek rêbazan hatiye holê re “wêjeya klasîk” tê gotin.”*²² Têgehên wêjeya klasîk ên sereke; Kêş, serwa / beşavend (qafiye), riste, malik, bend, qesîde, xezel, çarîn û dîwan in.²³

*“Ji edebiyata Kurdî ya nivîskî ya ku di serdema Îslamî de di bin bandora dînê Îslamê, unsurên Erebî û Farsî û çanda Îranê de li gorî hinek rêzikan hatiye meydanê” re edebiyata Kurdî ya klasîk tê gotin.”*²⁴ Li gorî vê pênaseyê, wêjeya Kurdî ya devkî û nivîskî ya beriya Îslamê, wêjeya Kurdî ya devkî û ya nûjen ên piştî Îslamê, derveyî wêjeya klasîk a Kurdî dimînin. Wêjeya Klasîk a Kurdî di bin bandora dînê Îslamê û ramana tesewifê de maye

²⁰ T. S. Eliot, *Edebiyat Üzerine Düşünceler*, (Wer.: Sevim Kantarcıoğlu), weş. Kültür Bakanlığı Yayınları, Ankara, 1990, r. 162-180.

²¹ Hêzil, *b.n.*, r. 66.

²² Adak, *b.n.*, r. 27.

²³ Hêzil, *b.n.*, r. 71-72.

²⁴ *b.n.*, r. 27.

û ev wêje piştî destpêkirina wêjeya nûjen a Kurdî, li kêleka wê, heta roja me ya îro hatiye.²⁵

Wêjeya klasîk a Kurdî, di heyama navbera sedsalên 15-19'an de cih digire. Beriya vê heyamê çend helbestvanên Kurd ên ku helbestên wan dikarin di nav kevneşopiya klasîk de bîn pejirandin hene. Baba Tahir û Elî Herîrî di beriya sedsala 15'an de jiyane û berhemên wan ji aliyê şewe û naveroka xwe ve klasîk in. Dikare were gotin ku ev her du helbestvan wekî destpêka wêjeya klasîk a Kurdî werin dîtin. Wêjeya klasîk a Kurdî di sedsalên 16 û 17'an de gelek xurt e. Beriya sedsala 16'an di Kurdistanê de ji aliyê fermî, zanistî û hunerî ve bikaranîna zimanê Kurdî xwediyê derfetên baş nebûye, zanyar û nivîskar bêpiştgirî û bêderfet mane ku berhemên giranbuha hilberînin.²⁶

Çawa ku tê zanîn dubeytiyên Baba Tahir destpêka helbestên Kurdî ne. Dubeytiyên Baba Tahir girêdayî baweriya Yarsan, sofizma kozmosî û Goraniya neteweyî ne. Helbestên zaravaya Goranî kevntir helbestên zimanê Kurdî ne. Ev helbestan di sedsalên navîn de peyda bûne.²⁷

Wêjeya Kurdî ya piştî Îslamê, wêjeya Kurdî ya ku di serdema Îslamê de hatiye hilberandinê di hundirine. Piştî Îslamê bi hemû zaravayên Kurdî berhem hatine nivîsandin. Her çî qas Wêjeya Kurdiya Goranî kevntir be jî, wê jî di serî de hemû taybetiyên wêjeya klasîk di xwe de nehewandiye. Wêjeya Kurdiya Soranî di sedsala 19'an de û wêjeya Kurdiya Zazakî jî di sedsala 20'an de bi derengî dest pê kirine. Lê dema em wêjeya Kurdiya Kurmancî dinêrin, em dibînin ku di dîroka wêjeya Kurdî de cara pêşî wêjeya Kurdî ya Kurmancî, wêjeya klasîk temsîl kiriye û temenê wê ji gişan dirêjtir e.²⁸

Piştî ku Kurdan Îslamiyet pejirandin, bandor û giraniya zimanê Erebî li Kurdistanê pir zêde bû.²⁹ Her çî qas zimanê Erebî bandor li ser Kurdan kir jî,

²⁵ *b.n.*, r. 27.

²⁶ Hêzil, *b.n.*, r. 66.

²⁷ Xeznedar, *b.n.*, r. 160.

²⁸ Adak, *b.n.*, r. 101.

²⁹ Uzun, *Antolojiya Edebiyata Kurdî*, r. 18.

Baba Tahirê Uryan helbestên xwe bi zaravaya Lorî, Elî Herîrî helbestên xwe bi zaravaya Kurmancî, Melayê Bateyî mewlûda xwe bi Kurmancî nivîsîn. Her wiha Melayê Cizîrî yê ku helbestvanê tesewifê dîwana xwe ya payebilind bi zaravaya Kurmancî nivîsî û bi van gotinên xwe ên jêr hemberê Farisî bal kişand li ser zimanê Kurdî û wiha pê de çû:

Ger lu'lu'ê mensûrî ji nezmê tu dixwazî

Wer şî'rê Melê bîn te bi Şîrazî çî hacet³⁰

Feqiyê Teyran bi şêweyeke hêsan helbestên xwe bi zaravaya Kurmancî rist û cihê xwe yê bijarte di nav wêjeya Kurdî ya klasîk û dilê gelê Kurd de girt. Wêjeya Klasîk a Kurdî bi Ehmedê Xanî û bi berhemên wî derkete lûtkeyê. Ev helbestvan, zana û nivîskarê şanaz, her çî qas zimanê Erebbî, Farisî û Tirkî baş dizanî jî berhemên xwe bi zaravayê Kurmancî nivîsî da ku gelê Kurd jê sûd wergirin. Xanî piçûkên Kurmancan jî ji bîr nekir ku ji bo wan mîna pedogokek berhemek bi navê “Nûbehara Biçûkan” nivîsî. Xanî, derbarê vê pirtûkê wiha got:

Ji paş hemd û selewatan

Ev çend kelîme ne, ji luxatan

Vêk êxistin Ehmedê Xanî

Navê “Nûbehara Biçûkan” danî

Ne ji bo sahibrewacan

Belkî ji bo biçûkê Kurmancan.³¹

Ehmedê Xanî cara pêşîn di berhemên xwe de derbarê yekitiya Kurdan, ziman, çand û risûma wan agahî daye. Ji ber van taybetiyan ew bîrewer û ramangêrê yekem ê netewî ye. Ji bindestiya Kurdan aciz bûye û daxwaz kiriye

³⁰ Melayê Cizîrî, *Dîwan*, (Amd.: Selman Dilovan), weş. Nûbihar, Stenbol, 2010, r. 51.

³¹ *Nûbehara Biçûkan Ehmedê Xanî Külliyyatı I*, (Lêkolîn û Şerh: Kadri Yıldırım), weş. Avesta, İstanbul, 2008. r. 157-159.

ku Kurd, li ziman, çand û welatê xwe xwedî derkevin. Berhema wî ya Mem û Zîn berhemekî bêhempa ye. Ev berhem ji aliyê şêwe, ziman, wêje û hunerê ve di asta herî jor de ye. Ji hêla ziman, çand û wêjeyên wan ve girîngiya Shakespeare, Cervantes, Dante, û Fîrdewsî çî be, girîngiya Ehmedê Xanî jî ji bo ziman, wêje û çanda Kurdî heman e.³²

Ji ber ku di sedsala 16'an de li Kurdistanê mîrektiyên Kurdan ên xweser ava bûn, bi xêra wan li navendên mîrnişîniyan medreseyan ku bi Kurdî û Erebi perwerdehi didan ava bûn. Her wiha derfetên baş ji bo bikaranîna zimanê Kurdî çêbûn. Di wan medreseyan de berhemên giranbuha hatine nivîsîn û wêjeya klasîk a Kurdî bi wan geş bû. Eliyê Teremaxî (kd. 1655), Axaokê Bêdarî, Xarisê Bedlîsî (kd. ss. 18), Îsmailê Bazidî, Miradxanê Bazidî (kd. 1832), Selîmê Silêman, Mela Yûnisê Erqetînî (kd. 1785), Şêx Riza Talebanî (kd. 1910), Salîm (kd. 1866), Melayê Xasî (kd. 1951), Siyahpûş (kd. ss. 19), Pertew Begê Hekarî (kd. 1841), Wedaî, Mele Xelîlê Sêrtî (kd. 1841), Mele Mehmûdê Bazîdî (kd. 1863) hinek ji helbestvanên serdema klasîk in.³³

1.2.2.1.1. Çavkaniyên Wêjeya Klasîk a Kurdî

Çavkaniyên wêjeya klasîk a Kurdî ji du beşan pêk tên. Ya yekem her cure materyal û belge ne ku lêkolîner û xwendekar jê sûdê werdigirin. Ya duyem jî ji bo danasîna nivîskar û berheman hatine nivîsandin. Wêjeya Kurdî, di heyama klasîk de aliyê teşeyên nezmê û cureyên berheman ve di nava wêjeya klasîk ya rojhilatê de xwediyê cihekî taybet e. Di vî warê navborî de gelek behremên Kurdî hene. Lê di wêjeya Kurdî de berhemên bîyografîk û bîblîyografîk li gorî wêjeyên Erebi, Farisî û Tirkî gelek dereng hatine nivîsandin.³⁴

Di serdema klasîk de di wêjeya Kurdî de berhemên bîyografîk ên wêjevan û helbestvanan nehatine nivîsandin. Em ji bo çavkaniyên wêjeya

³² Uzun, *Antolojiya Edebiyata Kurdî*, r. 18-20.

³³ Hêzil, *b.n.*, r. 67-83.

³⁴ Adak, *b.n.*, r. 44-45.

klasîk a Kurdî, ji belge û destnivîsên Kurdî, helbestên helbestvanên Kurd û bi taybet ji berhemên bi zimanê Erebi, Farisî û Tirkî sûd werdigirin.³⁵

Yekem xebata bîyografîk ya derbarê helbestvanên klasîk ên Kurd, ku di warê helbestvanên serdema klasîk de tê zanîn, xebata A. Jaba (1800-1891) ye. Jaba wekî balyozê dewleta Îris li Erzeromê 17 salan jiyaye (1848-1866) û bi alîkariya melayên Kurdan berhemên Kurdî berhevkerîye û çapkiriye.³⁶ Rîsaleya “Şaîr û Musennefên di Kurdistanê” yek ji van xebatan e. Ev xebat di sala 1860’î li Ptersbûrgê bi navê “Recueil de Notices et Recits Kourdes” (Cimayî rîsaleyan û hikayetan bi zimanê Kurdî) hatiye çapkirin. Cara pêşî di vê berhemê de derbarê biyografiya helbestvanên Kurd rîsaleyek hatiye çapkirin. Di vê xebata navborî ya Jaba de derbarê heşt helbestvanên Kurd ên bi navê; Eliyê Herîrî, Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Melayê Bateyî, Ehmedê Xanî, Mela Îsmailê Bazîdî, Şerefxan û Muradxanê Bazîdî de agahî hene.³⁷

Çavkaniyên wêjeya klasîk a Kurdî bi giştî Hêmanên Îslamî, Erebi, Farisî û yên çanda Îranê ne. Mebesta me bi çanda Îranê, çanda niştecihên Îranê ne, bi taybet çanda Kurdî ye. Kurdên Zerdûşt, Êzîdî bi komên xwe bi hatina Îslamiyetê bi piranî ketin bin bandora Îslamiyetê. Bi vî awayî bawerîya Îslamê bandor li ser civaka Kurd kir, wêjeya klasîk a Kurdî dest pê kir pêşve çû û kemilî.

Pirtûka pîroz Qur’an, hedîs û sunetên cenabê pêxember ji bo Wêjeya Klasîk a Kurdî çavkaniyên baweriyê ne. Her wiha ji her du çavkaniyan pergala fiqhî ya bi navê şerîet derkete holê. Piştî di nava misilmanan de pergaleke nû terîqet derket. Her wiha wekî ramanekî tesewif derket û di nav misilmanan de belav bû. Tesewif ji bo Wêjeya Klasîk a Kurdî çavkaniya herî xurt e. Ziman û Wêjeya Erebi jî ji bo Wêjeya Klasîk a Kurdî re çavkanî ne. Him teşeyên nezmê yên ku Ereban afirandibûn him jî kêşa erûzê ji wêjeya Erebi derbasê wêjeya Kurdî bûn. Ji nav Kurdan ên ku berhemên xwe yekrû bi Erebi nivîsandine

³⁵b.n., r. 47

³⁶b.n., r. 48.

³⁷b.n., r. 48.

hene. Her wiha hin helbestvanên Kurd jî di helbestên xwe de peyv û têgehên Erebi bi kar anîne.³⁸

Çavkaniyeke wêjeya Klasîk a Kurdî ziman û wêjeya Farisî ye. Hin peyv û têgehên wêjeyî her wiha teşeyên nezmê ji Wêjeya Farisî derbasî Wêjeya Kurdî bûne. Hêmanên çanda erdnîgariya Îranê ji bo Wêjeya Klasîk a Kurdî çavkanî ne. Divê em vê jî bêjin ku mebesta me ji vê erdnîgariyê ne dewleta Îranê ya modern tenê ye. Dema em dibêjin çanda Îranê, em wê çanda ku di nava gelên Îraniyan / Ariyan tevan de peyda bûye nîşan dikin û kesayetên dîrokî, efsane, baweriyên dînî û gelek tiştên din yên wan gelan têxin nava wê. Divê em çanda Hindê jî bi bîr bînin ku di nav çanda erdnîgariya Hindê û Îranê de danustandin pêk hatine.³⁹

1.2.2.2. Wêjeya Nûjen a Kurdî

Wêjeya Kurdî ya nûjen, di serdema modernîzmê (modernîzm di sedsala 19'an de dest pê dîke) de di bin bandora çanda Ewropî de bi termînolojî, rê û rêzikên wêjeya modern ya Ewropî pêk hatiye re tê gotin. Modernîzm di her warê de bi armanca nûkirinê di destpêkê de li Ewropa û Amerîkayê kete rojevê û pişt re jî berbelav bû.⁴⁰

Modernîzm, di heyama kapîtalîzmê vir ve di warê aborî, civakî, dînî, raman û hunerê de guherînên mezin in. Di vê heyamê de sanayî, laîkbûn, pêşve derketina hişmendiyê, rêberiya zanistê, ji nirxên kevneşopiyê qetîn, heyberî (objektîf), jiyana takekesî û wd. derketiye holê.⁴¹

Îro wêjeya Kurdî ya nûjen bi berhem û nivîskarên xwe di nav wêjeya cîhanê de xwedî cihekî girîng e.⁴²

³⁸*b.n.*, r. 31-39.

³⁹*b.n.*, r. 37.

⁴⁰ Hêzil, *b.n.*, r. 96.

⁴¹ Karataş, *b.n.*, r. 405.

⁴² Hêzil, *b.n.*, r. 100.

2. JIYAN Ê BERHEMÊN BABA TAHİR

2.1. JİYANA WÎ

Baba Tahir li bajarê Hemedanê çavên xwe li cîhanê re vekiriye ku ew; bajarekî kevnar, navendeke mutesewif e û bajarê sofî û medreseyan e. Her wiha di heman bajarî de jiyaye û çûye ser dilovaniya Xwedê. Di vî bajarê navborî de mirovekî pêşeng û navdar bûye. Wî jiyanê qelenderî û derwêşî domandiye. Di derbarê jiyana Baba Tahir de gelek kêma agahî gihîştine roja îro.⁴³

Di derbarê mêjûyên rojbûn û mirina Baba Tahir de hin dîtinên cuda hene. Hin belgenûsên hingê Baba Tahir wekî hemdemê ‘Aynu’l-Quzzat-ê Hemedanî (kd. 525/1130) pejirandine ku agahiyên wan ji rastiye dîr in. Hinek jî wî ji serdema Xacê Neşîru’ d-dînê Tûsî dizanin ku ev agahî zêdetir ji rastiye dîr e.⁴⁴

Kevntir pirtûka ku behsa Baba Tahir dike ya bi navê “Rahetu’s-Sudûr we Ayetu’s-Surûr der Tarîx-ê Al-ê Selçûq” e. Ev pirtûk di sala 599/1202’yan de ji aliyê Rawendî (Muhammed bîn ‘Elî bîn Sulêyman Rawendî, kd. pîştî mêjûya 603/1207’an) ve hatiye nivîsandin. Di vê pirtûkê de tê gotin ku Baba Tahir hevdemê Siltan Tuşrulê (990-1063) Selçûqî ye. Her wiha ev pirtûk ji aliyê Muhammed Îqbal ve hatiye sererastkirin û Muctebâ Mînovî û Bedî’uzzeman-a Frûzanfer ji vê pirtûkê re pêşgotin nivîsandine.⁴⁵ Di pirtûkê de gotûbêja Baba Tahir û Siltan Tuşrul di bin serenava “Hêkayetê Baba Tahir ba Tuşrul Beg” wiha cih girtiye: Nivîskar dibêje, min bihîstiye dema ku Siltan Tuşrul çûye Hemedanê rastê ji ewliyayan sê pîrên bi navê Baba Tahir, Baba Ce’fer û Şêx Hemşa hatiye. Dema siltan wan dîtine, ji hespê xwe peya bûye û bi wezîrê xwe

⁴³ Yazıcı, *b.n.*, r. 370-371.

⁴⁴ Xeznedar, *b.n.*, r. 184.

⁴⁵ *b.n.*, r. 184.

re çûye li cem her sê pîran, kiriye ku destê wan maç bike, di wê demê de Baba Tahir hinek di halê “cezb”ê de bûye û wiha gotiye:⁴⁶

- *Ey Tork, tu dixwazî çî bi xelkê Xuda bikî?*

Siltan got:

- *Tu çî ferman bikî.*

Baba got:

- *Wê bike ku Xoda ferman kiriye, gotiye: “Xweda fermana edelet û îhsanê li we dike.”*

Siltan bi girî got:

- *Ez ê wisa bikim.*

Baba, destê wî girt û got:

- *Tu vê ji min werdigirî?*

Siltan got:

- *Erê.*

Baba, serê misînê xwe yê şkestî yê destnimêjê, ku bi salan wekî gustîlekê bi kar anîbû, ji tiliya xwe derxist û xiste tiliya siltan û got:

- *Bi vî awayî min memleketê alemê xist destê te, ji wan re ‘adil be.*

Piştî hingî siltan çû li ku ew gustîl xiste tiliya xwe û vî bûyerê bi bîr anî.⁴⁷

Wekî ku tê zanîn Siltan Tuhrul di devdora salên 447/1055’an û 450/1058’an de jî çûye Hemedanê⁴⁸ û di wan salan de Baba Tahir ne li dinê bûye. Ji vê mêjûya ku Siltan Tuhrul hatiye Hemedanê derdikeve holê ku wan hevdu nedîtine.

Baba Tahir di dubeytiyeke xwe de dibêje “ez di serê hezar salî de hatime”. Ev gotina wî, mîna rojbûna wî diyar dike. Reşîd Yasmî jî li ser vê gotina Baba Tahir di pêşgotineke çapa dubeytiyên Baba Tahir de digihîje wê

⁴⁶ Rawendî (Muhemmed Bîn Elî Bîn Soleyman), *Rahetu's-Sudûr we Ayetu's-Surûr der Tarîx-ê Al-ê Selçûq*, weş. Asafîr, h. 473, Têhran, r. 98-99.

⁴⁷ Rawendî, *b.n.*, r. 99.

⁴⁸ Adak, *b.n.*, r. 108.

encamê ku Baba Tahir di serê 1000 saliya mîladî de hatiye dinê û wî Siltan Tuḫrul dîtiye.⁴⁹ Dubeytiya navborî ya Baba Tahir wiha ye:

Mu an behr um ki der zerf amedestum

Mu an nuqte kî der herf amedestum

Be her elfî elif qeddî ber ayû

Elif qeddum kî der elf amedestum

Ez ew behr im ku di zerfê de hatime

Ez ew nuqte me ku di nava herfekê de hatime

Serê her hezar salî qamet elîfek tê

*Ez ew qamet elîf im ku di serê hezar salî de hatime*⁵⁰

Minorsky diyar kiriye ku Mîrza Mehdî Xanî Kewkeb di sala 1904'an de di nivîseke xwe ya di kovara "Mecelle-î Encumenî Asyayî Bingal"ê de diyar kiriye ku Baba Tahir di vê dubeytiya jor de bi hesabê Ebcedê rojbûna xwe diyar kiriye. Li gorî wî, di dubeytiyê de di rêza sêyem de gotina "elf qed elif" (الف قد الف) bi hesabê ebcedê mêjûya h. 326'an nîşan dike û beramberî vê mêjûyê, mîladî sala 937 e. Li gorî vê hesabê hevdiîna Baba Tahir û Siltan Tuḫrul ne pêkan e.⁵¹ Di heman demê de Me'rûf Xeznedar di pirtûka xwe ya bi navê Mêjûy Edebî Kurdî de diyar dike ku peyva "elf"ê (الف) yekîtiya Xwedê nîşan dike.⁵² Di agahiyên Kewkeb û Xeznedar de diyar dibe ku Baba Tahir ne di serê hezar saliya mîladê de hatiye û ne jî bi Siltan Tuḫrul re hevdiîtin pêkaniye.

⁴⁹*b.n.*, r. 109.

⁵⁰*b.n.*, r. 109.

⁵¹ Vladimir Minorsky, "Zistname-î Baba Tahir", Parvîz Azkaii, *Baba Tahir- Name*, weş. Tus, Têhran, 1995, r. 116.

⁵² Xeznedar, *b.n.*, r. 186.

Feqî Huseyn Sagniç di pirtûka xwe ya Dîroka Wêjeya Kurdî de dibêje: “*Baba Tahirê Uryan di dema hukumdariya Deylemiyana de jiyaye. Bi tenê dudu-sisê sal ji temenê wî ketiye dema hukumdariya Kakoyan. Li gorî min, ji van dîtinan a rast ew e ku di sala 938’ê zayinî de li Hemedanê ji dayik bûye û di sala 1010’î de koçdawî kiriye.*”⁵³

Hin nivîskar derbarê rojbûn û koçdawiya wî wiha agahî dane:

Navê pîrozê Tahirê Uryanê Hemedanî, Baba Tahir e. Ji zana, dana û arifên serdema xwe bûye. Xwediyê keramet, meqamet û helbestên bilind bûye. Hin kes wî hevdemê siltanên Selçûqî dizanin, lê ev agahî ne rast e. Baba Tahir ji şêxên kevntirîn ê heyama Deylemiyana e. Di sala 410/1019’an de berî Unsurî û Firdewsî koçî dawî kiriye.⁵⁴ Her çi qas derbarê jidayikbûn û koçdawiya Baba Tahir de gotinên cuda hebin jî Baba Tahir 937’an de (h.q. 326), hatiye dinê û di sala 1010’an (h.q. 401) de koçdawî kiriye.⁵⁵

Li gorî agahiyên jor diyar dibe ku Baba Tahir di mîladî sala 937’an de ji dayik bûye û 1010’an de koçdawî kiriye. Gora Baba Tahir li bakurê rojavayê Hemedanê di taxa Bûn-ê Bâzâr de li ser girekî piçûk û di hundurê turbekî de ye. Li ser dîwarê turbê wekî mînak hin helbestên Baba Tahir nivîsar in.⁵⁶ Gora Fatime û derwêşê Baba Tahir ê bi navê ‘Elî Neqî Koşerî li cem gora Baba Tahir in.⁵⁷

2.2.1. Nav û Nasnava Wî

Navê helbestvan “Tahir” e ku ew di helbesta xwe ya jêr de navê xwe aniye ziman. Ew di heman demê de mîna helbestvanên klasîk ên rojhilatê, vî navê xwe di helbesteke xwe de wekî nasnav bi kar aniye.

Wateya peyva “tahir” paqijbûn û bêlekebûn e. Paqijbûn û bêlekebûn taybetiyên rihê Îlahî ne. Her wiha rih, ji Xwedê ye, paqij û bêmirin e. Nexwe,

⁵³ Sagniç, *b.n.*, r. 69-70.

⁵⁴ Riza Qulî Xan Hidayet, *Mecmau’l-Fusaha*, Têhran, q. 1284, vgz. Xeznedar, *b.n.*, r. 185.

⁵⁵ Xeznedar, *b.n.*, r. 180.

⁵⁶ V. Minorsky, “Baba Tahir ‘Uryan”, *Îslâm Ansiklopedisi*, ç. 5, I-XII, weş. M.E.B., Eskişehir, 1997, II, r. 167.

⁵⁷ Dâ’iretu’l-Me’ârif-ê Bozorg-ê Îslâmî, III, r. 232-233, vgz. ‘Ela’eddîn-ê Seccadî, *Mêjûy Edebî Kurdî*, weş. Bilavkirdnewey Kurdistan, Sine, 1391, r. 180.

Baba ji aliyê rih ve Tahir e, teceliya Îlahî ye, rast e, qudret û evîn e.⁵⁸ Ew di vê dubeytiya xwe ya jêr de navê xwe wiha tîne ziman:

Nîgarê tazexîzê mû kuca yî?

Be çeşman surmerîzê mû kuca yî?

Nefes ber sîneyê Tahir resîde

*Demê murden 'ezîzê mû kuca yî?'*⁵⁹

Delala nûgihîştî tu li ku yî

Yara çavkilkirî tu li ku yî

Nefesa Tahir gihişte dawiyê

*Yar dema mirina wî tu li ku yî'*⁶⁰

Ew di dubeytiyeke din de navê xwe wekî nasnav wiha aniye ziman:

Xwudawenda, be fîryadê dilum res!

Kesê bêkes tu yî mû mande bêkes

Heme goyend Tahir kesî nedare

*Xwuda yerê men e, çi hacetî kes!'*⁶¹

Ey Xweda hawarê' dilê min bibhîs

Kesê bêkes tu yî, ez mame bêkes

⁵⁸ *b.n.*, r. 25.

⁵⁹ Kadri Yıldırım, *Baba Tahirê Uryan Hayatı Görüşleri Dîwanı*, weş. Avesta, Stenbol, 2013, r. 386.

⁶⁰ Sabah Kara, *Dubeytî Baba Tahirê Uryan*, ç. 3, weş. Nûbihar, Stenbol, 2012, r. 31.

⁶¹ Yıldırım, *b.n.*, r. 13.

Hemû dibêjin, kesê Tahir nîn e

Xwedê yarê min e, çi hacet bi kes⁶²

Yekem berhema ku navê wî wekî Tahir tomarkiriye, berhema bi navê “Nameyan” e û ev berhem ya ‘Aynu’l-Quzzat-ê Hemedanî ye. Berhema navborî di sala h. 520-525’an de hatiye nivîsîn.⁶³

2.1.2. Bernavên Wî

Helbestvan bi çend bernavan tê naskirin. Ev bernav; Baba, Uryan, Lorî û Hemedanî ne. Helbestvan di helbestên xwe de bernavên Baba, Uryan û Hemedanî bi kar anîne. Di heman demê de ev bernavên biwate, di derbarê raman û jiyana wî de agahî didin me.

Peyva “baba” di demên kevn de ji bo kesên navdar ên ji malbatên mezin, kesên ku ji aliyê gel ve hatine hezkirin û pêşrevên komên baweriyar re hatiye bikaranîn. Di heman demê de peyva “bav” a ku Kurd dewsa “baba” yê bi kar tînin, di demên kevn de ji bo şêx û kesên rêber re jî hatiye bikaranîn. Xêncî van peyva “baba” wateyên mîna “bavê mezin”, “mirovê pîr û kamil” jî dihudirîne.⁶⁴

Peyva “baba” ji demên kevn de ji bo rêberên baweriyar re hatiye bikaranîn û têkiliya “baba û kur” ji aliyê mirovan wekî mînak hatiye girtin. Di Tewratê de Hz. Adem, Hz. Şît, Hz. Îbrahîm û Hz. Îshaq wekî “baba” hatine navandin. Her wiha ev rewş di baweriyaya Xirîstiyaniyê de jî dom kiriye.⁶⁵ Di nav mesîhiyanê rojavayî de bi awayî “pap” û di serdema Êrûpûsê (m. ss. 3) Yewnanî de bi awayî “beb” hatiye bikaranîn. Peyva “Baba” ji bo rêzgirtina mezinên Yarsan, Bektaşî, Qelenderî, Melametî, Hayderî, Nûqtewî û Hurûfî re hatiye bikaranîn.⁶⁶

⁶² Kara, *b.n.*, r. 31.

⁶³ Yıldırım, *b.n.*, r. 14.

⁶⁴ Îbrahîm Ehmed Şiwan, *Edebê Kownî Kurdî*, weş. Zankoy Selehedîn, Hewlêr, 2012, r. 18.

⁶⁵ Süleyman Uludağ, “Baba”, *DİA.*, weş. TDV., İstanbul, 1991, IV, r. 365.

⁶⁶ Azkaii, *b.n.*, r. 128-130.

Helbestvan di xezeleke xwe de bernava xwe ya “baba” ji bo xwe wiha bi kar aniye:

Mû ez rûzê ezel tahir bizadem,

*Ez an rû nam Baba Tahir estem*⁶⁷

Ez ji roja ezel Tahir welîdim

*Ji ber vê ye ku ez Baba Tahir im*⁶⁸

Bernava “baba” ji bo Tahir cara yekem di pirtûka Rawendî ya bi navê “Rahetu’s-Şudûr we Ayetu’s-Surûr Der Tarîxê A’lî Selcûq” de cih girtiye. Di pirtûkê de helbestvan bi navê “Baba Tahir” cih digire û rêza ku hikûmdarê Selçûqî ji Baba Tahir re girtiye û daxwazên Baba Tahir ên ji hikûmdarê Selçûqî, wekî gotûbêj cih digirin.⁶⁹ Pirtûk cara yekem di sala 1386’an de hatiye çapkirin.⁷⁰ Destnivîsa vê pirtûkê di pirtûkxaneyê Parîsê de ye.⁷¹

Peyva “uryan” peyveke Erebi ye, di Kurdî de wateya peyvê “rût” e. Ji ber ramana wî ya felsefeya sofîzm û jiyana wî ya derwêşî bixwe, yan jî kesên din jê re “uryan” gotine.⁷² Ev bernav, arifî û sofitiya wî diyar dike. Ji ber ku wî nîrx nedaye dinê û guh nedaye tiştên dinê, bernava “uryan” li wî kirine. Vê bernavê ji bo xwe wiha bi kar aniye:

Nezûnem rût û ‘uryanim kî kerde

Xwudem cellad û bî cûnum kî kerde

Bide xencer ke ta sîne kunem çak

⁶⁷ Yıldırım, *b.n.*, r. 15.

⁶⁸ Kara, *b.n.*, r. 163.

⁶⁹ Rawendî, *b.n.*, r. 99.

⁷⁰ *b.n.*, r. VI.

⁷¹ Yıldırım, *b.n.*, r. 15.

⁷² Xeznedar, *b.n.*, r. 184.

*Bebînem ‘îşq ber cûnum çî kerde*⁷³

Nizanim kî ez tazî’w uryan kirme

Ez ku cellad im, kî ez bêcan kirme

Xencerkê bidin, ez sîng biqelêşim

*Bibînim ku ev eşq, çî bi can kirye*⁷⁴

*“Peyva “Uryan” di dîroka terîqetan de ji bo derwêşên ekola Qelenderiyân hatiye bikaranîn. Jixwe Baba Tahir jî ji aliyê pisporan ve ji pêşiyên vê ekolê tê hesabandin.”*⁷⁵

Rût û tazîbûna helbestvan terkîrin e. Xwe ji bar û bendên dinê û tiştên dine rizgarkîrin e. Yanê terkîrina mal, milk û nîrxên badilhewa ên dinê ne. Wî, cil û bergên kevn xwekiriye û girîngî nedaye dîmenê. Her wiha ew uryan e ku xwe ji qirêjîyên dinê şuştîye û paqij kiriye. Evîndariyeke rût û tazî jiyaye ku jê re gotine Baba Tahirê Uryan. Wî xwe bi bendê eşqa Xwedê ve girêdaye. Eşqa wî ya uryan û xwerû di dilên mirovan de hezkîrîna Xwedê peyda kiriye.⁷⁶

Bernaveke wî ya din jî “lorî” ye. Ew, wekî “Baba Tahirê Lorî” jî tê naskîrin. Ji ber ku bixwe Lor e ji wî re Lorî hatiye gotin. Lor beşek ji Kurdan in. Sînor û kewşênê Kurdan welatê Kurdan ku nawê wê Kurdistan e, ji ser qeraxên behra Hurmûzê ku dikeve ser okyanûsa Hîndî, dest pê dike û ji wir xetek rast dikêşe, tê heta digihîje Meletî û Mereşê.⁷⁷

Lor bi pîranî li ser erdê Îranê li bajarê cihê dijîn. Lor, wekî civakeke Kurd ji Lûlû, Kaşî û Gutiyan pêk hatine. Lor, navê xwe ji navê herêmeke newala Lûr girtine. Newala Lûr li gundê Kurd û li bajarê Miyanrûdê ye.

⁷³ *b.n.*, r. 16.

⁷⁴ Kara, *b.n.*, r. 87.

⁷⁵ Adak, *b.n.*, r. 107.

⁷⁶ Uluçay, *b.n.*, r.25.

⁷⁷ Şerefîxanê Bedlîsî, *Şerefname (Dîroka Kurdistanê)*, (Wer.: Ziya AVCI), weş. Azad, Mersin, 2014, r. 63.

Şemseddîn Samî (kd. 1904) di pirtûka xwe ya bi navê “Kamûsu’l-A’lam” de diyar kiriye ku Lor civatek in, ku li rojavayê Îranê rûdinin û milekî Kurdan in. Navê cihê Loran Loristan e û cihêkî berfireh e.⁷⁸ Şerefxanê Bedlîsî (kd. 1603) di pirtûka xwe ya “Şerefname”yê de êl û eşîrên Kurdan ên sereke wiha dabeş kiriye: Kurmanc (Kirmanc), Lor, Kelhor, Goran.⁷⁹

Baba Tahir ji ber ku li bajarê Hemedanê hatiye dinê û li wir çûye li ser dilovaniya Xwedê, ji wî re “Baba Tahirê Hemedanî” jî dibêjin. Ev bajar bajarekî kevnar e û paytextê dewleta Medan bûye. Ew di dubeytiyeke xwe de vê bernava xwe wiha dîne ziman:

Mû an espîdebaz em Hemedanî

Lane der kûh darem der nihanî

Be balê xwud perem kûhan be kûhan

Be çengê xwud kerem nexçîrbani⁸⁰

Ez ew bazê sipî yê Hemedanî

Mi l’ser çiyê hêlîn heyê nihênî

Bi baskê’xwe difirim li ser çiyên

Ez bi çengê’ xwe dikim nêçîrvanî⁸¹

Hemedan li rojavayê Îranê bajarek e û navenda eyaleta Hemedanê ye. Ev bajar li bintara çiyayê Elwendê li deşteke bibereket de ye. Navê bajêr li ser tabletên Asûriyan ên ku bi nivîsa mixî hatine nivîsîn de wekî “Amadana” hatiye nivîsandin. Hemedan di nivîsteka Bîsutûn ya ku di serdema Darîusê I’em (bz. 521-486) de hatiye nivîsîn wekî “Haxmatana” cih digire û

⁷⁸ Şemseddîn Samî, *Kamûsu’l-A’lam*, IV, 4013, vgz. Yıldırım, *b.n.*, r. 16-17.

⁷⁹ Şerefxanê Bedlîsî, *b.n.* r. 63.

⁸⁰ Yıldırım, *b.n.*, r. 18.

⁸¹ Kara, *b.n.*, r. 113.

Herodotosê dîroknûsê Grek jî navê bajar wekî “Agbatana” tomar kiriye. Ev bajar ji aliyê Kral Deîokes (bz. 728-673) wekî paytextê Medan hatiye kifşkirin.⁸²

Tê dîtin ku her bernavekî wî taybetiyeke wî nîşan dikin.

2.1.3. Zimanê Wî

Zimanên cîhanê li hev bandor kirine û di nav wan de danûstana peyvên çêbûye ku ev helwest ji bo zimanan helwesteke asayî ye. Gelek berhemên ku ji aliyê wêjevanan hatine nivîsandin peyvên zimanên cuda di hundirîn.

Dema ku em berê xwe didin dubeytiyên Baba Tahir rastî peyvên Kurdî û Farsî tînin. Ev helwest jî bi xwe re pirsar; Gelo zimanê Baba Tahir kîjan e? derxistiye holê. Zimanzan û lêkolîner li ser vê pirsê rawestiyane û encamên lêkolînan xwe pêşkeş kirine.

Perwîz Natil Xanlerî jî aniye ziman ku zimanê helbestên Baba Tahir zaravayê niştecîhê Hemedanê ye.⁸³ Edward Browne jî gotiye ku zimanê Baba Tahir zimanê devera wî ye.⁸⁴ Abbarîkî di gotara xwe de tîne ziman ku li Îranê, di ferhenga Dêhxoda⁸⁵ (“Baba Tahir”, *Loxetname-ê Dêhxoda*, hş. 1373) de hatiye nivîsandin ku zimanê Baba Tahir dişibe zimanê Lorî (ذیل باباطاهر: 1373 دهخدا). Moradê Êreng di derbarê helbestên Baba Tahir de nivîsandiye ku mirovên berê ên Loristanê Baba Tahir wekî Lor zanîne û gotine ku helbestên wî jî bi zaravayê Lorî hatiye nivîsandin. Lokolîner û mamosteyên Kurd jî Baba Tahir wekî Kurd pejirandine û gotine ku helbestên wî bi Loriya Kurdî hatiye nivîsandin.⁸⁶

Zimanê Kurdî xwediyê zarava û devokan e. Hin lokolîner di dabeşkirina zimanê Kurdî de hin zaravayan wekî devok, hin devokan jî wekî

⁸² Yıldırım, *b.n.*, r. 18-19.

⁸³ Perwîz Natil Xanlerî, “Dubeytîhayê Baba Tahir”, Parwîz Azkaii, *Baba Tahir-Name*, *b.n.*, r. 58.

⁸⁴ Edward Browne, “Baba Tahirê Uryan”, Parwîz Azkaii, *Baba Tahir-Name*, *b.n.*, r. 36-37.

⁸⁵ “Loxetname-ê Dêhxoda”, Navê ferhengeke Farsî ye.

[<http://parsî.wîkî/dehxodasearchresult-fa.htm>], Gihîn: 28 Gelawêj 2015

⁸⁶ Seyyêd Arman Huseynî Abbarîkî, “Nêgahî Tazê Be-Zebanê Şêrê Baba Tahêrê Hemedanî”, *Kêtabê Mah Edebiyat*, j. 80, Azermah 1392, r. 24.

zarava nîşan kirine. Reşîd Yasmî zimanê Kurdî bi çar zaravayan ve dabeş kiriye: Goranî, Kurmancî, Lorî û Kelhorî. Moradê Êreng jî zimanê Kurdî wiha dabeş kiriye: Soranî, Hewramî, Badînanî, Lorî û Bextiyarî. Tê dîtin ku her du lêkolîner jî Lorî wekî zaravayê Kurdî nîşan kirine.⁸⁷

Zaravayê Goranî zimanê helbestên irfanî û mezhebî yê Kurdan e. Di heman demê de ev zarava di erdnîgariya Kurdan de bûye zimanê wêjeyê. Helbestvan û arifên Kurdan bi zaravayê Goranî berhemên xwe nivîsandine. Helbestvanên mîna; Şa Xoşîn, Baba Bozorg, Fatime Lore, Molla Perîşan, Xan Elmas, Torke Mîr ku ew di herêma Lekan jiyane, Xolam Rêza Erkevazî, Şake, Xan Mensûr, Seyyêd Yeqûbê Mahîdeştî û Seyyêd Salêhê Mahîdeştî ku ew jî bi zaravayên Kelhorî û Feylî axivîne, bi zaravayê Goranî helbest nivîsandine. Têkiliya Baba Tahir jî bi wan re heye ku ew di dubeytiyeke xwe de dibêje ez Lek im. Di dubeytiyên Baba Tahir de peyvên zaravayên Goranî û Lekî hene.⁸⁸

Di derbarê zimanê Baba Tahir de Qedem ‘Elî Seramî, di gotara xwe ya bi navê “Baba Tahir û ‘Îrfan” de dibêje: Bêguman zimanê helbestên Baba Tahir zimanê herêma wî ya bi navê Lorî ye. Lorî, li herêma ku Baba Tahir lê jiyaye berbelav bû. Cara yekem helbestên Baba Tahir, di hicrî sedsala nehem de hatine weşandin. Her wiha zimanê vê weşanê ne Pehlûyat e. Pehlûyat zimanê ku Baba Tahir helbestên xwe pê nivîsandiye û zimanê kevntirîn ya wê herêmê ye. Di pirtûka Şemsê Qeysê Razî ya bi navê el-Mu‘cem fî me‘ayîri Eş‘ari’l-‘Ecem de mînakên Pehlûyatê Cobal hene û him ji aliyê peyvên û him ji aliyê kêşeyê ve jî helbestên ku wekî yê Baba Tahir hatine pejiwandin de cudatî hene. Ev jî diyar dike ku gava ku helbestên Baba Tahir hatine weşandin wê gavê peyv û kêşeya helbestên wî bi kêşe û peyvên nû ve hatine guherandin. Lê zimanê helbestên wî cureyekî Lorî ye ku Lorî di wê herêma ku Baba Tahir lê jiyaye de dihate bikaranîn.⁸⁹

⁸⁷*b.n.*, r. 28.

⁸⁸*b.n.*, r. 29.

⁸⁹ Qedem ‘Elî Seramî, “Baba Tahir û ‘Îrfan”, [<http://www.drserami.com/index.php/2014>], Gihîn: 30 Berfenbar 2014.

‘Ebdulhuseyn-ê Zerrînkûb di pirtûka xwe ya *Custucû der Tesewif-ê Îran* de diyar dike ku berhemên Baba Tahir bi zimanê xwe yê resen nemane û zimanê berhemên wî hatine guherandin. Baba Tahir bi Fehlewî berhemên xwe nivîsiye.⁹⁰ Baba Tahir di helbesteke xwe de diyar kiriye ku zimanê min “Pehlewî” ye. Gelek zimanzan dibêjin ku Pehlewî zimanê Kurdan e ku niha di dewsa wî de Kurdî tê gotin. Her wiha ev nav ji bo zaravayên Kurdî sîwan e.

Xeznedar diyar dike ku, hêviya bi gihîştina zimanê resen ên helbestên Baba Tahir tune. Ji ber ku dubeytiyên wî di nav gelan de li ser zimanan bûye, mixabin wekî resenê xwe nehatine nivîsîn.⁹¹ Helbestên ku nehatine nivîsîn lê bi devkî hatine gotin bi domana demê re li ser wan guherîn pêk hatine.

Cudatiya zaravayê Baba Tahir ji zaravayên hawirdora Hemedanê heye. Têkiliya helbestên wî ên ku hatine berhevkirin û çapkirin, ji aliyê ziman ve bi Farisîyê ve têkil in. Lê ji aliyê din ve tê dîtin ku helbestên wî hatine guhertin. Wekî mînak: Peyvên zaravayê Lorî bi Farisîyê ve wiha guherîne; nûm-nam, destûm-destem, reftûm-reftem, dîr-dûr. Peyvên hevpar ên zaravayên Kurdî bi Farisî ve wiha guherîne; vac⁹²-goften, ker-kerden. Qertafên zaravayê Goraniya rojavayê dîr bi Farisîyê ve wiha guherîne; mî, ker, w-mîkoned, ay, yû-mîayed. Xêncî van peyva dîrem / derûm, bi peyva “darem”ê ve guheriye ku ev peyv li bajarê Kazerûnê ku ev bajar nêzîkê Şîrazê ye, tê bikaranîn.⁹³

Karl Hedenk gotiye ku dubeytiyên Baba Tahir hemû zaravayan dihundirîne.⁹⁴ Minorsky derbarê zimanê Baba Tahir dibêje; Kelman Hevar zimanê dubeytiyên Baba Tahir bi navê “Pehlewiya Îslamî” navandiye (m. 1885) lê ev nav ji aliyê gelek profesorên ve nehatiye pejirandin.⁹⁵

⁹⁰ ‘Ebdulhuseyn-ê Zerrînkûb, *Custucû der Tesewif-ê Îran*, ç. 5, weş. Muesese-ê Intişarât Emîrkebir, Têhran, h. 1376, r. 181-187.

⁹¹ Bnr., Xeznedar, *b.n.*

⁹² Vac: Kurdî ye û tê wateya “gotin” e. Di gelek helbestên Baba Tahir de “vac” hatiye bikaranîn. Di pirtûka Parvîz Azkaii ya bi navê “Baba Tahir-Name” de 24 dubeytin Baba Tahir wekî mînak hatiye dayîn ku di wan de “vac” hatiye bikaranîn. (bnr. Azkaii, *b.n.*)

⁹³ Vladimir Minorsky, “Zîstname-î Baba Tahir”, Parvîz Azkaii, *Baba Tahir-Name*, *b.n.*, r. 118.

⁹⁴ Karl Hedenk, “Zebanê Çarperehayê Baba Tahir”, Parvîz Azkaii, *Baba Tahir-Name*, *b.n.*, r. 15-20.

⁹⁵ Vladimir Minorsky, “Zîstname-î Baba Tahir”, Parvîz Azkaii, *Baba Tahir-Name*, *b.n.*, r. 118.

Koçberên Îranê di angaşên xwe de Baba Tahir ji xwe dibînin. Ev rewşeke asayî ye ku dubeytî bi awayekî xwezayî bi zarava û devokên wan ve guherîne. Minorsky diyar dike ku dubeytiyên Baba Tahir ên ku hatine çapkirin bêguman nêzî Farisiya îro ne. Di helbestên Baba Tahir de lêkerên wekî mînak vac (axaftin), ker (kirin) bi ziman û zaravayên Kurdî ne.⁹⁶

Di lêkolînên li ser peyvên dubeytiyên Baba Tahir hatine kirin de tê dîtîn ku bi piranî peyvên dubeytiyan peyvên zaravayên rojavayê Îranê ne ku li rojavayê Îranê Kurdên Lor, Hewram, Soran, Goran, Kurmanc dijîn. Ji bo van peyvan em dikarin bi Kurmanciya wan, çend mînakan bidin: dî-dîtin, dard⁹⁷-heyîn, dal⁹⁸-helo, wênewşe-binevş, vêl⁹⁹-gul, ov-av, kirê-kirin, ya-cî, behrûzî-danîn / daynî, te-te, bemed-bêyîn/hatin, vûçadest-vûçan/behnvedan/rawestan, ez¹⁰⁰-ez, henî-niha, nebî-nebû, dî-dît, ro-roj, cînan-êjînan/ji van re, beraman-girîn, e-ez, tule-tule,¹⁰¹ rût-rût, beşûm-biçim, waxwerd-vexwar, neçîrwan-nêçîrwan, nej-ne jî û wd.¹⁰²

Li gorî lokolîneran zimanê “Med”¹⁰³ bingeha zimanê gelên rojhilata navîn e. Bi heman navî navê dewleta “Med” heye ku dewleta gelên rojhilata navîn e. Ev dewlet dewleteke Kurdan e û xwediyê şaristaniyeke bilind a serdema xwe bûye.

Dewleta Med ku di heyama xwe de dewleteke pêşketî bûye, bav û bapîrên Farisan (Pers) bi koçan ji rojhilata behra Hazarê tînin li welatê Medan bicih dibin û bi sedsalan di vê dewletê de di bin ziman û çanda Medan

⁹⁶ *b.n.*, r. 118.

⁹⁷ Dard: Peyveke Avestayî ye (*Azkaii, b.n.*, r. 105) û di Kurdiya Kurmancî de wateya wî: “xwedîbûn û heyîn” e.

⁹⁸ Dal: Wateya peyvê helo ye. Di zaravayên Kurdî de wekî teyr, eylo, hilo, qertel, daraş jî tînin navandin. (*Türkçe-Kürtçe Sözlük*, Amd.: Zana Farqînî, weş. Enstîtuya Kurdî. Stenbol, 2000, r. 672)

⁹⁹ Vêl: Ev peyv peyveke Avestayî ye (*Azkaii, b.n.*, r. 104) û wateya peyvê gul e.

¹⁰⁰ Ez: Peyva Avestayî ye (*Azkaii, b.n.*, r. 109) û di Kurdî de jî beramberê peyvê “ez” e. Ji xwe wekî ku tê zanîn Kurdî berdewama zimanê Avestayê ye.

¹⁰¹ Tule: Ji aliyê Kurdan ve tê bikaranîn (*Azkaii, b.n.*, r. 112). Ev peyva ku di zaravayê Kurmancî de wateya tule, têtjikên kuçik, se û segan de tê bikaranîn. Lê bi giştî ji bo hemû ajal, nebat û gîha tê bikaranîn.

¹⁰² *Azkaii, b.n.*, r. 105-112.

¹⁰³ Med: Jê re mad jî tê gotin ku navê gelekî rojhilata naverast e, her wiha di dîrokê de navê dewleteke Kurdan e.

(Kurdan) de dimînin. Wê demê Med şaristanî ne û pêşkefî ne. Her wiha çanda serdest Med in ya bindest Faris in ku ji ber van helwestan gelek peyvên zimanê Med derbasê zimanê wan dibe. Li gorî civaknasiyê jî çanda bindest dikeve bin bandora çanda serdest û diguhere. Di heman demê de ji aliyê ziman û wêjeyê jî çanda bindest dikeve bin bandora çanda serdest. Bi awayekî xwezayî peyvên Medî derbasî zimanê Farisan dibin, ziman û wêjeya wan teşeyeke nû digire. Bi sedsalan şûnde desthilatî bi awayekî derbasî destê Farisan dibe û demeke şûnde jî ew dawî bi dewleta Medan dînin.¹⁰⁴

Diakonoff (1914-1999) pisporê dewleta Medan gotiye ku: Di dema desthilatiya Hexemenîşiyân de di heyama desthilatiya Daryûş û Kûroş de nivîstek / kîtabe hatine nivîsin. Di van nivîstekan de em hîn dibin ku wêjeyeke xurt heye lê ev wêje ne wêjeya desthilatiya Hexemenîşiyân e. Ev wêje wêjeyeke kevnar e û ya beriya Hexemenîşiyân e. Ev wêje, wêjeya Medan e.¹⁰⁵ Xêncî vê nivîstekek bi navê “bêsitûn” heye ku niha li bajarê Kurdistan Kirmanşahê ye, derbarê vê nivîstekê Dandamaev pisporê alfabeya mîxî diyar kiriye ku nivîsteka bêsitûn bi zimanê Medî hatiye nivîsin û nivîstekên heyama desthilatiya Hexemenîşiyân bi giştî bi peyv û hevokên Medî hatine nivîsin. Her wiha di van nivîstekan de navên taybet (navên cih û zîndewaran) bi giştî bi zimanê Medî hatine nivîsin. Ev jî diyar dike ku serdema desthilatiya Farisan de bingeha wêjeya Farisî bi zimanê Medî ye û Farisan bi ziman û çanda Medan wêje û çanda xwe domandine. Lêkolînerên ku li ser dewleta Medan xebatên zanistî kirine bi giştî dibêjin; Navên taybet ên Medan ên ku di nivîstekan de hene nîşan dikin ku Med beriya hemû Îraniyan li wir bûne û li beriya tevî Îraniyan xwedî medenîyet bûne. Ji ber ku ew beriya hemû gelên devdorên xwe medeniyet ava kirine, ew ji gelek aliyan bandor li yên din kirine.¹⁰⁶

Abbarîkî diyar dike ku hin nivîskarên berê, bajarên Farisîziman ji bajarên Pehlewîziman veqetandine. Wekî mînak; Hemzê Êşfehanî diyar kiriye

¹⁰⁴ Ali Fuat Yılmazel, *Uygurluk Tarihi*, weş. Anadolu Üniversitesi, Eskişehir, 2011, r. 131-132.

¹⁰⁵ Igor Mikhailovich Diakonoff, *Istoriya Midii, 1956/Media, The Cambridge*, [cf. 14], 2, 36-148, vgz. Azkaîf, *b.n.*, r. 162-164.

¹⁰⁶ Muhammad Abdoukadyrovitch Dandamaev, *A Political History of the Achaemenid Empire*, 1989, r. 82-121, vgz. Azkaîf, *b.n.*, r. 164.

ku pênc heb zimanê Îraniyan hene: Pehlewî, Derî, Farisî, Xuzî û Suryanî (التنبيه على حدوث التصحيف). Padîşah serdemên kevn ên Îranê di qesr û civînan de bi zimanê Pehlewî axaftine. Ew dibêje di nivîsên nivîskarên berê ên mîna: Hemzê Êşfehî, Şîrvîyê bîn Şehrdar û Îbn Mûqf'e de diyar dibe ku zimanê Pehlewî li rojavayê Îranê hatiye axaftin. Ji ber nivîsên nivîskarên navborî diyar dibe ku wan, zimanê Kurdî-Lorî wekî zimanê Pehlewî pejirandine. Abbarîkî dibêje: Îro jî ez dibînim ku gelek peyvên Pehlewî di zaravayên cuda ên Kurdî de tên bikaranîn.¹⁰⁷

Ji zimanê Pehlewî re Farisiya naverast tê gotin. Lê dewsa vê gotinê ji zimanê Pehlewî re zimanê “Mediya Naverast” bê gotin rastir e. Olz Hewzin Îrannasekî Almanî ye ku yekem car wî gotiye ku ziman û nivîsîna Pehlewî dewama zimanê Medî ya kevnare ye. Diakonoff dibêje ku peyva “part û pars” navên Medî ne. Peyvên part û pars di zimanê Medî de tên wateya cînariyê. Her du jî cînar in.¹⁰⁸ Di vir de diyar dibe ku ji wan neteweyên ku hatine cîwarê Medan ji aliyê Medan ve nav li wan hatine kirin. Her wiha navê Farisan (part û pars) jî Medan li Farisan kirine.

Baba Tahir di dubeytiyeke xwe de xwe wekî Lek nîşan daye û di yeke din de jî gotiye ku zimanê min Pehlewî ye, ku bingeha Pehlewîyê jî zimanê Medî ye. Lê di helbestên wî de bandora zaravayê Lorî girantir e. Lekî, Lorî û Goranî zaravayên Kurdî ne. Wekî encam, ji lêkolîn û rastiyên dîrokê eşkere dibe ku zimanê Baba Tahir Kurdî ye.

2.1.4. Nasnameya Wî

Ji ber ku van salên dawiyê li ser nasnameya Baba Tahir gotinên cuda derketin der, em di vê xebata xwe de li ser nasnameya wî rawestiyên. Ji ber ku dubeytiyên wî ên ku niha li dest in, bi dîmeneke Farisî xuya dikin ji aliyê hin kesên Îranî ve tê angaştîkirin ku Baba Tahir ji aliyê neteweyê ve Faris e. Lê, nivîskar û lêkolînerên bîyanî û hin yên Faris Baba Tahir wekî Faris nabînin. Di heman demê de hemû nivîskarên Kurd bawer dikin ku Baba Tahir Kurdê Lor e

¹⁰⁷ Abbarîkî, *b.n.*, r. 25.

¹⁰⁸ Azkaî, *b.n.*, r. 167-171.

û di navbera Hemedan û Loristanê jiyaye. Ji bo îspatkirina van gotinan pêdiviya belgeyên ronî û eşkere hene. Çend belgeyên ku ji bo îspatkirina van gotinan ev in:

- 1- *Baba Tahir birayê Baba Yusif e. Baba Yusif bavê Baba 'Elî ye. Baba 'Elî jî bavê Şêx Îsa û Musayê Berzincî ye. Seyidên Berzincî jî ji neviyên Şêx Îsa ne û Kurdên sunî ne.*
- 2- *Di destpêka dîwana Baba Tahir û hin çavkaniyên din de nîşaneyek derbarê gotineke Baba Tahir heye ku ev gotin wiha ye: "Emseytu Kurdiyyen ve eşbehtu 'Erebiyyen." Ev gotin Kurdbûna wî diyar dike. Lê ev gotin wekî gotina hin kesên din jî hatine diyarkirin ku yek ji wan Ebû'l-Wefayê Kurd e. Lê bi raya giştî tê pejirandin ku ev gotin gotina Baba Tahir e. Di pirtûka Nefehatê rûpela 362'an de derbarê vê gotinê agahî heye. Xêncî van lêkolîner Jûkûfskî dibêje ku min li bajarê Têhranê bihîstiyê ku ev gotin ya Baba Tahir e. Heron Allen jî aniye ziman ku ev gotin li bajarê Hemedanê bi nav û deng e.¹⁰⁹*
- 3- *Di pirtûka Cuneydê Şîrazî (kd. 801/1399) Şeddu'l-'Izar (Şeddu'l-'Izar fî haftî'l-evzar 'an zuvvarî'l-mezar / شدالازار فى حطّ الاوزار عن زوار المزار / de li ser gotina "Emseytu Kurdiyyen ve eşbehtu 'Erebiyyen" hatiye rawestan. Di pirtûkê de tê fêmkirin ku ev gotin her çiqas wekî gotina hin kesên din hatibe gotin jî bi piranî wekî gotina Baba Tahir hatiye pejirandin. Mewlanayê Romî di mesnewiya xwe de nîşan bi vê gotina Baba Tahir kiriye û ew bi şêweyeke raz û bi awayekî payeberz şîroveya vê gotinê kiriye.¹¹⁰*

Mewlana di Mesnewiyê de derbarê gotina Baba Tahir wiha gotiye:

¹¹¹ سرامسینا لکردیا بدان راز صبحنا عربیا بخوان

¹⁰⁹ Şiwan, *b.n.*, r. 23.

¹¹⁰ Muînuddîn İbnu'l Qasim Cuneydê Şîrazî, *Şeddu'l-'Izar fî haftî'l-evzar 'an zuvvarî'l-mezar*, b. 3, weş. Mohles, Têhran, şemsî 1328, r. 510-516.

¹¹¹ Mevlânâ Celâleddîn Rûmî, *Mesnevî-i Şerîf Şerhî*, (Werger û Şerh: Ahmed Avni Konuk), b. II, weş. Gelenek, İstanbul, 2004, r. 428.

Raza ku min şevê wekî Kurd derbas kir bizane. Raza ku em wekî Ereb derketine berbangê bixwîne.¹¹²

Mewlana di Mesnewiya xwe de li ser gotina Baba Tahir a ku dibêje: “Ez ketim xewê Kurd bum û sibehê hişyar bûm ‘Ereb im” helbesta jor nivîsandiye. Ev gotin, gotina Baba Tahir e ku di mesnewiya Mewlana de gotina Baba Tahir û şîroveya bûyera Baba Tahir ya bi xwendakarên medreseyê û hewza qeşemgirtî cih digire. Mewlana di mesneviya xwe de derbarê razê û ilma veşartî agahî dide û wiha dibêje: Ew, ilma ku bêpirtûk, bêmamoste û bêhînkêr di dil de peyda dibe vedibêje. Ew, ilma pêxemberan rave dike.¹¹³ Derbarê vê mijarê di Ansîklopediya Îslamê de agahî wiha ye: Çawa derbarê kerametên helbestvanên sofî ên mîna Attar, Celaledînê Rumî û Hafizê Şîrazî gotinên balkêş hene, bi heman awayî derbarê jîyan û kerametên Baba Tahir de jî gelek gotinên balkêş hene. Li gorî gotinan, ji rojan rojekê Baba Tahir, ji feqiyên medreseya Hemedanê pirsar; “ji bo bidestxistina zanîne divê çî bê kirin” dipirse. Feqî henekên xwe bi wî dikin û ji wî re dibêjin, divê tu şeveke zivistanê di nav ava hewza qeşemgirtî de bimînî. Baba Tahir, şîreta wan pêk tîne û di nav ava qeşemgirtî de heta sibê dimîne. Berbangê ronahiyek tê dikeve devê wî, qêrîn jê diçe û wiha dibêje: “Emseytu Kurdiyyen ve eşbehtu ‘Erebiyyen” (Ez ketim xewê Kurd bum û sibê hişyar bûm ‘Ereb’im). Bi vî awayî ew bi ronîya zanîne ronî dibe. Tê gotin ku ji wê rojê pê de êdî hemû rêyên zanîne li ber Baba Tahirê Uryan vedibin û pêdiviyên zimanan jî pêk tên. Li piştî vê bûyerê, ew dibe xwediyê ilmeke bilind û bi xwendekarên medreseyê re axaftinên felsefî û tesewîfî dike.¹¹⁴ Em di vê buyera Baba Tahir de hîn dibin ku ew xwediyê ilmekî biraz e ku vê ilmê ji mamoste û pirtûkan negirtiye. Di vê bûyerê de xuya dibe ku ilm di Baba Tahir de bêvîna wî peyda bûye ku ev cure ilm, ilma biraz e. Dema ku em bûyera Baba Tahir û gotinên Mewlana didin berhev, dibînin ku di navbera bûyera Baba Tahir û gotinên Mewlana de têkilî heye. Di vê têkiliyê de eşkere dibe ku helbesta Mewlana ya jor derbarê gotina

¹¹² Mevlâna Celâleddîn Rûmî, *Mesnevî*, (Amd.: Adnan Karaismailoğlu), b. 1, weş. Yeni Şafak, İstanbul, 2004, r. 149.

¹¹³ *b.n.*, r. 148-149.

¹¹⁴ V. Minorsky, “Baba Tâhir ‘Uryan”, *İslâm Ansiklopedisi*, ç. 5, weş. M.E.B., Eskişehir, 1997, II, r. 171.

Baba Tahir û bûyera wî agahî dide. Mewlana him behsa ilma biraz dike û him jî Kurdbûna Baba Tahir tîne ziman.

Di vê gotina, “Ez ketim xewê Kurd bum û sibê hişyar bûm ‘Ereb’im” de tê dîtin ku di derûniya Baba Tahir de guherînek qewimiye. Dibe ku hin kes bêjin, ku yê dibêjin hene, bi vê gotina xwe Baba Tahir ji Kûrdbûnê derketiye û bûye Ereb. Mirovên ku wiha difikirin ne ji gotina Baba Tahir tiştêkî fêhm kirine ne jî ji cîhanê. Ji şevê heta sibehê guherîn pêk hatiye lê ev guherîn ne guherînek neteweyî ye. Her wekî ku tê zanîn ji bo mirovekî guherîna neteweyî ne pêkan e. Yanê kesek nikare bêje ez Kurdbûnê berdidim û dibim Ereb. Mîna çawa ku meriv nikare dayik û bavê xwe, xwîşk û birayên xwe biguherîne, her wiha nasname û netew jî wisa ne. Ev guherîna ku Baba Tahir behs dike, guherîneke têgihîştinî ye ku me şîroveya vê gotina Baba Tahir di mijara “Baba Tahir û Mewlana” de kiriye.

4- *Çi qas guherîn li ser dubeytiyên Baba Tahir hatine jî dîsa jî di nav dubeytiyan komek peyv hene ku Faris ji wan peyvên fêhm nakin û ji bo têgihîştina wan peyvên ferheng amade kirine ku ji dubeytiyan fêhm bikin.*

5- *Di kovara “Herêma Kurdistan”ê de ji aliyê nivîskar Hekîm Mele Salih ve dubeytiyek Baba Tahir hatiye weşandin ku di vê dubeytiyê de Baba Tahir xwe wekî “Lek” dide nasîn ku Lek jî hozeke / êleke Kurdan nin. Baba Tahir wiha dibêje:*

Mû derwêş im, Lek im, îcaz dîr im

Mû dustê çû Xoşîn hawraz dîr im

6- *Di destnivîseke kevn de ku ev destnivîs di sala 848’ê koçiyê / hîcriyê de hatiye nivîsîn û li mûzeyê Qonyayê ye, dubeytiyên Baba Tahir hene ku li ser van dubeytiyan guherîn pêk nehatine û ji dîwanên Baba Tahir ên ku hatine çapkirin gelek cuda ne. Ev destnivîsa kevn jî nîşan dike ku dubeytiyên Baba Tahir hatine guherîn û zimanê rast ên dubeytiyan Lorî ye. Ev belgeyan diyar dikin ku Baba Tahir Kurd e.¹¹⁵*

Ziman û nasname girêdayî hevdu ne. Ji bo mirovekî zimanê dayikê heman demê de nasnameya wî kesî jî nîşan dike. Em baş dizanin ku ji bo

¹¹⁵ Şiwan, *b.n.*, r. 23-24.

mirovekî mîna Baba Tahir ne ziman ne jî nasname girîng e. Bi baweriya me, nasnameya wî hebe nebe eşqa wî ye, fikir û ramanên wî ne. Ew mirovekî dildar e û bi zimanê dayikê eşqa dilê xwe vegotiye. Bi zimanê xwe yê zikmakî berhemên xwe hilberandiye û ev berhemên wî ji bo hemû mirovên cîhanê re ne. Lê çawa ku Xwedê mirovan qewm bi qewm afirandiye ku hevdu nasbikin, Baba Tahir jî ji qewmekî ye û xwediyê nasnameyekî ye. Baba Tahir di heman demê de aşiqê rastiyê ye, lê niha hin alî hene ku ji bo berjewendiya xwe, hewl didin ji aliyê nasnameyê ve wî ji rastiya wî dûrbixin.

Baba Tahir Lor e û “lor” beşeke ji kurdan in. Jixwe ji demên kevnare ve kurd, li ser çar liqan dihatin beşkirin: Kurmanc, Zaza, Soran û Lor. Vê rewşa hanê heya dawîya çarîka yekem a sedsala bîstan ajot. Li Îranê di nav farisan de heya sedsala bîstan hemû farisan jî kurdbûna loriyan dipejirandin. Di vê sedsala me de, ji bo neyê gotin ku wêjeya Îranê ya pêşîn ji aliyê yekî Kurd ve (ku Baba Tahir e) hatiye nivîsandin; beşek ji farisan înkara kurdbûna loriyan dikin. Hal ew e ku lorî kurd in û berî navê Kurdistanê navê erdê wan hebû û Loristan bû.¹¹⁶

‘Elî Şerî’etî di pirtûka xwe ya Kevîr de dibêje: Arifek him jî çî arifek, di hundir de bi qasî cîhanan ronahî, qasê asoyan merîfet, zerya bi zarya zanîn, têgihîştin û fêmdarî, Baba Tahirê Uryan ê Kurd.¹¹⁷ Bi vê gotina xwe ‘Elî Şerî’etî, Baba Tahir wekî arif, xwedî merîfet, ehlê nûr û ronahiyê û bi qasî zeryayan zana dibîne. Her wiha diyar dike ku Baba Tahir kemiliye û kamil e ku ew ji rastiya hebûnê fêm kiriye û têgihîştiye. ‘Elî Şerî’etî di derbarê nasnameya Baba Tahir de agahî dide û dibêje ev arifê zana Kurd e. ‘Elî Şerî’etî Faris e lê ew ne mîna Farisên nijadperest tevgeriyaye. Mirovên nijadperest her tiştî li ser berjewendiya neteweya xwe dinirxîne hin caran rêya xwe şaş dike û ji rastiyê derdikeve, hin caran jî derewa dike hewl dide ku nerastiyê wekî rastiyê nîşan bike. Lê belê dike nake nagihîje vê daxwaziya xwe. Nexwe hin nivîskarên Faris nikarên ku ev mirovê mîna rojê yê ehlê nûr û ronahiyê wekî Faris nîşan bikin û wî ji nasnameya wî ya rast dûr bixin. Ji bo Baba Tahir, Kurdbûn an jî ji

¹¹⁶ Sağniç, *b.n.*, r. 69.

¹¹⁷ Ali Şerîati, *Çöle İniş (Hubut-Kevir)*, ç. 2, (Wer.: Hicabi Kırlangıç-Derya Örs), weş. Fecr, Ankara, 2002, r. 473.

neteweke din bûn taybetiyeke ne girîng e. Heke girîng bûya ew nedibû Baba Tahir û di dilê tevî mirovên cîhanê de cih nedibû, yan jî nedigihîşte vê asta bilind. Ew bi huner û eşqa xwe ya dilsoz û bi felsefeya xwe, gihîşte vê astê. Ji ber ku mirovên nijadperset xwedî fikir û hişekî teng in, mixabin tenegehîştine ku ew nikarin bibin mirovên cîhanê.

Reşîd Yasmî Baba Tahir wekî helbestvanê xwezayê navandiye û wî derbarê Baba Tahir wiha gotiye: Helbestên Baba Tahir ji ber ku xwerû û pîrxem in di dil de rûdinin. Helbestvanê Farisîziman carinan helbestên xwe bi zimanê herêmî saz kirine ku wekî mînak: Bundar-ê Razi, Se'diyê Şîrazî, Xace Hafîz û Ebî Îshaq-ê Et'îme û wd. Lê belê gotinên hozanên Kurd û Lor bêtir letîf û xwezayî û xweşiktir in. Bêguman ji van hozanan yek jî Baba Tahir e. Helbestên mezhebî û dînî yên Molla Perîşan û Molla Rehîmê Kurd, xezelên Seyyîd Ye'qûbê Mahîdeştî û wd. di nav eşîrên rojhilatê Îranê de îro jî bi nav û deng in. Lê dubeytiyên Baba Tahir kevntir in û ji aliyê wateyên tesewîfî ve bêtir balkêş in. Lewre berhemên Baba Tahir di nav berhemên Îslamî yên wêjeyî de herî kevn in.¹¹⁸

Baba Tahir di dubeytiyeke xwe de wiha gotiye:

Ez ustadê zimanê pehlewî me

Ji kitêba evînê re mester im

Ey Xweda eşqa Tahir bînîşan e

*Ku ji eşqa seneman bê pî û ser im*¹¹⁹

Helbestvan zimanê xwe wekî Pehlewî nîşan daye. “*Divê neyê ji bîrkirin ku zimanê pehlewî maka zimanê Kurdî ye û jê re Kurdiya Kevn jî tê gotin.*”¹²⁰

Wêjeya Îranê ya nivîskî bi Baba Tahir dest pê dike. Ev jî tê vê wateyê, wêjeya Îranê ya nivîskî bi Kurdekî dest pê dike. Bi destpêkirina bi Kurdekî

¹¹⁸ Reşîd Yasmî, “Baba Tahirê Uryan”, *Meccele-î Armaxan*, Têhran, ş. 10/1308, r. 66-70.

¹¹⁹ Sağniç, *b.n.*, r. 70-71.

¹²⁰ *b.n.*, r. 71.

helwestekî cuda derdixe holê ji bo pergala Îranê. Li gorî pergala Îranê divê ev wêje bi Farisî û Farisekî destpê bikira. Ji ber ku wêjeya Farisan bi Kurdekî dest pê dike, Faris ji bo xwe vê rewşê wekî kêmasî dibînin. Ev jî dibe sedemê înkarkirina Kurdbûna Baba Tahir. Di encamê de Baba Tahir wekî Faris dipejirînin. Zaravayê Lorî ya ku Baba Tahir dubeytî û xezelên xwe pê nivîsî ye jî wekî Farisiya kevn dipejirînin. Bi vê rewşê zaraveyekî Kurdî jî ji holê radikin. Xêncî van li ser dubeytiyên Baba Tahir lîstik pêk hatine da ku berhemên wî nêziktirê Farisî bikin. Hin peyvên zaravayê Lorî ji dubeytiyan hatine derxistin û peyvên Farisî hatine bicihkirin da ku Baba Tahir bibe Faris. Gava ku em nusxeyên dubeytiyên Baba Tahir didin li ber hev, dibînin ku hin nusxe ber bi Farisî ve hatine guherandin, lê hin nusxe nêzî Kurdî ne.


Ji ber ku Baba Tahir bi berhemên xwe destpêka wêjeya nivîskî ya piştî Îslamê ye, mirovekî payebilind e û ji ber bêdewletbûn û bê sazîbûna Kurdan bêxayî maye, Farisan dest avêtine wî, daxwaz kirine ku wî û berhemên wî ji xwe bidin zanîn. Baba Tahir ji kîjan neteweyê be, dê bi berhemên xwe wêjeya wî neteweyê xurtir bike û bi vî awayî nirxa wî neteweyê bilintir bike. Li rojhilata navîn ev lîstikan bi taybet li ser ziman û berhemên Kurdan tên kirin, ne tenê li ser Baba Tahir û berhemên wî.

Her wekî ku tê zanîn cînarên Kurdan ji ber berjewendiyên xwe heta ku destên wan hatine Kurdan wekî neteweyekî nepejiradine, berhemên Kurdî neparastine, hin berhemên Kurdî wekî malên xwe dane zanîn, hin kesên navdar ên Kurd ji neteweyên xwe dane zanîn, di wergerên ku ji pirtûkan kirine de, wergera peyva “Kurd” yan nekirine, yan jî dewsa peyvê peyva neteweya xwe bi kar anîne.¹²¹ Hikimetên stemkar bi derew û xapandinan Kurdan wekî Tirkên çiyayî, Farisên çiyayî, Erebên pašmayî û koçer navandine. Bi vî awayî Kurdan bêmaf kirine, welatê wan talan kirine.¹²² Derbarê vê mijarê em dikarin ji pirtûka Ibnu’l- Esîr mînakekê bidin.

¹²¹ M. Kewê Dilxêrî, “Rustemê Zal’ın Kürtlüğü Üzerine”, [http://www.bilicanhaber.com/yazar.asp?], Gihîn: 28 Tirmeh 2015

¹²² Kurdo, *b.n.*, r. 11.

Pirtûka el-Kamil fi't-Tarîx ji bo dîroknasên Îslamî û ji bo dîroknasên serdema navîn çavkaniyeke girîng e. Ev pirtûk ya Îbnu'l-Esîr e. Pirtûka wî di salên 1980'yî de bi zimanê Tirkî ve hatiye wergerkirin. Peyva “cezîre” peyveke Erebi ye û tê wateya “girav”ê. Ev peyv ji aliyê erdnîgarnasên Erebe ve ji bo navbera çemê Firat û Dîcleyê, ji bo mezopotamyaya jorîn tê bikaranîn. Lewre navbera van her du çeman mîna giravek e. Di wergera pirtûkê ya bi Tirkî de “gelên cezîrê” wekî “gelên nîvgirava Ereban”, di hin ciyan de jî wekî “gelên Erebanê” hatiye wegerkirin. Di nav bûyerên ku sala h. 361'an de qewimîne gotina: “Ebu Taglîp b. Hamdan di meha Şewala vê salê de kela Mêrdînê bi dest xist” wekî “Ebu Taglîp Hamdan di meha Şewala vê salê de kela Hamdanê bi dest xist” hatiye wergerkirin.¹²³ Di wergera Tirkî de mînakên wiha gelek in. Tê dîtîn ku di wergera Tirkî de cî warên Kurdan bi cî warên Ereban ve hatine guhertin. Di pirtûka el-Kamîl Fî't-Tarîx de resena paragrafêkê wiha ye:



Wêneya Rûpeleke Pirtûka el-Kamîl Fî't-Tarîx¹²⁴

¹²³ Mehmet Azimli, *Diyarbakır ve Çevresinin Müslümanlaşma Süreci*, weş. Çizgi Kitabevi, Qonya, 2010, r. 218-220.

¹²⁴ Îbnu'l-Esîr, (Îzzuddîn Ebû'l Hesan-'Elî) *el-Kamil fi't-Tarîx*, ç. el-Mektebetu't-Tewfîqiyye, (Amd.: Xeyrî Seîd), I-X, VI, Mîsir, 2004, r. 280.

Di paragrafa jor de me binê peyva el-Ekrad (Kurd) xêzkir ku ev peyv di wergera paragrafê ya bi Tirkî de çawa hatiye wergerkirin were dîtin. Paragrafa jor bi Tirkî wiha hatiye wergerkirin:

"Bu yıl içinde Zenciler giriştikleri bir savaşta mağlup olmuşlardı. Aralarında akdettikleri barıştan sonra Muhammet b. Ubeydullah Ali b. Eban'a mektup yazıp Türlere karşı kendisine yardım etmesini istemiş ve elde edecekleri ganimeti aralarında paylaşacaklarını söylemişti. Ali efendisine mektup yazıp ondan bu husus hakkında izin istemiş, o da ona: "Oraya bir ordu gönder ve sen kendin olduğun yerde kal, ayrıca ondan rehineler almadıkça ve ona tam güvenmedikçe oraya da hiç kimseyi gönderme. Belki o senden intikam almak isteyecektir." şeklinde mektup yazmıştı. Ali b. Ebân Muhammed'e mektup yazıp ondan yemin etmesini ve kendisine rehineler göndermesini istemişti. Muhammed ona bir sürü yeminler ettiği halde rehine gönderme hususunda bir hayli oyalamıştı. Ancak Ali'nin ganimet elde etmek hırsından dolayı duramamış ve Muhammed'in yanına ordu göndermişti. Muhammet de bu gelen zencilere bir grup askerini katmış ve Türkler üzerine göndermişti. Ancak Türkler karşısına çıkıp da çarpışmaya girince, aralarında şiddetli bir savaş meydana gelmiş, Muhammet b. Ubeydullah'ın adamları Zencileri yalnız bırakıp geri çekilmişlerdi. Böylece onlar büyük bir hezimete uğramışlar, Türkler de onlardan büyük bir kitleyi öldürmüşlerdi."920

Wêneya Wergera bi Tirkî¹²⁵

Pirtûka Îbnu'l-Esîr wekî resena xwe bi Tirkî ve nehatiye wergerkirin. Di paragrafê de peyva "Kurd" a ku di çar cihan de derbas dibe ên ku binê wan hatine xêzkirin, wekî peyva "Tirk" hatine wergerkirin û çapkirin. Di vê paragrafê de agahî bi kurtî wiha ye: Zencî di şerekî de têk çûne û peymanekî destnîşan kirine. Muhammed b. Ubeydullah ji 'Elî b. Eban re nameyek şandiye, di nameyê de li hemberî Kurdan ji wî alîkarî xwestiye û parvekirina ganîmetên ku dê bidestxin pêşniyarê wî kiriye. 'Elî, ji daxwaziya bidestxistina ganîmetan

¹²⁵ Îbnu'l-Esîr, *İslam Tarihi, el-Kamîl Fî't-Tarîx Tercemesi*, (Wer.: Ahmet Ağrakça, Redaktor: Mertol Tulum), VII, 275-276, vgz. Azimli, *b.n.*, r. 221-222.

artêşek ji Muhammed re şandiye. Muhammed jî artêşek tev li artêşa zancıyan kiriye û şandiye ser Kurdan. Lê dema ku Kurd derketine hemberî wan şerekî bihêz kirine, artêşa Muhammed b. Ubeydullah zancıyan tenê hiştine û paşve vekişiyane. Bi vî awayî zencî têk çûne û Kurd jî ji artêşa wan gelek leşker kuştine.

Di wergera Tirkî de tê dîtin ku ne rêz ji Îbnu'l-Esîr re hatiye girtin ne jî ji Kurdan re. Wergera Tirkî dûrê rewîşt û zanistê ye. Di vê şerê ku di pirtûkê de agahî hatiye dayîn de serkeftineke Kurdan heye ku wergerkar daxwaz kiriye vê serkeftinê bike malê Tirkan û wan berz bike. Ev mînakêk bû ku me derbarê lîstikên ku li ser Kurdan hatine lîstin da. Rewş wiha ye ku lîstikên li ser Baba Tahir û berhemên wî hatine kirin, ji me re xerîb nayên.

Li gorî baweriya me hewcedariya Tirka, Farisa û Ereba ji erd, berhem û serkeftinên Kurdan tune. Lewre ev her çar netewe jî xwediyê şaristanî, erd, berhem û serkeftinan ne. Her wiha hewcedariya Farisan û wêjeya Farisî bi Farisbûna Baba Tahir jî tune ye, lewre di nav Farisan de wêjewan û berhemên wêjeyî ên binirx gelek in.

Wekî encam, bi giştî lêkolîner zimanê Baba Tahir wekî Kurdî, wî jî Kurd pejirandine. Xêncî hin nivîskar û nijadperestên Faris ên ku li ser nasnemaya Baba Tahir bêlokolîn axaftine, tu lêkolîner Farisbûna Baba Tahir angaş nekirine. Di heman demê de ji belgeyên dîrokê derdikeve der ku ji aliyê nasnameyê ve ew Kurd e.

2.1.5. Serdema Wî

Agahiyên derbarê nasnameya wî, helbestên wî, jiyana wî ji bo fêmkirina Baba Tahir têrê nakin. Divê şert û mercên civakî, siyasî, aborî, çandî û şeweyê jiyana ku ji van şert û mercan derketiye holê were zanîn. Her wiha komên sofîyan, ên têkildarê xwendegehên sofîyan, cihên ku Îslamiyet lê belav bûye, bi taybet erdnîgariya rojhilata navîn ya serdema wî jî divê baş werin zanîn ku Baba Tahir baştir were fêmkirin. Her wiha Baba Tahir ne helbestvanekî nola hin helbestnûsan tenê ji bo helbest nivîsînê helbestên xwe nivîsiye. Ji ber eşqa wî ya paqij û bişewat, gotin bixwe ji dil û hişê wî herikîne û bûne helbest. Ew, mîna sofîyên serdema xwe, ji bo ku ramanên xwe vebêje û

ragihîne, helbestan wekî amûrek bi kar aniye. Lê belê vî karê helbestnivîsînê jî, bi awayekî hunermendî pêkaniye. Ew, di nav şert û mercên dem û dewrana ku lê jiyaye, li ser bingeha çand û baweriyên Kurdan ên kevn û domdar di heman demê de li ser bingeha Îslamê, wekî sofîyekî Kurd bi têgehên vê sofîtiyê ramanên xwe pêşkeş kiriye.

Di erdnîgariya ku Baba Tahir jiyaye, baweriyên mîna Zerdûştî, Êzdîtî, Yarsanî, Îslam û hin baweriyên din hebûne. Wêje û bawerî ji mêj ve xwediyê têkiliyeke xurt in. Helbestvan, helbest û gotinên xwe di rêya Yezdan de, derbarê baweriyên xwe anîne ziman. Di gelek berhemên kevn de wekî mijar bawerî û têgehên wan tên dîtin. Tê diyarkirin ku, wêje ji kirinên baweriyên kevn derhatine. Heta dîroka wêjeya hin neteweyan bi nivîsên baweriyên dest pê dikin. Wekî mînak dîroka wêjeya Almanî bi werger û şîrovevên Încîlê dest pê dike. Di wêjeya Kurdî de jî, hêmanên baweriyên Zerdûştî, Êzdîtî, Yarsan û Îslamê hene.¹²⁶ Di dîrokê de qasî ku tê zanîn yekem pirtûka Kurdî Zend Avesta ye ku ji aliyê Zerdest ve hatiye nivîsîn. Ev pirtûka pîroz a baweriya Zerdûştîyê, wekî bingeha wêjeya Kurdî tê hesibandin.¹²⁷

Di dîrokê de piraniya terîqetan bi taybet di erdnîgariya Kurdan, Xorosan û Anatolyayê de hebûne. Lêkolîner sedemê vê rewşê wiha diyar dikin: Rêvebirên Ereban di serdema Emewîyan de dest bi ber bi cîhanê ve beralîbûnê kirine, bi tevger û rewîştên nijadperestiyê tevgeriyane. Gelên ne Ereban li hemberî rewîştên Ereban ên nijadperestî û derveyî Îslamî, nerazîbûn nîşan dane û ber bi jiyana manevî ve beralîbûne, ku yek ji wan jî Kurd in. Ekolên tesewîfî, raman û nêrînen heterodoks ên tesewîfî bi taybet di erdnîgariya Kurdan û Xorosanê berbelav bûne. Her wiha mitesewîf û sofîyên ku ji van her du herêman gihîştine ji bo ragihandina ramanên xwe ên tesewîfî çûne Anatoliya, Maweraunehîr û Bexdayê. Şêx û derwêşên ku ji van herêman rabûne hewl dane ku hemberî kirin û rewîştên ku aramî û hizûra gel ji holê radikin, aramî û hizûrê di nav civakê de peyda bikin. Di nav van ekolan de yê herî navdar Melamî û Qelenderî ne ku Melamî bi taybet di nav sofîyên Tirkmenan de

¹²⁶ Hêzil, *b.n.*, r. 40.

¹²⁷ Sağniç, *b.n.*, r. 36.

Qelenderî jî di nav sofiyên Kurdan de derketine, ku ev her du ekolên tesewîfî ekolên heterodoks in. Yek ji wan qelenderan Baba Tahir e ku wî hewl daye, ji civakê re bibe awêne, rêberiya civakê bike û rêya wan ronî bike. Ew ji bo bigihîje armanca xwe dest ji her tiştî şuştîye, erdê ji xwe re kiriye cî û nivîn kevir jî ji xwe re kiriye belgî û xwe serdanpê spartîye Xwedê.¹²⁸ Di dîrokê de yekem car Baba Tahir ji xwe re Qelender gotîye û wî hal û jiyana sofîyan di helbesta xwe de wiha aniye ziman:

Ez ew rind im ku navê min qelender

Ne xan û malên min hene ne lenger

Dema dibe roj li dora mala te digirim

*Dema dibe şev kevir datînim bin ser*¹²⁹

Şêweya jiyana evdalên ku Îslamiyet belavê rojava û herêmên din kirine li ser bingeha derwêşên Kurd sazûye. Her wiha evdalên Kurd ji evdalên Tirkmenan re jî rêberî kirine.¹³⁰

Di heyama Baba Tahir de bi taybet artêşên Ereb-Îslamê, êrişan avêtine li ser erdnîgariya Kurdan. Kurdan hemberî van êrişan çand û baweriyên xwe parastine. Di encamên van parastinan de tevgerên baweriyê derketine holê û baweriya Yarsanê, bi baweriyeke raz û veşartî ve veguherîye. Baweriya Yarsan wekî “baweriyeke biraz” kirasê razê li xwe kiriye. Ji ber erîşan xizanî û feqîriyek derketibû holê. Baba Tahir jiyanekî qelenderî jiya û bi vê jiyane bo gelê xwe bû mînak. Her wiha bi vê jiyana qelenderî û derwêşî li hemberî şer û cengên li ser wan de dihat, gelê xwe li ser lingan digirt. Hewl dida ku gelê wî qinaet bi tiştên kêr û hindik bînin û bikarin bi tiştên hindik ve bextewar bibin. Ji ber vê Baba Tahir serê xwe dadinî li ser kevirê li erdê radiza. Ew nedixwast ku gelê wî li pey mal û milkên zêde bikevin, ji rê derkevin û him ji xwe re him jî ji bawerî û gelê xwe re şaşî bikin. Ev jiyana ji aliyê pêşengên

¹²⁸ Ali Husein Kerim, *Balkan Yarımadasında Kürtler*, weş Evrensel, İstanbul, 2011, r. 270-277.

¹²⁹ Yıldırım, *b.n.*, r. 136.

¹³⁰ Kerim, *b.n.*, r. 277.

Kurdan di her serdemê de nehatiye pêşniyarkirin. Bi vê jiyane pêşiya kesên ku tenê li pey berjewendiyê xwe ne jî hatiye birîn ku kesên wisa dernekevin holê û ji gelê xwe re xeletiyên nekin.¹³¹

Baba Tahir di "Dema Dûgela Deylemî"yan de jiyaye. Gelê Deylemî li rojavayê Îranê, di kohistana hawîrê Geylanê de rûdiniştin. Di heman demê de ji rûniştgeha wan re jî "Deylem" dihate gotin. Ji ber vê yekê sînore wê bi vebir nedihate zanîn. Ji çemê Dîcleyê heya rojhilata bajarên Kermansah û Hemedanê di bin femandariya wan de bû. Deylemî, ji demên kevnare û vir ve hîç radestî tu dûgel û femandarên ne ji gelê xwe nebûne. Her dem di wan çiyayên asê, di kelhên serê şaxan, deşt û zozanên di navbera çiyayan de bi serê xwe jiyana xwe domandine. Her tim cengawerî û dilêriya wan tê pejirandin. Vî gelî nêzikê sêsed salan bi artêşa Îslam û Ereban re şer kirine. Piştîre bawerî bi dîne Îslamê anîne û ew ol pejirandine. Lê li piştî pejirandina Îslamê gelek karên hêja ji destê wan derdikevin. Deylemiyan li dora 920 salên zayînî dûgela xwe damezirandin. Piştî pêkanîna vî karê pîroz, di nav xwe de gelek mizgeft û medrese ava kirin û xistine bin xizmeta gel. Di nav wan de digel cengawerên jîr û jêhatî; gelek kesên zana û zanyar, helbestvan û olperwerên hêja jî derketine. Li gorî beşek ji dîroknivîs û ansîklopediyan Dûgela Bûweyhiyan 932-1055 digel Dûgela Hesên Weyhî (Hesnewiyan) 942-1016'ê zayînî ku femandariya xwe domandine parçeyên Deylemiyan e. Di vê mijarê de, Ansîklopediya Meydan Larousse di cildê 3, rûpel 504'an de, bi kurtasî wiha dibêje; "Bûweyhi li başûrê Îran û Iraqê neteweyek e ku li ser baweriya Îslamê û mezheba Şîî ye. Ew ji malmîrekên Îranê ne û di sala 932-1055'an de desthilatdar bûne. Navê damezirînerê vê dûgelê, Ebû Şûca Bûweyh e. Di heman demê de navê wê dûgelê jî bûye Dûgela Bûweyhiyan. Ev zat (Ebû Şuca Bûweyh) Deylemî ye û di dema şerê Deylemî-Ereb û Deylemî-Teberistaniyan de serekfemandarê artêşa Deylemiyan bûye. Pişt re bi navê xwe dûgel sazandiyê. Di derbarê Dûgela Hesnewî (Hesên Weyhî) de jî heman berhem digel pirtûka dîrokê ya Kemal Burkay nêzikî dabaşa jorîn bi me didin zanîn. Di navbera van her sê dûgelan de tîkiliyeye xurt heye û gelek medrese ava kirine û seydayên qenc kar kirine. Di wan medreseyan de çawa seya olî

¹³¹ Uluçay, b.n., r. 50-52.

*dihate xwendin, wisa jî seya wêjeyî digel lêxistina tembûrê jî bi seyki didîtin.
Bi vê rewşê gelek wêjekar û tembûrjenên qenc jê radibûn.*¹³²

Bi taybet di nav Ereban de beriya Îslamiyetê helbestnivîsîn gelek pêşketî bû. Bi pivanên taybet helbest dihatin nivîsin û yên serketî bi dîwarên Ke‘beyê ve dihatin daliqandin. Bi hatina Îslamiyetê di Qur’ana pîroz de helbest û helbestnûs hatin rexnekirin û li gorî Qur’ana pîroz helbestnûs sêrbaz û derewkar in. Diviya bû kes nix neda helbest û helbestnûsan. Ayeteke Qur’anê derbarê helbestê agahiyeke wiha daye: “*Me helbest fêrî Pêxember nekiriye û ev ne babetê wî ye.*”¹³³ (Yasîn, 36/69) Di heyama li ser ayetên derbarê helbest û helbestnûsan û hedîsa Hz. Pêxember ya ku “Di hin helbestan de hikmet, di hin helbestên din de jî sêr heye” de niqaşî dihatin kirin.¹³⁴

Di encama niqaşiyên derbarê helbestê de û bi geşedanên tevgerên sofî û ramana tesewifê ve mutesewif bi helbestan eşq û ramanên xwe anîn ziman. Di nav gelê Kurd de jî mutesewifên payebilind derketin ku yek ji wan Baba Tahir e. Ev helbestnûsan û berhemên wan bûn bingeha wêjeya klasîk. Her wiha em dikarin berhemên Baba Tahir wekî bingeha wêjeya klasîk a Kurdî bipejirînin.

Piştî Îslamê wêjeyên klasîk yên Erebi, Kurdî, Farisî û Tirkî her çî qas jî aliyê ziman ve cuda bûn jî jî aliyê naverok û hêmanê ve mîna hev bûn. Beriya Îslamê di nav Ereban de helbest gelek pêşketî bû. Helbestvanên Erebi bi taybet bi şeweyê “qesîde”yê û bi pîvana kêşeyê helbestan dinivîsin. Bi hatina baweriya Îslamê Erebi bûn Misilman û helbesta wan jî jî hêla ruxsarê ve neguherî lê jî hêla naverokê ve guherî. Helbestnûsên Erebi bi şeweyê qesîdeyê, bi kêşa arûzê û bi hêman û naveroka Îslamê helbestên xwe nivîsandin. Bi vî awayî wêjeya Erebi jî aliyê ruxsarê ve mîna heyama cahiliyeyê ma, lê jî aliyê naverokê ve nûjen bû.¹³⁵ Kêşa taybet ya helbestên Baba Tahir jî kevneşopîya helbesta Kurdî ya beriya Îslamê ya ku di başûr û navîna Kurdistanê belav bû

¹³² Sağniç, *b.n.*, r. 67-68.

¹³³ *Qur’ana Pîroz û Meala Wê ya Kurdî*, weş. Serokatiya Karûbarên Diyanetê, İstanbul, 2015, r. 443.

¹³⁴ Mahmud Erol Kılıç, *Sûfî ve Şiir Osmanlı Tasavvuf Şiirinin Poetikası*, ç. 10, weş. İnsan, İstanbul, r. 22-26.

¹³⁵ Adak, *b.n.*, r. 29-30.

de tê.¹³⁶ Di heyama Xelîfe Omer de welatê Sasaniyan di şer de têk çû û ket bin desthilatiya dewleta Îslamê (642). Di heyama Çar Xelîfe, Emewî û Ebasiyan de Ereban bi rêya waliyan, welatên Faris û Kurdan bi rê ve birin. Lê di nîva duyem ya heyama Ebasiyan de Kurd, Faris, Tirk û Çerkez gelek hikûmet ava kirin û yek ji wan jî hikûmeta Seffariyan bû.¹³⁷

Di serdema hikûmeta Seffariyan de ku di sala 862'yan ava bû û her di wê serdemê de yekem helbestên Farisî hatin nivîsandin. Ew kesan kesên wekî Muhemmed b. Wasifê Segzî, Bessamê Kurdê Sistani û Muhammed b. Muxelled Sistani bûn ku yek ji wan Kurd bû. Dîsa di serdema Ebasiyan de di sedsala X'an de yekem helbestên Kurdî bi Kurdiya Goranî û Kurdiya Lorî li herêma Hewreman û Loristanê ji aliyê pêgirtî û bawermendên mezhebê Ehlê Heqê ve hatin nivîsandin. Wekî nimûne em dikarin di edebiyata Kurdiya Goranî de navê Baba Serhengê Dewdanî (kd. 1007) û di edebiyata Kurdiya Lorî de navê Baba Tahirê Uryan (kd.1010) bidin. Di serdema rêveberiya Emewî û Ebasiyan de Kurd û Farisên ku Îslamiyet qebûl kiribûn, ketibûn bin bandora zimanê Erebi û kultura Îslamê de. Dema Kurd û Farisan dest bi nivîsandina bi zimanê xwe kirin, her duyan jî kultura Îslamê naskiribûn û pejirandibûn. Bi vî awayî, piştî misilmanbûna Kurdan edebiyata Kurdî di bin bandora unsurên dînî û Erebi de destpêkiriye. Bi gotineke dî di dewra Îslamî de edebiyata Kurdan û Farisan ji Ereben misilman du tişt stendin: Unsurên Îslamî û yên Erebi. Di dawiya dewleta Ebasiyan de, yan jî di dewra duyem a dewleta Ebasiyan de gelek hikûmet ava bûn ku hijmara wan digihe 30-40 hebî. Ji van hikûmetan di serdema Seffarî (861-1003), Samanî (874-999) û Xezneviyan (961-1187) de zimanê Farisî bûbû zimanê edebiyatê û edebiyata Farisî ya wan dewletan bandoreke mezin li yên pişt xwe kirin. Li aliyeki dî ji ber ku Kurd hem ji aliyê zimên hem jî ji aliyê coxrafi ve nêzî farisan bûn û edebiyata Farisî beriya Kurdî kemilî bû, wekî edebiyatên dî yên rojhilatê Kurdî jî kete bin bandora edebiyata Îranî de. Piştî ku Kurdan û Farisan dînê Îslamê qebûl kirin, di sedsala X'an de Tirk jî ketin dînê Îslamê û cara ewil berhemên edebî yên Tirkî di sedsala XI'an de di bin bandora vî dînî de derketin meydanê. Lê kêleka unsurên dînî (Îslamî) û Erebi unsurên Îranî jî ketin edebiyata Tirkî. Bi

¹³⁶ Izady, b.n., r. 311.

¹³⁷ Adak, b.n., r. 29-30.

*vî avayî di nava edebiyatên Farisî, Kurdî û Tirkî de unsurên muşterek ên Îslamî û çanda Îranê peyda bûn. Dema em edebiyata Erebi têxin navê, di nava wan her çar edebiyatan de ev unsurên muşterek dibin unsurên Îslamî û Erebi.*¹³⁸

Di serdema Baba Tahir de bi navê niha di rojhilata navîn de di bajarên sereke de medrese dihatin damezirandin û gelek terîqet derketibûn holê. Di nav Îslamiyetê de tevgera sofîyan û ramana tesewifê derketibû. Li Bexda, derdora Hemedanê û Xorosanê komên terîqetan û ramangêrên tesewifî hebûn. Di nav Îslamiyetê de tevgera xurt ya bi navê Şîf derketibû holê û misilman bi giştî bibûn du kera. Her wiha mezhebên Îslamiyetê derketibûn holê. Di nav Kurdan de baweriyên Zerdûştî, Êzdîfî û Yarsanî bibandor bûn, di heman demê de Îslamiyet di erdnîgariya Kurdan de belav dibû. Di heman serdemê de Tirk ber bi erdnîgariya Kurdan ve dihatin û hevnasîna Tirkan û Kurdan pêk dihat.

Di heyama Dûgela Deylemiyân de (920-1005) ku Baba Tahir di tê de jiyaye, wêjekar û helbestvanên Kurd ên hêja ev bûn: Baba Sirincê Kelatî, Babe Gerçekê Hewramî, Daye Tewrêzê Hewramî, Evdilsemedê Babekî.¹³⁹

Di heyama Xeznewiyân de ku ev heyam beramberî heyama Baba Tahir e, Siltan Mehmûd rêz ji helbestvanan re girtiye û wan hewandiye. Lê Selçûqî bêtir nêzîki ji sofîyan re nîşan dane.¹⁴⁰

Di dîrokê de di nav Kurdan de terîqetên sofîyan hebûne û gelê Kurd jî endamên van terîqeta bûne. Di Kurdistanê de di ayînen sofîyan de gelek kevneşopî û kiryarên ku di Îslamê de tune ne hene. Mirovekî ku bixwaze beşdarê terîqetêke sofîyan bibe divê di pêvajoyekî beşdarbûnê de derbas bibe. Endamên terîqetê yanê murîdên terîqetê beşdarê ayînen zikrê sofîyan, îlahî û diayan dibin, her wiha hin caran jî ji bo şêxên xwe diçine şer. Şêx Ubeydulah,

¹³⁸ *b.n.*, r. 30-31.

¹³⁹ Sağniç, *b.n.*, r. 68.

¹⁴⁰ Şiwan, *b.n.*, r. 19.

Şêx Seîd, Şêx Ehmed Barzanî, Şêx Mehmûd Berzencî û wd. ji bo şerên xwe ên polîtîk ji murîdên xwe piştgirî girtine.¹⁴¹

Di çavkaniyan de û di çarînên Baba Tahir de derbarê murîdbûna wî agahî tune. Ew wekî sofîyekî xweser xuya dike. Ji ber ku di dubeytiyên wî de navê Şa Xoşîn heye, hin kes Şa Xoşîn wekî rêberê wî pejirandine, lê ev agahî jî bi guman e û ji aliyê hin lêkolanan nayê pejirandin. Baba Tahir di helbesteke xwe de dibêje ez dostê Şa Xoşîn im. Ew xwe wekî dostê Şa Xoşîn dide nasîn ku ev jî diyar dike ku ew ne mûrîdê Şa Xoşîn e. Di gotin û helbestên Yarsanan de tê gotin ku Şa Xoşîn bi yaranê xwe ve diçe mêvandariya Baba Tahir û li mala wî rastî kerametên tî. Dema em li wê mêvandariya Şa Xoşîn dinêrin derbarê murîdbûna Baba Tahir tu amaje nabînin. Her wiha ji ber ku di baweriya Yarsanê de Baba Tahir ferîşteyeke û ferîşte ne murîd in û nabine murîd. Behsa murîdbûna Baba Tahir ne pêkan e.

Sağniç, diyar dike ku di pirtûka Serencamê de tê gotin ku Şa Xoşîn di sala 406'ê koçî de li Loristanê ji dayik bûye û di sala 467'ê koçî de gava ku 61 salî bûye çûye ser dilovaniya Xwedê. Navê hin alîgir û dostên Şa Xoşîn ev in: Baba Tahir, Qazî Nebî, Xewada, Qirindî, Hindole, Xûbiyar, Heyder, Pîr Xidir, Pîr Şaliyar, Rêhan Xanim, Lîza Xanima Caf û Xatû Mey. Helbestên ku ji Şa Xoşîn û dostên wî mane, gelek nazik, dilnişîn û berz in. Helbestên wan wekî “Dewrey Şa Xoşîn” (berhemên Serdema Şa Xoşîn) tî nasîn û hêj nehatine çapkirin. Şa Xoşîn helbestên xwe li ser rêbaza yarî ristiye û helbestên wî bigiştî Xwedênasiyê dihundirînin.¹⁴² Di helbestên Baba Tahir de û di helbest û çîrokên Yarsanan de tîkiliya Baba Tahir û Şa Xoşîn eşkere ye, ku ev tîkili ne tîkiliyeke Şêx û murîdî ye, ew wekî dostê hevdu ne. Şa Xoşîn di helbesteke xwe de wiha gotiye:

Yarsan we ra, Yarsan we ra

Ray Heq rasiyen birna we ra

¹⁴¹ Izady, *b.n.*, r. 282.

¹⁴² Sağniç, *b.n.*, r. 92-93.

Pakî û rastî û nîkî û rida

*Qedem we qedem ta we menzilega*¹⁴³

*Ey Heq (Ehlê Heq) rêbaza Heq rastî ye û divê em di vê rêyê de herin û pakî, rastî, çakî û başiyê bibexşin heta roja Peslanê (roja qiyamet û hesabê) vê yekê ji xwe re bikin dirûşme.*¹⁴⁴

Baba Tahir yek ji sofîyên serdema xwe ye. Lê rêberê Baba Tahir nayê zanîn ku kes nizane rêbaza sofîtiya wî ji kî ye. Baba Tahir xwedî ilma sofîtiyê ye ku berhema Kelîmatu'l Qîşar delîl e. Bi baweriya Şiwan, rêber û pîrekî Baba Tahir tune. Ew sofîyekî ûyîsî ye, yanê ew xwebixwe gihandiye. Ew ji hemû qonaxên sofîgeriyê derbas bûye û bi yekbûna fenayê ve gihîştiye.¹⁴⁵

Di nav sofîtiyê de tevgerên herî kevn û bi niqaşî yê Huseyn Bîn Mensûr-ê Hellac (di sala 922'an de hate kuştin), 'Aynu'l-Quzzat-ê Hemedanî (di sala 1131'an de hate kuştin) û Şihabu'd-Din-ê Suhreverdî (di sala 1191'an de hate kuştin) ne. Ramanên her sêyan jî bi Yezdanî ve lihevhatî bûn, lê bi rêzikên bingehîn yê Îslamê ve nakokiyên dihewandin. Bo mînak Hellac, xwe wekî avatarê Xwedê didît, ji yekitiya heyînan bawer dikir. Wî hemû heyînan wekî nîşaneyên rihê gerdûnî didît. Wî vê ramana xwe bi Erebbî wekî "enel heq" anîbû ziman. Çawa ku di Êzdîtiyê de jî heye ku, îtibara Lusîfer bi wî ve hate dayîn û ew bi meqamê herî berz ve hate bilindkirin. Ji ber vê gotina wî beriya çarmixê ji aliyê desthilatdarê Misilmanan ve li Bexdayê îşkenceyên giran li ser wî hatine pêkanîn. Îro jî bo Hellac li Laleşa cihê pîroz ê Êzdiyan, li cem tirba Şêx Adî serdangehek hatiye vekirin.¹⁴⁶

Izady diyar dike ku ramanên Hemedanî jî derbarê yekitiya heyînan bû. Ew ji ramana "her tiştên vê dinê, nîşaneyên rihê gerdûnê yê xweser e", bawer dikir. Baweriya wî ya li ser renkarnasyonê ya ku li pey hev diqewime, hin agahiyên wî ên derveyî Îslamî û yê bi Yezdanîtiyê ve lihevhatî bûn, bûn

¹⁴³ *b.n.*, r. 93.

¹⁴⁴ *b.n.*, r. 93.

¹⁴⁵ Şiwan, *b.n.*, r. 30-31.

¹⁴⁶ Izady, *b.n.*, r. 282-283.

sedemê kuştina wî. Ramanên Hellac û Hemedanî ên mîna hev, di xebat û ramanên Suhreverdî de jî tê dîtin ku ew sofîyekî Kurd e. Hîndariyên Suhreverdî ên bi navê Îşraq (ronîbûn) ne dewama tevgera sofî ya Îslamî ye, zêdetir wekî dewama baweriya Kurdan ya Ferîşteyan xuya dike. Ew diyar dike ku baweriya Yezdaniî ya ku ramana renkarnasyonê dihundurand, her wiha ramana baweriya Kurdan ya herêmî ya Mezheba Ferîşteyan li ser Hellac, Hemedanî û Suhreverdî bibandorbûn. Suhreverdî ku ew ramana “rihên mirovan bi Xwedê ve vediguhere” anîbû ziman, bi tûjkirina ulemaya Misilmanan ji aliyê prensê Eyubî yê Helebê yê Kurd ve di 38 saliya xwe de hate kuştin. Malbata Xelac ji başurê Zagrosê, ji herêma êl û eşîrên Kurdan bi Bexdayê ve koçkiribûn. Hellac jî li Bexdayê hatibû dinê. Hemedanî li Kurdistana Başûr li bajarê Hemedanê hatibû dinê û li wir jiyabû. Sohrewerdî jî ji bajarê Şahrawardê ye ku ev bajar di navbera bajarên Şehrezor / Silêmaniye û Zencanê de ye. Izady bi van gotinên xwe diyar dike ku di serdema Baba Tahir û dewama serdema wî de tevgerên sofî ên bi baweriyên Kurdan (Yezdaniî, baweriya Ferîşteyan / Yarsan) ve têkilbûn hebûn.¹⁴⁷

2.1.6. Xelwetgeha Wî

Çiya, stargeh, kûl an jî şekefteke her mirovê kamil heye ku demeke dur û dirêj tena serê xwe li wir borandine. Zerdûşt Elbrûz, Mûsa-Sîna, Îsa-Tabor, Muhammed li Hîrayê gihîştine nûra Xwedayî. Baba Tahir jî, li çiyayê Elwendê ku li Hemedanê ye bi ronahiya Xwedê ve gihîştiye.¹⁴⁸

Çiyayê Elwendê di jiyana Baba Tahir de xwedî cihakî taybet e ku ev çiya di gelek dubeytiyên wî de derbas dibe. Diyar e ku ew demên dûr û dirêj li vî çiyayê borandiye, bi dilbera xwe ve tenê maye û gelek dubeytiyên xwe ji dilberê re li wir gotiye. Ew di helbesteke xwe de wiha dibêje:

Beşum be Elwend daman mû neşanum

¹⁴⁷ *b.n.*, r. 282.

¹⁴⁸ Uluçay, *b.n.*, r. 28.

*Damen ez her dû gîtî haweşanum*¹⁴⁹

Biçim li damana Elwendê rûnim

Damanê ji du aleman bikşînim

Ji bo aşiq û evîndaran cihên taybet hene ku ew li wir digîhîjine hevdu, li wir hev dibînin an jî hîsdikin. Ew cih cihên bêdeng û bêkes in. Baba Tahir jî wekî dildar, cihê wî yê taybet çiyayê Elwend e. Ew dildar e û li çiyayê Elwendê bêtir ji dilberê dihise. Li wir dubeytiyên xwe ên xweşik û têrwate ji dilberê re rêzdike. Li wir agirê dilê xwe dibêje û dinale. Di helbestên wî de ne tenê çiyayê Elwend, giya û ajalên li wir jî cihê xwe digirin.

Baba Tahir li bin tara çiyayê Elwendê bi zor û zehmetiyan gul diçîne. Li ber gulê rûdine ya dilê xwe jê re parvedike û digirî. Bi girînên wî gul şîn dibe û vedike. Dema gul vedike êdî dema bêhnkirina gulê tê. Lê bêhnkirin ji ber bayê nabe nesîb û ew jî vê helwestê wiha tîne ziman:

Gulî keştem pey Elwend daman

Aweş ez dîde dadem şubh û şaman

Weqtê an bî ke bûyeş wa mû ayî

Bire badeş bire saman be saman

Min li ser çiyayê Elwendê gulek çand

Min ji çavên xwe sibe êvar av lê reşand

Dem hatiye ku ez wê gulê bêhn bikim

*Bayê bêhna wê diyar bi diyar gerand*¹⁵⁰

¹⁴⁹ Yıldırım, *b.n.*, r. 19.

¹⁵⁰ Yıldırım, *b.n.*, r. 229.

Di vê dubeytiya jor de bayekî wisa ji derekî derdikeve û tê, bêhna gula wî diyar bi diyar digerîne. Di vê dubeytiyê de diyar dibe ku ew aşiq e lê di vê cîhanê de nagihîje dilbera xwe. Ew di vê cîhanê de pêk nayîne ku gulê bêhn bike.

Helbestvan demên dur û dirêj li çiyayê Elwendê diborîne, giha û nebatên Elwendê jî di helbestên xwe de bikar tîne. Simbilê dişibîne xwe û wiha dibêje:

Heme 'alem pur ez gerd e çi wacem?

Çû mû dilha pur ez derd e çi wacem?

Sunbulî geşte bîd damanê Elwend

Û nim ez tali'um zerd e çi wacem?

Hemû cîhan tijî erd e, çi bêjim?

Mîna min dil tijî derd e, çi bêjim?

Li qontara Elwendê simbil çandine

*Ew jî ji bextê min zer e, çi bêjim?*¹⁵¹

Elwend e stargeha wî. Ew herî zêde ji demborandina Elwendê hezdike. Him ji wir hezdike, him jî li wir helbestan ji dilberê re dibêje û dinale. Cihê ku wî bi yarê herî nêzîk dike, û agirê dilê wî gurtir dike ew der e. Çiya mirovan wêrektir dike. Hestên ku çiya dide mirova cuda ye ku meriv li wir bi xwezayê re rû bi rû ye. Her tişt di xwezaya xwe de ne. Li wir xirecira dînê ya badilhewa tune. Baba Tahir di wî çiyayê bilind û asê de yarê digere lê nagihîje yarê. Gava ku nagihîje yarê, agirê dilê xwe jê re bi helbestan parvedike.

¹⁵¹ *b.n.*, r. 190.

Baba Tahir diçe çiyayê Elwendê û dest ji herdû aleman dikişîne. Armanca wî ne ev alem e ne jî ya din e. Di cihê ku herî jê hezdike de wiha dibêje:

Her an ke Elwend daman mûnişanî

Daman ez her dû 'alem der kuşanî

Eşkê xwûnîn paşem ez rahî Elwend

Ta ke dilber be payeş ber feşanî

Her dema ku li ser Elwend rûdinim

Destê xwe ji her du aleman dikşînim

Hêstirên xwûnîn dirijînim riya Elwend

Ku bi piyê xwe belav bike dilbera min¹⁵²

Armanca wî ne ev alem e, ne jî alema din e. Ew dilberê dixwaze. Dixwaze bigihije dilbera xwe û di wî de tune bibe.

Ew di dubeytiyekî xwe de xwe wekî niştecihê çiyayê Girîn dide nîşan:

¹⁵³ مه درویش مسلک و اگر درینم

مه طاهر ساکن پای گرینم

Ez Tahir im niştecihê Girîn im. Karê min derwêşî û hundir agirîn im.

Girîn (گرین), navê çiya û herêmekî Lorîstanê ye. Li gorî vê helbestê yan Baba Tahir demek li wir maye, yan jî beriya Hemedanê li wir jiyaye. Li gorî

¹⁵² b.n., r. 366.

¹⁵³ Abbarîkî, b.n., 25.

ravekirina Hemzê Êşfehanî û Şîrvîyê Bin Şehrdar, ev her du cih jî herêmên zimanê Pehlewî ne.¹⁵⁴ Diyar e ku Baba Tahir demek li vî çiyayê jî jiyaye.

Çiyayê wî ê ku eşq lê peyda bûye, demên dur û dirêj lê jiyaye, çiyayê Elwend e.

2.1.7. Peyrewên Wî

Ew kesên ku raman û peyamên xwe ji serdema xwe gihandine heta mirovên îro û bûne nirxên mirovatîyê ên hevpar di dîroka Kurdistan de ne gelek in. Yek ji wan ji sedsala 10 û 11'an dengê xwe ji Hemedanê daye bihîstîn, mutesewif û sofîyê bi navê Baba Tahir e.

Raman û helbestên Baba Tahir kevn nabin. Ji bo mirovên niha jî mîna mirovên berê xwediyê heman çêj in. Li pey Baba Tahir, gelek sofîyên misilman ji Erebb, Faris, Tirk, Kurd û ji netewên din hatine. Ev sofîyan gelek berhemên nû ên berz nivîsandine. Her wiha dema ku em temenê wan sofîyan dinêrin, dibînin ku Baba Tahir li beriya hemûyan e û ew yekem kes e ku şêweyê nû ya bi navê sofîzmê aniye di nav wêjeyê de.

Baba Tahir (kd. 1010) beriya Îbn 'Erebî (kd. 1240), Mewlana (kd. 1273) Şemsê Tebrîzî (kd. 1248) û Yunis Emre (kd. 1320) jiyaye. Ev kesên navborî peyrewên ramanên Baba Tahir in û sofîyên serbixwe ên serdemê xwe ne. Di helbest û nivîsên van sofîyan de manendî hene û ev manendîyan ne ji zarîkirina hevdu ne, ji ber raman û helwestên wan ên hevpar pêk hatine. Van mutasawifan bertek nîşanê ilma bêçêj kirine ku ev cure ilm mirovan nagihîne çêja eşqa Îlahî. Her wiha ew, vê ilmê piçûk dîtine û ji ber vê yekê jî di serdemên xwe de ji aliyê derdora medreseyan ve bi awayekî şid hatine rexnekirin. Sofî, gelek caran helbestên xwe gava ku di halê cezbeyê de bûne vegotîne, ji ber vê yekê bixwe nikarîbûne helbestên xwe binivîsîn ku murîdên wan gotînen wan derbasê nivîsê kirine. Ev sofîyan ji ber ku li ser tesewifê rawestiyane, gelek têgeh û remzên taybet ên tesewifî bi kar anîne. Ev helwesta jî ji bo rastfêmkirina wan û helbestên wan bûye arîşeyek. Ji bo ku fikir û

¹⁵⁴b.n., 25.

ramanên wan, remz û têgehên wan ên ku di helbestên xwe de bi kar anîne rast were fêmkirin, divê neyê ji bîrkirin ku beriya her tiştî ew sofî ne û mirovên şert û mercên serdema xwe ne. Tenê bi vê rewşê em dikarin van sofîyan rast binirxînin û fêm bikin. Nijad, civak û serdemên van sofîyan ji hev cuda ne, lê di ramanê hevpar a tesewifê de digihîjine hevdu.¹⁵⁵

Heke Baba Tahir pêşeng be nexwe peyrewên wî kî ne? Omer Xeyyam, Mewlana Celaledînê Rûmî, Hacı Bektaşê Welî, Yûnis Emre, Sohrewerdîyê Şehrîzorî, Molla Sadra, Melayê Cizirî, Ehmedê Xanî, peyrewên Baba Tahir in. Li pey wî di rêya wî de û li ser rêça wî reçûne.¹⁵⁶ ‘Elî Şerî‘etî derbarê çand û medeniyetê wiha dibêje: Rojava gava ku yekem çavkaniya medeniyet û çandê rave dike, hîç behsa navbera Firat û Dicleyê nake. Lewre heke behs bihata kirin, teoriya ku derbarê medeniyet û çandê dê di carekî de serobinê hev bûya. Navbera her du çeman navenda çand, medeniyet û felsefeyê ye. Navbera her du çeman çavkaniya tevî bawerîyan e. Çavkaniya şaristaniya Yewnanan Kurd in.¹⁵⁷ Tê dîtin ku şaristanî wekî zanist û teknolojiyê hevdu temam dîkin. Navbera wan de danûstandin heye. Bawerî jî wisanin. Bawerîya dawiyê ku hat ya beriya xwe înkâr nekiriye, li ser çanda wî pêşve çûye. Her wiha çand ne dijminê hev in, bira û alîkar in. Ya girîng ew e ku ji çandê sûdwegirtin û sentezeke erênî derxistin pêk were. Heke wisa nebe daristana ku di nav mijê de maye nayê dîtin, lê nayê înkarkirin jî. Di dîrokê de Baba Tahir mîna daristana di nav mijê de bû lê bi sedsalan şûnde mîja li ser wî rabû. Ew baştir hat nasîn ku ew pêşengên gelek sofîyên navdar bû. Raman û gotinên Baba Tahir li pişt wî di zimanên arifan de bû çem, herikî, mezin bû û di dilan de xerabî û kîne şûşt bir. Agirê eşqa wî mîna stêrka çûrisî û rêya mirovên Xwedêhez ronî kir. Her wiha di nav dilê mirovan de agirê eşqê vexist û geş kir. Pêre evîn xurt û belav bû.¹⁵⁸

¹⁵⁵ Ahmet Yaşar Ocak, *Türk Süfiliğine Bakışlar*, weş. İletişim, İstanbul, 2004, r. 119-127.

¹⁵⁶ Uluçay, *b.n.*, r. 49.

¹⁵⁷ Ali Şerîati, *Medeniyet ve Modernizm*, ç. 5, (Wer.: Ahmet Yüksek), weş. Birleşik, İstanbul, 1998, r. 71.

¹⁵⁸ Uluçay, *b.n.*, r. 30.

Gelek derwêş di kaniya Baba Tahir de av vexarine. Peyrewên Baba Tahir di nav neteweyên Erebb, Fers û Tirkan de derketine û bi berhemên xwe wêjeyên van netewan xurt û rengîn kirine. Berhemên Baba Tahir him di nav Kurdan him jî di nav gelên din bi nav û deng in. Wêjeya Kurdan ya nivîskî di sedsela 16 û 17'an de derketiye asta jor. Lûtkeya wêjeya Kurdî di serdema asta bilind de bi Ehmedê Xanî ve hatiye taçkirin. Her wiha Elî Herîrî, Feqiyê Teyran û Melayê Cizîrî di wêjeya Kurdan de kesên payebilind in. Elî Herîrî di hêla wêjeya nivîskî de pirek e. Di vî warî de helbestên Elî Herîrî hin hêlan ve dişibin rûbaiyên Baba Tahirê bavê wêjeya Kurdî ya nivîskî. Helbestên Elî Herîrî yê bi zaravayê Kurmancî nivîsandiye, ji tixûbên bakûrê Kurdistanê derbasî navenda wêjeya Kurdî ya nivîskî, ya başûrê Kurdistanê bûye. Li başûr jî di nav gel de hetiyê pejirandin û belav bûye. Elî Herîrî û Feqiyê Teyran folklorê Kurdî û wêjeya Kurdî ya nivîskî bi hunerdest gihandine hevdu. Bandora Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran li ser Ehmedê Xanî çêbûye. Wêjeya klasîk a Kurdî bi koçdawiya stêrka wêjeya Kurdî, yê bi navê Ehmedê Xanî ji lûtkeyê xwe ber bi jêr ve berdaye.¹⁵⁹ Tê dîtîn ku di nav wêjeya Kurdî de helbestvanên hêja derketine û ev hunermendên hêja ji hêla raman û helbestvaniyê de bandor li hevdu kirine.

Di destpêka tesewifê û wêjeya sofftîyê de wêjevanên Kurd xwedî cihên girîng in. *Wêjeya Sûfî, bi bandora ramana Ebû'l-Wefayê Kurd (kd. 1107) ê Bexdayî, li ser Baba Îshaq, Yûnis Emre, Mewlana û Hecî Bektaşê Welî tê roja me. Her wiha Selmanê Farisî, Cuneydiyê Bexdayî, Hasan Basrî, Mansûrê Hellac, Ferîdedînî Attar, Senaî, Fahrudînê Îraqî, Hafîz, Suhreverdî, Xeyyam û wd. hilberînerên heman çanda baweriyê ne.*¹⁶⁰

Baba Tahir, agirek vexistiye, rêya tarî ronî kiriye û bûye rêberê rêya dilberê. Peyrewên wî jî bûne rêwiyan heman rêyê. Ev rêya eşqê û rastiye ye. Ev rê rêyeke dijwar e û bi êş û jan e. Li ser vê rêyê astengî û xetere hene. Her kesek nikare ku beraliyê vê rêyê be. Baba Tahir wekî pêşengekî beraliyê vê rêyê bûye. Ew, “*ji bîra evîne û zeryaya muhebetê bi satila Kurdî, hezkiriyê xwe*

¹⁵⁹b.n., r. 31-32.

¹⁶⁰b.n., r. 32.

re av aniye.”¹⁶¹ Bi Baba Tahir û bi peyrewên wî rêya eşqeke rast li ber mirovên cîhanê vebûye.

2.1.7.1. Baba Tahir û ‘Aynu’l-Quzzat-ê Hemedanî

‘Aynu’l-Quzzat-ê Hemedanî sofîyekî navdar ê serdema xwe ye û li pişt Baba Tahir hatiye dinê. Di berhema wî ya bi navê “Nameyan” (h. 520-525) de navê Tahir derbes dibe ku ev nav ji bo Baba Tahir nîşane ye. Di berhema wî de navê Baba Tahir hin caran digel murîdên Baba Tahir ên bi navê Fethe û Bereke ve derbasdibe.¹⁶² Di çavkaniyan de di derbarê têkiliya Baba Tahir û ‘Aynu’l-Quzzat-ê Hemedanî de hin agahiyên berevajiyê hev hene.

Şêx Bereke di nav murîdên Baba Tahir de mirovekî girîng e. Belge û diyarde nîşan dîkin ku Şêx Bereke ehlê xaneqa û xirqe bûye. Ev jî diyar dike ku Baba Tahir û Baba Baba Ce‘fer ehlê xaneqa û xirqe (ji kesê ku sofîti û derwêşiti dîkin re tê gotin) bûne. Şêx Ehmed Xezalî jî têkiliya wî bi Hemedanê re habûye û di nav koma Şêx Bereke de maye. Îro ji wan re dibêjin Ehlê Heq. ‘Aynu’l-Quzzat-ê Hemedanî, derbarê Şêx Ehmed gotinên nebaş gotiye, wî wekî mirovekî xerab û kujer nîşan daye û ew aciz kiriye. Sofiyên Ehlê Heq hin caran peyva “bereke” wekî “berake” bi kar anîne û bi vî awayî pîrozî lê bar kirine. Di pirtûka ‘Aynu’l-Quzzat-ê Hemedanî de behsa şêxekî bi navê Fethe hatiye kirin. Navê van kesan ji bo Baba Tahir û Baba Baba Ce‘fer amaje ne. Di van amajeyan de tê fêmkirin ku Bereke û Fethe kesên sadedil, aşiq û şeyda ne. Di nivîsên ‘Aynu’l-Quzzat-ê Hemedanî de Bereke û Fethe wekî murîdên Tahir hatine nasandin ku bi tevî amaje û diyardeyan xuya dibe ku ev Tahirê ku tê behs kirin, Baba Tahir e.¹⁶³

Baba Tahir (kd. 1010), beriya ‘Aynu’l-Quzzat-ê Hemedanî (kd. 1131) jiyaye. Zerrînkûb diyar dike ku navbera ‘Aynu’l-Quzzat-ê Hemedanî û Baba Tahir nebaş bûye. ‘Aynu’l-Quzzat-ê Hemedanî gotinên Baba Tahir şîrove kirine, lê derbarê Baba Tahir agahî nedaye. Teqez û eşkere nebe jî em dikarin

¹⁶¹ Uluçay, *b.n.*, r. 33.

¹⁶² ‘Aynu’l-Quzzat-ê Hemedanî, Nameha-yê ‘Aynu’l-Quzzat-ê Hemedanî, I, Tehran, 1348, r. 47, vgz. Yıldırım, *b.n.*, r. 14.

¹⁶³ Zerrînkûb, *b.n.*, r. 192-193.

bêjin navbera wan ji ber komên wan ne xweş e. Ji ber kuştina ‘Aynu’l-Quzzat-ê Hemedanî, feqiyên sûnî di nav şik û guman de ne, her wiha ji aliyê piştgiriyên ‘Aynu’l-Quzzat-ê Hemedanî ve tê bawer kirin ku destê Fethe û Bereke jî di vî karî de hene. Baba Tahir ku bixwe aliyê tesewifê de bi nav û deng e û navê wî di nav şêx û arifên serdema wî de nehatiye gotin ku ji vî jî diyar e, ew bi felsefe û bawerîya xwe di nav komeke cuda de bûye ku ev kom ne komekî sûniyan e. Ew ji aliyên kesên Ehlê Heq ve hatiye hezkirin û parastin. Hin dubeytiyên wî ên ku ji aliyê bawermendên Ehlê Heq ve ku wekî pîroz hatine dîtin di pirtûka koma Ehlê Heq ya bi navê “Serencam”ê de hatiye çapkirin ku ev dubeytî di nav koma dubeytiyên Baba Tahir ên ku hatine çapkirin de tune.¹⁶⁴

Berevajî Zerrînkûb, di çavkaniya Ansîklopediya Îslamê de agahî wiha ye: Şêx Berekeyê Hemedanî yê nexwende (ummî) yek ji rêberên ‘Aynu’l-Quzzat-ê Hemedanî ye. ‘Aynu’l-Quzzat di nameyên xwe de heyranîyên xwe ji Bereke re anîye ziman. Dema ku Şêx Bereke çûye li ser dilovaniya Xwedê (kd. 1126) ‘Aynu’l-Quzzat du mehan xwendin û nivîsê terikandine. Mîna Baba Tahir ‘Aynu’l-Quzzat jî ji eşqê bawer kiriye û li gorî wî, tenê rêya ku meriv Xwedê binase eşq e û eşq cewhera Xwedayî ye. Berhema “Şerh-î Kelîmetu’l Qisar” ne şerha ‘Aynu’l-Quzzat e. Wezîrê Siltan Sencerê Selçûqî yê bi navê Kıvamüddin Dergezfni ji hin fakîxan daxwaz kiriye ku peyvên dijî dîn ên di berhemên ‘Aynu’l-Quzzat de hene kifş bikin. Wî bi vî awayî dê ‘Aynu’l-Quzzat wekî mirovekî bêbawer (zindîq) nîşan bixista û ji holê rakira. Her wiha ew fetva kuştina ‘Aynu’l-Quzzat bidestxist û dawiyê de ‘Aynu’l-Quzzat bi awayekî hovane hate kuştin.¹⁶⁵ Berhema “Şerh-î Kelîmetu’l Qisar” li gorî Ansîklopediya Îslamê ne ya ‘Aynu’l-Quzzat e, lê li gorî raya lêkolîner û nivîskarên ev berhem wekî ya ‘Aynu’l-Quzzat hatiye pejirandin.

Di berhema “Şerh-î Kelîmetu’l Qisar” de gotinên Baba Tahir ên tesewifî û bi hikmet hatine şîrovekirin. Ev şîrove şîroveyeke ferhengî ye û

¹⁶⁴ *b.n.*, r. 192-194.

¹⁶⁵ Süleyman Uludağ-Nurettin Bayburtlugil, “Aynülkudât el-Hemedânî”, *DİA*, weş. TDV., İstanbul, 1991, IV, r. 280-282.

gotinên Baba Tahir peyv bi peyv hatine ravekirin. Lê gotinên Baba Tahir bi Erebi hatine şîrovekirin, ne bi zimanê Baba Tahir ê Fehlewiyat.¹⁶⁶

‘Aynu’l-Quzzat-ê Hemedanî navê wî yê rastîn Ebulmelî Ebdullah bûye û ew di sala h. 492’yan de li Hemedanê hatiye dinê. Bavê wî, ji navbera Tewrêz û Meraxê ye. Bi rivayetên Semanî û Îbn Elfûtî bav û bapîrên wî qaziyên navdar bûne û ew jî şehîd bûne. Di dîroka sofîyan û di sîlsîla meşayixan de navê ‘Aynu’l-Quzzat-ê Hemedanî mîna navê Baba Tahir û Baba Baba Ce‘fer nehatiye nivîsandin. Kurekî ‘Aynu’l-Quzzat-ê Hemedanî hebûye ku ev agahî di nivîsên wî de diyar dibe. ‘Aynu’l-Quzzat-ê Hemedanî hatiye girtin û li Bexdayê di zindanê de maye. Di zindanê de name bi navê “Şikvul Elxerîb” nivîsiye û ji murîdên xwe re şandiye. Piştî demekê ‘Aynu’l-Quzzat-ê Hemedanî vegerandine Hemedanê li ber deriyê medreseya ku ders dida, di mêjuya 7’ê cemedulaxir de, di sala h. 525’an de di 33 saliya xwe de hatiye dardekirin.¹⁶⁷

Izady diyar dike ku baweriya wî ya li ser renkarnasyonê ya ku li pey hev diqewime, hin agahiyên wî ên derveyî Îslamî û yên bi Yezdanitîyê ve lihevhatî bûn, bûn sedemên kuştina wî. Herwiha Izady têkiliya ‘Aynu’l-Quzzat-ê Hemedanî bi sofîyên bi navê Mensûr-ê Hellac (di sala 922’an de hatiye kuştin) û Şîhabu’d-Din-ê Suhreverdî (di sala 1191’an de hatiye kuştin) ve dadîne, di derbarê Kurdbûna wan û ramanên wan ên bi Yezdanitî û baweriya Ferîşteyan (Yarsan) ve hevpar in de hin agahiyên dide.¹⁶⁸

Ji çavkaniyan tê fêmkirin ku di mêjûya jidayikbûn û koçdawiya van her du mutesewifan diyar dibe ku Baba Tahir beriya ‘Aynu’l-Quzzat-ê Hemedanî hatiye dinê û çûye li ser dilovaniya Xwedê. Di navbera murîdên Baba Tahir û ‘Aynu’l-Quzzat-ê Hemedanî de têkili heye. Herwiha tê fêmkirin ku ‘Aynu’l-Quzzat-ê Hemedanî ji Baba Tahir û berhemên wî haydar e, ku bandora Baba Tahir li ser wî çêbûye. Ramana Baba Tahir ya derbarê eşqê bi heman awayî ji aliyê ‘Aynu’l-Quzzat-ê Hemedanî ve jî hatiye parastin. Di serdema navbera

¹⁶⁶ Zerrînkûb, *b.n.*, r. 198-200.

¹⁶⁷ *b.n.*, r. 192-200.

¹⁶⁸ Izady, *b.n.*, r. 282-283.

sedsala 9'em û 11'hem de dijberî di nav medrese û terîqetan, bawerî û mezheban de hebûne. Cihêtiya Baba Tahir û ya 'Aynu'l-Quzzat-ê Hemedanî heke bi gotina Zerînkûb be, dibe ku ji aliyê komên wan ên cuda be. Lê di vê mijarê de zelaliyek tune. Lê heke têkiliya 'Aynu'l-Quzzat-ê Hemedanî ya bi Şêx Bereke ve li gorî çavkaniya Ansîklopediya Îslamê ya ku me li jor pêşkeş kiribe be, nexwe ji ber ku Şêx Bereke murîdê Baba Tahir e, bandora Baba Tahir ya li ser 'Aynu'l-Quzzat-ê Hemedanî heye radixe li ber çavan.

2.1.7.2. Baba Tahir û Omer Xeyyam

Baba Tahir (937-1010) li Hemedanê, Omer Xeyyam (1048-1131) jî li Îranê herêma Xorosanê li bajarê Nişabûrê hatine dinê.¹⁶⁹ Ji mêjûyên koçdawiya wan tên dîtin ku Baba Tahir beriya Omer Xeyyam jiyaye.

Xeyyam, wekî Faris tê pejirandin lê derbarê neteweya wî gotinên cuda jî hene. Ew ji aliyê gelek zanistan pêş ve çûye û di zanista bîrkariyê de deng vedaye. Di serdema xwe de di zanistên bîrkarî, geometrî û asîmanzaniyê de hatiye nasîn lê ji aliyê xwe yê helbestvaniyê ve nehatiye nasîn. Sedema vê jî di serdema wî de helbestvanê rûbaiyan hestên xwe yên veşartî wekî rûbaiyan nivîsandine û bi nivîsandina rûbaiyan derûniya xwe aram kirine. Lê ev rûbaî bi kesî re nehatine parvekirin. Derbarê hejmara rûbaiyên Xeyyam de niqaş hene, ku hejmara rûbaiyên wî ên ku hatine berhevkirin di sedsala XIV'an de gihîştine 66'an, lê ji vê sedsalê şûn de heta roja me ya îro ji hezarî borîne. Lêkolînerên rûbaiyên Xeyyam diyar dikin ku rûbaiyên helbestvanên din wekî rûbaiyên Xeyyam hatine pejirandin, ku ji ber vê rewşê hejmara rûbaiyên wî ew qas zêde bûne. Sadiq Hîdayet di nav rûbaiyên ku wekî yên Xeyyam tê dîtin de 143 rûbaiyên Xeyyam kifş kirine, lê Eliyê Deştî di encama lêkolînên xwe diyar kiriye ku di nav van rûbaiyan de tenê 65 rûbaî yên Xeyyam in.¹⁷⁰

Dubeytiyên Baba Tahir û rûbaiyên Omer Xeyyam, ji aliyê şêweyê ve dişibin hevdu lê belê ji aliyê kêşê ve ji hev cuda ne. Kêşa dubeytiyan "hezec-î musedes-î mahzûf bahrîn a arûzê" ye. Lê kêşa rûbaiyan, "hezecî mek-fuf-î

¹⁶⁹ Yavuz Unat, "Ömer Hayyâm", *DİA*, weş. TDV., İstanbul, 2012, XXXIV, r. 66.

¹⁷⁰ Hicabi Kırlangıç, "Ömer Hayyâm", *DİA*, weş. TDV., İstanbul, 2012, XXXIV, r. 69.

maksûr” e. Ji ber vê ji çarînên Baba Tahir re dubeytî hatine gotin. Her wiha Baba Tahir di xezelên xwe de jî kêşa dubeytiyan bi kar aniyê. Di helbestên Baba Tahir de ji hev derxistina eşqa Îlahî û ya beşerî dijwar e. Di dubeytiyên wî de nîşaneyên eşqa beşerî û ya Xwedayî hene. Ji ber ku perwerdeya tesewîfê nedîtiye, hest û ramanên xwe bi zimanekî xwerû aniyê ziman û fişal nekiriye. Ew, nola Omer Xeyyam li pey çêjgirtina dinê neketiye û di helbestên xwe de çêjgirtina dinê dernexistiye pêş, ku ew berevajî Xeyyam derd û kesera jiyane, êş û jana xwe bêsekin aniyê ziman.¹⁷¹

Di salnameya ku Xeyyam amade kiriye de sal bi meha adarê û bi roja newrozê dest pê dike. Lê ew di cîhanê de ne bi salname ne jî bi bîrkarî û asîmanzaniyê deng vedaye. Ew bi rûbaiyên xwe ên felsefî di cîhanê de hatiye nasîn. Rûbaiyên Xeyyam bi gelek zimanan ve hatine wergerkirin. Xeyyam di rûbaiyên xwe de li pey fêmkirina hinceta hebûnê û jiyane digere, derbarê piştî mirinê agahî dide. Ew di rûbaiyên xwe de pirsên mîna; Mirov ji ku hatine cîhanê û bi ku ve diçin, çima hatine cîhanê û çima ji cîhanê vediqetin, kî ji alema nediyar vegeheriya ye ku em ji wê alemê haydar bin, jiyane divê çawa were jiyîn, dema jiyane çawa were derbaskirin pirsîye. Ew ji ber ku ji pirsên xwe re bersivên ku dil û hişê wî aram bike nedîtiye û bersivên derveyî hiş û zanistê jî napejirandiye, hewl daye ku bi meynoşîn, xweşborîn û sermestiyê dema xwe derbas bike. Ew ne ji demên buhurî ne jî yê dahatûyê xemgîn bûye, kiriye ku her demên cîhanê bi şadî û xweşiyê derbas bike. Ew di helbestên xwe de pir girîngî daye mey û meynoşînê. Hin lêkolîner diyar kirine ku wî mey û meynoşînê wekî sembol bi kar anîne. Mebesta wî ji mey û meynoşînê ew e ku mirov her çirka demên xwe ên cîhanê bêxem derbas bike, şad û kêfxweş be.¹⁷² Xeyyam ji aliyê van ramanên ji Baba Tahir vediqete, ku ew bi heman nêrînê li cîhanê û cîhana piştî mirinê nanêrin. Baba Tahir di helbesteke xwe de dibêje: Ev cîhan ne hêja ye bi libek ka ve. Ew berevajî Xeyyam, her tim xemgîn e û ji dinê hîç caran çêj nagire û wiha dibêje:

Ez ji dinê qet zewq nagirim bê te

¹⁷¹ Tahsin Yazıcı, “Baba Tâhir-i Uryân”, *DÎA*, weş. TDV., İstanbul, 2012, IV, r. 371.

¹⁷² *Çarîneyên Omer Xeyyam*, (Wer.: Perwîz Cîhanî), weş. Nûbihar, İstanbul, 2015, r. 9-10.

Ez qedehê bi dest qet nagirim bê te

Dilerizim bi roj û şev wekî dîn bibim

*Demekê be jî rihetiyê nabînim bê te*¹⁷³

Baba Tahir ji demên cîhanê çêj nagire, lewra di cîhanê de dem bêyî dilberê derbas dibe. Ji ber ku gihîştina wî di cîhanê de ne pêkan e, ew ji her çirka cîhanê êş dikişîne.

Xeyyamê ku nixr dide cîhan û her demeke cîhanê, di rûbaiyeke xwe de wiha dibêje:

Ez razabûm di xeweka şîrîn da

Hişiyarekî bi min meya noşîn da

Got wer bijî, xwe nexer nav nivîn da

*Dê zor razêy di bin xaka zemîn da*¹⁷⁴

Di rûbaiyê de tê dîtin ku Xeyyam di jiyanê de di nav xeweka şîrîn de demên xwe derbas kiriye, lê mirovekî hişyar niçandiye wî, mey daye wî û wî jî mîna xwe hişyar kiriye. Mirovê hişyar gotiye Xeyyam bijî, demên cîhanê bi razanê bêwate neborîne, lewra tu dê bimîrî û di bin xakê de demên dirêj derbas bikî. Xeyyam di gelek helbestên xwe de behsa meyê dike, ku em bawer dikin wî “mey” wekî sembola dewsa xweşborandina demê û çêjgirtina ji demê bi kar aniye.

Baba Tahirê xwediyê dubeytiyan ji yekem helbestvanê rojhilatê ye. Di heman demê de ew amûra navdariya Xeyyam e. Ji ber ku Baba Tahir di nav xwezayê de jiyaye û hakimê zimanê Lekî / Goranî û Farisî ye, ji bo mirovên her du neteweyan (Kurd û Faris) xwediyê nixrekî bilind e. Kêşa taybet ya helbestên wî ji kevneşopiya helbesta Kurda ya beriya Îslamê ya ku di başûr û

¹⁷³ Yıldırım, *b.n.*, r. 272.

¹⁷⁴ Çarîneyên Omer Xeyyam, *b.n.*, r. 11.

navîna Kurdistanê belav bû de tê. Îlahiyên pîroz ên pirtûka Cîlve ya Şêx Adî ku ew rêberê Êzdiyan e, bi şeweyê helbestên Baba Tahir hatine nivîsîn.¹⁷⁵

Baba Tahir û Omer Xeyyam di helbestên xwe de mijarên giran yê felsefî û tesewîfî bi awayekî xwerû û hêsan anîne ziman. Gelek wateyên giran li peyvan barkirine.

Xeyyam di gelek rûbaiyên xwe de diyar kiriye ku mirov ji tunebûnê hatiye û dê ber bi tunebûnê ve here, ji ber vê yekê, divê dema ku di tê de ye xweş derbas bike. Xeyyam hebûnê wekî nepenî (muema) dîtiye û hewldana têgihîştina hebûnê badîhewa dîtiye.¹⁷⁶ Ew di rûbaiyeke xwe de gumana xwe ya derbarê bihûştê wiha aniye ziman:

Dilo tu çend bikî liv û hejiyanê

Tênegijî tu dê ji razên cîhanê

Bi meyceman li vir bihiştê saz ke

Ya ku dibên, heye na, kes nizanê¹⁷⁷

Xeyyam dixwaze mirov li cîhanê bihûstekê saz bike, xwe bi bihûsta cîhana piştî mirinê girênde. Cîhana piştî mirinê yan heye yan na, lewre tu kes nedîtiye. Ew bi hişê xwe tevdigere û hîsên xwe dernaxe pêş. Lê di dubeytiyên Baba Tahir de diyar dibe ku ew ji rastiya hebûnê haydar e. Armanca xwe ya vê dinê dizane û ji pişt mirinê jî haydar e. Di heman demê de ew derbarê rastiye mirovan hişyar dike. Baba Tahir berevajî Xeyyam di jiyana xwe de tu car li pey xweşborandina demeke cîhanê neketiye. Her wiha wî xwe bi bihûsta piştî mirinê jî girênedaye. Baba Tahir tenê xwe bi Xwedê ve girêdaye.

Dema ku rûbaiyên Xeyyam tê xwendin, di serî de meriv dibêje qey dubeytiyên Baba Tahir in, lê dema ku meriv bala xwe dide wate û ramanên ku di rûbaiyan de hatine ristîn, meriv têdigihije ku ew ne dubeytiyên Baba Tahir

¹⁷⁵ Izady, *b.n.*, r. 311.

¹⁷⁶ Hicabi Kırılgiç, “Ömer Hayyâm”, *DİA*, weş. TDV, İstanbul, 2012, XXXIV, r. 68.

¹⁷⁷ *Çarîneyên Omer Xeyyam, b.n.*, r. 82.

in. Mîna hin lêkolîneran em jî li ser wê baweriyê ne ku bandora Baba Tahir li ser Xeyyam çêbûye. Her du helbestvan di helbestên xwe de li ser hebûn, jîyan, mirin, cîhana niha û ya piştî mirinê, Xwedê, hezkirin, guneh, bihûşt, dojah û wd. rawestiyane.

Baba Tahir, di dubeytiyeke xwe de diyar kiriye ku: *Ne derwêş bê kefen ketibûn bin axê, Ne dewlemend biribû ji kefenek pê de.*¹⁷⁸ Wî derbarê encama mirina şah û xizanan wiha agahî daye:

Dilê min ji agirê xemê şewitî ye

Di canê min de agirê işqê pêti ye

Kefenan girê nadin bi girêkan

*Ji bo şah û feqîran wekhevî ye*¹⁷⁹

Omer Xeyyam jî, derbarê encama mirina şah û parsek wiha gotiye:

Temenê te bibe sed yan hezarî

Tu dê rojkê he bimrî bi neçarî

Eger şah bî, yan parsekê bazarî

*Wekî hev bin hûn dê li dawîya karî*¹⁸⁰

Her du helbestvan di helbestên jor de li ser mirinê rawestiyane, diyar kirine ku mirin dewlemend û xizanan wekhev dike. Helbestvan nirx nedane dewlemendiyê, rastiya mirinê bi awayekî balkêş raxistine li ber çavan.

Baba Tahir di dubeytiyeke xwe de derbarê felek û mirovên cîhanê wiha agahî daye:

Ya reb stûyê felekê bişke di binî de

¹⁷⁸ Yıldırım, *b.n.*, r. 389.

¹⁷⁹ *b.n.*, r. 374.

¹⁸⁰ Çarîneyên Omer Xeyyam, *b.n.*, r. 98.

Girt û birin hemî mêrxasên di dinê de

Kes nabêje ku “filankes li heyatê ye”

Her kes dibêje “filan kurê filan mirî ye”¹⁸¹

Xeyyam derbarê nepêkanbûna zivîrîna cîhanê wiha gotiye:

Bê hed bê hîsab mirdin pîr û ciwan

Ema nebîst kesê bîtewe le wan

Rêsi hat û nehat nagerênewe

Çit heye bibe le siwik û giran¹⁸²

Gelek mirin ji mirovên pîr û ciwan

Lê kes nebîst ku yek vegeriya ji wan

Rêya qeza û qederê zivirîn tune

Çi hebe bi xwe re bibe çî sivik û çî giran

Newaya her du helbestan dişibin hevdu, lê belê ji hêla nîrxandina jiyanê ve ev her du pisporên rubaiyan rêyên cuda ji hevdu xêz dikin. Di helbestên Xeyyam de xemsarî, xweşborandina demê û li hemberî geşedanan bêxemî diyar dike, lê ev taybetiyan li cem Baba Tahir tune.¹⁸³

Mehmet Emîn Zekî Beg dibêje: Zimannasê rojhilatê Fîtescerald derbarê Baba Tahir û Xeyyam de wiha gotiye: “*Baba Tahir ji Xeyyam berztir e*”.

¹⁸¹ Yıldırım, *b.n.*, r. 121.

¹⁸² *b.n.*, r. 39-40.

¹⁸³ *b.n.*, r. 40.

Ewliyayên berê ên mîna Mewlanayê Rûmî û Şîrazî jî anîne ziman ku Baba Tahir ji Xeyyam berztir e.¹⁸⁴

Xeyyam wekî mirovekî çêjger dide pey tiştên ku wî diçêjîne. Ji çêj û şadiyên dinê hez dike. Lê ev helwest di şêweyê jiyana Baba Tahir de tune. Baba Tahir li pey bextewariyê nakeve, çêj û şadiyên dinê bala wî nakêşin. Ew ji rê û rêzikên dilberê naqete û naxwaze ku bi şaşiyekî derbikeve hemberî dilberê, lê li cem Xeyyam ev berpirsiyarî tune. Xeyyam ji gunehan nareve û hin caran guh nade rêzikên dînî. Baba Tahir her tim bi yarê re rûdine û radibe. Eşqeke dilsoz, jiyaneke derwêşî dijî, agirê eşqê dilê wî disojîne, lê ev rewş li cem Xeyyam tune.

Baba Tahir naxwaze bi gunehan derkeve hemberî Xwedê. Wî derbarê gunehan wiha gotiye:

Karekî ku bibe kevirê lingê te meke

Cîhana wisa fireh li ser xwe teng meke

Sibe ku xwendevanên kitêban ew xwendin

*Ji xwe re jê rûpeleke reş dermexe*¹⁸⁵

Xeyyam derbarê gunehan ji Baba Tahir cihê ponijiye û wiha gotiye:

Ji noşîna me meyxane ava ye

Gunehê me, çêkir rehma Xuda ye

Ger em nekin guneh û sûc û tawan

*Rehma Xuda bê me 'îna û wata ye*¹⁸⁶

Xeyyam ji bexişandina Xwedê bawer dike û têkili di navbera guneh û bexişandinê datîne. Ew bawer dike ku guneh nebin bexişandina Xwedê

¹⁸⁴ Mehmet Emin Zeki Bey, *Kürt ve Kürdistan Ünlüleri (Meşâhirê Kurd û Kurdistanê)*, ç. 3, (Wer: M. Baban, M. Yağmur, S. Kutlay), weş. Öz-Ge, Ankara, 2005, r. 75.

¹⁸⁵ Yıldırım, *b.n.*, r. 243.

¹⁸⁶ *Çarîneyên Omer Xeyyam, b.n.*, r. 32.

dernameke der. Ew li hemberî qedexeyên ku bi Qur'ana pîroz hatiye, bi awayekî aram bersivên hişmendane pêşkeş dike û li pey xweşborandina demê dikeve.

Di dilê Xeyyam de agirê softiyê û jiyana derwêşî nayê dîtin. Baba Tahirê sofî di nav eşqeke dilsoz de dişewite lê Xeyyam ji şewitandina softî ya Baba Tahir bêpar e. Hestên Baba Tahir ên xwerû û têrwate ên ku di nav civaka sofîyan de hêj nû ne, xeyalên wî ên sirûşt, xweşikiya zimanê wî û çêja helbestên wî balkêş in.¹⁸⁷

Mirin û helwesta piştî mirinê Xeyyam naêşnin. Dilê ku Xeyyam di helbesta xwe de xêz kiriye ji razê têngihîştîye. Dil ji ber ku ji razê têngihîştîye naşewite. Lê di hundurê Baba Tahir de agirekî bi germiya sofîyane heye. Ji bo wî mirin û piştî mirinê gelek giring in. Di nav helbestên Xeyyam de agirê softiyê tune. Ji ber ku Baba Tahir sofîzîm kiriye di nav wêjeyê, hestên xweşik di helbestên wî de hene, dubeytiyên wî xweşiktir in.

Wekî encam aliyê naverokê û sazkirina helbestan ve helbestên Xeyyam dişibin helbestên Baba Tahir lê felsefeya Baba Tahir ji ya Xeyyam cuda ye. Secadî diyar dike ku Xeyyam bi du çavan temaşayê du aleman dike. Li ser her du aleman jî radiweste, lê hemberî her du aleman jî rêyeke bêperwa girtiye. Nirx nade her du aleman. Lê Baba Tahir hemberî vê alemê bêperwa be jî, li hemberî alema din baldar e. Ew bala xwe bi giştî daye alema piştî mirinê. Ji bo Baba Tahir gihîştin, heyîna mirin û ya piştî mirinê gelek girîng in.¹⁸⁸

2.1.7.3. Baba Tahir û Îbn 'Erebî

Baba Tahir û Îbn 'Erebî hilberînerên ramana wehdetê wicûdê ne. Bi vê ramanê renekî xurt dane tesewifê.

“Îbn Arabî di nav salên hîcrî 560-638'an (mîladî 1165-1240) de jiyaye û 230 salî piştî koçdawiya Baba Tahir koçdawî kiriye. Balkêşiya Îbn Arabî ew

¹⁸⁷ V. Minorsky, “Baba Tâhir ‘Uryan”, *Îslâm Ansiklopedisi*, ç. 5, weş. M.E.B., Eskişehir, 1997, II, r. 168.

¹⁸⁸ ‘Elaeddîn Secadî, *Mêjûy Edebî Kurdî*, weş. Bilavkirdnewey Kurdistan, Sine, 1391, r. 185.

*e ku damezîrînerê ramana “wahdetê vicûd” (yekitiya heyînan) û “vahdetê edyan”ê (yekitiya baweriyân) ye.*¹⁸⁹

Baba Tahir ramana wehdetê wicûdê beriya Îbn ‘Erebî aniye ziman. Ew di dîrokê de wekî yek ji pêşengên ramana wehdetê wicûdê derdikeve pêş. Di dubeytiya wî de diyar dibe ku, ew her li ku dênêre dilberê (afirîner) dibîne. Di her tiştî de nîşaneyek ji balabejna dilberê dibîne. Lewre her tiştên dinê parçeyek û sifetek ji afirîner in. Afirîner di her tiştî de tecelî kiriye. Baba Tahir di dubeytiya xwe de ramana xwe wiha aniye ziman:

Ez li çolê dinêrim te dibînim

Ez li behrê dinêrim te dibînim

Çiya, der, deşt: Li ku binêrim

*Nîşanekê ji balabejna te dibînim*¹⁹⁰

Baba Tahir ramana wehdetê edyanê jî beriya Îbn ‘Erebî aniye ziman. Wî tevî baweriyân û cihên wan ên pîroz heman dîtiye, ku li gorî wî hemû ji “Yek”î ne. Ji ber ku her tişt parçeyek ji Xwedê ne, nexwe ter û hişk, pê û ser, Kenîşt û Ke‘be yek in. Ew yekitiya heyînan û ya baweriyân wiha aniye ziman:

Bijî yên ku serî ji pê cuda nakin

Wekî şewatê hişk û ter cuda nakin

Hewra û Ke‘be û putxane û dêr:

*Bi serayeke bê dilber bawer nakin*¹⁹¹

Vegotinên tesewifê yên têrwate, bi Îbn ‘Erebî, Mawlana, Attar, Yunus Emre û wd. hatin bihîstin. Nexwe ew ji kî bandor girtin. Çavkaniya wan kî ye? Ev robarên mezin, bi ava yên mîna Baba Tahir zêdebûn. Nola rehmeta ku ji esmana peya bû, tova ku kete erdê, ev sofîyan jî ji wan zan. Çi qas dem li ser

¹⁸⁹ Yıldırım, *b.n.*, r. 40.

¹⁹⁰ *b.n.*, r. 40.

¹⁹¹ *b.n.*, r. 40-41.

gotinên mezinan derbas bin jî gotinên wan ew qas nû û rengîn dibin. Baba Tahir jî yek ji wan mezinan e.¹⁹²

Ew derbarê hebûnê ramanên hevpar parastine. Alemê yekwicûd dîtine. Di warê felsefe û tesewifê de deng vedane.

2.1.7.4. Baba Tahir û Mewlana

Baba Tahir (kd. 1010) beriya Mewlana (kd. 1273) jiyaye. Mewlana û Baba Tahir xwediyê ramanên hevpar in. Her wiha di heman demê de ev her du mutesewif xwediyê şeweyên xwe û mirovên serdemên cuda ne. Mewlana ramanên xwe bi zimanê Farisî nivîsandiye, ku ev ziman di nav sofîyan de ji bo nivîsandina helbestan dihat bijartin, lê Baba Tahir helbestên xwe bi zaravayê Lorî nivîsandiye.

Ev her du mutesewif ramana yekitiya heyînan parastine. Tova wehdetê wicûdê ku Baba Tahir reşandibû li ser axa tesewifê, ji aliyê Şemsê Tebrîzî û Mewlana xurt û geş bûye. Mewlana vê ramanê bi şeweyê xwe aniye ziman û ew çawa fikiriye wisa jî jiyaye. Di heman demê de Baba Tahir xwe wekî qelender û derwêş daye nasîn. Mewlana, li ser şopa sofîtiya Melametî-Qelenderiyê û wehdetê wicûdê bûye.¹⁹³

Mewlana mirovekî alim, faqîh û zahid bû. Têkiliya wî bi Şemsê Tebrîzî re gelek xurt bû. Tebrîzî li ser Mewlana xwedî bandor bû. Mewlana ramanên tesewifî ji Şemsê Tebrîzîyê ku ji Îrana ku xwedî çandê bilind bû girtiye. Tebrîzî, di derbarê ramana, "*Ilim ne amûreke ku mirovan bibe eşqa îlahî*" de, Mewlana serwext kiribû û bi vê serwextkirinê karekî mezin bi dest xistibû. Birastî ev raman ne ya Tebrîzî bû, ya bingeha felsefeya sofîtiya qelenderiyê bû. Her wiha yek ji pêşengên vê ramanê Baba Tahirê Uryanê Hemedanî bû ku wî di gotineke xwe de heman gotina sofîtiyê anîbû ziman û ramana; "*Amûra yekta ku mirovan bigihîne eşqa Îlahî mutleq cehîl e*" diparast û ew wiha pêde diçû: "*Ilim, min cezb kir anî peravê zeryayê. Wecd, min kişand di nav zeryayê,*

¹⁹² Uluçay, *b.n.*, r. 26.

¹⁹³ Ocak, *b.n.*, r. 132.

radestê xeniqandinê kir. Min di nav zeryayê de ji ilmê alîkarî xwest, lê nikarîbû min xelas bike. Min xwe bi wecdê ve berda, ew jî min xêncî birina ber bi nêzî xeniqandinê tiştekan nekir. Lê tenê cehalet min xelaskir.”¹⁹⁴

Baba Tahir di gotineke xwe de gotibû: “Emseytû Kurdiyên ve Esbehtû Erebiyên”. Ev gotina wî bi Kurdî wiha ye: “Ez ketim xewê Kurd bum û sibê hişyar bûm ‘Ereb’im.” Mewlanayê Romî di mesnewiya xwe de bi şêweyeke raz û bi awayekî payeberz şîroveya vê gotinê kiriye.¹⁹⁵ Mewlana di mesnewiya xwe de derbarê gotina Baba Tahir wiha gotiye:

سرامسینا لکردیا بدان راز صبحنا عربیا بخوان

سرامسینا واصبحنا تورا میرساند جانب راه خدا¹⁹⁶

Raza ku min şevê wekî Kurd derbas kir bizane. Raza ku em wekî Ereb derketine berbangê bixwîne.¹⁹⁷ Raza şev û sibehê te, digihînin li cem Xwedê.

Mewlana di mesnewiya xwe de derbarê gotina Baba Tahir wiha gotiye: Bêpirtûk, bêmamoste û bêhînkêr di dilê xwe de ilma pêxemberan dibînî. Pêxember diferre: “Di nav kesên ometa min de, yên xwediyê heman cewhera min hene. Bi nûra ku ez wan dibînim, rihê wan min dibînin.” Ew bêyî pirtûkên Buharî û Muslîm û bêyî kesên hedîs û rîvayetan dikin, heta di çavkaniya ava jîyanê de dibînin. Raza ku min şevê wekî Kurd derbas kir bizane. Raza ku em wekî Ereb derketine berbangê bixwîne.¹⁹⁸ Mewlana mijarê bi mînakên derbarê ilma biraz didomîne û behsa eksa ku di dil de peyda dibe dike. Me di mijareke xwe ya beriya vê mijarê de behsa bûyera Baba Tahir, xwendekarê medereseyekê û hewza qeşemgirtî kiribû. Baba Tahir dixwast ku bibe xwedî ilm. Vê daxwaza xwe ji xwendekarên medreseyê re kir, xwendekarên

¹⁹⁴ *b.n.*, r. 131-132.

¹⁹⁵ Şiwan, *b.n.*, r. 23.

¹⁹⁶ Mewlana, *Mesnewî*, çapa علاه الدوله, r. 90, vgz. Muînuddîn Îbnu’l Qasim Cuneydê Şîrazî, *b.n.*, r. 516.

¹⁹⁷ Mevlâna, *b.n.*, r. 149.

¹⁹⁸ *b.n.*, r. 148-149.

medreseyê henekê xwe bi wî kirin û ji bo ku ew ilmê bidest bixe wî ber bi hewzê ve beralî kirin. Baba Tahir gotina wan kir û ji bo ku mîna wan ilmê bidest bixe kete hewza qeşemgirtî. Şewa xwe di wê hewzê de borand. Rojtira paşîn berbangê ronahiyek / nûrek hat kete devê wî û wî got: “Ez ketim xewê Kurd bum û sibê hişyar bûm ‘Ereb’im.” Paşê bi xwendekarên wê medresê re kete di nav niqaşiyên felsefî û tesewifî. Di vê bûyerê de tê dîtîn ku Baba Tahir guherînek derbas kiriye. Guherîneke wisa di wî de peyda bûye ku ew bi hevokeke sembolîk a ku “Bişev Kurd bûm û berbangê bûm Ereb” vê guherîne aniyê ziman. Mirovekî cîhanê bi ser kîjan qewmîyetê / neteweyê were cîhanê ew e, ku ew netewe naguhere. Lê hin kes dibêjin ku Baba Tahir bi vê gotinê bûye Ereb. Lê tê zanîn ku merivek nikare neteweya xwe biguherîne ku ji bo vê divê dê û bavê xwe biguherîne ku ev jî ne pêkan e. Ji ber ku di hundirê Baba Tahir de guherînek qewimiye û berbangê bûye xwediyê ilma biraz, ew vê guherîna xwe bi gotina xwe ya jorê ya ku ne pêkan e, lê pêk hatiye, ku guherîneke wisa ye ku ew guherîn mîna ku qewmîyeta wî buguhere ye, aniyê ziman. Berbangê ilma nepen a biraz di wî de peyda bûye ku Mewlana diyar kiriye, ev ilm ilma pêxemberan e.

Baba Tahir di helbesteke xwe de wiha gotiye:

Eger dil dilber be, ma dilber kî ye

Eger dilber dil be, navê dil çi ye

Ez dil û dilber tevlihev dibînim

*Nizanim ku dil kî û dilber kî ye*¹⁹⁹

Mewlana jî di mesnewiya xwe de girêdayî vê helbesta Baba Tahir ramanên xwe wiha pêşkeş kiriye:

Sûreta bêsûret ya alema nepen,

Ji Mûsa re di awêneya dil de biriqî.

¹⁹⁹ Kara, *b.n.*, r. 13.

Ew sûret di felekê de cih nebe jî;

Di erş, erd, zerya û masiyan de jî cih nebe,

Ku ev bitixûb û bijimar in, lê tixûbê awêneya dil tune, bizane.

Dil bi wê re ye, yan dil ew bixwe ye, di vir de hiş disekine.

Her eksê wêneyan, hizkî yek, hizkî bêjimar bin,

Heta ebedê tenê ji dil re dibiriqin.

Heta ebedê her wêneya nû yên ku ji wê re dibiriqin,

Di wê de bêasteng xuya dikin.

Ên ku dilên xwe biriqandine, ji reng û bêhnan rizgar bûn;

Her dem bêrawest bedewiyê dibînin.

Dirûv û qalikê zanistê berdan, bi dîtîne ala baweriya teqez berz kirin.²⁰⁰

Tê dîtîn ku gotinên Baba Tahir û yên Mewlana hevdu tamam dikin. Mewlana jî mîna Baba Tahir ramana wehdetê wicûdê pejirandiye û bi berhemên xwe vê ramanê xurtir û rengîntir kiriye.

2.1.7.5. Baba Tahir û Yûnis Emre

Baba Tahirê mutesewifê Kurd ê sedsala 10 û 11'an û Yûnis Emreyê mutesewifê Tirk ê sedsala 13 û 14'an, ji hêla ramanên tesewif û wehdetê wicûdê ve dişibin hevdu. Her du jî helbestên tesewifî bi şêweyeke herikbar, xwerû, têrwate û xweşik nivîsandine. Baba Tahir hest û ramanên xwe bi Kurdî, Yûnis Emre jî bi Tirkî anîne ziman, lê raman û armanca wan yek in. Ew rêwiyên heman rêyê ne.

Herêm, serdem, netewe û çandên ku di tê de jiyane ji hev cuda ne. Her çî qas di demên van her du arifan de zimanê Farisî û Erebi bi bandor bin jî her du hunermend bi zimanê dayikê fikirîne, jiyaneke feqîr jiyane û wêjevaniyê

²⁰⁰ Mevlâna, *b.n.*, r. 149.

kirine. Her du jî li hemberî zimanên serdest girêdayî zimanên xwe mane. Baba Tahir li ser axa Kurda, li bajarê Hemedanê hatiye jiyane. Di heyama wî de li erdnîgariya ku di tê de dijiya, baweriyên Îslam, Zerdûştî, Êzdîtî û Yarsanî bibandor bûn. Yûnis, li ser axa Anatoliyayê hatiye jiyane, ku Anatoliya wê demê cihê şer û dewan, cihê aloziyan bû. Li Anatoliyayê Îslamiyet bi bandor bû û her wiha Elewî û Bektaşî jî xwedî cihekî taybet bûn. Rêya van her du sofîyan di ravekirina hebûnê, hezkirina Xwedê û ramana wehdetê wicudê de digihije hevdu. Her du jî bêtirs li ser Xwedê, hebûn, mirov, mirin û eşqa Xwedayî rawestiyane.

Baba Tahir ramanên xwe bi helbestê bi awayekî xwerû û xweşik aniye ziman. Helbestên wî xwedî wateyên kûr in. Her wiha ew xwedî şeweyê xwe ya taybet e. Dubeytiyên wî bi cureyekê kêşa arûzê hatine nivîsîn.

Yûnis jî bi awayekî hunerane wateyên kûr li peyvên xwerû bar kiriye û helbestên xwe bi şeweyê axaftinê bilêv kiriye. Bi zimanê helbestên xwe û bi şeweyê xwe ya taybet bandor li ser helbestvanên li pey xwe kiriye.²⁰¹ Helbestên xwe, piranî bi kêşa kîteyî nivîsandiye.²⁰² Di helbestên wan de lîrîzimeke xurt heye.

Dema ku helbestên van her du mutesewifan tîn xwendin, ew wekî derwêşên xwerû, bêguneh û rihên ku bi rihma Xwedê ve tijî ne derdikevin pêşberî me. Di heyama her duyan de, di civakên wan de şer, alozî û jiyaneke dijwar hebûne. Di serdemên wan de guherîna çandî û civakî qewimîne. Civaka her duyan jî di nav şer, alozî û dijwariyan de bûne. Ew di nav demên dijwar de derketine holê.

Çawa ku Yûnis gotiye: Xwedê, di xwe û dilê xwe de bigere, ne ku li Meke, Qûdus û Hecê; Baba Tahir jî Xwedê di dilê xwe de dîtiye û wiha gotiye: Ez dil û dilberê tevlihev dibînin, nizamim dil kî ye û dilber kî ye. Her du arif jî ramanên xwe di nav cîhana hestên xwe de bi awayekî hunerane helandine.

²⁰¹ Mustafa Tatcı, *Yunus Emre Divanı*, Tahlil, b. 1, weş. M.E.B., İstanbul, 2005, r. 85.

²⁰² Cihan Okuyucu, *Divan Edebiyatı Estetiği*, weş. L&M, İstanbul, 2004, r. 129.

Baba Tahir di helbestên xwe de wekî mirovekî qelender derdikeve pêşberî me. Di dîrokê de yekem car wî ji xwe re gotiye qelender. “*Yûnis Emre jî di xwendegeha sofîtiya Melametî-Qelenderiyê û di nav pergala wehdetê wicudê de bûye. Yûnis bi rêya sofîyê Baba Tapduk ê ku li ser şopa Ahmed Yesevî bû, bi tesewifa Melametî-Qelenderiyê ve têkil bûye.*”²⁰³

*Sofîtiya Melametî-Qelenderî di hemberî tesewifa li ser zuhda klasîk a badilhewa ya Basra û Kufeyê wekî bertek derkete holê. Ev raman di navbera sedsala 9 û 11'an de li Hemedan, Nîşapûr, Herat, Belh û Kabilê, ji ramanên sofîyên mîna Ebu Hafîsî Hadad (kd. 874), Hamdûnî Qasar (kd.884), Baba Tahirê Uryan (kd. 1010) û Ebû Saîdî Ebûl Hayr (kd.1040) ve derkete holê û peşve çûye.*²⁰⁴

Her du arif seyr û silûkê jiyane, ji meqamên ku tesewifa Îslamê kifş kiriye ên ku şerîat, terîqet, heqîqet û merîfetê derbas bûne û gihîştine irfanê. Bi îlham û eşqê têgihîştine, ne bi xwendinê. Ji dost hezkirine û tu hêz têrê nekiriye ku wan ji dostê wan biqetîne.

Derdê wî, dermanê wî, cudatî û gihîştina wî ji dost e. Ger wî post bikin jî canê wî naqete ji dost. Baba Tahir ramana xwe ya derbarê dost wiha aniye ziman:

Hem derdê min, hem dermanê min ji dost

Hem wesla min, hem hîcrana min ji dost

Eger qesab çermê min ji beden ke

*Ti dem venaqete canê min ji dost*²⁰⁵

Yûnis Emre jî hestên xwe yê derbarê dost wiha aniye ziman:

Alem düşman olurısa beni dostdan ırımaya

*Dost kandayısı ben anda düşmanlık ayırımaya*²⁰⁶

²⁰³ Ocak, *b.n.*, r. 132.

²⁰⁴ *b.n.*, r. 133-134.

²⁰⁵ Kara, *b.n.*, r.13.

Alem bibe dijmin ji bo ku min ji dost veqetîne, dost li ku ye ez li wir im, dijminî me veneqetîne.

Di gotinên her du sofiyan eşkere ye, ku ew xwe radestê dost kirine û veqetîna wan a ji dost ne pêkan e. Her wiha dostê ku jê venaqetin heman e.

Ew dilên ku berê xwe dane Xwedê, di dilên wan kesan de cemala Xwedê tecelî dike. Xwedê xwe bi sifetekî xwe nîşan bike, tecelî pêk tê. Di vir de hebûna ku tecelî dike û teceliyê dide kirinê heman hebûn e. Cenabê Heq, bi awayekî timî di “mirovên kamil” de tecelî bûye. Eşq, nefsa mirovan dikuje û dilê wan bi teceliyê tijî dike. Xwedê bi sifetên xwe bi aliyê cemal û celala xwe tecelî dike. Kesên ku her du teceliyê yek dizanin, him celal him jî cemalê ji Heq dizanin, mijara wehdetê fêm kirine. Kesên ehlê wehdetê di her derî de nûra Xwedê dibînin.²⁰⁷

Baba Tahir û Yûnis Emre dilên xwe dane Xwedê, ji wehdetê fêm kirine û di her tiştî de teceliya Xwedê dîtine. Vê helwesta xwe Baba Tahir wiha aniye ziman:

Gulistan cihê te ye nazenînim

Ez li kulxan, li ser xwelyê rûdinim

Çi li kulxan, çi li gulşen, çi sehra

*Li ku binêrim, tenê te dibînim*²⁰⁸

Yûnis Emreyê ehlê wehdetê, nûra Xwedê dîtiye û wiha hatiye ziman:

Ger meyhâneye vardum ansuz yir göremedüm

Yine ana sataşdum gördüm dahı külhânda

Bir niçesine kaç dir bir niçesine tut dir

²⁰⁶ Tatçı, *b.n.*, r. 97.

²⁰⁷ *b.n.*, r. 239.

²⁰⁸ Kara, *b.n.*, r. 55.

*Kaçanla bile kaçar bile turur turanda*²⁰⁹

Ez çûme meyxaneyê, min ji bilî wî tu der nedît. Dîsa rastê wî hatim, li kulxanê jî min wî dît. Ji hinekan re dibêje bireve û ji hinekan re dibêje bigire. Him bi yê ku direve re ye, him jî bi yê ku sekinî re ye.

Di dilê van her du sofîyan de razek heye ku vedişêrin. Vê razê bi remzan tînin ziman. Mirovên ji rêzê naşên ku ji razê fêm bikin. Aşiq gava ku di halê wecdê de ne, dişên ku razê eşkere bikin. Lê eşkerekirina razê ji bo aşiq xetere ye. Hin aşiq razên xwe eşkere kirine. Yek ji wan Hellac e ku bi vê eşkerekirinê ji canê xwe bûye.

Li gorî Baba Tahir mirov çî qas ji ber eşqê biêşe jî, divê raza xwe bi awayekî zelal eşkere neke. Ew derbarê razê wiha hatiye ziman:

Serê min ji ber yarê gêj û mêj e

Bi şevan av ji çavên min dirêje

Kî ku razên dilê xwe bibêje xelkê

*Ew ya mirovekî dîn e yan gêj e*²¹⁰

Yûnisê xwedî raz jî wiha gotiye:

Yunus sen bir olgıl gönülde sır olgıl

*Ki derviş olanlar o sırdan tuyalar*²¹¹

Yûnis tu bikemile, di dil de bibe razek kemilî, ku derwêş vê razê bibihîzin.

Xwedê, dilên derwêşan wekî raza zerya afirandiye. Raz di dilê derwêşan de ji erşê mezintir e. Divê ev rind were veşartin. Heke neyê veşartin

²⁰⁹ Tatçı, *b.n.*, r. 239.

²¹⁰ Yıldırım, *b.n.*, r. 356.

²¹¹ Tatçı, *b.n.*, r. 244.

dê mîna Hellac biavêjin agir. Ên ku gihîştine murşîdê, dest bi eşkerekirina razê dîkin. Pîr raza Xwedê ne. Peyvên wan jî wisa nin.²¹²

Her du aşiq ji ber dilê xwe tengezar in. Gilî û gazince ji dil dîkin û dixwazin ji dil xelas bibin. Baba Tahir di dubeytiya xwe ya jêr de dixwaze ku dilê wî ji wî were standin û bi vî awayî rizgar bibe. Her wiha bi dilstandinê ew ê ji êşa eşqê rizgar bibe. Ew helwesta xwe û ya dilê xwe wiha aniye ziman:

Xwedêyo ez bêzar im ji ber vî dilî

Bi şev û roj bi ezar im ji ber vî dilî

Ji ber nalînên min nalîn dinalin

Bistîn ji min, tengezar im ji ber vî dilî²¹³

Yûnis Emre di helbesta xwe ya jêr de, bi dilê xwe re diaxive û ji dil dixwaze ku ew bila gotina nefsê neke, fesadiyê berde û vê cîhanê terk bike. Ew vê daxwaziya xwe ya ji dilê xwe, wiha tîne ziman:

N'ola gelsen şimden girü fesâdı terk itsen gönül

Gâh aglasan günahuna gâh kanâat itsen gönül²¹⁴

Dê çibe tu werî fesadiyê berdî, geh bigirî ji ber gunehên xwe, geh qîma xwe bînî ey dil.

Dil, di helbestên her du helbestvanan de xwedî cihekî girîng e. Dil, têgeheke sereke ya tesewifê ye. Navenda jiyana tesewifî ye. Tim helwestên nepenî / batînî di dil de peyda dibin û dilivin. Yanê dil cihê têgihîna her tiştê ku nepenî ne. Di Qur'anê de kesên ku dilên wan paqij in, tîn pesinkirin. Dil cihê ku Xwedê tecelî dike ye.²¹⁵

²¹² *b.n.*, r. 245.

²¹³ Yıldırım, *b.n.*, r. 149.

²¹⁴ Tatçı, *b.n.*, r. 247.

²¹⁵ *b.n.*, r. 245.

Baba Tahir û Yûnis di piraniyê / kesretê de yekitiyê dibînin. Li gorî wan piraniya ku xuya dike, di rastiye de yek e. Her tişt ji “Yek”ê derketine holê û hatine alema îmkanê. Ji vê alemê dîsa dê vegerin wehdetê.

Baba Tahir di piraniyê de “Yek”ê dibîne. Her çi dibêje û her çi dibîne ji “Yek”ê ne. Nabe dikeve deryayê ku cewher derbixe, lê dibîne ku cewher jî ji Yekê peyda bûye. Wî vê ramana xwe bi dubeytiya xwe ya jêr, bi awayekî xweşik wiha aniye ziman:

Çi bibêjim her çi bibêjim ji te ne

Pir hindik ez her çi bibêjim ji te ne

Ez ketim deryayê ku cewher derxim

*Hemû cewherên ku min dît ji te ne*²¹⁶

Yûnis di helbesta xwe ya jêr de təkiliya piranî û yekitiyê (kesret-wehdet) bi şibandinan ve wiha rave kiriye:

Zihî deryâ ki katreden görindi

Ne deryâdur ne katredür gör indi

Aceb katre ki deryâ anda mahfî

*Bu mahfî sırrı senden sor indi*²¹⁷

Ji dilopekî, zeryayekî bêhempa xuya bû. Zeryayekî çawa ne, dilopekî çawa ne, niha bibîne. Gelo zerya di dolopekî de veşartî ye. Niha vê raza veşartî ji xwe bipirse.

Gerdûna ku xuya ye îzafî ye, yanê girêdayî hebûna Îlahî ye. Hêj ku gerdûn û mexluqat nehatibûn afirandin, di wargeha wehdetê de bi zatê Îlahî ve yekwicûd bûn. Wehdet alemeke bêpîvan, bêhecim û bêneqîş e, di heman demê de ev wargeh bêdem û bêcî ye. Her tişt ji yekê peyda ye û dê dîsa vegerin

²¹⁶ Yıldırım, *b.n.*, r. 279.

²¹⁷ Tatçı, *b.n.*, r. 235-236.

wehdetê. Piranî, li hemberî deryaya wehdetê piçek e, ango mîna niqûtekî baranê ye, yan jî çemek e. Di rastiyê de niqût û çêm ji deryayê ne. Piranî ji wehdetê ye. Nexwe yek, di piraniyê de veşartî ye.²¹⁸

Aşiq û arif bi piraniyê naxapin, lewre ew di piraniyê de yekitiyê dibînin. Baba Tahir û Yûnîs Emre perdeyên li ber çavên xwe rakirine, piraniyê temaşa kirine û di piraniyê de yekbûna Heq dîtine. Her wiha piranî ji bo wan awêneya wehdetê ye. Piraniya li ber çavan di nepenê de yek e. Hebûnên vê cîhanê girêdayî Xwedê ne. Wehdet bêhecim, bêşewe, bêcih û bêdem e. Hebûn hê ku nehatibûne afirandin, bi zatê Îlahî re bûne. Ji yekbûna wî çêbûne û hatine vê alamê. Ji vir jî dê dîsa bi wehdetê ve veşartin. Her du arif di heman awêneyê de li piraniyê nihêrine û piranî wekî yek dîtine.²¹⁹

Baba Tahir piraniyê temaşa kiriye, li ku nêriye hebûna mutleq dîtiye û wiha hatiye ziman:

Ez li çolê dinêrim te dibînim

Ez li behrê dinêrim te dibînim

Çiya, der, deşt: Li ku binêrim

*Nîşanekê ji balabejna te dibînim*²²⁰

Yûnîs Emre jî di helbesta xwe ya jêr de piraniyê wekî awêneya wehdetê nîşan kiriye. Yê ku bizanibin binêrin dikarin di awêneyê de tenê cemalek bibînin. Piranî mîna awêneya wehdetê ye, ew kesê ku bizane lê binêre, di awêneyê de dê tenê rûyek / sûretek bibîne. Derbarê piranî û wehdetê, Yûnîs wiha gotiye:

Eğer âyine bin olsa bakan bir

*Gören bir görinen bin-bin görindi*²²¹

²¹⁸ *b.n.*, r. 235.

²¹⁹ "Yunus Emre ve Tasavvuf", [<http://web.deu.edu.tr/ilyas/edebiyat/yunusvetasavvuf.htm>], Gihîn: 25 Tebax 2015.

²²⁰ Yıldırım, *b.n.*, r. 171.

Heke awêne hezar be, yê ku dinêre yek be. Yê ku dinêre yek, ên ku tîn dîtin hezar in.

Yûnis di helbesta xwe ya jêr de xwe dişibîne çemên ku ber bi zeryayê ve diherikin. Çem ji zeryayê ye û dîsa vedigere zeryayê, yanê vedigere wehdetê. Ew wiha dibêje:

Benüm cânım uyanıkdur dost yüzüne bakan benem

*Hem denize karışmağa ırmak olup kan benem*²²²

Canê min hişyar e, yê ku li rûyê yarê dinêre ez im. Ez im ew çemê ku diherike tev li zeryayê dibe.

Yûnis di vê helbesta xwe ya jêr de dîne ziman ku di alema piraniyê de Yûsuf û Ya'qûb hene lê di alema wehdetê de her du jî tune ne.

Bu 'alem-i kesret de sen Yûsuf u ben Ya'kûb

*Ol 'alem-i vahdet de ne Yûsuf u ne Ken'ân*²²³

Di vê alema piraniyê de tu Yûsif û ez Ye'qûb. Di alema yekitiyê de ne Yûsif heye ne jî Kenan.

Gava ku mijar dibe eşq, arifên mîna Baba Tahir û Yûnis tîn bîra mirov ku ev arifan xwediyê eşqa rast in. Eşq, mijara wan a sereke ye, her wiha hêza hebûna wan e. Eşq hêzeke wisa ye ku aşiq di meşuq de winda dike. Baba Tahir û Yûnis di heyamên cuda de jiyane lê aşiqê heman hebûnê ne. Berê xwe dane hebûna yek. Ew bi vê eşqa xwe dikin xwe bigihînin yara xwe. Nexwe Baba Tahir û Yûnis di yarê de dê bigihîjîn hevdu lê bi gihîştina yarê ne Baba Tahir dê bimîne ne jî Yûnis, lewre her du jî dê di yarê de ret bibin.

Eşqê Baba Tahir dîn û dîwane kiriye. Wî bi derdê bêderman re mubtela kiriye. Baba Tahir hal û hewalê xwe wiha aniye ziman:

Misilman! Sê derdê min derketin holê

²²¹ Tatçı, *b.n.*, r. 235-236.

²²² *b.n.*, r. 235-236.

²²³ *b.n.*, r. 236-237.

Yek xerîbî, yek esîrî, yek jî derdê yarê

Xerîbî û esîrî jo bo min hêsan bûn

*Lê derdekî bêderman e derdê yarê*²²⁴

Yûnis Emre di halê eşqê de tê ziman û dibêje ger nebêjim eşqa xwe ez ê bixeniqim. Helwesta eşqa xwe di helbesta xwe de wiha tîne ziman:

Sözüm ay gün için değül, sevenlere bir söz yiter

*Sevdüğüm söylemezisem, sevmek derdi beni boğar*²²⁵

Gotinê min ne ji bo heyv û rojê ne, ji bo evîndaran gotinek bes e. Ger evîna xwe nebêjim, derdê evînê dê min bixeniqîne.

Yûnis, di helbesteke xwe ya din de, ji ber eşqa xwe, helwesta xwe wiha aniye ziman:

Gönlüm düşdi bir sevdâya, gel gör beni 'ışk neyledi

*Başımı virdüm gavgâya, gel gör beni 'ışk neyledi*²²⁶

Min dil berda evîndariyekê, were bibîne eşqê çi bi min kiriye. Min xwe sipart bi şerekî dijwar, were bibîne eşqê çi bi min kiriye.

Mutesewif, tesewifa zuhdê ya ku li ser ji tirsra dojhê, heviya çûyîna bihuştê bû, nedipejirandin. Baba Tahir û Yûnis Emre bi eşq û cezbeyê xwe bi Xwedê ve girêdabûn û ji bilî evîndarbûna Xwedê dest ji her tiştî berdabûn da ku bi vî awayî xwegihandina Îlahî pêk bîyanîna. Nefs, daxwazî û dinê li ber çavên xwe reş kiribûn û bi vî awayî xwegihandina bextewariya mîstîk pêk dianîn.²²⁷

Baba Tahir bi hezaran milkê dinê û yên axiretê (bihuştê) nade bi yarê. Ne malê dinê ne jî bihuşt bo wî biwate ne. Ew ne xweşikiyên dinê ne jî yên

²²⁴ Yıldırım, *b.n.*, r. 133.

²²⁵ Tatçı, *b.n.*, r. 263.

²²⁶ *b.n.*, r. 263.

²²⁷ Ocak, *b.n.*, r. 134.

axiretê dixwaze. Armanca wî gihîştina yarê ye. Wî vê helwesta xwe wiha aniye ziman:

Eger milkê min ê dinê hebe bi hezaran

Eger milkê min ê axretê hebe bi hezaran

Dilbera min were ez ji te re bibêjim ku

*Bê rûyê te qet naxwazim wan milkan*²²⁸

Bi gelemperî di baweriyên de piştî mirinê nemirî heye. Yanê jiyaneke bêdawî heye. Ev helwest mirovan şa dike. Du cîhan heye, yek ev cîhan e ya din jî cîhana piştî mirinê ye. Yanê tunebûn tune, mirin destpêka jiyana din e. Ev zanîna tirsê mirovan dişikîne û mirovan bi armanckî ve girê dide. Mirov dixwazin ku bigihîjin jiyana bêdawî ya piştî mirinê. Lê eşqa Xwedayî, Baba Tahir û Yûnis ji daxwaziya dinya dinê derbas dike. Ew bi tenê dixwazin bigihîjin Xwedê, ji bo wan bihûşt ne hewce ye, Xwedê bes e. Her wiha ew dizanin ku dê bigihîjin Xwedê ku ev zanîn wan şad dike.²²⁹

Baba Tahir di xezeleke xwe de di derbarê bihûşt, horî û tuba de wiha gotiye:

Eger bê te b'cennet, horî û tuba

*Dilşad bibim, birastî ez kafir im.*²³⁰

Baba Tahir di vê xezela xwe de armanca hebûna xwe û ramana xwe diyar dike. Bêguman armanca wî Xwedê ye, ne bihûşt, ne jî horî û tuba ne.

Yûnis di helbesta xwe ya jêr de eşqa xwe ya dilsoz eşkere dike. Ew guh nade malê dinê û armanca wî ne bihûşt e. Ew aşiq e û armanca wî bi tenê gihîştina bi yarê ye. Wî vê rewşa xwe wiha aniye ziman:

Ne varluğa sevinürem ne yokluğa yirinürem

²²⁸ Yıldırım, *b.n.*, r. 112.

²²⁹ Abdullah Rıza Ergüven, *Bütün Yönleriyle Yunus Emre*, weş. Berfin, İstanbul, 2001, r. 57.

²³⁰ Kara, *b.n.*, r. 155.

*Işkun ile avınuram bana seni gerek seni*²³¹

Cennet Cennet dedikleri bir ev ile bir kaç hûrî

*İsteyene vergil anı bana seni gerek seni*²³²

Ne ji dewlemendiyê şad dibim, ne ji xizaniyê gazinde dikim. Ji eşqa te kêfxweş dibim, ji min re tu divê tu. Bihuşta ku her tim behs dikin, ji malek û çend huriyan pêk tên. Tu van bide yên ku daxwaz dikin, ji min re tu divê tu.

Mirovên nefspiçûk têrbûn çiyê nizanin. Bi destxistina tişteki têr nabin û daxwaziya tişteki din dikin. Lê mirovê çavtêr û aşiq ji aliyê Baba Tahir wiha tê ravekirin:

Dilê evîndar bi peyamekê têr dibe

Kesê mexmûr bi piyalekê têr dibe

Ji min re çawaniya çavên te bes e

*Kesê qenaetkar bi behîvekê têr dibe*²³³

Li hemberê xizaniyê çavên Yûnis ne li malê dinê ye. Dewlemendiya wî di dilê wî de ye. Li gorî wî dewlêdî ne bi malê dinê ye. Dewlemendiya bi malê dinê dewlemendiyeke derew e. Lê dewlemendiya rast dilê ku bi eşqê ve tijî ye. Yûnis vê helwesta xwe wiha aniye ziman:

Ben bunda geldim bu dem, geri ilime gidem

*Sanmaki bunda beni, altına mala geldim*²³⁴

Ez di vê dema tengasî de hatim, ez dê paş ve vegerim ilmê. Bawer neke ku ez di vê demê de, ji bo mal û zêran hatim.

²³¹ Faruk Kadri Timurtaş, *Yunus Emre Divanı*, Tercüman 1001 Temel Eser 1, weş. Kervan Kitapçılık, 1972, r. 153.

²³² Mustafa Özçelik, *Bizim Yunus*, weş. Sistem Ofset, Ankara, 2010, r. 156.

²³³ Yıldırım, *b.n.*, r. 270.

²³⁴ Ergüven, *b.n.*, r. 41.

Wateya jiyanê, wateya dema ku diherike çiyê? Hewldanên mirovan divê ber bi kîjan alî ve be? Divê jiyan çawa be, çanî were jiyan? Jiyan çiyê mirin çiyê? Ji berê ber de mirovahî li ser van pirsan rawestiyane. Kî ji mirinê natirse, kîjan hunermend, mamoste, alim û egît. Her kes rojek dikeve di nav dest û lepên mirinê, carekî din venagerin dinê. Her kesê ku baş û xerab, hezker û dildar, dewlemend û xizan li ber mirinê neçar in.²³⁵

Him Baba Tahir û him jî Yûnis ramanên xwe ên derbarê mirinê bi helbestên xwe bi awayekî zelal û wêrek vegotine. Ew ji mirinê netirsiyane û tirsê mirinê ya dil de heye kuştine. Kîjan mirov heye ku ji mirinê hezbike û mirinê bixwaze? Him Baba Tahir û him jî Yûnis Emre daxwaziya mirinê kirine, bi coş û bi ken ber bi mirinê ve çûne.

Baba Tahir di helbesteke xwe de rewşa xwe ya derbarê mirinê bi awayekî bikêf wiha aniye ziman:

Çi xweş e roja ku min têkin mezel

Li ser min bicivin giya û ax û pel

Du ling ber bi qibleyê, can li çolê

*Laş bi mar û mûran re bike ceng*²³⁶

Yûnis di gotineke xwe de dibêje: “Çi ditirsî ji mirinê, netirse tu her tim heyî”, lewre mirin ne tunebûn e, hebûneke ji nû ve ye û ji ber ku li pişt mirinê jiyaneke bêdawî heye, divê mirov ji mirinê netirse. Bi vê gotina xwe Yûnis mirovan hemberî mirinê wêrek dike. Yûnis bi hişmendiyeke nêzîkê mirinê dibe û ji mirinê natirse. Ne tenê li ser mirinê, li ser mirinê şûnde jî radiweste. Mirinê parçeyekî jiyanê dibîne. Li hemberî mirinê bêtirs, aram, û xwezayî disekine. Rewşa kesekî ku pirs û pirsgrêkekî herî mezin çareser kiriye û pişt re aramiyek mezin dijî, di wî de xuya dike. Li gorî Yûnis laş dimire lê can mayînde ye.

²³⁵ *b.n.*, r. 41-45.

²³⁶ Yıldırım, *b.n.*, r. 147.

Mirin heman demê de zayîn e, mirin tovê jiyanê ye. Jiyan çawa ber bi mirinê ve diçe, çima mirin ber bi jiyanê ve neçe? ²³⁷

Ew di helbestên xwe de mirovan vedixwîne heta hatayê. Wî bûyera mirinê di helbestên xwe de wiha rave kiriye:

Ûy benûm 'ömrüm kuşu kanda varasın birgün

Ecel avlayıp yudar ele giresin birgün

Binüp ağaç atına yanulup Hızır'a tana

Şol kara yir altına gire yatasın birgün

Şol yılana çiyana nasib olasın birgün

Yûnus Emrem n'idesin kaçıp kanda gidesin

*Erenler sohbetine gelmez olasın birgün*²³⁸

Ey temenê min, rojek were tu bidawî bî. Ecel were te hilde bibe. Ew roj were tu siwarê hespê dar bî. Tu bikevî bin axa sar. Rojek were tu bibî qutê mar û mûran. Yûnis Emre tu dê çi bikî, bi ku ve birevî. Rojek were tu beşdarî galegala qenc û pîran nebî.

Baba Tahir û Yûnus Emre di van helbestên xwe ên jêr de di mirinê de rewşa feqîr û dewlemendan didin li ber hev. Mirin dewlemend û feqîrên dinê aliyê madêyê ve wekhev dike. Lê ji mirinê pê ve yê dewlemend êdî feqîr in.

Baba Tahir ramana xwe ya derbarê dewlemend û xizanan wiha aniye ziman:

Di ber gorîstane re buhurîm kêm zêde

Min halê dewlemend û feqîran dît tê de

Ne feqîr bê kefen ketibûn bin axê

²³⁷ Ergüven, *b.n.*, r. 47.

²³⁸ Tatçı, *b.n.*, r. 190.

*Ne dewlemend biribû ji kefenek pê de*²³⁹

Yûnus Emre derbarê dewlemend û feqîran wiha gotiye:

Şunlar ki çoktur malları, gör nice oldu halları

Son ucu bir gömlek imiş, anında yoktur yenleri

Kani mülke benim deyen, köşk ü saray beğenmeyen

*Şimdi bir evde yaturlar, taşlar olmuş üstünleri*²⁴⁰

Ev bûn yê dewlemend, bibîne ketine çî halî. Dawiya wan kiresek bûye, lê berfêkirasê jî tunin. Gotin ev mal û milk yê me ne, ji koşk û qesran qayil nebûn. Niha di malekî wisa de radizên, kevir bûye lihêfa wan.

Ji helbestên Baba Tahir û Yûnis diyar dibe ku ew di nav civaka ku tê de jiyane berpirsiyariya xwe zanîne û xwe ji civaka xwe cuda nedîtine. Ji mirina xwe aciz nabûne û xastine ku cezayên xwe bikişînin, mîna mirovên din ji cezayên xwe nereviyane.²⁴¹ Mîna Baba Tahir, Yûnis jî li ser ramana “mirov bi mirînê nemir dibe” ye. Mirov xwe dibîne, digihîje rastiya xwe, bêdawî dibe û digihîje xwe.

Her du arif mirovên serdem, netew û zimanên cuda nin lê ji aliyê felsefeya jiyana û ramanê ve mîna hev fikirîne û tevgeriyane. Ramana wehdetê wicûdê parastine û derbarê rastiya hebûnê mirovan hişyar û ronî kirine. Di nav civakê de bi awayekî adil tevgeriyane. Eşqeke pak û pîroz jiyane û helbestên xweşik, biaheng, xwerû û têrwate diyariyê mirovên cîhanê kirine.

2.1.7.6. Baba Tahir û Melayê Cizîrî

Her du jî bi Kurdî helbestan vegotine. Baba Tahir (kd. 1010) bi zaravayê Lorî, Cizîrî (kd. 1664) jî bi zaravayê Kurmancî hatine ziman. Di heyamên xwe de binav û deng bûne. Serdemên wan ji hev dir in, lê di heman

²³⁹ Yıldırım, *b.n.*, r. 389.

²⁴⁰ “Ger Taş İsen Eriyesin”, Gihîn: [http://www.yunusemre.net/siirler/17-Ger-Tas-Isen-Eriyesin.html], Mêjûya Gihînê: 09 Gulan 2015.

²⁴¹ Ergüven, *b.n.*, r. 49.

rêvê de birêve çûne û aşiqê heman dilberê bûne. Her du jî bi bendê heman yarê ve xwe girêdane û ramana wehdetê wicûdê parastine. Eşqê, her duyan jî şewitandiyê û ew di vê eşqa xwe de winda bûne. Ji cudabûna yarê, ketine tayê, eş û jan kişandine, naliyane, feryad kirine û daxwaziya gihîştinê kirine. Vê rewşên xwe di helbestên xwe de bi awayekî xemgînî anîne ziman. Her du jî berhemên giranbûha nivîsandine. Ji ber bêrîkirina yarê, feryad kirine û ev feryad berhemên giranbuha bi wan daye nivîsîn.

Baba Tahir di helbesteke xwe de derdê cudabûna xwe û hesreta dilê xwe wiha aniye ziman:

Laşekî min ê derdkêş heye Xwedêyo

Dilekî min ê hesretkêş heye Xwedêyo

Ji ber xerîbiyê bêrîkirina yar û war

Sîngekî min ê agirkêş heye Xwedêyo²⁴²

Melayê Cizîrî jî feryada xwe ya ji destê cudabûna xwe wiha aniye ziman:

Vê firqetê ebter kirîn feryad ji destê firqetê

Jar û zeîf û zer kirîn feryad ji destê firqetê²⁴³

Melayê Cizîrî di helbesta xwe ya jêr de diyar dike ku pêl, derya û niqûtên avê yek in. Di rastiyê de hemû yek in, çi av û çi cemed. Wî wicûda mutleq ya bêdestpêk û bêdawî, şibandiye deryayê û gerdûnê şibandiye pêlan, her wiha av û cemedê jî şibandiye têkiliya di navbera afirîner û aferîdeyan de û wiha gotiye:

Yeke derya Tu bizan qencê çi mewc û çi hûbab

Bi heqîqet ku yek in her dû çi av û çi cemed²⁴⁴

²⁴² Yıldırım, *b.n.*, r. 100.

²⁴³ Abdulkakî Turan, *Melayê Cizîrî Dîvani ve Şerhî*, ç. 2, weş. Nûbihar, Stenbol, r. 641.

Baba Tahir jî, di helbesta xwe ya jêr de, ramana xwe ya derbarê felsefeya wehdetê wicûdê rave kiriye. Wî, serî û pê heman dîtiye, her wiha ter û hişk her çi qas dijberê hevdu xuya bikin jî, heman û yek dîtiye. Di heman demê de di her derî de Yekê dîtiye, cihên pîroz ên baweriyên asîmanî jî heman dîtiye. Wî di cihên pîroz ên baweriyên de dilberê dîtiye û ramana xwe ya yekitiya heyînan wiha aniye ziman:

Bijî yên ku serî ji pê cuda nakin

Wekî şewatê hişk û ter cuda nakin

Hewra û Ke'be û pûtxane û dêr:

Bi serayeke bê dilber bawer nakin²⁴⁵

Eşqê, Baba Tahir şewitandiyê û ew ji xwe çûye. Gihîştîye meqamekê wisa ku êdî dil û dilberê di nav hevdu de dîtiye. Wî vê rewşa xwe wiha aniye ziman:

Eger dil dilber be, ma dilber kî ye

Eger dilber dil be, navê dil çi ye

Ez dil û dilber tevlihev dibînim

Nizanim ku dil kî û dilber kî ye²⁴⁶

Melayê Cizîrî aşiq û dilberê tevlihev û yek dîtiye. Di heman demê de wan wekî awêneya nûra Heq dîtiye û wiha gotiye:

Ger dilber û wer aşiq in

Arif di vîda sadiq in

Ayîne yê nûr a heq in

²⁴⁴ Abdurrahman Durre, *Şerha Dîwana Ehmedê Xanî Felsefe û Jiyana Wî*, weş. Avesta, İstanbul, r. 78.

²⁴⁵ Yıldırım, *b.n.*, r. 119.

²⁴⁶ Kara, *b.n.*, r. 13.

*Cîh-cîh di wan da şû'le da*²⁴⁷

Baba Tahir û Melayê Cizîrî bi pîvanên bi estetîk û bilind, helbestên bêhempa diyariyê wêjeya Kurdî û ya cîhanê kirine. Her du jî di serdemên xwe de bûne ekol. Ramana wehdetê wicûdê ya ku bi Baba Tahir dest pê kiribû ji aliyê Melayê Cizîrî ve bi şêweyeke xweşik bi helbestên giranbuha hatine pêşkeşkirin.

2.1.7.7. Baba Tahir û Ehmedê Xanî

Baba Tahir (kd. 1010) û Ehmedê Xanî (kd. 1707) xwedî berhemên girîng, şêwazên bêhempa yên vegotinê û pisporên şêwaza helebestên klasîk in. Baba Tahir di dîrokê de wekî bingeha wêjeya klasîk a Kurdî xuya dike û Wêjeya Klasîk a Kurdî bi Ehmedê Xanî digihîje lûtkeyê. Berhemên Xanî ên navdar, ferhenga Nûbara Biçûkan, Eqîdeya Îmanê, mesnewiya bi navê Mem û Zîn, û Diwana Helbestan in. Xêncî van hin berhemên din jî henin ku hin lêkolîner wan berheman wekî berhemên wî hesibandine. Wî, li Bazîdê medreseyek ava kiriye û di heman medreseyê de bi zimanê Kurdî perwerde daye.²⁴⁸

Xanî, di berhema xwe ya Mem û Zîn de mijara eşqê û rastiya civaka Kurdan nirxandiye. Wî, destpêka eşqê bi awayekî xweşik aniye ziman. Di berhemê de piştî destpêkê mijara gihîştinê dest pê kiriye, paşê li ser dijarî û astengiyên li ser rêya gihîştinê ne rawestiye. Bi taybet eşqa mecazî û eşqa Îlahî di berhemê de bi awayekî balkêş hatiye ristin. Xanî jî wekî Baba Tahir rêwiyê eşqa Xwedayî ye. Çawa ku wî astangiyên li ser rêya gihîştina Mem û Zînê ne bi bûyerên cuda aniye ziman, Baba Tahir jî di helbestên xwe de dijarîyên li ser rêya tesewifê û yên li ser rêya gihîştina xwe ne, aniye ziman. Di berhema Xanî de derbarê piştî mirinê agahî hene. Mem û Zîn diçin bihûştê.

Di naveroka helbestên herdûyan de şibandin hene, lê her du hunermend bi şêweyên xwe helbestên xwe hilberandine. Di helbestên wan de ji aliyê

²⁴⁷ Durre, *b.n.*, r. 95.

²⁴⁸ Kadri Yıldırım, *Ehmedê Xanî Mem û Zîn*, ç. 2, weş. Avesta, İstanbul, 2013, r. 19-22.

naverokê ve hevparî hene ku yek ji wan hesta xemê ye. Di helbestên Baba Tahir de hesta “xem”ê gelek bi bandor e. Di heman demê de di helbestên Ehmedê Xanî de jî ev hest xuya dike. Lewre derd û kulên wan yek in û derd û dermanê wan jî yek in. Peyv û hevokên wan kêm zêde ji hevdu cuda bin jî armanca wan yek in. Her çi qas yekî bi zaravayê Lorî û yê din jî bi zaravayê Kurmancî hestên xwe vegotibin jî eşqên wan heman in.

Baba Tahir dinyayê wekî zindanê dibîne û hestên xwe yên xemgîn wiha tîne ziman:

Dinyaya bêwefa zindana min e

Dirika derd û xeman para min e

Sebra Eyûb û mîhmeta Ye‘qûb

Hema bibêje tev para canê min e²⁴⁹

Ehmedê Xanî jî xem û nalînên xwe, derd û kulên xwe wiha tîne ziman:

Her dinalim şev û rojan, meger ez Eyyûb im ez

Hêstiran her vedimalim, meger ez Ye‘qûb im ez

Bigirin dest ji me bêrûn, kul û derdan ku yek in

Wer bipêçin bi cefayê xwe, ku ez mektûbim ez

Hindeki xem hene daîm li min ew vêk dikevin

Ez nizanîm ku bi çav wan çi qewî mehbûb im ez

Xem telebkarê me ye, em xo telebkarê diyar

Weh tilismê teleb im, talib û metlûb im ez

‘Eceb îqbalî ji bo min nihê “Xanî” kul i bal

²⁴⁹ Yıldırım, *Baba Tahirê Uryan Hayatı Görüşleri Dîwanı*, r. 318.

*Padîşahê xem û derdan wehe ez merxûb im ez*²⁵⁰

Her du jî xwe dişibînin Eyûb û Ye‘qûb pêxember û xwe di rewşa wan de hîsdikin. Gelek bûyerên giran bi serê Eyûb pêxember ve tê, lê ew dîsa berê xwe dide Xwedê û sebir dike. Pêşiyê tevî malên wî ji destên wî tîn girtin, lê ew dest ji îbadeta Xwedê bernade û dibêje ku hemû mal û milk yên Xwedê ne ku wan mal û milkan sitandibe jî tu tîkiliya wan bi min tune ne, ku ew jixwe yên Xwedê ne. Piştî tevî zarokên wî ji destên wî tîn girtin û ew dimirin, lê ew dibêje ku yê ku diafirîne, can dide û distîne Xwedê ye. Hikim û biryar jî yên Xwedê ne. Paşê nexweşiyê giran lê peyda dibe, lê ew dîsa gilî û gazince nake, sebir dike û îbadeta xwe berdewam dike. Ji ber nexweşiya xwe bi salan tenê dimîne. Eyûb pêxember sebir û şîkur dike, bi vî awayî dibe mînaka sebrê. Di Qur’anê de hatiye diyarkirin ku: “Ew kesên ku sebir dikin dê bi xelatiyên mezin ve werin xelatkirin.” Her çî ku ji Eyûb pêxember hatine standin dîsa paşve ji wî re tîn dayîn.²⁵¹ Ye‘qûb pêxember jî bi windakirina kurê xwe yê bi navê Yûsif ku zêde ji wî hezdikey, bi salan digirî û çavên wî kor dibin. Lê ew sebir dike, hîç caran hêvî ji Xwedê nabire ku dawiya sebra xwe bi salan şûn ve digihîje Yûsif.²⁵² Baba Tahir û Xanî jî him diêşin û him jî sebrê nîşan dikin. Tu car gilî û gazince nakin û hêviya xwe ya ji Xwedê hîç nabirin.

2.2. BERHEMÊN WÎ

Berhemên Baba Tahir ên ku hatine berhevkirin û gihîştine roja îro bi du berheman tîn navandin. Ya yekem dîwana helbestên wî ye ku ev dîwan ji çar xezel, yek qesîde û ji sêsedî zêdetir dubeytiyan pêk tê. Ya duyem Kelîmatu’l Qîşar e. Ev berhem ji gotinên kurt û tesewîfî pêk tîn. Ev gotin xwediyê çêj û bêhna sofitiyê ne. Xêncî van berheman, behsa hin berhemên wî tîn kirin, lê ew berheman nehatine dîtin û di dest de nîn in.²⁵³

²⁵⁰ Durre, *b.n.*, r. 228.

²⁵¹ “Hz. Eyyub ve Sabrı”, [<http://www.dinimizislam.com/detay.asp?Aid=3168>], Gihîn: 22 Sermawez 2015

²⁵² “Hz Yakup (as)’in Sabrı”, [<http://www.ihya.org/kavram/kavramlar-ansiklopedisi/dt-6245.html>], Gihîn: 22 Sermawez 2015

²⁵³ Şiwan, *b.n.*, r. 29.

Berhema wî ya bi navê “Kelîmatu’l Qîşar” berhemeke tesewifî ye. Di vê berhema wî de mijarên mîna; eql û nefis, dinya, û ‘uqba, sema û zikr, ilm, me’rîfet, îlham, wecd, yadkirin, muşahede û muraqebe hene. Li ser vê berhemê gelek şîrove hatine kirin û ji aliyê gelek sofîyan ve peywendiyê mezîna dîtiye. Berhem ji aliyê Huseyn Wehîd Destgirdî ve di sala 1952’yan de digel dubeytiyan ve hatiye çapkirin, ku ev berhem ji 23 beşan pêk tê û gotinên bipuxte û bi hikmet di hundurîne.²⁵⁴

2.2.1. Helbestên Wî

Helbestên Baba Tahir ji dubeytî, xezel û bendan pêk tên.

2.2.1.1. Dubeytî

Helbestên Baba Tahir ji ber kêş (wezn), serwa (qafiye) û qalibên wan bi navên wekî çarîne, dubeytî, rubaî û terane hatine binavkirin.

Dubeytî; helbesta ji çar rîzan pêk tê û bi qalibên arûzê tên nivîsin re tê gotin. Rêza serwaya dubeytiyê aaxa ye. Hinekî wan bi qalibê mîna aaaa û xaxa jî tên nivîsandin. Yê tevî rîzên wan biserwa ne re (aaaa) terane tê gotin. Dubeytî aliyê hecim ve piçûk bin jî ji aliyê nivîsînê ve gelek dijwar in. Di dubeytiyan de peyv hindik in lê gotin û wate pir in. Her wiha ev gotinan bi awayekî xweşik, balkêş û mayînde tên gotin. Di jiyana de her tişt ji bo dubeytiyê dibin mijar. Dubeytî xwerû, kurt û bi wate ne. Bandor li ser mirovan saz dikin, wan kelecandin û difikirînin. Her du rîzên pêşiyê ji bo ramana ku were gotin re dibin bingeh û di rîza sêyem û çaram de ramana ku hatiye armanckirin cih digire. Di wêjeya rojhilatê de gelek pisporên dubeytiyan hene. Yê herî bi nav û deng di wêjeya Kurdî de Baba Tahir (kd. 1010) ya Farisî de Omer Xeyyam (kd. 1135) û ya Tirkî de jî Asmîzade Haletî (kd. 1630) ne. Ji ber ku bi dubeytiyan bi hêsanî hestên nazik û xweşik dikarin were gotin, dubeytî heta roja me ya îro hebûna xwe domandiye.²⁵⁵

²⁵⁴ Adak, *b.n.*, r. 111.

²⁵⁵ Karataş, *b.n.*, r. 493-494.

Terane helbestên ku hatine bestekirin û bi sazê tên gotin in. Gelên Yarsan dubeytiyên Baba Tahir bi tembûrê wekî staranan dibêjin.²⁵⁶

*“Dubeytiyên Baba Tahir ji aliyê ruxsarî ve bi kêşa erûza Erebi ji behra Hezeca şeşa hezîkirî li ser kêşa “Mefailun mefailun feûlun” hatine nivîsandin. Lê di çapa Armaxan de kêma dubeytî bi kêşên wekî “Faîlatun mefaîlun feûlûn” hatine nivîsandin.”*²⁵⁷

*“Serwaya dubeytiyan, wekî serwaya ruba’iyê ye. Misrayên yekem, duyem û çarem hemserwa ne, ya sêyem ji wan cihê ye (aaxa).”*²⁵⁸

Baba Tahir ji yekem pisporê dubeytiyan e. Ji heyama xwe û heta roja me ya îro bi dubeytiyên xwe ên delal, dilsoz û têrwate deng vedaye. Wî, di dubeytiyan de him eşqa esmanî aniye ziman, him jî derbarê qelenderî, feqîrî û hejariya xwe agahî daye. Dibaytiyên wî bi piranî eşqa Xwedayî, ramana wehdetê wicudê dihundirînin. Ew ji aliyê gel ve wekî mirovekî pîroz tê naskirin û hezkirin. Dubeytiyên wî ji aliyê gelek kesî ve hatine jiberkirin, hinekî wan hatine bestekirin û hin dubeytiyên wî jî wekî stranan bi tembûrê tên gotin ku çêja teraneyên wî ji stranan zehftir in. Dubeytiyên wî wekî gotinên pîroz tên pejirandin.

2.2.1.1.1. Destnivîs, Çap û Wergerên Dubeytiyan

Dubeytiyên Baba Tahir beriya her tiştî di dil û hişên gel de hatine veşartin. Hezkerên wî, dubeytiyên wî parastine. Xêncî van hin dubeytiyên wî li ser kevîran hatine nivîsandin. Di sala 1844’an de Mihemed Şahê Qacar ferman kiriye ku dubeytiyên Baba Tahir werin berhevkirin. Ev ferman girîngiya Baba Tahir û helbestên wî derdixe holê, her wiha ev ferman diyar dike ku helbestên wî ên berhevkerî di serdema Şahê Qacar de tunebûye. Bexş ‘Elî Qerebaxî di destpêka vê berhevkerinê de diyar dike ku dubeytiyên Baba Tahir ji gund û bajarên dûr û cuda hatine berhevkirin. Di encama berhevkerinê de 175 dubeytî

²⁵⁶ Xeznedar, *b.n.*, r. 193.

²⁵⁷ Şiwan, *b.n.*, r. 28.

²⁵⁸ Adak, *b.n.*, r. 112.

li ser 4 rûpelan hatine nivîsîn û 6 rûpel jî vala hatine hiştin ku heke paşê helbestên wî ên din werin ditin ew jî li wan werin zêdekirin.²⁵⁹

Bi lêkolînên Huseyn Wehîd Destgirdî ku ew serkarê kovara Farisî ya bi navê “Armağan”ê bû, hejmara dubeytiyên Baba Tahir ji 87’an derketiye 296’an. Ew hejmara xezelan jî ji yekî derxistiye çaran û di pirtûka xwe ya bi navê “Dîwanê Kamêlê Baba Tahêrê Uryan” de weşandiye (1306/1927).²⁶⁰ Çapa herî baş ku bi awayekî zanistî hatiye çapkirin ya Huseyn Wehîd Destgurdî ye. Reşîd Yasmî jî destpêka wî nivîsiye.²⁶¹

Xebatek din ji aliyê Mihemed kurê Îbrahîm ku nasnava wî Xetîbî Wezîrî ye hatiye kirin. Ew hewl daye çî belgeyên derbarê Baba Tahir hebe hemûyan berhev bike. Lê di xebata wî de ramana Pan Îranîzm eşkere xuya dike. Ew bi ramana nijadperestî li ser xebatê hûr bûye. Ji ber helwesta wî ya nijadperestî xebat ji rewîştî zanistiyê dur ketiye. Di xebata wî de Baba Tahir ji nasnameya xwe ya rast durketiye û di nav çarçoveya Farsîzmê de hatiye dorpêçkirin.²⁶²

Baba Tahir bi raman, jîyan û hunera xwe ve bala gelek lokolîneran kişandiye. Lêkolînerên cîhanê ên mîna; Clement Huart, Heron Allen, L. Leszcynski, K. Hadank, E.G. Browne, Edward-Brenton, Elizabeth Curtis, Minorsky û wd. li ser berhemên Baba Tahir xebat kirine, helbestên wî ên ku berhev kirine, birine welatên xwe çapkirine û di pirtûkxaneyên xwe ên neteweyî de cih kirine. Nusxeyên Dubeytiyên Baba Tahir li pirtûkxaneyên Ewropa, Rûsya, Îran û Tirkîyê hene.

Helbestên Baba Tahir wekî dîwan bi awayekî nivîsî heta sedsala 19’an nehatine berhevkirin. Lê ji sedsala 19’an şûnde nirxa helbestên wî ya hunerî ji

²⁵⁹ Xeznedar, *b.n.*, r. 194.

²⁶⁰ Tahsin Yazıcı, “Baba Tahir”, *DÎA*, weş. TDV., İstanbul, 2012, IV, r. 371.

²⁶¹ Xeznedar, *b.n.*, r. 194.

²⁶² *b.n.*, r. 194.

aliyê şêwe û naverokê ve hatiye dîtin û helbestên wî hatine berhevkerin û weşandin.²⁶³

Dubeytiyên Baba Tahir piranî li gel rûbaiyên ‘Omer Xeyyam li Hindîstan û Îranê hatine çapkirin. Lê dubeytiyên wî bi awayekî timî di sê pirtûkan de hatine çapkirin: Ya yekem “Nameyê Asyayî” (Parîs, 1885) ye ku ji aliyê rojhilatnasê Fransewî C. Huart ve hatiye amadekirin. Huart di vê xebatê de ji nusxeyên cuda sûd wergirtiye û dubeytî bi wergera wan a Fransewî ve çapkiriye. Ya duyem “The Lament Of Baba Tahir” e ku ji aliyê Edward Heron Allen ve hatiye amadekirin û dubeytî bi wergera wan a Îngîlîzî ve hatine çapkirin (London, 1902). Allen ji xebata Huart sûd wergirtiye. Ev xebat ji 62 çarînan pêk tîn. Sêyem jî “Dîwana Baba Tahir” ya çapa “Meceleyê Armağan”ê ye ku ji aliyê Wehîd Destgirdî ve hatiye çapkirin. Ev çap ji nav çapên dubeytiyan ya herî berfireh e ku di vê çapê de 366 dubeytî û çar xezel hene. Lê Destgirdî derbarê çavkanî û bidestxistina dubeytiyan agahî nedaye.²⁶⁴

Dubeytiyên Baba Tahir yên resen ên ji heyama wî negihîştîne destên me. Dubeytiyên ku wekî yên Baba Tahir hatine çapkirin bi giştî ne yên wî ne. Hin dubeytî bi awayê zarîkirina wî hatine sazîkirin, hinên din jî helbestên deverî ne ku ew jî yan bi zaravayê wî yan jî bi zaravayekî din hatine sazîkirin. Lê kifşkirina dubeytiyên wî yên resen gelek dijwar e.²⁶⁵ Em dikarin derbarê vê mijarê mînakek bidin:

Îlahî vakêyaşim vakêyaşim

Mû kê bî dest û payim vakêyaşim

Hemê ez der berûnend vatû ayim

Tû ger ez der bêrûnî vakêyaşim

²⁶³ Yıldırım, *b.n.*, r. 53.

²⁶⁴ Perwîz Natil Xanlerî, “Dubeytîhayê Baba Tahir”, Parvîz Azkaii, *Baba Tahir-Name*, *b.n.*, r. 58.

²⁶⁵ *b.n.*, r. 61.

Bê in bî aşnayî ber kêyan şim

Bê in bî xanmanî ber kêyan şim

Hemê ger mû bêrûnen vatê ayim

*Te ez der ger bêrûnî vakêyan şim*²⁶⁶

Di dubeytiya jor jî eşkere ye ku guherîn li ser dubeytiyê de hatiye. Li gorî baweriya me dubeytî li her herêmî şeweyeke nû girtine. Her wiha helbestên helbestvanên cuda jî di nav helbestên Baba Tahir de hene, yek ji wan Pûr Ferîdûn e ku di nav helbestên ku wekî yên Baba Tahir tên pejirandin de di helbestekî de gotineke wiha heye: *Rastiyê bibîze ji Pûr Ferîdûn*.²⁶⁷

2.2.1.1.1.1. Nusxeyên Destnivîsî yên Dubeytiyan

Nusxeya Muzeya Etnografya / Mewlana ya Bahauddîn Qumî

Ev nusxe di muzeya Etnografya / Mewlana de ye. Muze li Tirkîyê û li bajarê Qonyayê ye. Di nusxeyê de du bend û heşt dubeytiyên Baba Tahir cih digirin. Jimara ku muzeyê daye vê pirtûkê 2530 ye. Qumî vê destnivîsê di sala 1444'an de nivîsiye.

Di pirtûkan de hatiye diyarkirin ku jimara destnivîsê ya li muzeyê 2546 e. Lê ev agahiyeke şaş e, lewre me vê destnivîsê nihêrî û dubeytiyên Baba Tahir di tê de nedîtin. Paşê em lê geriyan û me helbestên Baba Tahir di muzeyê de destnivîsa bi jimara 2530 hatiye tomarkirin de dîtin. Her wiha me helbestan bi awayên wan ê resen di dawiya xebata xwe de wekî pêvek pêşkeş kirin.

Nusxeya Tezkîreya Şuarâ

Ev destnivîsa di beşa sedsala heştem de bi jimara 900'î di pirtûkxaneyê Meclîsa Îranê de cih digire û bi sernivîsa "Fehlewiya" 4 bend û 11 dubeytî di hundirîne. Sadiq Kiya van helbestan di kovara "Îran Kûde" de di hejmarê

²⁶⁶b.n., r. 61.

²⁶⁷b.n., r. 62.

10'an de weşandiyê; Edîb Tûsî jî wan şîrove kiriye û xebata wî jî di nav Neşriyata Fakulteya Edebiyatê ya Tewrêzê hatiye weşandin.²⁶⁸

Nusxeya Camî

Di vê nusxeya ku di pirtûkxaneya Melîk, bi mêjûya 930 û bi jimara 5125'an hatiye tomarkirin de 31 dubeytî cih digirin.²⁶⁹

Nusxeya Tezkîreya Hemîşe Behar

Ev tezkîreya ku di qemerî sedsala 11'an hatiye çapkirin de, di Fakulteya Edebiyat ya Têhranê de bi jimara B98 cih digire û tezkîre 13 terane dihundirîne.²⁷⁰

Nusxeya Zanîngeha Têhranê

Di vê nusxeya ku bi mêjûya qemerî 1125 û bi jimara 4351'an ve hatiye tomarkirin de 30 terane cih digirin.²⁷¹

Nusxeya Pirtûkxaneya Meclîsa Şura

Di vê nusxeya ku sedsala 12'an hatiye nivîsîn û bi jimara 2334'an ve hatiye tomarkirin de 17 dubeytî hene.²⁷²

Nusxeya Pirtûkxaneya Tewrêzê

Di vê nusxeya bi mêjûya 1193/1779 û bi jimara 2576'an de 19 terane cih digirin.²⁷³

Nusxeya Tezkîreya Ateşgedeyî Azer Bêgdelî

Di nusxeya bi mêjûya 1193/1779'an de 25 terane hene. Dr. Şehîdî van li Têhranê weşandiyê.²⁷⁴

²⁶⁸ Yıldırım, *b.n.*, r. 53.

²⁶⁹ *b.n.*, r. 54.

²⁷⁰ *b.n.*, r. 54.

²⁷¹ *b.n.*, r. 54.

²⁷² *b.n.*, r. 54.

²⁷³ *b.n.*, r. 54.

Nusxeya Pirtûkxaneya Berlînê

Di vê nusxeya bi sernavê “Eş’âr-i Baba Tahir / Rubaiyât-i Lorî” û bi jimara 1151/1219’an de 90 terane cih digirin.²⁷⁵

Destnivîsa Nusxeya Gulşenê

Ev nusxe ji aliyê Muhemed Qazî ve di sala 1783’an de hatiye nivîsandin û 459 rûpel e.²⁷⁶ Ev nusxe keşkuleke bi navê “Gulşen”e. Di vê keşkulê de digel sed mînyatûrên rengîn, helbestên curbicur û beşek ji dubeytiyên Baba Tahir cih digirin. Jimareya vê keşkûlê E-12 e.²⁷⁷

Nusxeya Edward Heron Allen

Di vê nusxeya bi mêjûya 1210/1800’î de 27 terane cih digirin.²⁷⁸

Nusxeya Zanîngeha Têhranê

Di vê nusxeya bi mêjûya 1254 û jimara 5124’an hatiye tomarkirin de 42 terane cih digirin.²⁷⁹

Nusxeya Zeynelabîdîn Hemedanî

Di vê nusxeya ku li Hankaya Şîraz Ahmediyê ye bi mêjûya qemerî 1258 û jimara 137’an hatiye tomarkirin de 27 terane cih digirin.²⁸⁰

Nusxeya Bexş ‘Elî Qerabaxî ya di Pirtûkxaneya Neteweyî ya Parîsê

Pêşgotina vê nusxeyê ji aliyê Bexş ‘Elî Qerabaxî ve di sala 1844’an de hatiye nivîsandin. Di nusxeyê de 175 dubeytî hene. Bi fermana Mihemed Şahê Qaçar ev dubeytî hatine komkirin. Di vê xebatê de pêşeknûs dibêje ku heke

²⁷⁴ *b.n.*, r. 54.

²⁷⁵ *b.n.*, r. 54.

²⁷⁶ *b.n.*, r. 54.

²⁷⁷ Adak, *b.n.*, r. 112-113.

²⁷⁸ Yıldırım, *b.n.*, r. 54.

²⁷⁹ *b.n.*, r. 54.

²⁸⁰ *b.n.*, r. 54.

hinek dubeytiyên nû bân dîtin ez dê wan jî lê zêde bikim û ji bo vê jî 6 rûpel vala hiştine.²⁸¹

Nusxeya Abdulhamîd Mewlewî ya Meşhedê

Di vê nusxeya bi mêjûya qemerî 1260 û bi jimara 574'an hatiye tomarkirin de 39 terane hene.²⁸²

Nusxeya Mescîda Sîpehsalar a Têhranê

Di vê nusxeya bi mêjûya qemerî 1276 û bi jimara 143'yan hatiye tomarkirin de 131 terane cih digirin.²⁸³

Nusxeya Muhemmed Taqî Ferehanî

Di vê nusxeya ku li Zanîngeha Têhranê ye bi mêjûya qemerî 1277 û bi jimara 4377'an hatiye tomarkirin de 121 terane hene.²⁸⁴

Nusxeya Pirtûkxaneya Meclîsa Têhranê

Di vê nusxeya bi mêjûya qemerî 1281 û bi jimara 2892'yan hatiye tomarkirin de 82 terane hene.²⁸⁵

Nusxeya Tezkîreya Rîyadu'l-Arifîn

Ev nusxe ya Riza Qulîxan Hîdayet e. Di vê nusxeya ku bi mêjûya qemerî 1303'yan hatiye tomarkirin de 24 terane cih digirin. Ev nusxe ji aliyê Mihr 'Elî Gîrganî ve di mêjûya 1344'an de li Têhranê hatiye weşandin.²⁸⁶

2.2.1.1.1.2. Çap û Wergerên Dubeytiyan

Dubeytiyên Baba Tahir ji aliyê kesên cuda ve gelek caran hatine çapkirin. Ev çapan jî bi gelek zimanan û li welatên cihê hatine amadekirin.

²⁸¹ Adak, *b.n.*, r. 112.

²⁸² Yıldırım, *b.n.*, r. 55.

²⁸³ *b.n.*, r. 55.

²⁸⁴ *b.n.*, r. 55.

²⁸⁵ *b.n.*, r. 55.

²⁸⁶ *b.n.*, r. 55.

Yekem car rojhilatnas li ser dubeytiyên Baba Tahir lêkolîn kirine. Di nav van de Clement Huart di sala 1885'an de 59 dubeytiyên Baba Tahir weşandiye. Leszczynsky, ji pirtûkxaneyên Berlînê 8 dubeytî û xezeleke Baba Tahir wergirtiye û weşandiye. Edward Heron Allen wergera wan a Îngilîzî kiriye (London 1902). Li Îranê Huseyn Wehîd Destgurdî di sala 1927'an de 296 dubeytî û 4 xezelên Baba Tahir weşandiye. Çapa vê xebatê ya ku Reşîd Yasmî jê re pêşgotinek nivîsandiye (1952) girîng e. Berhema Xetîbî Wezîrî ya ku di derbarê Baba Tahir de nivîsiye jî di vî warî de lêkolîna herî berfireh tê pejirandin. Lê Xetîbî di vê xebata xwe de ji çarçoveya Pan Îranîzmê derneketiye. Sabah Kara di berhema xwe ya bi navê “Baba Tahirê Uryan” (weşan: Nûbihar 1998) de wergera dubeytiyan bi Kurmancî kiriye. Ömer Kavalcı, di berhema xwe ya bi navê “Baba Tahirê Uryan ve Şiirleri” de cih daye wergera wan a Tirkî (Kültür weşan:1989). Talat Sait Halman jî, bi navê “Aşk Çırılçıplak” (weşan: Koç Kültür Sanat, İstanbul 2003) ve wergera dubeytiyan bi Tirkî kiriye.²⁸⁷

Çapên Dubeytiyan ên Sereke:

Rûbaiyata Baba Tahir

Ev xebata ku 24 rûbaî dihundirîne, ji aliyê Şehzade Sencer Mîrza ve tê amadekirin û di sala qemerî 1274'an de li gel hin rûbaiyên Omer Xeyyam ve wekî çapkevir tê çapkirin.²⁸⁸

Rûbaiyata Baba Tahir

Bi “Munecatnameya Ensarî” ve di sala qemerî 1301'an a ku li Bombayê hatiye çapkirin de 32 rûbaî cih digirin.²⁸⁹

Les Quatrains de Bâbâ Tahir Uryan en Pehlewî Musulman

Xebata “Rubaiyatê Baba Tahir ên bi Pehlewiya Îslamî” ya Clement Huart e. Ev zana, di sala 1885'an de, 87 rûbaiyên Baba Tahir û xezeleke wî, li

²⁸⁷ Adak, *b.n.*, r. 112-113.

²⁸⁸ Yıldırım, *b.n.*, r. 55.

²⁸⁹ *b.n.*, r. 55.

Parîsê bi tevî wergerên wan ên Fransewî ve di kovara Journal Asiaticque de weşandiyê.²⁹⁰

The Lament of Bâbâ Tâhir

Xwediyê vê xebatê Edward Heron-Allen e û di vê xebata xwe de 62 rûbaiyên Baba Tahir bi wergerên wan ên Îngilîzî ve di sala 1902'yan de li Londonê çapkiriye.²⁹¹

Çarganihâyê Baba Tahir

Ev çap ji aliyê Mîrza Mehdî Xan Kewkeb ve ji ber nusxeya Edward Heron-Allen hatiye amade kirin. Bi wergera Seyyîd 'Elî Bilgramî ya bi Îngilîzî ve di sala 1904'an de di Journal of the Royel Asiatic Society of Bangal de hatiye weşandin.²⁹²

Çarganihayê Nuwînê Baba Tahir

Ev xebat 28 rubaî û yek xezel dihundirîne. Clement Huart di “Îstanbul Fatih Kütüphanesi” de ji mecmûaya “Keşkûlu'l-Fukarâ” yê girtiye û di sala 1908'an de li Bombayê weşandiyê.²⁹³

Munacât û Makalat

Ev berhema ku 118 rubaî dihundirîne, bi rubaiyên Omer Xeyyam ve di mêjûya şemsî 1331'an de li Têhranê hatiye çapkirin.²⁹⁴

Hezar û Sed Terane (Baba Tahir Hemedanî ve Fayiz Deştistanî)

Ev xebat ji aliyê Ittihad-i Matbûat-i Faris ve li Şîrazê hatiye çapkirin.²⁹⁵

Sirûdhâyê Baba Tahirê Hemedanî

²⁹⁰*b.n.*, r. 55.

²⁹¹*b.n.*, r. 55.

²⁹²*b.n.*, r. 56.

²⁹³*b.n.*, r. 56.

²⁹⁴*b.n.*, r. 56.

²⁹⁵*b.n.*, r. 56.

Ev berhema ku 120 dubeytî û xezelek di hundirîne di sala 1351'an de li Têhranê hatiye çapkirin.²⁹⁶

Baba Tahirê Uryan

Ev xebat ji 114 dubeytî, 2 bend û ji xezelekê pêk tên û ji aliyê Dr. Seyyid Esedullah Mustefewî ve, bi hin wergeran ve, di sala 1352'yan de hatiye çapkirin.²⁹⁷

Dubeytihayê Baba Tahirê Hemedanî

Ev xebat ji 365 rûbaî û 3 xezelan pêk tê. Ji aliyê Cewad Maqşûd ve, di nav berhema “Şerh-i Ahvâl ve Asâr ve Dubeytiha-yi Baba Tahir-i Uryan” de hatiye weşandin û ev berhem di sala 1356'an de ji aliyê Tahran Encumen-i Asâr-i Millî ve hatiye derxistin.²⁹⁸

Wergerên Dubeytiyên Baba Tahir ên Sereke:

Wergera Fransî ya Clement Huart

Huartê zana, di sala 1885'an de 87 rûbaî û xezeleke Baba Tahir wergerê Fransewî kiriye.²⁹⁹

Wergera Îngilîzî ya Edward Heron Allen û Elîzabeth Curtîs Brenton

Edward Heron Allen û Elîzabeth Curtîs Brenton, derbarê Baba Tahir xebateke hevpar kirine. 1902'yan de 62 dubeytiyên Baba Tahir ji aliyê Edward wekî pexşan hatiye nivîsîn, ji aliyê Elîzabeth jî wekî helbestkî bi Îngilîzî ve hatine werger kirin.³⁰⁰

Nivîskar ji bo vê xebatê pêşnivîsek jî nivîsîne. Di vê pêşnivîsa xwe ya bi zimanê Îngilîzî de zehmetiya xebata li ser Baba Tahir anîne ziman û diyar kirine ku berhema ku raza wekî ewran ya ku keseyeta Baba Tahir pêçaya rake,

²⁹⁶*b.n.*, r. 56.

²⁹⁷*b.n.*, r. 56.

²⁹⁸*b.n.*, r. 56.

²⁹⁹*b.n.*, r. 56.

³⁰⁰*b.n.*, r. 57.

berhema Riza Qulîxan ya bi navê Mayma'ul Fuşaha (Têhran A.H.1295, vol.i., p. 326) ye. Ew di vê berhemê de, ji bo deh rûbaiyên Baba Tahir pêşnivîsek nivîsandiye û di vê pêşnivîsê de dibêje: Baba Tahirê Uryanê Hemedanî di serdema xwe de mutesewifekî bijarte bû. Ew ji şêxên yekem bû û di serdema Xanedana Deylem de jiyaye. Agahiya ku ew hevdemê siltanê Selçûqîyan e xelet e. Ew, di sala A.H. 410'an de jiyaye û beriya Fîrdewsî çûye li ser dilovaniya Xwedê. Ew nivîskarê rûbaiyên jîndar ên bi nivîsa kevn e. Ev nivîskaran, di pêşnivîsa xwe de qala pirtûka ku derbarê Baba Tahir agahî dihundirîne ya bi navê "Rahetu's-Sudûr we Ayetu's-Surûr der Tarîx-ê Al-ê Selçûq" kirine. Ev pirtûka navborî ji aliyê Rawendî ve di sala m. 1202-1203'yan de derbarê dîroka Selçûqîyan hatiye nivîsîn û pirtûk li Parîsê di koleksiyona Schefer de ye.³⁰¹

Di pêşgotina vê wergerê wiha tê gotin: Di hin helbestên Baba Tahir ên ku li ser kevir hatine çapkirin de ên ku li Bombayê (m. 1879-1890), Têhranê (m. 1857-8) û dîsa li Bombayê di Munacata Khuaja Abdullah Ensarî (m. 1882-3) de pêşgotin tune. Lê belê li Ateş Kedeha Lûtfî 'Elî Beg Azar [Bombay A.H. 1277 (m.1860-61) r. 247] de, 24 rûbaiyên Baba Tahir di beşa "Pers Iraq" de hene û Baba Tahir wiha tê ravekirin: Baba Tahirê Uryan mirovekî dîn (meczûp) e. Ew zanayê her tiştî û biperwerde ye. Derbarê wî berhemên nivîsî gelek kêr in. Kesayeta wî ji aliyê pisporan ve gelek baş tê zanîn. Ew aşîqekî ku şewqa rihê wî ji helbestên wî de diyar dibe ye. Gelek helbestên xwe bi zaravaya Rajî û bi her yekî wan bi wezna taybet ristiye. Ji wan hinek me bijart û li vir parast. Her çî qas çarînên Baba Tahir wekî rûbaiyat hatibe binavkirin jî kêşa dubeytiyên wî ya taybet kêşeke ne belavbûyî ye.³⁰²

Ew pêşgotinê wiha didomînin: Baba Tahir mirovekî qelender û derwêş e. Ew, di kolanên Hemedanê de wekî derwêşekî dîn û dîwane, bi navê uryan hatiye nasîn. Ew êzingan berhev kiriye û mirovekî cahil bûye. Rojek Baba Tahir çûye li ber deriyê medresê ku ilmê hîn bibe. Xwedekarên medresê

³⁰¹ Edward Heron Allen, Elizabeth Curtis Brenton, *The Lament Of Baba Tahir Being The Rubaiyat Of Baba Tahir Hemedani (Uryan)*, weş. Gilbert and Rivington Ltd., London, 1902, r. 7-13.

³⁰² *b.n.*, r. 13-16.

henekê xwe bi wî kirine û ji Baba Tahir re gotine ku ji bo ku tu ilmê hîn bibî, divê tu bikevî vê hewza qeşemgirtî û wî beraliyê hewza qeşemgirtî kirine. Ew ji xwendekarên medresê bawer kiriye û ketiye ava qeşemgirtî ku di wir de ilmê hîn bibe. Heta berbangê di wî hewzê de maye. Ew, berbangê ji hewzê derketiye û ronahiyeke bi nûr hatiye ketiye devê wî. Rojtira paşîn bi xwendekaran re ketiye niqasiya mijarên felsefik. Xwendekarên medreseyê derbarê guherîna wî jê agahî xwestine. Ew jî wekî bersiv gotiye: “Şeva min wekî Kurd derbas bû, lê berbangê wekî Ereb hişyar bûm.” Guhdarvanê wî bi vê gotina wî şaş mane. Behsa germahiya laşê Baba Tahir hatiye kirin û gotine ku tu kes nikaribûye li cem wî rûnin. Li gorî gotinan ew rojek bi germahiya laşê xwe berfa çiyayê Elwendê helandiye. Ew her tim dema xwe bi gerîna daristan û çiya derbas kiriye. Ew helbestvanekî filozof bûye.³⁰³

Di vê wergerê de derbarê zimanê wî agahî hatiye dayîn û nivîskar dibêjin ku di mêjûya 30 Tîrmeh 1891’an de şêxekî Kîrmanê derbarê zimanê Baba Tahir gotiye ku ev zaravayê ku hun hezdikin hîn bibin, zaravayê Pehlewî ya bi navê Lorî ye û ya ku Şîraz û Îsfahanê tê axaftin e. Xêncî van wan behsa berhevkirina dubeytiyên wî û alikarên xebata xwe kirine.³⁰⁴

Wergera Îngilîzî ya Seyîd ‘Elî Bîlgramî

Seyîd ‘Elî Bîlgramî 62 dubeytiyên Baba Tahir wergerê Îngilîzî kiriye û di sala 1904’an de weşandiye.³⁰⁵

Wergera Almanî ya G.L. Leszczynskî

Leszczynskî 80 dubeytiyên Baba Tahir wekî helbestkî wergerê Almanî kiriye û li bajarê Munîhê weşandiye.³⁰⁶

Wergera Ermenîkî ya R. Abrahamîan

³⁰³*b.n.*, r. 16-20.

³⁰⁴*b.n.*, r. 20-23.

³⁰⁵ Yıldırım, *b.n.*, r. 57.

³⁰⁶*b.n.*, r. 57.

Abrahamîan hin dubeytî û xezelên Baba Tahir wergerê Ermenîkî kirine û wergara wî di sala 1930'yan de li Têhranê hatiye çapkirin.³⁰⁷

Wergera Îngilîzî ya A. J. Arbery

Arbery, 60 dubeytiyên Baba Tahir wekî helbestkî wergerê Îngilîzî kiriye û di sala 1937'an de li Cambrîdgeyê weşandiye.³⁰⁸

Wergera Çekî ya Dr. Josef Ştybr

Dr. Josef ji nusxeya Arbery 60 dubeytiyên Baba Tahir wergerê Çekî kiriye û di sala 1938'an de li Brnoyê weşandiye.³⁰⁹

Wergera Rûsî ya Derzhavîn

Derzhavîn hin dubeytiyên Baba Tahir di bin serenava “Ji Helbestvanekî Fars-Tacîk Rûbaiyên Hilbijêr” de wergerê Rûsî kiriye û ev werger di sala 1965'an de hatiye weşandin.³¹⁰

Wergera Ermenîkî ya Aram Garone

Garone, 59 dubeytiyên Baba Tahir wekî helbestkî wergerê Ermenîkî kiriye û 1973'yan de li Têhran û Nasiriyê hatiye weşandin.³¹¹

Wergera Êrdûkî ya Huzûr Ahmed Selîm

Ev nivîskar 405 dubeytiyên ku wekî yên Baba Tahir hatine pejirandin wekî helbestkî wergerê Êrdûkî kiriye û vê wergerê 1973'yan li Haydarabadê weşandiye.³¹²

Wergera Îngilîzî ya Mehdî Noxwostî

³⁰⁷*b.n.*, r. 57.

³⁰⁸*b.n.*, r. 57.

³⁰⁹*b.n.*, r. 57.

³¹⁰*b.n.*, r. 58.

³¹¹*b.n.*, r. 58.

³¹²*b.n.*, r. 58.

Noxwostî beşek ji dubeytiyên Baba Tahir wergerê Îngilîzî kiriye û ev werger di sala 1976'an de li Boulderê hatiye çapkirin.³¹³

Wergera Îtalî ya Gabrîele Rebechî

Nivîskar nusxeya Wahîd Destgirdî ya ku ji 296 dubeytiyan pêk tê esas girtiye û dubeytiyan bi Îtalî ve werger kiriye.³¹⁴

Wergera Gurcîtî ya Lîa Asafîanî

Wergera Lîa di sala 1990'î de li Gurcîstanê hatiye çapkirin.³¹⁵

Wergera Kurmancî ya Sabah Kara

Kara, wergera xwe ji ber pirtûka Reşîd Yasmî ya bi navê “Dîwanî Şi’rî Baba Tahirî Uryanî Hemedanî” pêkaniye. Wergera Kara di sala 1998'an de li Stenbolê hatiye weşandin.³¹⁶

Wergerên Soranî yê Razi, Ahmed Dilzar û Karwan Osman ‘Elî

Wergera Razi di kovara “Rovar”ê de, di bin serenava “Çewarînekanî Baba Tahîrî Uryan” de hatiye weşandin. Wergera Dilzar, bi serenava “Beşek le Çewarînekanî Baba Tayerî Hemedanî”, li Erbilê hatiye weşandin. Wergera Karwan ya bi serenava “Çewarînekanî Baba Tahirî Hemedanî Be Soranî” di sala 2009'an de li Xaneqînê hatiye amadekirin.³¹⁷

Wergera Kurmancî ya Tahsîn Îbrahîm Dostkî

Nivîskar ji bo vê wergera xwe ji nusxeyên Abdusamed Tebrîzî û Reşîd Yasmî sûd wergirtiye.³¹⁸

Wergera Baqî Şefîî ya bi Hewramî

³¹³*b.n.*, r. 58.

³¹⁴*b.n.*, r. 58.

³¹⁵*b.n.*, r. 58.

³¹⁶*b.n.*, r. 58.

³¹⁷*b.n.*, r. 58-59.

³¹⁸*b.n.*, r. 59.

Şeffî, dubeytiyên Baba Tahir bi zaravayê Hewramî ve werger kiriye (Senendec h. 1384). Ev werger ji 296 dubeytiyan pêk tê. Şeffî ji bo vê wergerê nusxeya Destgirdî esas girtiye, lê hin dubeytî biguman dîtiye û jê derxistiye. Yanê dubeytiyên Baba Tahir ên biguman hatine dîtin, di wergera wî de tune.³¹⁹

Wergera Lorî, Hewramî, Kurmancî û Tirkî ya Qedrî Yildirim

Yildirim ji bo wergerê nusxeya Şeffî esas gitiye. Di wergera Yildirim de wergerên dubeytiyan ên Kurmancî û Tirkî Yildirim bixwe kiriye, lê yên din wî ji nusxeya Şeffî girtiye.³²⁰ Me jî di vê xebata xwe de dubeytiyan bi piranî ji wergera Yildirim girt. Lê me hin şaşî di wergerên ku wî kiriye de dît, em hêvî dikin ku di çapeke din de ew şaşî werin sererastkirin.

Xêncî wergerên dubeytiyan, dubeytiyên Baba Tahir wekî dîwan hatine weşandin. Di kovara “Armağan” ya bi Farisî derdikeve de xwediye Kovarê Huseyîn Wahîd Destgirdî di sala 1927’an de 296 dubeytî, 3 xezel û 3 rûbaiyên Baba Tahir bi navê “Dîwanî Baba Tahir” weşandiye. Bi vî awayî yekem car helbestên Baba Tahir wekî dîwan derketiye pêşberî xwendevanan. Di çapa duyan de 10 dubeytî lê hatine zêdekirin. Çapa sêyem ji aliyê Reşîd Yasmî ve di sala 1932’yan de hatiye amadekirin û di sala 1983’yan de bi navê “Dîwanî Şî’rî Baba Tahîrî Uryanî Hemedanî” ji nû ve hatiye çapkirin.³²¹

“Dîwanî Baba Tahir” ji aliyê Îbrahîm Dîngan ve hatiye amadekirin. Ev dîwan 98 dubeytî û xezelek di hundirîne. “Dîwanî Baba Tahîrê Hemedanî” ji aliyê Baqî Şeffî ve bi zaravaya Hewramî hatiye amadekirin (Senendec 1384).³²²

2.2.1.1.2. Naveroka Dubeytiyan

Di dubeytiyên Baba Tahir de mijarên evînî bibandor in. Di dubeytiyên wî de eşkere dibe ku wî evîneke rût û tazî jiyaye û evîndarî wî serdanpê şewitandiye. Dubeytiyên wî bi giştî lîrik / coşdar in. Di heman demê de mijarên

³¹⁹*b.n.*, r. 59.

³²⁰*b.n.*, r. 59.

³²¹*b.n.*, r. 59.

³²²*b.n.*, r. 59.

evîni di dubeytiyên wî de bi ramana wehdetê wicûdê (yekitîbûn) ve têkil in. Ew di helbestên xwe de ji bo vegotina raman û hestên xwe gelek sembolên xwezayî û yên tesewifî bi kar aniyê. Wekî mînak ew gulê wekî sembol di helbestên xwe de bi kar aniyê ku gula di helbestên wî de bêwefa, bêhêvî û temenê wê yek hefteyî ye. Ew bi rondikên çavên xwe gulê av dide lê gul dîsa ji destê wî derdikeve. Di dubeytiyên wî de wekî şeweyê jiyana wî qelenderbûn û derwêşbûna wî xuya dikin. “*Ew wekî qelenderiyê yekem tê hesabandin.*”³²³ Lêkolîner têkiliya wî bi sofizma Îslamî û bi baweriya Yarsanê ve danîne. Ramana yekitiya heyînan (wehdetê wicûd) dubeytiyên wî balkêştir kiriye.

Bi giştî di naveroka dubeytiyên wî de eşq, ramana wehdetê wicûdê, sofizma Îslamî, jiyana qelenderî û derwêşî hin taybetiyên baweriya Yarsanê wekî mijar cih digirin.

2.2.1.1.3. Di Dubeytiyên Wî de Kîte, Serwa û Kêş

Dubeytiyên Baba Tahir ji aliyê ruxsarî ve bi kêşa arûzê ji behra “hezecê musedesê mehzûf” ve hatine nivîsandin.³²⁴ Şiwan kêşa dubeytiyan wiha navandiyê: Dubeytî ji behra şeşê hezifkirî, li ser kêşa “mefaîlun mefaîlun feûlun” hatine nivîsandin.³²⁵ Serwaya (qafiyeya) dubeytiyan, wekî serwaya ruba’iyê ye. Rêzên yekem, duyem, û çarem hemserwa ne, ya sêyem ji wan cihê ye. Lê ji ber ku kêşa helbestên wî yên ku wekî dîwan hatine berhevkerin ji kêşa rûbaiyê cuda ye, helbestên wî wekî dubeytî, çarîn, çarpare hatine navandin.³²⁶

Dema ku em li ser dubeytiyên Baba Tahir radiwestin, dibînin ku dubeytiyên wî ji 11 kîteyan pêk tên. Pîvanên serwaya dubeytiyên wî bi piranî wekî aaxa ne. Kêma dubeytiyên wî, wekî aaaa hatine ristin. Lê helbestên ku di hin weşanên cuda de derketine, qalibên kêşên cihê hatine bikaranîn. Minorsky diyar dike ku li gorî agahiyên berê kêşa wan bi kêşa “hezecê mekfûfê mefkûr” ve têkil bûne. Kêşa dubeytiyên Baba Tahir di hin helbestên gelerî de jî tê

³²³ *b.n.*, r. 116.

³²⁴ Parvîz Natil Xanlerî, “Dubeytîhayê Baba Tahir”, Parvîz Azkaii, *Baba Tahir-Name, b.n.*, r. 65.

³²⁵ Şiwan, *b.n.*, r. 22.

³²⁶ Vladimir Minorsky, “Zîstname-î Baba Tahir”, Parvîz Azkaii, *Baba Tahir-Name, b.n.*, r. 118.

dîtin.³²⁷ Kêşa dubeytiyên Baba Tahir ên ku niha li dest in, ji kêşa helbastvanên ku bi zimanê Fehlewî nivîsandine cuda ne. Di heman demê de hin helbestên Baba Tahir ên ku ji aliyê Destgirdî ve hatine weşandinê de kêşa “faîlatûn mefaîlun feûlun” tê dîtin.³²⁸ Xeznedar derbarê helbestên Baba Tahir dibêje: Şemsê Qeysê Razî yekem kes e ku di pirtûka xwe ya bi navê “el-Mu‘cem fî Me‘ayîri Eş‘ari’l-‘Ecem” (المعجم فى معايير أشعار العجم) de bi giştî van cure helbestan (dubeytî, çarîne û terane) yê mîna helbestên Baba Tahir wekî “pehlewiyat” (پهلهویات) bi nav kiriye.³²⁹

Helbestên wî ji aliyê kêşeyê ve bi giştî wiha hatine rastin.

Mefaîlun / mefaîlun / feûlun

*U - - - / U - - - / U - -*³³⁰

2.2.1.2. Xezel

Xezel tê wateya peyvên xweşik û bi eşq, ên ku ji jinan re tèn gotin. Bi giştî ji 5-12 beytan pêk tèn, lê xezelên ji diwazdeh beytan zêdetir jî hene. Serwaya xezelê bi giştî wiha ye: a-a, x-a, x-a, x-a, x-a, x-a. Di wêjeya klasîk de helbestvan giringiyeke mezin dane xezelê.³³¹ Bi xebatên cihêreng çar xezelên Baba Tahir hatine tomarkirin.³³² Em ê li vir xezeleke wî wekî mînak bidin:

Ji ber ez nexweşê te ey dîlber im

Sertapa sotiyî heta cîger im

Cehennem parçek ji xweliya min e

Ez ew sotîdilê mîzac-agir im

Ne dixwîm, ne radikevim bê te wek

³²⁷ *b.n.*, r. 118.

³²⁸ Perwîz Natil Xanlerî, “Dubeytîhayê Baba Tahir”, Parvîz Azkaii, *Baba Tahir-Name*, *b.n.*, r. 63.

³²⁹ Xeznedar, *b.n.*, r. 188-190.

³³⁰ Perwîz Natil Xanlerî, “Dubeytîhayê Baba Tahir”, Parvîz Azkaii, *Baba Tahir-Name*, *b.n.*, r. 64.

³³¹ Pala, *b.n.*, r. 165.

³³² Yıldırım, *b.n.*, r. 46.

Bi her mûyekî xwe ez xencer dibim

Eger bê te b'cennet, horî û tûba

Dilşad bibim, bi rastî ez kafir im

Îftîxar nakim bi tacê şahî ku

Ez bi vî porê tevlihev faxir im

Elmas dighin li bin balîfê min, lê

Ez di nav sitiriyên de radizim

Wek mûmkê me, eger sed car ser jêkin

Ez hê ronîtir û hê jî gurtir im

Min ne j'axret, ne j'dinyê re tiştê kir

Ez wek dareke bê-sî û bê-ber im

Ruwê te tav e, lê ez jê mehrûm im

Ez pejmûrdeyekî wek nîlûfer im

Ne semender li nav agirê eşqê

Lê ez wek teyrekî bêbask û bê per im

Ez ew dara xurmeya evînê me

Hesret siya min û zehmet in berim

Kes bi ti şiklî qedrê min nizane

Ez li vî welatî j'kêm jî kêmtir im

Bi nalînkê disojînim du-alem

Ku ez bi sotîna dil distirînim

Li vê dêrê ez we b'xem û keder im

Mîna ku ez Muxê li nav agir im

Ji dewran mûyek jî behra min nîn e

Ku ez herro j'roja din xerabtir im

Li vê dinyê sêwî me, bê te goya

Ez wek tiplê bê-dê û bê-peder im

Ez wek mu'minkî me li kafiristan

Û wek li mu'ministanê kafir im

Li milkê evînê, rihê bênîşan

Li şehre dil, yekî sûretperwer im

Eger herroj te dused car bibînim

Bi can, ez muştaqê carek dîger im

Ez ustadê zimanê pehlewî me

Ji kitaba evînê re mester im

Ey Xweda eşqa Tahir bênîşan e

Ku j'eşqa seneman bêpa û ser im.³³³

2.2.1.3. Bend

Bend, ji her beşên helbestên ji serî heya dawiyê bi heman kêşeyê ve hatine ristîn û ji gelek rêzan pêk hatine re tê gotin.³³⁴ Bendên Baba Tahir di destnivîsa Qûmî, ya li muzeya Mewlana de hene. Me ji destnivîsa Qumî wêneya bendan wekî resana wan di dawiya teza xwe de pêşkeş kirin. Bendên Baba Tahir wihan ne:

³³³ Kara, *b.n.*, r. 155-157.

³³⁴ Pala, *b.n.*, r. 66.

Benda Yekem

Ger ej zer ewnihî eywanî ej gil

Be perçîneş kerî wanûşe û wil

Ger ew beşneş nihî an dar şimşad

Ger ew rûneş kerî awaci bilbil

Serencaman beşî be ya beherzî

Yayê te gûr wî mawayê te gil³³⁵

Ger tu bi zêr biseyinî eywana gil

Dewsa perçînê biçînî sosin û gul

Ger daçikînî devdorê darê şimşad

Ger li wir bidî xwendinê bilbil

Dawiyê de tu yê herî, li wir bihêlî

Cî û nivînê te gor, lihêfa te gil

Benda duyem

Zaricem dî widowê mûric edxwerd

Mûric anî dû desteş û Xwuda derd

Nagehan bamed an baz wi darî

Zariceş kuşt û mûran zaric edxwerd

Daliç Elwend kûhan kerd perwaz

³³⁵ Yıldırım, *b.n.*, r. 42-43.

Bazeş bekuşt û xwûneş pak waxwerd

Bemed neçîrwan derdên weayên

Bewekdeş tîr û dal ej kar bederd

Beşe neçîrwan destut wucad est

Ce înet wedkere ej kar bederd

Fena mî neşe îniwed ke men kerd

Be men hem an keren her wed ke men kerd³³⁶

Min dît kewa gozel qutê moriyê xwar

Morî ber bi Xwedê ve destên xwe vekir

Hingav bazekî nêçîrwan hate wir

Kewa gozel kuşt morî kewê xwar

Ji çiyayê Elwendê îcar dalek hat

Baz kuşt, xwîna wî vexwar û wî xwar

Piştî nêçîrvanekî bi xem û bêxeyset hat

Bi yek tîrê ve dal kuşt

Her bijî neçîrwan, Xwedê zedê li te nexel!

Lewre xerab bira cezayê xerabiyê bikişîne

Ez jî xerab im ev ji min re namîne

Min her çi xerabî kiribe dê bi min ve vegere

³³⁶b.n., r. 43.

2.2.2. el-Kelîmatu'l Qîşar

Ev berhema Baba Tahir berhemeke tesewifî ye. Di vê berhemê de bi gotinên wî ên puxtedar, aliyê wî yê tesewifî derdikeve pêş, her wiha ramanên sofitî û arifbûna wî xuya dike. Berhem ji aliyê mutasawifan ve peywendiyê xurt dîtiye.

Li ser gotinên wî ên kurt ên tesewifî (el-Kelîmatu'l Qîşar) ji aliyê hin kesan şîrove (şerh) hatine kirin. Şîroveyek ji aliyê 'Aynu'l-Quzzat-ê Hemedanî bi zimanê Erebi hatiye kirin. Şîroveyeke din bi navê "el-Fitûhat el-Rebaniye fî Îşarat el-Hemedaniye" ye ku nusxeyeke vê şîroveyê ji aliyê Edgar Blochet ve di pirtukxaneyê Parîsê ya neteweyî de hatiye cihkirin. Şîroveyek jî ku wisa diyar e li ser şîroveya navborî ji aliyê Canî Beg El 'Ezîzî di sala 890/1484'an de hatiye nivîsîn. Şîroveya ji şîroveyên dawiyê ji aliyê Hacı Mela Siltan Gunabedî ve bi navê "Îzah" hatiye nivîsîn (q. 1326 / m. 1906).³³⁷ Gunabedî li ser berhema Baba Tahir, di sala h. 1326'an de bi zimanên Farîsî û Erebi du şîrove nivîsîne.³³⁸ Ji ber şîroveyên ku li ser gotinên Baba Tahir hatine kirin de diyar dibe ku ew li cem sofîyên ku piştî sedsala nehem jiyane, xwedî nîrx û gotinên giring bûne.

'Ebdulhuseyn-ê Zerrînkûb di pirtûka xwe ya "Custucû der Tesewif-ê Îran" de diyar kiriye ku zimanê berhema navborî ya Baba Tahir ne Erebi ye. Baba Tahir vê berhemê bi Fehlewî nivîsandiyê, lê ji ber ku demên paşê tesewif bêtir bi zimanê Erebi hatiye nivîsîn û parvekirin, ev berhema Baba Tahir jî bi zimanê Erebi ve hatiye nivîsîn û şîrovekirin.³³⁹ Lê resenên gotinên tesewifî ên Baba Tahir, yan negihiştine roja me, yan jî henin lê nehatine dîtin.

el-Kelîmatu'l Qîşar 23 bab e ku ji remz û nasandinan pêk tê. Derbarê 21 rîsaleyên ku ji aliyê Baba Tahir ve hatiye nivîsîn gotegot hene, lê derbareyê van gotegotan belge di dest de tune ne.³⁴⁰ Ev 23 bab derbarê ilm, wecd,

³³⁷ Zerrînkûb, *b.n.*, r. 190.

³³⁸ Yıldırım, *b.n.*, r. 29.

³³⁹ Zerrînkûb, *b.n.*, r. 192-193.

³⁴⁰ *b.n.*, r. 190-191.

merîfet, îlham û feraset, aqil û nefis, dinya û ûqba, zikir û îxlasê de ne. Ew, van mijara bi 368 gotinên xweş û bi hikmet aniye ziman.³⁴¹

Em dikarin ji van gotinên wî ên tesewifî hinek mînak bidin:

*“Dawiya ilmê cehalet e, dawiya aqil şaşmayîn e, dawiya merîfetê teslîmiyet e.”*³⁴²

*“Kî bizane ber bi heq ve vegere, tu weswese zîrarê nade wî.”*³⁴³

*“Rastî pêşgotina heqê ye.”*³⁴⁴

*“Di rêya meçhûl de rêwîtî xetere ye.”*³⁴⁵

*“Nefsê bi nefsê ve jiyandin şaşî ye.”*³⁴⁶

*“Kesî ku ji bo nefsa xwe ye, ew kes bendeyê nefsa xwe ye. Kesî ku nefsa wî ji bo wî ye, nefsa wî bendeyê wî ye.”*³⁴⁷

*“Destpêka hezkirinê ceribandîn e, navenda wê hîskirina hewcedariya wê ye, dawiya wî biryardayîn e.”*³⁴⁸

*“Xerîbî windabûn e.”*³⁴⁹

*“Xerîbî beramberî jehrê ye.”*³⁵⁰

*“Kî dest ji tevdîrê berde, ji teqdîrê razî dibe.”*³⁵¹

“et-Tasavvufu la yesauhu şeyun ve huve yesa ’ul-eşyae kulleha.

³⁴¹ Vladimir Minorsky, “Zîstname-î Baba Tahir”, Parvîz Azkaii, *Baba Tahir- Name, b.n.*, r. 121.

³⁴² Hacı Mele Siltan Mihemed Siltan ‘Elişah Gunabadî, *Şerhê Farisî ber Kelîmatu’l Qişar Baba Tahir Uryan*, ç. 2, weş. Ketabxaneyî Salih Hesiniyê Emîr Selîmanî, Azer 63, r. 29.

³⁴³*b.n.*, r. 29.

³⁴⁴*b.n.*, r. 41.

³⁴⁵*b.n.*, r. 60.

³⁴⁶*b.n.*, r. 61.

³⁴⁷*b.n.*, r. 70.

³⁴⁸*b.n.*, r. 74.

³⁴⁹*b.n.*, r. 92.

³⁵⁰*b.n.*, r. 92.

³⁵¹*b.n.*, r. 94.

Tiştêk tesewifê nikare bihundirîne lê tesewif her tiştî dihundirîne.”³⁵²

“*es-Sûfiyyu yekûnu lehu kullu şeyin, vela yekûnu huve li şeyin.*

Her tişt dibe ya sofî lê sofî nabe ya tu tiştî.”³⁵³

“*el-Vecdu fakdanu 'l-mevcûdatî ve vicûdu 'l-mefkûdatî.*

Halê wecdê ew e ku yên hene winda dibin û yên windabûne peyda dibin.”³⁵⁴

“*Întîhau 'l-aqlî île 't-tahayyur ve întîhau 't-tahayyur île 's-sekrî.*

Dawiya hiş heyirîn, dawiya heyirîne serxweşbûn e.”³⁵⁵

“*ez-Zikru 'l-hafî ellezî yahfa ani 'l-kalb*

Zikra nepen, zikra ji dil jî hatiye veşartinê ye.”³⁵⁶

“*el-Gafletu anî 'l-lahî kufrun ve an heqîqetu zatîlahî tevhîdun.*

Bêhaybûna ji Xwedê kufr e, ji zatê Xwedê bêhaybûn tewhîd e.”³⁵⁷

“*en-Nefsu sicnu 'r-rûhî ve 'd-dunya sicnu 'n-nefsî.*

Nefs zindana rih, dinya jî zindana nefse ye.”³⁵⁸

Hin gotinên wî ên derbarê ilmê wiha ne:

“*Ilm rêberê merîfetê ye; rêya merîfetê nişan dike. Gava ku merîfet pêkhat ilm diçe, nişaneyên wî ên merîfetê dimînin.*”³⁵⁹

Baba Tahir di vir de balê dikişîne li ser cudatiya “ilm” û “merîfetê”. Bi ilmê zanîn, bi merîfetê naskirin pêk tên. Bi vê gotina xwe cudatiya zanîn û naskirina Xwedê tîne ziman. Bo mînak; gava ku me pirtûkek dît, em ê

³⁵²Yıldırım, *b.n.*, r. 29

³⁵³*b.n.*, r. 29.

³⁵⁴*b.n.*, r. 30.

³⁵⁵*b.n.*, r. 30.

³⁵⁶*b.n.*, r. 30.

³⁵⁷*b.n.*, r. 30.

³⁵⁸*b.n.*, r. 30.

³⁵⁹*b.n.*, r. 30.

nîvîskarê pirtûkê bizanin, lê em nivîskar nas nakin. Gava ku rojek me nivîskarê pirtûkê nas kir wê gavê pirtûk, wekî rêberê nîvîskarê xwe, me bi nivîskar ve digihîne û li paş ve dimîne. Ji wê demê pê ve nivîskar derdikeve pêş. Ji pirtûkê me fêhm kir ku nivîskarekî pirtûkê heye ku ev “zanîn” e, naskirina nivîskar jî “merîfet” e.³⁶⁰

“Hînbûna ilmê tengazeriya murîd nîşan dike.”³⁶¹

Armanca murîd a sereke divê naskirina Xwedê be. Ji ber vê yekê heke murîd tenê di payeya zanînê bimîne, yanê ji ilmê derbasê merîfetê nebe, ev tengazeriya murîd nîşan dike. Ew di vê gotina xwe de diyar dike ku zanîn divê, lê tena serê xwe têrê nake û di payeya zanînê de mayîn ji bo murîd dibe kêmasî. Murîd divê bizane û peyre binase, lê heke ew di payeya zanînê de bimîne tengazer e.³⁶²

“Ilm rêber e; hikmet wergêr e. Wê gavê ilm vexwendineke giştî, hikmet jî vexwandineke taybetî ye.”³⁶³

Baba Tahir di vir de bal dikişîne li ser cihêtiya “ilm” û “hikmetê”. Li gorî wî ilm bi giştî û rûxarî ye. Yanê kêm zêde her kes xwediye ilmekî ye. Di vî ilmê de ihtîmala şaşbûnê, tevlihevkirina rast û çewtiyê her tim heye. Lê belê hikmet ji bo ku mahiyeta têkberan, yanê tenê rastiya wan di hundurîne, zanîneke taybet e û ji ber ku pareke şaşitiyê nahundurîne, her kes nikare bigihîjin vê zanînê. Hikmet di navbera ew kesên ku gihîştine vê astê û Xwedê de dibe wergêrek; dibe amûrek ku peyamên Îlahî bigihîje wan û ji aliyê wan ve werin fêmkirin.³⁶⁴

“Ilm rêber e; hikmet sedem e.”³⁶⁵

³⁶⁰b.n., r. 30.

³⁶¹b.n., r. 31.

³⁶²b.n., r. 31.

³⁶³b.n., r. 31.

³⁶⁴b.n., r. 31.

³⁶⁵b.n., r. 31.

Ilm, ji bo ku em bigihîjin Xwedê tenê rêbertî dike û rê nîşan dike, lê belê nagihîjîne qonaxa dawî. Amûr û sedema esas a ku me dibe Xwedê û Xwedê bi me dide nasîn hikmet e. Murîd, bi alîkariya vê amûrê ji merhaleyan derbas dibe û digihîje aramanca esas a naskirina Xwedê.³⁶⁶

“Ilm wekî rêberekî rêya ku diçe Xwedê nîşan dike, lê wecd (coşa eşqê) bi tenê Xwedê nîşan dike. Her wiha rêber, ber bi rêya Xwedê ve mirov beralî dike û dişîne; wecd jî mirov rasterast radigihîne Xwedê.”³⁶⁷

Baba Tahir di vir de bal dikişîne li ser cihêtiya “ilm” û “wecd”ê. Li gorî wî ilm ew e, rêya ku diçe Xwedê nîşanî mirov dike, lê tiştê ku mirov cezbê Xwedê dike “wecd” e. Wecd, ji ber naskirina Xwedê pêk tê û eşqa bi şid e. Yanê ilm mirov nêzî Xwedê dike, wecd jî bi Xwedê ve digihîne.³⁶⁸

“Guhnedêriya ilmê cehalet e; di payeya ilmê de mayîn lewazî ye; bi xêra ilmê bi destxistina merîfetê tewhîd e.”³⁶⁹

Têkiliya şid a navbera ilm û merîfetê, têkiliya rih û bedenê ye. Çawa bedena bêrih û rihê bêbeden nayê ponijandin; Ilma bêmerîfet û merîfeta bêilm jî ne pêkan in. Her çi qas rih ji bedenê, merîfet jî ji ilmê serdestir bin jî, hebûna rihê bi xêra bedenê tê zanîn û bi merîfetê ve gihîştin jî bi xêra ilmê pêk tê. Lê belê kesek di girtîgeha bedenê de bimîne û bi kemilîna rihê ve negihîje lewaziyek e, ew kes di çarçoveya ilmê bimîne û xwe negihîne merîfetê jî lewazî ye. Lê hekeew kes bi xêra ilmê bigihîje merîfetê, dê tewhîd derkeve holê. Yanê mirov bi amûra ilmê merîfetê bidest dixê û xwe digihîne “tewhîd”a ku tê wateya yekitiya Xwedê. Wekî encam ilm dema ku mirov dibe merîfetê, merîfet jî wî dibe tewhîdê.³⁷⁰

“Ilm” girtîgeha derveyî ye; “muşahede” girtîgeha hundirîn e.

³⁶⁶b.n., r. 31.

³⁶⁷b.n., r. 31.

³⁶⁸b.n., r. 31.

³⁶⁹b.n., r. 32.

³⁷⁰b.n., r. 32.

Yanê ilm endamên meriv ên xuya ne, dîl digire û bitixûb dike. Wekî mînak; zanîna ku derew xerab e, ji bo ku derew neyê gotin, ziman bisînor dike; zanîna guhdarîkirina tiştên xerab ne baş in, ji bo ku tiştên xerab neyên guhdarîkirin guh bisînor dike û dîl digire. Lê xwe bi bedewbûna Îlahî ve girêdan û ji xêncî wê bedewiyê hîç tiştêkî nedîtin “muşahede”ye, ku ew “basîret”ê ya ku tê wateya çavê dil, dixwe dewrê; basîret di çerçoveya bedewbûna Xwedê de, yanê bi muşahedekirina cemalê ve bisînor dimîne û ber bi tu kesî ve beralî nabe, bi vî awayî di girtîgeha bedewbûna Îlahî de dimîne; her wiha bedewbûna Îlahî wî dîl digire.³⁷¹

“Xwedê tevî endamên laş avêtiye girtîgeha ilmê. Divê ji bêyî ilmê hîç endamek ji vê girtîgehê dernekeve. Her kî bêyî ilmê bike ku endamên laş ji wê girtîgehê derxîne, dê ji tixûbê ilmê derkeve, gunehkar be û ji hedê xwe derkeve.”³⁷²

Yanê Xwedê zanîna kîjan endamên laş dê li kê derê û kîjan demê were bikaranîn daye me. Bikaranîna endamên laş ji lêrasthatiniyê re nehatiye hiştin. Her wiha endamên laş bi ilmê bisînor kiriye û wan avêtiye girtîgeha ilmê. Her kî ku ji derveyî rêberiya ilmê, endamên laş bi kar bîne, dê ji girtîgeha ilmê fîrar bike, guneh bike û dê ji sînoren ku ji bo wî hatiye kifşkirin derkeve. Bo mînak; Ilma ku ji bo destan hatiye diyarkirin, destan bi alîkarîdayîne û xêrkirinê ve sînor kiriye. Kî ku destên xwe bo zilmkirinê dirêj bike, dê wê gavê ji sînoren ilmê derkeve û bikeve gunehan.³⁷³

“Ilm, bendê benîtiyê ye û girtîgeha heq e. Her kê ku bi serbestiya bê ilmê dest bi benîtiyê / evdbûnê bike, dê ji benîtiyê derkeve û azadbûneke mutleq bi kar bîne.”³⁷⁴

Wekî benî / evd, îbadetek dê çawa were kirin, ji aliyê Xwedê ve bi ilmekî ku ji bo wê îbadetê hatiye kifşkirin ve hatiye tomarkirin. Her kê ku ji vê ilma ku

³⁷¹b.n., r. 32.

³⁷²b.n., r. 32.

³⁷³b.n., r. 32-33.

³⁷⁴b.n., r. 33.

*ji aliyê Xwedê ve hatiye kifşkirin derkeve, serî li azadbûneke bikêf û bêsînor dixê, ku ev jî dê bi xwe re beredayîtiyeke dûrê rêkûpêkbûna benîtiyê bîne. Yanê bi awayekî her kes li gorî hişê xwe dê îbadetê bike.*³⁷⁵

“Ilm’ diaxifîne; ‘wecd’ aş dike.”³⁷⁶

*Kesê ku bi rêya ilmê Xwedê binase, zimanê wî dirêj dibe û gelek diaxife. Ji ber ku hêj bedewbûna Xwedêyî nenêriye, wê bedewiyê nedîtiye, temaşa nekiriye û her tim behsa çawaniya wê dike. Lê bi encama dîtina dîdariya Xwedê “wecd”a ku eşqa bengînî ye, hemberî vê dîdariyê mirov diheyirîne, aş dike û bêdeng dihêle. Ev hinek jî dişibe vê meselê: Mirovekî ku derbarê siltanekî mezin û bi heybet tiştan bibîze, heta ku zimanê wî bizvire dê gelek behsa wî bike. Lê gava ku siltan bibîne dê biheyirê, zimanê wî bikişê, hêza axaftinê wînda bike û ker (bêdeng) bibe.*³⁷⁷

“Ilm’ rê vedike ‘wecd’cûda dike; ‘heqîqet’ dişewitîne.”³⁷⁸

*Baba Tahir di vir de, bal dikişîne li ser rêza serdestiya ilm, wecd û heqîqetê. Bi nêrîna wî, wecd ji ilmê serdestir, lê ji heqîqetê niviztir e. Lewre ilm tenê rêya ku dibe Xwedê nîşan dike û astengên li ser wê rêyê dinasîne û pêşiya murîd vedike. Wecd jî têkiliya wî ya ku ji xêncî Xwedê bi yên din re hene dibire, hebûna wî bi timî li ser Xwedê ve hûr dike, lê hebûna mirov dîsa jî xwe diparêze, fena pêknayê. Heqîqet jî ji ber ku meqamê fenefilahê ye, yanê ji ber ku meqamê ku benî hebûna xwe di hebûna Xwedê de ret dike ye, ev meqam ji aliyê manewî ve benî dişewitîne û wî tune dike.*³⁷⁹

“Ilm’ diceribîne; ‘wecd’ dirûxîne; ‘heqîqet’ pêdixe.”³⁸⁰

Ilm benî ji ezmûnên cerebe derbas dike; rêya paqijkirina hundir û derve nîşan dike. Ev meqam di ew kesê ku digihîje meqamê wecdê de aliyê laş ve

³⁷⁵b.n., r. 33.

³⁷⁶b.n., r. 33.

³⁷⁷b.n., r. 33.

³⁷⁸b.n., r. 34.

³⁷⁹b.n., r. 34.

³⁸⁰b.n., r. 34.

*rûxandinek pêk tîne, lê bi timî wî tune nake. Meqamê ku hebûna wî di hebûna Xwedê de ret dike heqîqet e. Kesê ku digihîje meqamê heqîqetê li ber hebûna Xwedê hebûna xwe ji bîr dike.*³⁸¹

“Him şewateke ilmê heye, him jî ya wecd û heqîqetê hene. Kêsê ku bi ilmê şewitiye sozê benîbûnê aniye dewsê; kesê ku bi wecdê şewitiye, paqij dibe, bi şewitandina heqîqetê jî bilind dibe.”³⁸²

*Hevpariya wecd, ilm û heqîqetê ew e ku nefsa mirovan bi ronahiya rastiye ve vêdixin. Lê pileyên şewitandina wan cuda ne; ji ber ku pileyên van her sê kirûyan cuda ne. Li gorî ilmên zahirî, kesên ku îbadetên xwe dikin, sozê benîbûnê anîne cih. Lewre Xwedê di Qur’anê de dibêje “min mirova û cina ji bo ku tenê ji min re îbadetê bikin afirand.” Pişt re di alema rihan de ji mirovan pirsra “ ez ne rebê we me?” pirsîye; rihan jî bersiv dane gotine: “erê tu rebê me yî” ku ev jî bersiveke benîtî û îbadetê dihundirîne. Yanê mirov ji bo benîtiyê bikin ji Xwedê re soz dane. Mirov bi dayîna vî sozî newsa xwe dişewitîne û tune dike. Lê wecda ku li hemberê bedewbûna Xwedêyî ji xwe çûyîn e, dê nefsa wî bêtir bişewitîne, tune bike û pêre paqij bike. Ew ê nefsa xwe ji bîr bike, dê xwe di hebûna Xwedê de tune bike. Pişt re rih dimîne ku di vê rewşê de rih berzbûnê bidest dike û ber bi meqamên jor ve bilind dibe.*³⁸³

“Ilm’ agirê Xwedê, ‘wecd’ nûra Xwedê ne. Kesek ku li gorî ilmê tevnegere agir dê wî bişewitîne; li gorî wecdê tevnegere dê nûrê wî bixe her halî.”³⁸⁴

Taybetiya Şeytan ya ontolojîk ew e ku ew ji agir hatiye afirandin. Lewre agir ji aliyekî ve taybetiya Şeytanî ye. Ji ber vê yekê kesê ku dernekeve pîleya wecdê, ihtîmal e ku şeytan bikeve daîra ilmê û bendeyê bixapîne, her wiha dibe ku ew di agir de bişewite. Lê şeytan ji agir ferîşte jî ji nûr hatine afirandin. Bi vî awayî kesê ku digihîje meqamê wecdê taybetiya nûranî bi dest dixê, mîna

³⁸¹b.n., r. 34.

³⁸²b.n., r. 34.

³⁸³b.n., r. 34.

³⁸⁴b.n., r. 35.

*ferîşte dibe. Lê belê ji bo bigihîje heqîqetê wecdê wekî pir bikarneyîne û tevgerên li dijî rêzikên ji bo derbasbûna li ser pirê nîşan bike, ev nûra dê wî ji vî halî derxe bixe helekî din û di wî de her cure guherîn peyda bike.*³⁸⁵

“Ilm’ tirsîn, ‘wecd’şewitandin e.”³⁸⁶

*Alim têdigihîje, ku Xwedê çima mirovan afirandiye, dizane ku armanca afirandinê, razîkirina Xwedê ye. Alim li xwe vedigere ka li gorî vê armancê tevgeriyaye yan na. Ew xwe dipîve, lê ji dahatûya xwe jî ditirse. Ji ber vê yekê ye ku Xwedê di Qur’anê de dibêje; “Di nav evdê min de yên bi rasteqînî ji Xwedê ditirsin alim in.” Lê yê ku digihîje dereceya wecdê ji xwe hebûna xwe ji bîr dike bi eşqa temeşakirina bedewbûna Xwedê ji xwe diçe û ev hal newsa wî dişewitîne û ji holê radike; di wî de hestên tirsê nahêle.*³⁸⁷

“Ilm’ murîd digihîjîne armanca wî; ‘wecd’ wî têkelê armancê dike; ‘heqîqet’ nêzîk dike; ‘merîfet’ bi wî re dibe heval.”³⁸⁸

*Yanê ilm murîd heta deriyê Îlahî dibe; “wecd” wî ji derî derbasî hundir dike, heqîqet” digihîjîne Xwedê; “marîfet” wî bi Heq re dike heval. Lewre meqamên ilm, wecd, heqîqet û merîfetê li gorî vê rêzê xwediyê serdestiyê bin jî hevdu temam dikin. Lewre bêilm gihîştina deriyê Heq nepêkan e; bêwecd ji derî nayê derbasbûn; bêheqîqet bi Xwedê ve nêzîkbûn nepêkan e; bêmerîfet hevaliya bi Xwedê nepêkan e.*³⁸⁹

“Ilm cehaletê ji holê radike; ‘heqîqet’ lezetên dinê tune dike; ‘heq’ jî rêça tiştê jê dibe.”³⁹⁰

Ilm û cehelat du wesfên dijî hev in. Gava ku ilm derkeve holê cehalet ji holê radibe. Yê ku bi xêra ilmê heqîqetê dibîne, xêncî çêjên Xwedêyî ji tu tiştî

³⁸⁵b.n., r. 35.

³⁸⁶b.n., r. 35.

³⁸⁷b.n., r. 35.

³⁸⁸b.n., r. 35.

³⁸⁹b.n., r. 35-36.

³⁹⁰b.n., r. 36.

*çêj hîlnade. Ji ber ku heq di hebûna Îlahî de xwe retkirin e, di kesê ku digihîje vî meqamê de xêncî rêça Xwedê tu rêç namîne.*³⁹¹

“İlm’ ferman e; ‘heqîqet’ hakim e.”³⁹²

*İlm ji bo fêmkirina emr û qedexeyên Xwedê fermaneke Îlahî ye. Bi fermana ilmê zanînên emr û qedexeyan bi dest dikeve. Lê heqîqet bi her alî ve “benî”yê hildide li bin kontrola xwe û bi her alî ve hukmê wî dike. Bi vî awayî ji bo ku bende bigihîje heqîqetê, ilm ji bo benî fermaneke. Lê ev ferman ne ji bo ilmê ye, ji bo xwe gihandina heqîqetê ye.*³⁹³

“İlm bi cahiltiyê ve were bikaranîn dibe sedemê quretîyê; bi hiş ve were bikaranîn heqîqetê derdixe holê; bi merîfetê ve were bikaranîn wicûdê peyda dike.”³⁹⁴

*Ji bo ku ilm ji bo kesan bikêr were, mercê bingeh îxlas e. Encama ilmeke bêîxlas a hişdar, quretî ye. Di encama ilma ku bi îxlasa hişdar were bikaranîn de heqîqet derdikeve holê. Li gorî merîfetê di emelan de ji nefsê re hiç parek dernakeve û çavkaniyên her cure ilm û emelên salih Xwedê ye. Merîfet kesan dibe “wicûdê” yanê dibe hebûna Îlahî.*³⁹⁵

“Ên ku ilmê bi ilmê ve bikarînin emelên wan bi îxlas in; Ên ku ilmê bi merîfetê ve bikarînin di çavên wan de emel tu car naxuyê.”³⁹⁶

*Emela ku bi ilma hişdar û ji quretîyê dûr tê bikaranîn dilsoz û bîîxlas e. Ji ber ku di emelên ew kesê ku gihîştîye meqamê merîfetê de para nefis û quretîyê tune, di çavên wî kesî de rêça amelê ku kiriye hiç naxuyê. Yanê her cure emel ji destdirêjiya nefisê dur dibe û ihtîmala têkilbûna quretîyê ji holê radibe.*³⁹⁷

³⁹¹b.n., r. 36.

³⁹²b.n., r. 36.

³⁹³b.n., r. 36.

³⁹⁴b.n., r. 36.

³⁹⁵b.n., r. 36-37.

³⁹⁶b.n., r. 37.

³⁹⁷b.n., r. 37.

“İlm min cezû kir bir peravê zeryayê. Wecd min kişand di nav zeryayê radestê xeniqandinê kir. Min di nava zeryayê de ji ilmê alîkarî xwest lê nikarîbû min xelas bike. Min xwe bi wecdê ve berda ew jî min xêncî birina ber bi nêzî xeniqandinê tiştê nekîr. Gava min xelasbûnê xwest, nezaniî min xelas kir.”³⁹⁸

İlm encax meriv heta peravê avê bibe. Wecd wî ji peravê avê hildide heta naverasta avê dibe û li wir bi xeniqandinê re rûbirû dihêle. Di derdorekî wiha de ji ilmên zahirî alîkarî were xwestin jî, ilm ji bo alîkariyê nayê. Lewre tixûbê ku ilm bikaribe bigihîje perav e, ne naverasta zeryayê ye. Peywira wecdê, wî heta naverasta zeryayê bibe ye, her wiha rîska xeniqandinê zêde dike. Rizgarbûn tenê ev e ku di helwestekî wiha de mirov hebûna xwe ji bîr bike di hebûna Îlahî de wînda bibe, bi vî awayî hay ji hebûna xwe nebe. Tiştê ku wî xelas bike nezaniyê hebûna xwe ye, ji bîr kirina hebûna xwe ye. Wê gavê hebûna Îlahî dê wî bi tecelîya xwe ji wir biqetîne û xelas bike.³⁹⁹

“İlm tûra Heq e.”⁴⁰⁰

İlm, tûreke manewî ye ku benîtiyê bi Xwedê ve sînor dike. Beniyê ku ketiye di nav vê tûrê, bi tevî xwebûna xwe, xwe tenê bi bendetiya Xwedê bi sînor dike, dernakeve derveyî vî sînorê û li gorî daxwaza nefîsê aliyê xwe naguherîne.⁴⁰¹

“İlm nêçîrvan, nîşan zincîr e.”⁴⁰²

Çawa ku di gotina beriya vî gotinê de jî hatiye gotin, ilm tûreke manewî ye, ku beniyên di nav sînorê xwe de digire. Nîşan jî ji bo ku benî di nav vê tûrê zexm bimîne û firar neke, peywira zincîrê dibîne.⁴⁰³

³⁹⁸b.n., r. 37.

³⁹⁹b.n., r. 37.

⁴⁰⁰b.n., r. 38.

⁴⁰¹b.n., r. 38.

⁴⁰²b.n., r. 38.

⁴⁰³b.n., r. 38.

“Temamê ilmê xêr, tamamê heqîqetê zikir, tamamê nîşanan bedgumanî, tamamê çandan kevneşopî ne.”⁴⁰⁴

İlmên mirovan sê cure ne. Ya yekem re ilma irafanî tê gotin ku ev ilm mirovan dibe naskirina Xwedê, yanê dibe merîfetê. Ya duyan ilma burhanî ye. Wateya “burhan”ê delîl e. Ev ilm bi nîşaneyên zahirî derdikeve rê, gihîştina Xwedê bidest dixê. Ya sêyan jî îmanî ye, yanê bi baweriyê ve têkildar e. Ev ilm jî bi rêya Qûr’an û sinetan kirûyên ku bi me hatine ragihandin in. İlmên bi vî re têkildar bixêr in.⁴⁰⁵

Pîleya zikirê ya herî jor çavnêrî ye û çavnêrî bi vî awayî zikir e. Şanîder jî ber ku pîrjimarî diyar dikin, beniyên ku bi şanîderan ve aliqî dimînin, negihîştine tewhîdê. Lewma di nav gumreşîyan ve dimînin û bi gelek tiştan ve mijûl dibin. Çanda ku merîfetê derdixîne holê, jî ber ku jî adet û hînbûniyên mayînde pêk hatine, nahêlin mirov jî rê derkevin û di rêyeke xilexwar de biçin, jî bo mirov dibin alîkar ku mirov bi xêzeke biryardar jî meqaman derbasbibin.⁴⁰⁶

“İlm cerebe ye; heqîqet jî hîlbijartin e; mucahede xizanî ye.”⁴⁰⁷

Yanê jî bo gihîştina heqîqetê, ilm pêvajoyeke cerebe ye. Heqîqet piştî derbasbûyîna jî şik û şaşîbûnê gihîştina rastiya heq e. Ji bo gihîştina heqîqetê hewldana ku herî zêde ya jî aliyê benî hetîye serf (xerc) kirin, yanê çavkaniya mucahedeyê jî hewcadariya heqîqetê ye.⁴⁰⁸

2.3. ZİMANÊ BERHEMÊN WÎ

Berhemên Baba Tahir gelek sal li pişt koçdawiya wî hatine berhev kirin. Di vê navberê de hin guherîn li ser zimanê berhemên wî pêk hatine. Ev helwest jî li ser zimanê berhemên Baba Tahir niqaşî û gengeşe anîne der.

⁴⁰⁴b.n., r. 38.

⁴⁰⁵b.n., r. 38.

⁴⁰⁶b.n., r. 38.

⁴⁰⁷b.n., r. 38.

⁴⁰⁸b.n., r. 38-39.

Zerrînkûb di pirtûka xwe ya bi navê “Custucû der Tesewif-ê Îran” de diyar dîke ku berhemên Baba Tahir el-Kelîmatu’l Qîşar û helbestên wî bi Fehlewî hatine nivîsandin, lê berhemên wî bi zimanê xwe yê resen nemane. Resenên berhemên wî di dest de tune. Berhema wî ya bi navê el-Kelîmatu’l Qîşar ne bi zimanê Erebî ye, Baba Tahir wê berhemê bi zimanê Erebî nenivîsandiye. Lê belê gotinên wî ên tesewifî ên ku di berhema el-Kelîmatu’l Qîşar de hatine berhevkerin, di dema berhevkerinê de, bi zimanê Erebî hatine berhevkerin ku kesên ehlê tesewifê bi hêsanî ji wan fêm bikin û şîroveya wan binivîsin.⁴⁰⁹

Zerrînkûb diyar kiriye ku zimanê el-Kelîmatu’l Qîşar ne Erebî ye, Fehlewî ye⁴¹⁰ ku Fehlewî bi Pehlewiye ve têkil e û berdewama zimanê Medî ye. Angaşt Zerrînkûb watedar e, ku Baba Tahir di helbestên xwe de zimanê Erebî bi kar neaniye, lê gotinên wî ên tesewifî ên hatine berhevkerin û gihîştine roje me bi Erebî ne. Ev jî pîrsa: Gelo Baba Tahir çima helbestên xwe bi zaravayê deverê xwe nivîsandiye, çima gotinên xwe ên tesewifî bi Erebî nivîsandiye? Tîne rojevê. Sofî û mutesewifên Kurd ên ku di erdnîgariya gelê xwe / ednîgariya Kurdistanê de jiyane, her çî qas Erebî, Farisî û Tirkî zanîbûne jî dîsa berhemên xwe bi Kurdî nivîsandine ku gelê wan ji wan fêm bikin. Sofiyên Kurd helbestên xwe ên tesewifî bi Kurdî nivîsandine lê di van helbestan de peyvên Erebî bi kar anîne. Lê gotinên Baba Tahir ên tesewifî ên ku hatine berhevkerin bi giştî bi zimanê Erebî ne, yanê peyv û sazkirina hevokan bi giştî bi zimanê Erebî ne. Lê niha tu belge di dest de tune û nehatiye dîtin ku ev angaşt Zerrînkûb pîştrast bike.

Li ser zimanê dubeytiyan hinek gengeşe hene û ev mijar di nava lêkolînên tarîxa edebiyata Kurdî û Farisî de mijareke girîng tê dîtin. Lewre Baba Tahir di demeke zû de jiyaye û li gorî aîdiyeta zimanê wî, dubeytiyên wî dê di tarîxa edebiyata wî gelê de cihê xwe yê tarîxî bigirin. Bi taybetî ji ber ku

⁴⁰⁹ Zerrînkûb, *b.n.*, r. 170-200.

⁴¹⁰ *bnr., b.n.*

*Baba Tahir ji helbestvanê Farisan ê neteweyî Firdewsî jî kevntir e, aîdiyeta zimanê wî girîngtir dibe.*⁴¹¹

Di nav dîrokê de li ser helbestên Baba Tahir guherîn pêk hatine û zimanê helbestên wî bi zimanê wêjeya Îranê ve hatiye nêzîkirin. Komek dubeytiyên helbestvanên din her wiha yek ji wan jî Pûrî Ferûdun e, ketine di nav dubeytiyên Baba Tahir.⁴¹²

Perwîz Natil Xanlerî di derbarê angaştê mamoste Îbrahîmiyan de, ku Îbrahîmiyan mamosteyê “Zanîngeha Têhran”ê ye û pirtûkek bi navê “Lehceyê Yehûdiyanê Hemedan û Îsfehan û Lehceyê Baba Tahir” nivîsandiye û di vê pirtûkê de têkiliya zimanê Baba Tahir bi zimanê Yehûdiyên Hemedanê ve daniye, dibêje angaştê têkiliya zimanê Baba Tahir ku bi zimanê Yehûdiyên Hemedan û Îsfehanê ve heye nayê îspatkirin. Ji ber ku gelek taybetiyên zimanê Yehûdiyên Hemedanê hene ku ew bi hîç awayî di dubeytiyên Baba Tahir de nayên dîtin.⁴¹³

Dubeytiyên Baba Tahir bi şewaza zimanê Pehlewî hatine nivîsandin ku ji ber vê yekê hin caran ji zimanê dubeytiyên wî re Fehlewiyat jî tê gotin. Fehlewiyat tê wateya Pehlewiya Îslamî, ku nayê wateya Pehlewiya navîn. Clement Huart bawer dike ku zimanên ku li rojavayê Îranê (Mad / Med) hene, ji zimanê Avestayê derketine ku ji şeweyê nû re jî Mada nû yan jî Pehlewiya Misilman tên gotin. Her wiha şeweyê dubeytiyên Baba Tahir jî ji wan in.⁴¹⁴

Minorsky diyar dike ku Baba Tahir him bi navê Hemedanî him jî bi Lorsitanî tê nasîn ku taybetiyên şeweyên Hemedanê û Loristanê di nav dubeytiyên wî de diyar in. Li Xoremabadê taxek heye ku navê wê Baba Tahir e. Niha di navbera Xoremabad û Hemedanê gelek zarava û devok hene lê hîç yekî wan ne zaravayê Baba Tahir e. Zaravayê helbestên wî bi hîç zaravayê ve ne têkil e, wisa tê fêmkirin ku ji hemûyan sûd wergirtiye. Dubeytiyên Baba

⁴¹¹ Adak, *b.n.*, r. 113.

⁴¹² Şiwan, *b.n.*, r. 22.

⁴¹³ Perwîz Natil Xanlerî, “Dubeytîhayê Baba Tahir”, Parwîz Azkaii, *Baba Tahir-Name, b.n.*, r. 66-67.

⁴¹⁴ Şiwan, *b.n.*, r. 22.

Tahir ji ber ku di nav dírokê de bi awayê devkî hatine gotin û nehatine nivîsîn, gelek guherîn li ser dubeytiyan ve hatine. Ji ber vê yekê zimanê dubeytiyên wî bi şêweyên Hemedan û Loristanê ve tevlihev in.⁴¹⁵

Minorsky derbarê gotinên nivîskarên dubeytiyên Baba Tahir dibêje, Jûkovskî diyar kiriye ku dubeytiyên Baba Tahir di dîwana Mele Muhammedê Sofiyê Mazenderanî (ss. h.q. 11) de hene. Yek ji helbestvanê Hemedanê yê bi navê Şatir Beg Muhammed angaşt kiriye ku gelek dubeytiyên Kurdî (Pehlewî) wekî yên Baba Tahir hatine pêşkeşkirin.⁴¹⁶

Clement Huart dibêje ku Baba Tahir bi zimanê Racî / Razî helbestên xwe nivîsiye. Razî yek ji gundên Qeturî ye ku ew jî girêdayî bajarê “Xoy”ê ye, li aliyê rojavayê “Xoy”ê û cihekî çiyayî ye. Gelên wir jî Sûnî û Kurd in. Bi piraniya rayan ku yek ji wan C. Gobineau ye, zimanê dubeytiyên Baba Tahir bi zaravayê Lorî ye û Lorî jî zaravayê zimanê Kurdî ye.⁴¹⁷

Di nusxeyên dubeytiyên Baba Tahir ên ku hatine çapkirin de cudatî hene. Gava ku heman dubeytî yê ku di çapên cuda de ne, em didin li ber hev, dibînin ku peyvên dubeytiyê ji hev cuda ne. Di hin çapan de dubeytî ber bi Farisî ve hatine nêzîk kirin. Di hin nusxeyên dubeytiyan de peyvên Farisiya îroyîn, yanê peyvên ku van demên nêzîk ketine Farisiyê de jî hene. Di heman dubeytiyên çapên cuda de, peyvên ku di Farisî, Lorî her wiha zaravayên Kurdî yên din, bi taybet devokên Kirmanşah û Îlamê xêncî van di Lekî û Bextiyarî de tînin bikaranîn hene. Di dubeytiyên ku hatine çapkirin û yên ku di destên me de ne, him peyvên Kurdî û him jî yên Farisî hene. Lê ji raya giştî ya lêkolîneran tê fêmkirin ku dubeytiyên Baba Tahir wekî xwe yanê bi awayekî resen nemane û negihîştine roja me.

Ji ber guherînan zimanê dubeytiyan bi Farisiya îro xuya dike. Lê di dubeytiyan de peyvên Kurdî gelek in. Wê gavê zimanê dubeytiyan bi giştî ne

⁴¹⁵ Vladimir Minorsky, “Zîstname-î Baba Tahir”, Parvîz Azkaii, *Baba Tahir- Name, b.n.*, r. 117-118.

⁴¹⁶ *b.n.*, r. 119.

⁴¹⁷ Clement Huart, *Les Quatrains de Baba Tahir*, vgz. Şiwan, *b.n.*, r. 23.

Farisî ne. Îcar dema ku Faris dibînin ku zimanê dubeytiyan bi temamî ne wekî Farisiya îro ye, rêyeke hêsan hildibijêrin û dibêjin ku dubeytî bi Farisiya kevn ve hatine nivîsandin.⁴¹⁸ Girêdayî van agahiyan em ê li jêrê li ser çend dubeytiyan rawestin da ku ev mijar zelal bibe.

Dilê mu xeyrê te dilber negîre

Bi cayê cewherî cewher negîre

Dilê mu sûte mihrê te azer

Benê nasote azer dernegîre⁴¹⁹

Dilem ez ‘îşqê xûban gêc û wêc e’

Muje behrem zenem xûnawe rêce

Dilê ‘aşiq mîsalê çûbe ter be

Serî soce serî xûnabe rêce⁴²⁰

Bê te ser der girîban um şew û roc

Sirişk ez dîde baranim şew û roc

Ne bîmar um ne cayum mî kero derd

Hemî zûnum ki nalûn um şew û roc⁴²¹

Dema em li van dubeytiyan dinêrin em dibînin ku di ya yekem de peyvên “mu”, “negîre”, “cayê”, “ben”, di ya duyem de “gêc” û wêc”, “xûnawe”, “rêce”, “soce”, di ya sêyem de “şew û roc”, “cayim”, “mî kero”,

⁴¹⁸ Adak, *b.n.*, r. 113.

⁴¹⁹ *b.n.*, r. 114.

⁴²⁰ *b.n.*, r. 114.

⁴²¹ *b.n.*, r. 114.

“danum” ne wekî Farisiya îro ne û herweha di dubeytiyan de rêjeya bikaranîna wan jî ne hindik in.⁴²²

Baba Tahir yekem çavkaniya nivîskî ya wêjeya Îranê ye û bi vê taybetiya xwe gelek girîng e. Bi zaravayê Kurdî ya bi navê Lorî berhemên xwe nivîsandiye, ji ber vê rastiye wêjeya Îranê ya nivîskî bi Baba Tahir, yanê bi Kurdekî û bi Kurdî dest pê dike.⁴²³ Ev rewş ji aliyê wêjevan û zimanzanên Faris, wekî kêmasiyeke wêjeya Farisî tê hîskirin û ji bo vê kêmasiyê ji holê rakin li bal xwe çareseriyek dibînin û dibêjin, zaravayê Kurdî ya bi navê Lorî zaravayê Farisî ye û hinekê din jî dibêjin Lorî, Farisiya kevn e. Lê belê zimanzanên ji neteweyên cuda bi taybet yên rojava û rojhilatnas, zimanê Baba Tahir, wekî zimanê Farisî napejirînin. Her wiha dema ku em li ser zimanê berhemên ku bi Farisî hatine nivîsandin ên nêzikî heyama Baba Tahir lêkolîn dikin, dibînin ku zimanê berhemên wan ne nola zimanê berhemên Baba Tahir in. Wekî mînak Fîrdewsiyê (934-1020) ku di heyama Baba Tahir de jiyaye, bi zimanê Farisî berhema xwe ya bi navê “Şahnameyê” nivîsandiye û zimanê Şahnameyê ne mîna zimanê dubeytiyên Baba Tahir e. Heke Lorî Farisiya Kevn an jî zaravayê Farisî bûya, divê berhema Fîrdewsi jî bi wî zimanê bihata nivîsandin û zimanê berhema Fîrdewsi mîna zimanê dubeytiyên Baba Tahir bûya. Wekî tê zanîn, Fîrdewsi û hin helbestvanên Îranî di serdemên xwe de ji aliyê siltanên wî serdemê ên mîna Siltan Mehmûdê Xeznewî û hin helbestvan û sofîyên din, ji aliyê siltanên Selçûqîyan ve hatine pesinkirin û ji aliyê Qesra dewletê ve hatine vexwendin û piştgirîkirin. Lê belê her çî qas Baba Tahirê Îranî jî yek ji helbestvanên hêja ya wê serdemê bûye, vê pêwendiyê ji siltanan nedîtiye ku ev jî diyar dike ku Baba Tahir ji wan helbestvanan cuda bûye.

Zimanê Kurdî û zimanê Farisî nêzî hev in. Ji ber vê yekê divê em derbarê dîroka Kurd û Farisan hin agahiyan bidin da ku ev agahî ji bo têgihîştina zimanê dubeytiyan ji me re bibin alîkar. Med wekî gelê kevn yê Îranê li rojhilat, bakûr û bakûrê rojhilata Îranê li bajarên îroyîn yên bi navê Têhran, Hemedan, bakûrê Îsfahan û derdora Zencanê jiyane. Di dîrokê de

⁴²² *b.n.*, r. 114.

⁴²³ Uluçay, *b.n.*, r. 50.

yekem car navê Medan di nivîstekên Kralê Asûriyan ê bi navê Salmanassar de derbas dibe (bz. 835). Di vê nivîstekê de diyar dibe ku Med û Asûrî ji aliyê sîyasî ve li hev nekirine û di navbera her du welatan de pirsgirêk hebûne. Herêma Medan di Yewnaniya kevn de wekî Mediâ hatiye pênasekirin. Elamiyan ji vî gelî re Madapî gotine ku li gor diyarkirina Heredotos, gelê Madan ji aliyê netewe, kevneşopî, cil û bergên xwe ve xwe wekî Arî / Ariyan yanê kesên bi esil û berz dîtine û ew ji Persan cuda ne. Li gorî agahiyên Heredotos ji aliyê girêdayîbûna rewîştan û ji aliyê hêza baweriyê ve Madan xwe ji Persan veqetandine û Persan wekî penaber dîtine. Gelên Pers demên dûr û dirêj li erdê Medan, di bin desthilatiya Medan de jiyane. Bindestiya Persan heta dema Kyrosê II'yem dom kiriye. Kralê Medan keçika xwe daye Persekî û ji wan Kyros bûye. Dema ku Kyrosê II'yem bi piştgiriya Babîlan paytextê Medan ê bi navê Ekbatana hildaye bin destê xwe, xwe wekî “Kralê Mezin ê Akamedîn” pênase kiriye (bz. 559). Bi vî awayî Medên ku ji aliyê çand û ziman ve xizmên Persan in, ketine bin desthilatiya Persan. Êdî Persên bende (kole) bûne efendî û Medên desthilatdar jî bûne bende. Ji vê mêjûyê pê ve pişavtina Persan li ser Medan pêk hatiye. Dewsa zimanê Medan zimanê Persan bi domana demê re hatiye bicihkirin. Lê belê her çî qas ev helwestan pêk hatine jî bigiştî şaristaniya hemû Îranê li ser çanda Medan teşe girtiye. Gelek hêman ji qesra Ekbatana bi qesra Persopolîs ve ji baweriya Medan bi baweriya Persan ve derbas bûne. Persan pergala rêvebirîya qesrê ji Medan girtine û wekî mîratgirên Medan, ji gelek aliyên Medan ji xwe re wekî mînak girtine. Her wiha di rêvebirîya Persan de Medan jî cih girtine. Pers ji aliyê baweriyê ve ji baweriya Zerdûştî bawer kirine û navê Xwedayê wan Ahûramazda (fermandarê zana) ye, ku ev bawerî baweriya Medan a kevn e. Bi desthilatiya Persan herêma Medan bi navê Ariyanam (welatê Ariyan / di Farisî de Îran) hatiye navandin ku ev peyv jî peyveke Medî ye.⁴²⁴

Berhemên mutesewif û helbestvanên heyama Baba Tahir hatine parastin lê berhemên Baba Tahir bêxwedî mane. Gava ku em serdema ku Baba Tahir jîyaye dinêrin ew erdnîgarî ya ku Kurd, Ereb, Fers û Tirk lê dijîyan xwedî

⁴²⁴ Yilmazel, *b.n.*, r. 131-132.

gengeşî û aloziyan bûye. Her wiha di wê erdnîgariya navborî, baweriyên bi navê Zerdûştî, Êzidî, Manî, Şamanî û wd. hebune. Îslamiyet bi ser van baweriyên de bi awayekî bihêz, şid û lez hatiye ku ev jî bûye sedemên gengeşî û guherînan. Bi vê hatina Îslamiyetê sentezên baweriyên derketine der û bawerî têkilê hevdu bûne. Bêguman di wê serdemê de di nav Îslamiyetê de ekola Şiîya û ya Suniya bihêz bûne. Ev her dû ekol hewl dane ku ekolên din hildin li bin baskên xwe. Yek ji van ekolan baweriya Yarsan e ku baweriyeke Kurdan e û hin lêkolîner têkiliya Baba Tahir bi vê baweriyê re danîne. Zimanê vê baweriyê zaravayê Goranî ye. Hin dubeytiyên Baba Tahir ji aliyê Yarsanan ve hatine parastin û bi vî awayî heta roja me ya îro hatine. Peyvên taybet ên zaravayê Goranî di helbestên Baba Tahir de hene ku jî têkilya Baba Tahir a ku bi Goraniyê re heye radixe li ber çavan.

Baba Tahir di dubeytiyeke xwe de zimanê xwe wekî Pehlewî navandiye. Zimanê zikmakî yê Kurdan ji du beşên bingehîn pêk tên. Ya yekem Kurmancî (Bahdînanî-Soranî) ye, ya duyem Pehlewî (Dimilî / Zazakî-Goranî) ye. Bahdînanî, Soranî, Dimilî û Goranî xwediyê gelek devokan in. Wekî mînak Hewramî û Lakî zaravayên Goranî ne ku di helbestên Baba Tahir de gelek peyvên Goranî hene. Her wiha gelek berhemên wêjeyî yên nivîsî yên ji 1000 salî jortir hene. Peyva Pehlewî ji peyva “Pahla”yê tê ku ew jî ji peyva “Pahlawand”ê derketiye. Pahla bi ihtîmaleke mezin herêma ku ziman ji wir derketiye holê, ji Kurdistanê Başûr û bakûrê Loristanê pêk hatiye. Peyva Pahla bi awayekî xira bûye, bi peyva Feylî ve guheriye û Feylî niha navê êleke / eşîreke Kurdan e, ku ev êl niha li başûrê Kurdistanê di herêma Pahlayê dijîn.⁴²⁵ Zimanê Pehlewî di serdema şahên Sasaniyan de fermî bûye. Ji zimanê Pehlewî re Farisiya naverast jî hatiye gotin. Farisiya nû ji zimanê Pehlewî derketiye. Farisiya naverast, Farisiya nû û bi giştî zimanên Îranî ketine bin bandora Pehlewiyê.⁴²⁶ Di encama vê bandoriyê peyvên Pehlewî di nav zimanên Îranî de cih girtine û ev peyvên ji bo tevî zimanên Îranî bûne peyvên hevpar. Ev peyvên hevpar ên ku di dubeytiyên Baba Tahir de hene, zimanê dubeytiyan

⁴²⁵ Izady, *b.n.*, r. 299.

⁴²⁶ Xeznedar, *b.n.*, r. 184- 203.

nake zimanê Farisî. Xêncî van Baba Tahir di dubeytiyeke xwe de xwe wekî Lek nîşan daye ku Lek jî êleke Kurdan e. Baba Tahir di dubeytiyên xwe de behsa Farisî û Farisan nekiriye, yan jî peyvên taybet ên Farisiyê bi kar neaniye.

Gava ku em li ser zimanê dubeytiyên Baba Tahir radiwestin, dibînin ku di navbera dubeytiyên Baba Tahir û zimanê Farisiya nû de tu têkili tune. Faris ji ber vê pirsgrêkê ji bo berjewendiyên xwe, xwe bi Pehlewîyê ve girê didin û dibêjin zimanê Pehlewî maka zimanê Farisî ye. Çira dibêjin Pehlewî maka Farisî ye? Ew bi ramana “Pan Îranîst” nêzikî vê mijarê dibin û hewl didin ku hemû tiştên resen bi Farisî ve girê bidin. Heke ev kesan ne Pan Îranîst bin wê gavê ji bo çî li ser zimanê dubeytiyan û zaravayên Kurdî lêkolîn nakin. Tenê dibêjin Pehlewî Farisî ye û ji nav vê mijarê derdikevin.⁴²⁷

Dubeytiyên Baba Tahir li kîjan bajar û deveran hatine gotin peyvên wan deveran ketine têkili wan bûye. Di nav dubeytiyên wî de tevî zaravayên Îranê hene. Dubeytî ji aliyê gundî û bajariyan ew qas hatine jiberkirin û gotin, gelek peyvên Farisî ketine nav dubeytiyan. Faris dema ku dubeytiyên Baba Tahir dinivîsin û çapdikin, ji bo dubeytiyan ferhengokekî gelek kurt amade dikin. Lê belê ji ber ku zimanê dubeytiyên wî ew qas kevn e û ji Farisiya îro ew qas dûr e, divê ferhengokek gelek dirêj hebûya da ku dubeytî bihatana fêmkirin. Lê dubeytî ew qas ber bi Farisî ve hatine guherandin ku hewcetiya ferhengeke dirêj nemaye ku ferhengokeke kurt ji bo fêmkirina Farisan têrê dike. Lê dîsa jî bê ferheng fêmkirina dubeytiyên wî ji aliyê Farisan ve ne pêkan e.⁴²⁸

Xeznedar di derbarê zimanê dubeytiyan de ji hin lêkolîneran wiha mînak dide: Bertîlis ji rojhilatnasên Ewropî ye ku dibêje, çarîneyên Baba Tahir ne bi zimanê wêjeya Farisî ne, bi zaravayê gundên Hemedanê ne. Rojhilatnasê Rûs ê bi navê Jukovski dibêje ku li Îranê ji kê bipirsî ew ê bêje ku Baba Tahir ji me ye. Sedemê vê helwestê ev e ku dubeytiyên wî bi tevî zimanên Îranê tînin gotin. Dîsa rojhilatnas ê bi navê Mînorsky dibeje, Baba Tahir ji aliyê Lorî ve Kurd e, belkî dubeytiyên wî bi zaravayê Loristanê ya serdama wî hatiye

⁴²⁷*b.n.*, r. 191-193.

⁴²⁸*b.n.*, r. 191.

nivîsandîn ku zaravayê Hemedanê di wî serdemê de heman zarava bûye. Ew dibêje çarîneyên wî bi domana demê re guherîne û ji reseniya xwe dûr ketine. Dubeytiyên wî ji aliyê kêşe û bilêvkerinê ve bi hemû zimanên Îranê ve guherîne ku kesên wî deverê ji dubeytiyan baştir fêm bikin û pişt re Baba Tahir ji xwe bizanibin.⁴²⁹ Em ji aliyê peyvan ve li ser zimanê dubeytiyeke Baba Tahir rawestin:

Neway naley xem endûh (te) zono

Eyar qelbî xalis bote zono

Bore sûteditûn gerd hem ayim

*Ke qedrî sutedil dilsûte zono*⁴³⁰

Di dubeytiya jor de peyva “newa” Pehlewî ye.⁴³¹ Peyva “te” Botanî (Kurmancî) ye. Peyva “zono” ku ev peyv di resenê de zanu ye û peyveke kevn ya zaravayê Hewramî ye. Peyva “bore” Lorî ye. Peyva “bote” jî Kurmancî ye. Secadî diyar dike ku Baba Tahir bi bikaranîna peyvên zaravayên cuda xwestiye ku bîr û baweriya xwe di nav hemû Kurdan de belav bike.⁴³²

Yildirim derbarê zimanê dubeytiyan û guherîna wan ji hin lêkolîneran mînakên dide û wiha dibêje: Seyîd Raxîb Ahmedî di pirtûka xwe ya bi navê “Dîwanî Baba Tahir Hemedanî” de dibêje ku Baba Tahir di dubeytiyê xwe de zaravayê Kurdî ya Lorî bi kar aniyê. Li gorî Edward Browne Baba Tahir zaravayê ku bi kar aniyê devoka niştecihên Yezd û Kîrmanê ye û ev devokan nêzî zimanê Avestayê ne. Gava ku li ser helbestên herî kevn ên Baba Tahir ên ku li muzeya Qonyayê ne lêkolîn tê kirin eşkere tê dîtin ku ev nusxe ji nusxeyên din bêtir nêzî Lorî ye û dema ku bi nusxeyên din ve tê rûberûkirin derdikeve holê ku zimanê dubeytiyan bi xebatên paşê nêzî Farisî hatiye kirin. Perwîz Natil Xanlerî û Mustafa Fexrayî jî mîna gelek lêkolîneran dibêjin li ser

⁴²⁹ *b.n.*, r. 191.

⁴³⁰ Secadî, *b.n.*, r. 182.

⁴³¹ Mehmet Kanar, *Farsça Türkçe Sözlük*, ç. 3, weş. Say, İstanbul, 2011, r. 735.

⁴³² Secadî, *b.n.*, r. 182.

dubeytiyên wî guherîn pêk hatine û ji resenên wan hatine durxistin. Li gorî tespîtkirina Şêx Muhammed Xal helbestên Baba Tahir her ku ji nû ve hatine çapkirin ji aliyê hin Îraniyan ve her car peyvên Lorî bi peyvên Farisî ve hatinê guherandin. Em ji van peyvan wekî mînak peyvên resen ên Lorî li cem wan jî, guherîna wan a bi Farisî bidin: “*Amête-amîxte, taw-tab, rêje-rîzde, şew-şeb, kirin- kunend, mû/mo- men, meke- mekun, witim-goyem, wînem- bînem*”.⁴³³

Ji aliyê peyv û sazkirina hevokan ve di navbera dubeytiyên Baba Tahir ên ku hatine çapkirin de gelek cudatî hene. Di dubeytiyên Baba Tahir ên nusxeyên cuda de ev helwest tê dîtin. Di vê mînaka jêr de, em ê dubeytiyeke Baba Tahir ji pênc nusxeyên cuda bidin berhev da ku di nusxeyên cuda de heman dubeytiya Baba Tahir çawa guheriye baştir bibînin:

مو آن رندم که نام بی قلندر	نه خوان دیرم نه مان دیرم نه لنگر
چو روز ایه بگردم گرد کویت	چو شو آیه بخشان وانهم سر (نسخه وحید)
مو آن رندم که نام بی قلندر	نه خون دیرم نه مون دیرم نه لنگر
چو روز آیه بگردم گرد گیتی	چو شو کرده بخشتی وانهم سر (ادوارد هرون)
از آن گردم که نام بی قلندر	نه شو دارم نه رو دارم نه لنگر
چو روز آیه بهر دشتی کم سر	چو شو آیه به هر خشتی نهم سر (دهگان)
آن پیرم که خواندم قلندر	نه خاتم بی نه مانم بی نه لنگر
رو همه رو ورایم گرد گیتی	شو درایه و او سنگی نهم سر (قونیه)
مو آن رندم که نام بی قلندر	نه خون دیرم نه مون دیرم نه بستر

⁴³³ Yıldırım, *b.n.*, r. 60-61.

چو روج آید بگردم گرد گیتی

چو شو آید بخشتی وانهم سر (حاشیه مقالات)⁴³⁴

Di dubeytiyê de peyvên “مو” û “بی” derbas dibin ku ev peyvan di zimanê Farisî de nîn in. Lê di zaravaya Lorî de tîb bikaranîn. Payva “بی” ya Lorî, di Farisî de beramberî peyva “بود”⁴³⁵ ye ku di zaravayê Kurmancî de wekî “از” hatiye bikaranîn. Peyva “مو” di hin nûsxeyan de wekî “بو” û “بی” tîb bikaranîn. Her wiha peyva “مو” di Kurmancî û zaravayên Kurdî yê din de wekî “ez” / “از” yan jî wekî “min” tîb bikaranîn. Peyva “مو” (mû) di hin nûsxeyan de jî wekî “من” hatiye bikaranîn û “من” (men) di Farisiya îroyîn de tîb bikaranîn, wateya peyvê di Kurdî de “من” (min) e, ku di mînakê de nusxeya pêncan de hatiye bikaranîn. Diyar dibe ku di nusxeya pêncem de “مو” bi “من”^ê ve hatiye guherandin. Yanê peyva “مو” (mû) rakirine peyva “من” (men) danîne dewşê da ku dubeytî ber bi Farisî ve biqulibe. Peyva “من” di Kurdî û Farisî de bi tîpên Erebi wekî hev tî nivîsîn lê di her du zimanan de bilêvkirina (fonetîka) peyva “من”^ê cuda ye. Peyva “من” di Kurdî de wekî “min” di Farisî de wekî “men” tîb bilêvkin.

Di nusxeyên jor de peyvên “روز”, “روژ” û “روج” di dewşa hev de hatine bikaranîn. Peyva “روز” di zaravayên Kurdî û Farisî de peyveke hevpar e. Lê peyvên “روژ”, “روج” di Kurdî de tîb bikaranîn.

Di nusxeyên jor de peyvên “رند”, “پیر” û “گرد” di dewşa hevdu de hatine bikaranîn.

Di nusxeyan de hevokên “نه شو دارم نه رو دارم”, “نه خوان دیرم نه مان دیرم” û “نه خون دیرم نه مون دیرم” di şûne hev de hatine bikaranîn ku wateyên wan jî hevdu cuda ne.

Her wiha di nusxeyên jor de peyvên; “لنگر”, “رو” û “چو”, “خوانند” û “نام” di dewşa hevde hatine bikaranîn. û “سنگ” di dewşa hevde hatine bikaranîn.

⁴³⁴ “Baba Tahirê Hemedanî”, [http://k-b.ir/154967.htm], Gihîn: 25 Gulan 2015

⁴³⁵ Edward Heron-Allen, *A Fool Of God: The Mystical Verse Of Baba Tahir*, weş. The Octagon Pres, London, 1987, r. 7.

Ji nusxeyên jor de guherîna dubeytiyê bi awayekî eşkere tê dîtin. Guherîn ne tenê li ser vê dubeytiya ku me wekî mînak li jor da hatiye, li ser hemû dubeytiyan de ev guherînan pêk hatine. Lê em dikarin helbestên Baba Tahir ên ku di nusxeya Qûmî de ne cuda bigirin.

Bo mînak peyva “dest” ji aliyê nivîsînê him di Kurdî him jî di Farisî de bi heman tîpan tîpên nivîsîn. Lê di bilêvkirina peyvê de tîpa “e” di Kurdî de kurt, di Farisî de dirêj tê gotin. Her wiha lêkera “nalîn” ku di helbestên Baba Tahir de gelek hatiye bikaranîn di her du zimanan de di nivîsê de bi heman e lê di bilêvkirinê de cihê ne. Peyva “nalîn” di Kurdî de wekî “nenalim”, Farisî de “nenalem”, Xoremabadî û Brucirdî de “nenalom” tê bilêvkirin.⁴³⁶

Di dubeytiyan de komek peyv hene ku ev peyvên Kurdî ne û di Farisî de tune. Xêncî van di dubeytiyan de komek peyv jî hene ku him di zimanê Kurdî him jî di Farisî de hene. Peyvên ku mîna “dest”, “nalîn” û wd. di her du zimanan de jî hene. Ev peyvên hevpar di her du zimanan de bi heman awayî tîpên nivîsîn, lê bilêvkirina wan / fonetîka wan cihê ne. Nikare were gotin ku di dubeytiyan de peyvên hevpar ên ku di zimanê Kurdî û Farisî de hene Farisî ne.

Me‘rûf Xeznedar dibêje: Em dikarin Baba Tahir heta cihekî wekî Goranî hesab bikin. Her çi qas zaravayê wî yê de vera Hemedanê be jî ew Goranî dizane û heta niha dergevanê gora wî bi zaravayê Goranî diaxivin.⁴³⁷ Ji ber ku tîkiliya wî ya bi Yarsanê re heye ku zimanê Yarsanan Goranî ye, diyar dibe ku Baba Tahir di heman demê de zaravayê Kurdî ya Goranî jî zanibûye.

Di muzeya Mewlana ya li Qonyayê de pirtûkeke destnivîsî heye ku di vê pirtûka destnivîsî de du bend û heşt dubeytiyên Baba Tahir hene. Pirtûka destnivîsî ji aliyê Bahauddînê Qûmî di mêjûya 848/1444’an de hatiye nivîsîn. Di encamên lêgerînên xwe de me dît ku pirtûka destnivîsî di muzeya navborî

⁴³⁶ Xeznedar, *b.n.*, r. 192.

⁴³⁷ Me‘rûf Xeznedar, *Yekemîn Rojên Edebiyatê Li Diyarbekirê, Gotarên Konferansa Edebiyata Rojhilata Navîn û Pirçandiyê*, Weşanên Enstîtuya Kurdî Ya Stenbolê, 4-6 Sermawez 2003, Stenbol, 2004, r. 28.

de bi jimara 2530'yî ve hatiye tomarkirin. Ev nusxeya bend û dubeytiyên Baba Tahir di tê de ne, kevintir nusxeya bend û dubeytiyên wî ne. Ji vê nusxeyê kevintir tu nusxe heta niha nehatine dîtin ku em behsê bikin.

Mêhrdad Behar diyar dike ku helbestên Baba Tahir hatine xerabkirin. Di nav dubeytiyan de cînavkên Farisî wekî mînak “men” û peyvên herêma Xorosanê hene. Lê dubeytiyên Baba Tahir bi zimanê Farisî û Xorosanî nehatine nivîsîn. Bi zimanê Loriya resen hatine nivîsîn ku ji bernava wî ya Lorî jî diyar e.⁴³⁸ Ev nusxeya navborî ji aliyê Mêhrdad Behar Welî ve li gorî resenên dubeytiyan hatiye tomarkirin. Wisa xuya dike ku ev nusxe bêtir nêzî zimanê Lorî ye ku em dikarin bêjin li ser wan lîstik pêk nehatine.⁴³⁹ Li gorî hin lêkolîneran zimanê vê nusxeyê nêzîktirîn zimanê Baba Tahir e, lê em nikarin bêjin helbestên vê nusxeyê yekrû resen in û hîç neguherîne. Girîngiya vê nusxeyê ev e ku ji bo têgihiştina zimanê Baba Tahir alîkarî dide me. Di nusxeyê de helbest wiha ne:

Benda Yekem

Ger ej zer ewnihî eywanî ej gil

Be perçîneş kerî wanûşe û wil

Ger ew beşneş nihî an dar şimşad

Ger ew rûneş kerî awaci bilbil

Serencaman beşî be ya beherzî

Yayê te gûr wî mawayê te gil⁴⁴⁰

Ger tu bi zêr biseyinî eywana gil

Dewsa perçînê biçînî sosin û gul

⁴³⁸ Mêhrdad Behar, “Gûyeşê Baba Tahir”, Parvîz Azkaiî, *Baba Tahir-Name*, b.n., r. 102.

⁴³⁹ Yıldırım, b.n., r. 42.

⁴⁴⁰ b.n., r. 42-43.

Ger daçikînî devdorê darê şîmşad

Ger li wir bidî xwendinê bilbil

Dawiyê de tu yê herî, li wir bihêlî

Cî û nivînê te gor, lihêfa te gil

Benda duyem

Zaricem dî wîdayê mûric edxwerd

Mûric anî dû destêş û Xwuda derd

Nagehan bamed an baz wi darî

Zariceş kuşt û mûran zaric edxwerd

Daliç Elwend kûhan kerd perwaz

Bazeş bekuşt û xwûneş pak waxwerd

Bemed neçîrwan derdên weayên

Bewekdeş tîr û dal ej kar bederd

Beşe neçîrwan destut wucad est

Ce înet wedkere ej kar bederd

Fena mî neşe îniwed ke men kerd

Be men hem an keren her wed ke men kerd⁴⁴¹

Min dît kewa gozel qutê moriyê xwar

⁴⁴¹ *b.n.*, r. 43.

Morî ber bi Xwedê ve destên xwe vekir

Hingav bazekî nêçîrvan hate wir

Kewa gozel kuşt morî kewê xwar

Ji çiyayê Elwendê îcar dalek hat

Baz kuşt, xwîna wî vexwar û wî xwar

Piştî nêçîrvanekî bixem û bêxeyset hat

Bi yek tîrê ve dal kuşt

Her bijî neçîrvan, Xwedê zedê li te nexel!

Lewre xerab bira cezayê xerabiyê bikişîne

Ez jî xerab im ev ji min re namîne

Min her çi xerabî kiribe wê li min vegere

Dubeytî

1.

Yakem dur dî henî derya nebî, yar

Yakem xwur dî gehan peyda nebî, yar

Men ez an roz be damanê te jed dest

De gerdûnet perûpayî nebî, yar⁴⁴²

2.

Ya ke ej mihretum dem mijed ey yar!

Xwîş û bîganegan sengum zed ey yar!

⁴⁴²b.n., r. 44.

Curmum î n e ke ez te dûst darem

Ne xwûnum kerd û nem rahî jed ey yar!

2.

Men an pîr ûm ke xwanendum qelender

Ne xanum bî, ne manum bî, ne lenger

Ro hemme ro werayum girdi gîtî

Şew deraye we û sengî nehum ser⁴⁴³

4.

Ya ej î n bend der Eznawe ketîm

Xwûnum adxwurd û der xwûnawe ketîm

Ya derîn şo mahê gêtîm neyaya

Ej xo bi bare, der werlawe ketîm⁴⁴⁴

5.

Penc rojî henî xurrem gehan bî

Zemîn xendan, beraman aseman bî

Penc royî henî hajîd saman

Ne cînan nam û nej anan nîşan bi⁴⁴⁵

6.

“Elif” kej “kaf” û “nûn” eş ser be wer kerd

Hemeş haman gehan o lacewer kerd

⁴⁴³b.n., r. 44.

⁴⁴⁴b.n., r. 45.

⁴⁴⁵b.n., r. 45.

A keş ed afirî gerdûni gerdan

*Aneş edsat û men endace werkerd*⁴⁴⁶

7.

Beşum be Elwend daman mû neşanum

Damen ez her dû gîtî haweşanum

Neşanum tûle û moyum be zarî

*Bî ke bilbil henî wa wil nişanum*⁴⁴⁷

8.

Ez an espîde baz um Hemmedanî

Î tenhayî kerum neçîrwanî

Heme be men widîren çerx û şahîn

*Be namê men keren neçîrwanî*⁴⁴⁸

Em li ser hin lêkerên ku di dubeytiyan de hene rawestin:

Kerdîn (کردن): Ev lêker di zaravayê Kurmancî de wekî “kirin”, di zaravayê Kirmanckî (Zazakî) de wekî “kerdene”, di zaravayê Soranî de wekî “kirdin” û di zimanê Farisîyê de wekî “kerden” tên bilêvkirin.⁴⁴⁹ Her wiha di zaravayê Goranî de weki "kerdîn" tê bilêvkirin. Lêkera "کر" (ker) di hin nusxeyan de wekî "کُن" (kon) derbas dibe, ku di hin nusxeyên dubeytiyan de dewsa lêkera "کر" (ker), lêkera Farisî ya “کُن” (kon) hatiye cihkirin,⁴⁵⁰ bi vî awayî dubeytî nêzê Farisî hatiye kirin. Lêkera “ker” di Kurmanciyê de jî wekî

⁴⁴⁶b.n., r. 45.

⁴⁴⁷b.n., r. 46.

⁴⁴⁸b.n., r. 46.

⁴⁴⁹ Osman Aslanoğlu, Bedirhan İslamoğlu, Zeki Gürür, Hayrullah Acar, Evren Aslanoğlu, *Ferhenga Pirzimanî*, ç. 3, weş. Nûbihar, İstanbul, 2014, r. 120.

⁴⁵⁰ Abbarîkî, b.n., r. 30.

“kir” tê bilêvkin. Ev lêker di dubeytiyan de wekî “kerî” (کری), “kerim” (کرم), “kerind/ kirind” (کړند) hatine bikaranîn.

Şîyîn (شیین): Ev lêker di zaravayê Kurmanciyê de wekî “çûyîn”, di zaravayê Kirmanckiyê de wekî “şîyene / şîyayene”, di zaravayê Soraniyê de wekî “çûn”,⁴⁵¹ di zaravayê Hewramiyê de wekî “lowêyn” (لواين), di zarava û devokên Lekî, Kelhorî, Kirmanşahî, Feylî û wd. de wekî “çîyîn” (چیین) û di zimanê Farisiyê de wekî “reften” (رفتن) tên bilêvkin. Lêkera navborî di wêjeya Goraniyê de, di mêjûya h. sedsala 8'an de wekî “şîyîn” (شیین) hatiye bikaranîn.⁴⁵² Ev lêker di zaravayê Kurmanciyê de di wekî “biçim” (بچم), “biçî” (بچى) tên bikaranîn û di dubeytiyên Baba Tahir de wekî bişim (بشیم), “bişî” (بشى) hatine bikaranîn.

Watin (واتن): Ev lêker di zaravayê Kurmanciyê de wekî “gotin / wutin / wîtin”, di zaravayê Kirmanckiyê de wekî “vatene”, di zaravayê Soraniyê de wekî “wutin / gutin / gotin” tên bilêvkin. Lêkera navborî di dubeytiyên Baba Tahir de gelek derbas dibe. Rayeka lêkerê waç (واچ) e û di dema borî de wekî wat (وات) tê bikaranîn.⁴⁵³ Peyva “wêje”yê ji peyva “watin” / “wutin”ê tê. Wateya lêkera “watin”ê “gotin” e. Her wiha di zaravayên Kurdî ên din de bi bilêvkirineke nêzî hev lêkera “wutin”ê tê bikaranîn. Ev lêker di nusxeyên dubeytiyan de wekî wajem / wajim (واژم), wacem / wacim (واجم), watem / watim (واتم) hatine bikaranîn.

Wateya “watin”ê di Farisiyê de “goften” (گفتن) e. Di hin çapên dubeytiyên Baba Tahir de dewsa lêkera “watin”ê (واتن), lêkera Farisî “goften” (گفتن) cih digire. Di hin çapên dubeytiyan de, di dewsên “watem” (واتم), “watin” (واتش), (watiş), “waçin” (واچن) de, di rêzê de “goftem” (goftem), “gofta” (gofta), “goyend” (guyend) hatine bikaranîn.⁴⁵⁴ Guherîn li ser lêkera “watin”ê (واتن) ve hatiye û lêkera Farisî “goften” (گفتن) dewsa wê hatiye cihkirin.

⁴⁵¹ Aslanoğlu wd., *b.n.*, r. 102.

⁴⁵² Abbarîkî, *b.n.*, r. 31.

⁴⁵³ Aslanoğlu wd., *b.n.*, r. 112.

⁴⁵⁴ Abbarîkî, *b.n.*, r. 31.

Zanistin (زانستن): Ev lêker di zaravayê Kurmanciyê de wekî “zanîn”, di zaravayê Kirmanckiyê de wekî “zanayene”, di zaravayê Soraniyê de wekî “zanîn” tên bikêvkirin.⁴⁵⁵ Her wiha lêkera navborî di zimanê Farisîyê de wekî “danesten” (دانستن) tê bikaranîn. Lêkera zanistin (زانستن) di hemû zaravayên Kurdî de tê bikaranîn.⁴⁵⁶ Di dubeytiyan de wekî mînak “nezanî” (نزانى) hatiye bikaranîn.

Bî (بى): Di Farisîyê de baramberî vê lêkerê bûd û şod (بود / شد) in. Lêkera bî (بى) di Goranî de wekî bî (بى) tê bilêvkirin. Di heman demê de di zaravayên mîna Lekî û Kelhorî de jî wekî bî (بى) tê bilêvkirin.⁴⁵⁷ Di devokên Kurmanciyê de wekî “bî” (بى) “bû” (بى), û “bît” (بیت) tên bilêvkirin. Lêkera bî (بى) di hin çapên dubeytiyan de bi awayê Farisî wekî bûd û şod (بود / شد) hatine bikaranîn. Lê resenê lêkerê ya ku di dubeytiyan de heye bî (بى) ye.⁴⁵⁸

Bûre (بوره): Lêkera fermanî bûre (بوره), qasî ku tê zanîn tenê di zaravayê Lekî de tê bikaranîn. Wateya lêkera fermanî ya bûre (بوره) “were / bê” ye. Di zarava û devokên Kelhorî, Kirmanşahî û Feylî de wekî baw (باو) tê bikaranîn. Di zaravayê Goraniyê de wekî “bîw” (بیو)⁴⁵⁹ û di zaravayê Kurmancî de wekî “bê” (به) di Farisîyê de wekî biya (بیا) tên bikaranîn.

Dîrim (دیرم): Peyva dîrim (دیرم) tê wateya “xwedîbûn”ê. Ev peyv di dubeytiyan de gelek caran hatiye bikaranîn. Di zaravayê Goranî de wekî “darûm” (داروم) û di zaravayên Kurdî ên din de wekî “dêrim” / “dîrim” tên bilêvkirin. Mesûd Yûsfi diyar kiriye ku peyva “dîrim” (دیرم) bi awayekî şaş wekî “dîrom” (دیرم) tê bilêvkirin, lê di zarava, devok û zimanên Îranî de peyva dîrom (دیرم) tune. Lê di Lekî de wekî darom (دارم) tê bikaranîn.⁴⁶⁰ Di heman demê de di zaravayên Kurdî de bi piranî wekî dîrim (دیرم) tê bikaranîn.

⁴⁵⁵ Aslanoğlu wd, *b.n.*, r. 153.

⁴⁵⁶ Abbarîkî, *b.n.*, r. 31.

⁴⁵⁷*b.n.*, r. 31.

⁴⁵⁸*b.n.*, r. 30.

⁴⁵⁹*b.n.*, r. 30.

⁴⁶⁰*b.n.*, r. 30.

Diyîn / Dîyen (دیین): Ev lêker di zaravayê Kurmanciyê de wekî “dîtin” di zaravayê Kirmanckiyê de wekî “dîyene / vînayene”, di zaravayê Soranî de wekî “bînin / bînîn / dîtin” tên bilêvkerin û di zimanê Farisîyê de wekî “dîden” (دیدن) tê bikaranîn.⁴⁶¹ Di Kurdiya Goranî de di dema borî de wekî “dî” (دی) tê bikaranîn. Di Kurdiya Goranî de rayeka peyvê “wîn” (وین) e.⁴⁶² Lêkera navborî di dubeytiyên Baba Tahir de wekî “dî”, “dîd”, “wînim / wînem”, “newînî” hatine bikaranîn.

Wekî encam, li gorî raya giştî ya lokolîneran zimanê dubeytiyên wî wekî Farisî nehatiye pejirandin. Zimanê dubeytiyên Baba Tahir wekî Kurdî û wekî zimanê herêma ku Baba Tahir jiyaye, herêma Hemedan û Loristanê tê pejirandin. Em jî bawer dikin ku zimanê wî Kurdî ye û em dikarin vê angaştê xwe bi mînakên wiha rave bikin:

Şa Xoşîn bi yaranên xwe ve diçe serdana Baba Tahir û di navbera wan de axaftin derbas dibe. Zaravayê Şa Xoşîn Goranî ye ku ew bi Baba Tahir re Goranî diaxife. Di axaftina wan de diyar dibe ku Baba Tahir Goranî dizane, ev jî nîşaneyê ku zimanê Baba Tahir Kurdî ye û wî bi zaravayekî Kurdî dubeytiyan nivîsandîye.⁴⁶³

Baba Tahir di dubeytiyê xwe de dibêje: “Mû derwêş im, Lek im, îcaz dîr im.” Zaravayê Lek zaravayekî Kurdî ye. Me di mijara “Çiyayê Baba Tahir” de diyar kiribû ku Baba Tahir beriya Hemedanê, heyamek li Girînê jiyaye ku niha zêdetirîn mirovên Girînê bi zaravayê Lekî diaxifin.⁴⁶⁴

Heke zimanê dubeytiyan bi Farisiya kevn hatibe nivîsin nexwe divê zimanê Şehnameyê ku ev berhem ji aliyê Firdewsiyê ku serdema Baba Tahir jiyaye hatiye nivîsîn jî bi Farisiya kevn hatibe nivîsîn. Yan jî divê zimanê Şehnameyê mîna dubeytiyan bûya ku heyama her du berheman jî heman in. Lê gava ku em Farisiya îro dinêrin dewama Farisiya Şehnameyê ye û taybetî

⁴⁶¹ Aslanoğlu wd, *b.n.*, r. 106.

⁴⁶² Abbarîkî, *b.n.*, r. 31.

⁴⁶³ *b.n.*, r. 30.

⁴⁶⁴ *b.n.*, r. 30.

peyvên ku me li jorê nîşan dane ên dubeytiyan di Şehnameyê de tune. Ev helwest jî nîşan dike ku zimanê dubeytiyan ne Farisî ye.⁴⁶⁵

Di dubeytiyan de komek peyv hene ku di zimanê Kurdî û Farisî de hevpar in. Ev peyv di her du zimanan de di nivîsê de heman in lê di fonetîkê de cuda ne. Bo mînak fonetîka peyva “دست”⁴⁶⁶ (dest) di zimanê Farisî û Kurdî de cuda ne. Kurd dengdêra peyva “d-e-st”ê bi kurt bilêvdikin, Faris jî dirêj dikan. Her wiha lêkerên “nalîn” û “girîn” her du zimanan de hevpar in. Lê bilêvkirina van lêkeran di her du zimanan de cuda ne. Bilêvkirina lêkera “nalîn” di Kurdî de “nenalum” e, di Farisî de “nenalem” e. Lêkera “girîn” di Kurdî de wekî “girîbanum”, di Farisî de “girîbanem” tên bilêvkirin. Meriv di nivîsê de peyv û lêkerên hevpar yên her du zimanan ji hev dernaxe ku bi çî zimanê ne, lê di fonetîkê de têdigihîje ku bi kîjan zimanê ne. Nexwe nabe ku meriv ev peyvên di her du zimanan de hevpar in ên ku di dubeytiyan de derbasdibin her wiha ên ku di nivîsê de heman in lê di fonetîkê de cuda ne, wekî peyvên Farisî bipejirînin. Ev peyvên hevpar peyvên zimanê Îranî ne.⁴⁶⁷

Di dubeytiyan de peyvên mîna “nûm”, “destum”, “reftum” û “dîr” hene ku peyvên zaravayê Lorî ne, ev peyvên di hin çapên dubeytiyan de ber bi Farisî ve hatine guherandin û wekî “nam”, “destem”, “reftem” û “dûr” hatine çapkirin. Di dubeytiyan de rayekên mîna “mîkarû” (dike), “ayû” (te) bi Kurdiya Goranî ne. Her wiha “wac” (axaftin) û “ker” (kirin) jî di hemû zaravayên Kurdî de tên bikaranîn.⁴⁶⁸

Peyvên ku dubeytiyan de derbas dibin ên mîna; dî (dîtin), dard (heyîn) dal (helo), wênewşe (binevş), vêl (gul), ov (av), kirê (kirin), ya (cî), behrûzî (danîn, daynî), te (te), bemed (bêyîn, hatin), vûçadest (vûçan, behnvedan / rawestan), ez (ez), henî (niha), nebî (nebû), dî (dît), ro (roj), cînan (ejînan, ji van re), beraman (girîn), e (ez), tule (tule), rût (rût), beşûm (biçim), waxwerd

⁴⁶⁵ Adak, *b.n.*, r. 114.

⁴⁶⁶ دست : Peyva “dest”ê Pehlewî ye. (Mehmet Kanar Farsça-Türkçe Sözlük, *b.n.*) Peyveke Kurdî ye û ev peyv di zaravayên Kurdî de tê bikaranîn.

⁴⁶⁷ Xeznedar, *b.n.*, r. 192.

⁴⁶⁸ Vladimir Minorisky, “Zîstname-î Baba Tahir”, Parvîz Azkaii, *Baba Tahir-Name, b.n.*, r. 118.

(vexwar), neçîrwan (nêçîrwan), nej (ne jî) û wd. ji aliyê gelên rojavayê Îranê tîn bi kar anîn⁴⁶⁹ ku ew; Soran, Goran, Hewram, Lor û Kurmanc in.

Peyva “dîrem / dêrûm” ku di dubeytiyan de gelek cihan derbas dibe, bi peyva “darem”ê ve ya ku di Farisiya îro de heye, hatiye guhertin.⁴⁷⁰ Di çapên dubeytiyan de ev listik li ser vê peyvê hatiye kirin ku dubeytî bi Farisî ve were nêzîkirin.

Li gorî baweriya me dubeytiyên Baba Tahir bi du awayî guherîne. Ya yekem bi awayekî xwezayî guherîne. Gelê Îranê ji bo ku dubeytiyan baştir fêm bikin, dewsa peyvên Kurdî bi peyvên xwe, ji bo peyvên hevpar jî dewsa fonetîka Kurdî bi fonetîka xwe dubeytî vegotine û nivîsîne. Li pişt koçdawiya Baba Tahir bi sedsalan şûnde, di sedsala 19’an pê de dubeytiyên wî bi awayên ku bi xwezayî guherîne hatine berhevkirin. Ya duyem, dubeytî bi zanetî hatine guherandin ku dubeytiyên Baba Tahir bibin malê wêjeya Farisan.

Van demên dawiyê de her careke ku dubeytî hatine çapkirin, hinek peyvên Kurdiya Lorî bi bal Farisî ve hatine nêzîk kirin û bi yên Farisî ve hatine guhertin. Wekî mînak di çapên cuda de peyvên Kurdiya Lorî yên wekî amête, te, şew, meke, taw, rêje, kirin, mu, witim û wînem bi guherînan bi rêzê ve bûne; amîxte, tû, şeb, mekun, tab, rîzde, kunend, men, goyem û bînem.⁴⁷¹

Ji lokolînên zimanzanan de diyar dibe ku di serdema Medan de zimanê Farisî bêtir di bin bandora zimanê Medan de maye. Navên part û pars ji aliyê Medan ve ji Farisan re hatiye dayîn ku ev her du peyv jî bi Medî ne. Li Îranê li piştî dewlata Kurdan (Med) Faris (Part-Pars) li ser axa dewleta Kurdan bûne dewlet û zimanzanên Medî diyar dikin ku gelek navên Medî ên taybet û wêjeya Medan di dewleta Farisan a ku li pişt dewlata Medan ava bûye de ji aliyê Farisan ve hatine bikaranîn û di nivîstekên wê serdemê ên ku gihîştine roja me ya îro de diyar in. Bingeha wêjeya Farisan Med in.⁴⁷² Ji ber vê rastiye Faris

⁴⁶⁹ Azkaii, *b.n.* r. 104-113.

⁴⁷⁰ *b.n.*, r. 118.

⁴⁷¹ Adak, *b.n.*, r. 115.

⁴⁷² Yilmazel, *b.n.*, r. 131-132.

nikarin bêjin ku peyvên Kurdî û Farisî ên hevpar peyvên Farisî ne. Di heman demê de nikare were gotin ku Baba Tahir Faris e û dubeytiyên wî bi Farisî ne. Lewre bingeha zimanê Îranê Medî ye.

Lêkolînerên mîna Clement Huart, Heron Allen, L. Leszcynski, K. Hadank, E.G. Browne, Edward-Brenton, Elizabeth Curtis, Minorsky û hemû lêkolînerên Kurd û hin lêkolînerên Faris zimanê Baba Tahir wekî Farisî napejirînin. Ji van agahiyên jor ên ku me pêşkeş kirin, derdikeve der ku resenê zimanê helbestên Baba Tahir ne Farisî ye. Tê têgihîştin ku Baba Tahir bi Loriya Kurdî helbestên xwe nivîsandiye û zimanê dubeytiyan jî Kurdî ye.

2.4. DÎ HELBESTÊN WÎ DE SEMBOLÎZM

Di helbesta klasîk de zimanê sembolê hatiye bikaranîn. Helbestvan di helbestê de wateya nepenî di nav ya zahirî de veşartîye. Helbestvanên sofî ji sembolan, zimanekî biraz pêk anîne. Ji vî zimanî re zimanê serdest jî hatiye gotin.⁴⁷³ Helbestvan wekî helbestvanê sofî di helbestên xwe de sembolên wêjeyî, felsefî û tesewifî bi kar aniye.

2.4.1. Sembolên Wêjeyî

2.4.1.1. Sembolên di Derbarê Rûyê Dilberê de

Rû / Dêm

Di helbesta dîwanê de helbestvan rû wekî amûr bi kar tîne û dilbera xwe bi evîndarbûna xwe ve dihesîne. Rû, di tesewifê de xuyabûna yara heq e û wehdetê nîşan dike.⁴⁷⁴ Bi vî awayî sifet û navên Xwedê di rû de tecelî dike, her wiha rû awêneya cemala Xwedê ye, hin caran jî cemal bixwe ye.⁴⁷⁵ Xencî van rû bi Kabeyê ve hatiye şibandin û hin caran jî tewhîdê sembolîze dike. Rû wekî dijberê biskê (zulf) ya ku pirjimariyê sembolîze dike tê bikaranîn.⁴⁷⁶

⁴⁷³ Okuyucu, *b.n.*, r. 75-77.

⁴⁷⁴ Kaplan Üstüner, *Divan Şiirinde Tasavvuf*, weş. Birleşik, Ankara, 2007, r. 264.

⁴⁷⁵ İskender Pala, *Divan Şiiri Sözlüğü*, weş. Kapı, İstanbul, 2010, r. 116.

⁴⁷⁶ M. Nesim Doru, *Melayê Ciziri Felsefi Ve Tasavvufi Görüşleri*, weş. Nûbihar, Stenbol, 2012, r. 98-99.

Baba Tahir di çend dubeytiyên xwe de rû û cemala dilberê xwe tîne ziman. Bi dîtina bi rûyê evînê şa û mest dibe bi her car, lewre bedewiya Xwedê di rû de tecelî kiriye. Hiç tiştek wî şa nake xencî rûyê yarê.

Di vê dubeytiya jêr de ew bi dîtina rûyê evînê xwe şad dibe û dema ku bêdîtina rûyê evînê derbas dibe, ji bo wî dema xemgîniyê ye. Ew wiha tê ziman:

Xwoş an sa 'et ke dîdarê tû wînem

Kemend 'enberînê tarê tû wînem

Newîne xurremî hergiz dilê mû

Meger an dem ke ruxsarê tû wînem

Xweş e ew saet ku rûyê te bibînim

Wan keziyên emberînên te bibînim

Dilê min tu car nabîne şadiyê

*Ji bilî dema ku ez rûyê te dibînim*⁴⁷⁷

Her wiha di xezeleke xwe de rûyê evîna xwe dişibîne tavê. Rûyê evînê dibîne lê nikare xwe bigihîne pê. Ji ber vê yekê xwe ji rûyê evîna xwe mehrûm dibîne. Ew vê helwesta xwe wiha tîne ziman:

Ruwê te tav e, lê ez jê mehrûm im

*Ez pejmûrdeyekî wek nîlûfer im*⁴⁷⁸

Nîşan / Xal

Xala ku li ser rû de girover û piçûk e, di tesewifê de zatê Xwedê,

⁴⁷⁷ Yıldırım, *b.n.*, r. 184.

⁴⁷⁸ Kara, *b.n.*, r. 155.

wehdetê û alema ku nayê zanîn sembolîze dike.⁴⁷⁹ Ji aliyê din ve di helbestên dîwanê de bisk bi tîpa “ج”ê (cîm) ve hatiye şibandin û noqteya di nav de jî wekî “xal” hatiye pejirandin.⁴⁸⁰ Lê belê wateya “xal”ê ya ku pir hatiye bikaranîn têkiliya wê ya noqte û yek ê ye, yanê xal, alema ku pir xuya dike di rastiyê de yek e, nişan dike.⁴⁸¹

Xal, di ser cemalê de nîşana ku herî bi balkêş e. Baba Tahir yara xwe bêxal xeyal nekiriye ku xal neqş û bedewiya cemalê ye. Her wiha xal yekitiyê nîşan dike û ev helwest jî bingeha ramana wî ye. Ew bişew xeyala xala yarê dike û vê xeyala xwe wîha tîne ziman:

Be dil neqşê xeyalut der şebê tar

Xeyalê xeş û xalut der şebê tar

Muje kerdem be gird dîde purçîn

Ke ta wînem cemalut der şebê tar

Bişew di dil de neqşên xeyala te

Şeva tarî xeyalên nîşan û xala te

Min bi tîrên birûyên xwe çav girtin

*Ku di şeva tarî de bibînim cemala te*⁴⁸²

Bisk / Kezî

Di helbesta dîwanê de por, hişê aşiq ji serê aşiq hildide û aşiq perîşan dike. Bi taybet keziyên belavkirî aşiq bende dike.⁴⁸³ Bisk, di tesewifê de di wateya piraniyê de jî tê bikaranîn. Her wiha biska reş tê gotin ku wateya vî

⁴⁷⁹ Üstüner, *b.n.*, r. 276.

⁴⁸⁰ Pala, *b.n.*, r. 184.

⁴⁸¹ Beşir Ayvazoğlu, *Aşk Estetiği*, ç. 3, weş. Ötüken, Stenbol, 1995, r. 106.

⁴⁸² Yıldırım, *b.n.*, r. 131.

⁴⁸³ Pala, *b.n.*, r. 384.

rengê jî tarîbûn û kufr in.⁴⁸⁴ Baba Tahir vê têgehê di helbesteke xwe de wiha tîne ziman:

Muselsel gîsiwan purtab mekere

Xwumarîn nergizan purxab mekere

Hemî xwahî ke mîhr ez mû bebirî

Birîne rûzgar aşitab mekere

Keziyên xwe yên zincîrîn belav meke

Çavên xwe yên nêrgizîn xewar meke

Eger tu dixwazî evîna xwe ji min bibirî

Dema vî tiştî jî dê bê, tu qet lez meke⁴⁸⁵

Baba Tahir di helbestên xwe de por, bêtir wekî kezî û bisk bi kar tîne û kezî û biskan jî wekî bedewiyên yarê dibîne.

Lêv

Peyva lêv, di tesewifê de tê wateyên fenafilah, tunebûn, wehdet, feyza menewî û hesta şabûnê. Wekî peyva Heq û gotina ku bi dîzî tê gotin jî tê bikaranîn.⁴⁸⁶ Di heman demê de ev peyv armanca aşiq ya dawiyê, yanê gihîştinê (wûslat) nîşan dike.⁴⁸⁷

Şew tarest û gurgan mîzenend mêş

Du zulfûnut hemayîl kun bûre pêş

Ez an kuncê lebut bûsî be mû de

⁴⁸⁴ Doru, *b.n.*, r. 103.

⁴⁸⁵ Yıldırım, *b.n.*, r. 260.

⁴⁸⁶ Üstüner, *b.n.*, r. 269.

⁴⁸⁷ Saadet Karaköse, *Divan Şiiri Sevgili Tipindeki Abartıların Simgesel Boyutuna Birkaç Örnek*, Uluslararası Sosyal Araştırmalar Dergisi, b. 3, j. 15, r. 183, vgz. Doru, *b.n.*, r. 107.

Bego: Rahê Xwuda dadem be derwêş⁴⁸⁸

Şev tarî ye, gur dibin ser mîhê êriş

Du zilfên xwe bialîne were pêş

Ji kêleka lêva xwe maçek bide min

Bêje ku min ji bo Xwedê da derwêş

Di vê dubeytiya xwe de daxwaziya gihîştinê dike. Ev meqamê fenafillahê ye ku ew dixwaze bigihîje bi wî meqamê û ret bibe. Her wiha dawiya vê daxwazê pêk were ew ê şad bibe.

Çav û Mijang

Di tesewifê de çav, sembola ku “Xwedê ji her tiştî haydar e” ye. Di heman demê de piraniyê diyar dike û hêza ku mirovan ji menayê durdixe û nêzikê madeyê dike ye.⁴⁸⁹

Baba Tahir, di helbestên xwe de çavan wekî remz bi kar aniye. Di vê dubeytiya wî ya jêr de, çav ji bo aşîq bela ne ku ew nebin dil bedewiya yarê nikare temaşa bike. Çav bedewiya yarê dibîne, temaşa dike û pêre agir bi dil dikeve û dil eş û jan dide. Baba Tahir di helbesteke xwe de helwesta çavan wiha tîne ziman:

Bela bî dil Xwudaya dil bela bî

Gunah çeşman ker û dil muhtela bî

Eger çeşman nekerdî dîdebanî

Çe danistî dilum xwûban kuca bî!

⁴⁸⁸ Yıldırım, *b.n.*, r. 143.

⁴⁸⁹ Üstüner, *b.n.*, r. 286.

Bela ye dil, Xwedêyo bela ye dil

Çav guneh dike, dikşîne belayê dil

Eger çavan nekirana çavnêrî

Çi zanibû ku cihê rindan kuca ye dil⁴⁹⁰

Di dubeytiya jêr de çavên evînê wekî tîr di dilê aşiq dikeve û aşiq birîndar dike. Li gorî vê helwestê, çavên evînê ji bo aşiq stemkar (bêrihm) û kujdar in. Helbestvan derbarê stemkar û kujdariya çavên dilberê wiha tê ziman:

Cure bazî bidum reftom be nexçîr

Siyeh çeşmê bized be balî mû tîr

Birew xafîl meçer der kohsarûn

Her ûn xafîl çere xafîl xwure tîr⁴⁹¹

Ez bazek bûm derketim çûm nêçîrê

Çavreşek li baskê min da derba tîrê

Bêxeber meçêre li kenarên çêrgehan

Kî bêxeber biçêre dê bixwe derba tîrê⁴⁹²

Evîndarî ji hemû tiştên dinê hêztir e. Her wiha nêçîr dilber e. Remz û eşqa dildariyê ye. Helo, şêr û piling, leheng û şahensah in. Bihêz, zîrek û desthilatdar in. Lê helo, şêr û piling li hemberê eşqê, hêza xwe winda dikin û bêhêz dimînin. Ji ber vê ye helbestvan heke helo be, nêçîra wî hemû çivîkên cîhanê bin jî, hêza wî digihîje hemûyan, lê di heman demê de ew heloyê

⁴⁹⁰ Yıldırım, *b.n.*, r. 301.

⁴⁹¹ Xeznedar, *b.n.*, r. 217.

⁴⁹² Yıldırım, *b.n.*, r. 137.

neçîrvanê bihêz dibe nêçîra çavên çavreşeke xweşik, dikeve li ber tîrên mîjangên wê.⁴⁹³

Birû

Birû, di tesewifê de nêzikbûyîna bi Xwedê ve nîşan dike.⁴⁹⁴ Baba Tahir bi tîrên birûyên xwe çavan digire, dike ku nêzikî Xwedê bibe, rûyê Xwedê yê bedew bibîne û wiha pêde diçe:

Be dil neqşê xeyalut der şebê tar

Xeyalê xeç û xalut der şebê tar

Muje kerdem be gird dîde purçîn

Ke ta wînem cemalut der şebê tar

Bi şev di dil de neqşên xeyala te

Şeva tarî xeyalên nîşan û xala te

Min bi tîrên birûyên xwe çav girtin

*Ku di şeva tarî de bibînim cemala te*⁴⁹⁵

2.4.1.2. Sembolên di Derbareyê Meyê de

Di eşqa tesewifî de di helbestan de sembolên şerav û serxweşiyê gelek tîrên bikaranîn. Di wêjeya dîwanê helbestvan şeravê wekî aliyê wî yê madî yan jî aliyê wî yê coşa dil bi kar tîne de zelalî tune.⁴⁹⁶ Di çanda tesewifê de sembola serxweşiyê, li hemberê bedewiya bêserî û bêdawî, wekî ji xwe derbasbûn û halê wecdê nîşan dike. Ji ber vexerina şeravê ji destê dilberê, sofî bicoş dibe û

⁴⁹³ Xeznedar, *b.n.*, r. 217.

⁴⁹⁴ Üstüner, *b.n.*, r. 277.

⁴⁹⁵ Yıldırım, *b.n.*, r. 131.

⁴⁹⁶ Doru, *b.n.*, r. 115.

ber bi meqamên bilind ve bilind dibe.⁴⁹⁷ Sofî ew in ku bê vexwarina şeravê serxweş dibin.⁴⁹⁸

Sofî di berhemên xwe ên derbarê eşqa Îlahî de zimanê sembolê bi kar tînin. Ev zimanê sembolê zimanekî gerdûnî ye, ku sofî hemû jê fêhm dikin. Helbestvan ji bo mikur hatina eşqa xwe, dest avêtiye sembolan, her wiha sembolên derbarê şeravê jî. Helbestvan heke vexwaribe, ji şerava eşqê vexwariye ku vê şeravê wî ji xwe biriye.

Baba Tahir sembolên meyê di dubeytiyên xwe de wiha aniye ziman:

Te ke naxwandeyî 'ilmê semawat

Te ke neburdeyî reh der xerabat

Te ke sûd û ziyane xwud nezanî

Bi yarûn key resî! Heyhat, heyhat!

Tu yê ku te nexwendiyê ilmê asîmanan

Tu yê ku tu neçûyî aliyê meyxaneyan

Tu yê ku tu venaqetîni kar û zirara xwe

Tu dê çawa bigîjî yarê, eman ha eman!⁴⁹⁹

Şeb tarîk û sengistan û mû mest

Qedeş ez dest mû uftad û neşikest

Nîgehdamendeş nîkû nîgehdaşit

⁴⁹⁷ Halid Cemil Muhammed, *Melayê Cizîrî Sevgi ve Güzelliğın Şairi*, r. 207, (Wer.: Ümit Demirhan), weş. Hivda, İstanbul, 2008, vgz. Doru, *b.n.*, r. 115.

⁴⁹⁸ Ethem Cebecioğlu, *Tasavvuf Terimleri ve Deyimleri Sözlüğü*, ç. 2, weş. Anka, İstanbul, 2004, r. 331.

⁴⁹⁹ Yıldırım, *b.n.*, r. 102.

Wer ne, sed qedeḥ neftade bişikest

Şev tarî ye, rê bikevir e, ez jî mest

Qedeḥ ji destê min ket û neşikest

Parêzvanê wê ew pir baş parastiye

Eger na, sed qedeḥ bê ketin şikest⁵⁰⁰

Bade bergîrem û seyrê gulên şum

Kinarê sebze û abê rewan şum

Du se camê xwurrem ba şadigamî

Wa bem mest û be seyrî laleyan şum

Badeyê bigirim biçim seyra gulên

Biçim kenarê şînahî û ava rewan

Du sê qedeḥan vexwim ez bi kêf

Mest bibim û biçim seyra laleyan⁵⁰¹

Mû ke mest ez meyê 'engûr başem

Çira ez nazenînum dûr başem

Mû ke ez ateşit ger newînem

⁵⁰⁰b.n., r. 106.

⁵⁰¹b.n., r. 102.

Çira ez dûdê mîhnet kûr başem

Ez ê ku serxweşê meya tirî me

Çira ji nazenîna xwe dûrketî me?

Ez ê ku ji agirê te ez germ nabim

*Çira ez korê dûyê mîhnetî me?*⁵⁰²

Bê te telwase dîrum bûre bewîn

Zehr der kase dîrum bûre bewîn

Meyim xwûn, girye saqî, nale muṭrib

Musaḥîbî î n se dîrum bûre bewîn

Ez bê te bêhizûr im, were bibîne

Tijî jehr e tasa min, were bibîne

Mey xwîn, saqî giryan, mitrib nalan

*Ev in sê hevalên min, were bibîne*⁵⁰³

2.4.1.3. Sembolên di Derbarê Ajalan de

Hunermendên ku ji aliyê xeyalan ve pêşve çûne, di berhemên xwe de ajalan wekî simbol bi kar anîne. Hin caran xwe şibandine hin ajalan, hin caran jî mirovên din bi ajalan ve şibandine. Di wêjeyê de taybetiyên her ajalî cuda ne û ajal li gorî taybetiyên xwe di berheman de hatine bi kar anîn. Wêjevan

⁵⁰²b.n., r. 223.

⁵⁰³b.n., r. 227.

têkiliyên di navbera evîndaran de wekî sembol bi bikaranîna ajalan anîne ziman.

Ajal bi taybet di helbestên wêjeya klasîk ya rojhilatê de wekî metafor hatine bikaranîn.⁵⁰⁴ Di dubeytiyên Baba Tahir de ajalên wekî: Bilbil, ahû, xezal, baz, şahbaz, şahîn, bûm (kund), huma, mahî (masî), mar, siyehmar (marê reş), bebr / peleng (piling), dupişk, şêr, kebk (kevok / kewa gozel), perwane (minminîk) gur, mîh û wd. cih digirin.

Baba Tahir di helbestên xwe de ajal wekî metafor wiha bi kar anîne:

Gec û wêc em ke kafîr gêc mîbad

Çunan gêc em ke kafîr hem mewînad

Ber îna ayîna kem û ra can û dil dad

Şem'û perwane ra perwêc mîdad

Ez şaş û gêj im ku kafîr gêj dibe

Ew qas gêj im ku dilê kafîr pê diêşe

Yê ku can û dil bi vî awayî daye min

Bu mûm û perwaneyê mil û per dide⁵⁰⁵

Şew tarest û gurgan mîzenend mêş

Du zulfûnut hemayîl kun bûre pêş

Ez an kuncê lebut bûsî be mû de

Bego: Rahê Xwuda dadem be derwêş⁵⁰⁶

⁵⁰⁴ b.n., r. 103.

⁵⁰⁵ b.n., r. 128.

Şev tarî ye, gur dibin ser mîhê êriş

Du zilfên xwe bialîne were pêş

Ji kêleka lêva xwe maçek bide min

Bêje ku min ji bo Xwedê da derwêş

Bilbil

Wêjeya klasîk ji bilbilê cuda nayê ponijîn. Bilbil di helbestên klasîk de lehengekî sereke ye û dewsa aşîq digire. Bilbil bi stranên xwe digirî û dinale. Ew, bêsekin bedewbûna dilbera xwe ji wê re bi stranên evîndariyê pêşkeş dike. Gul û bilbil bêyî hev nayê fikirîn. Di helbestan de gul dewsa dilberê digire. Dengê bilbilê yê xweşik, deng û helbestên aşîq in. Diriyên gulê çawa ku bi kezeba bilbilê re diçe, êşên ku ji dilberê tîn bi dilê aşîq re diçin.⁵⁰⁷

Bilbilê aşîq ê ku bêsekin li ser gulê dixwîne di dubeytiyên Baba Tahir de wiha xuya dike:

Bûre bilbil benalîm ez serê soz

Bûre 'işqê seher ez mû beyamoz

Tû ez behrê gulê penc roze nalî

Mû ez behrê dilaramum şew û roz

Were bilbil em jî binalin ji serê bisoj

Tu were evîna seherê ji min biamoj

Tu ji bo gula xwe pênc rojan dinalî

⁵⁰⁶*b.n.*, r. 143.

⁵⁰⁷ İskender Pala, *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, weş. Kapı, İstanbul, 2013, r. 77.

Lê ez ji bo dilaraya xwe her şev û roj⁵⁰⁸

Xezal / Ahu

Xezal bi taybetiyên xwe ên bedew, çavxweşik û vecinoq bi dilberê ve hatiye şibandin. Ji ber ku çavên xezalê reş û gir in, çavên dilberê bi bîr tînin. Mecnûn dema ku li çolê dikeve, bi xezalan re hevaltiyê dike.⁵⁰⁹ Baba Tahir di dubeytiyeke xwe de xezalê wekî simbol wiha bi kar aniyê:

Xwoşa anan ke her ez ber nedanend

Ne herfî waniwîsend ne bixwanend

Çû Mecnûn rû nehed ender biyaban

Der î n kûhha rewend ahû çeranend

Xwezî bi kesên ku ker ji bar nas nakin

Ne karin herfekê binivîsin ne bixwînin

Mîna Mecnûn berê xwe didin çolê û

Li van çiyayan bi xezalan re diçêrin⁵¹⁰

Minminîk / Perwane

Minminîk, di helbestên klasîk de sembola aşîq e û bi findê re tê bikaranîn. Find maşûq e, perwane jî aşîqê ku ji bo findê kuştina xwe daye ber çavên xwe ye. Helbestvan ji mêj ve li ber findê xebitîne û gava ku helbestên xwe nivîsîne, minminîkên ku derdora findê zivirîne û gelek caran xwe avêtinê findê û şewitîne dîtine. Ew jî vê helwestê di helbestên xwe ên evîniyê de bi kar anîne. Her wiha helbestvan peyama “ji bo evînê ji mirinê re amade ne” dane û bi domana demê re, rewşeke mîstîk jî pêve kirine û ronahiya findê wekî

⁵⁰⁸ Yıldırım, *b.n.*, r. 140.

⁵⁰⁹ Pala, *b.n.*, r. 14.

⁵¹⁰ Yıldırım, *b.n.*, r. 66.

ronahiya wahdetê, minminîk jî wekî derwêşekî ku xwe ji bo vê nûra wahdetê tune kiriye sembolîze kirine. Yanê ronahî eşqa Îlahî ye, perwane jî aşiqê ku di vê eşqê de şewitiye ye.⁵¹¹

Baba Tahir di dubeytiyeke xwe de wiha dibêje:

Çû mû yek sûtedil perwaneyî ne

Be 'alem hemçû mû dîwaneyî ne

Heme marûn û mûrûn lane dîrun

Menê dîwane ra wîraneyî ne

Nîne wek min dilşewitî perwaneyek

Nîne li dinyayê wek min dîwaneyek

Ji bo her mar û mûrî hêlînek heyê

Nîne ji bo minê dîwane wîraneyek⁵¹²

Helbestvan di xezeleke xwe de xwe dişibîne findê û wiha pê de diçe:

Çû şem 'um ger serendazend sed bar

Fîrûzendeter û sûzanter estem

Wekî findê me, sed car bitemirînî jî

Bêtir biçurisim, bêtir bişewitim⁵¹³

Baz / Şahbaz

⁵¹¹ Pala, *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, r. 370.

⁵¹² Yıldırım, *b.n.*, r. 67.

⁵¹³ *b.n.*, r. 67.

Di helbestên klasîk de ji bo porê evîne tê bikaranîn. Porê dilberê mîna baz nêçîrvanek e ku li çivîka dilê aşiq dixê. Bazê ku bi piranî wekî “şehbaz” ango “şahbaz” tê bikaranîn, zengilek di stû de ye, beriya nêçîrê bendek diavêjin qeyda pêyê wî û ew tê girêdan.⁵¹⁴ Baz di baweriya Yarsanê de sembola rêberên wan e. Baba Tahir di dubeytiya jêr de xwe bi baz ve şibandiye û wiha gotiye:

Mû an espîde baz em sîne sûhan

Çiragahî mû bî ser beşnî kûhan

Heme tîxî be sûhan mîkerem tîz

Mû an tîxem ke Yezdan kerde sûhan

Ez ew bazê spî yê dilşewitî me

Warên min ew çiyayên bêserî ne

Tevê şûrên xwe tuj dikim bi hesan

Ez ew şûr im Yezdan ez tûj kirime⁵¹⁵

Cure bazî bûdem refem be nexçîr

Siyadestî zede ber balê mû tîr

Bûre xafil meçer der çeşmesaran

Her an xafil çere xafil xwere tîr

Ez bazek bûm derketim çûm nêçîrê

⁵¹⁴ Pala, *b.n.*, r. 67.

⁵¹⁵ Yıldırım, *b.n.*, r. 239.

Çavreşek li baskê min da derba tîrê

Bêxeber meçêre li kenarên çêrgehan

Kî bêxeber biçêre dê bixwe derba tîrê⁵¹⁶

Margîska Avê / Semender

Margîska avê, ajalekî efsenewî yê ku di agir de naşewite ye. Di her du kêlekên cendekê margîska avê de kîsikê avê hene. Ji ber vê gava ku diavêjin agir di nav agir de cihê ku derbas dibe bi kîsikên xwe yê avê av direşîne, ji wir derbas dibe û bi vî awayî naşewite. Li gorî hin gotinan ew tenê di nav agir de dikaribûye bijî û dema ku ji agir derxistine ew miriye. Ev ajal hêk û têjikên xwe di nav agir de aniye. Kesê ku vê ajalê dîtiye tune.⁵¹⁷ Semender ji ber ku di agir de naşewite “bêdawîbûnê” yanê “bekâ”yê sembol dike.⁵¹⁸ Baba Tahir di helbesta xwe ya jêr de xwe dişibîne semenderê û wiha dibêje:

Semender rewş miyanê ateşê ‘işq

Yekê perekende murxê bêper estem

Mîna semenderekî navenda agirê eşqê de me

Mîna çivîkeke baskşestî li erdê me⁵¹⁹

Tezerv / Semanek

Di helbestên klasîk de piranî dewsa çivîka ku nêçîriya wê tê kirin tê bikaranîn. Bedewbûna semanekê bi nav û deng e. Ji ber xweşikrêçûna wê, hin caran wekî sembola dilberê, hin caran jî di dewsa dilê dildar de tê bikaranîn.⁵²⁰ Baba Tahir xwe şibandîye semanekê û wiha gotiye:

⁵¹⁶ *b.n.*, r. 137.

⁵¹⁷ Pala, *b.n.*, r. 399.

⁵¹⁸ Yıldırım, *b.n.*, r. 69.

⁵¹⁹ *b.n.*, r. 69.

⁵²⁰ Pala, *b.n.*, r. 69.

Mû an miskîn tezerwî bêper estem

Mû an sûzende şem 'ê bêser estem

Ez ew teyrê miskîn û bêbask im

*Ez fîndê serî şewitî yê agir im*⁵²¹

Huma

Huma weki sembola şadî, şans û hêzê tê bikaranîn. Teyreke efsanewî ye. Huma bilind difire, nakeve dafikê û girtina wî dijwar e. Di wêjeya rojhilatê de bextewariyê, dewlet û femandariyê sembol dike. Helbestvan daxwazên ku gihîştina wan dijwar in, armancên xwe, şans û şadiyan bi şibandina humayê anîne ziman. Li gorî baweriyên berê kê bikeve bin sîya baskê vê teyrê, pîroz û bişans dibin. Baskên vê teyrê ji kî re bibe sî, ew kes dibe femandar. Di helbestên klasîk de helbestvan hin caran taybetiyên xwe ên awarte bi sembola humayê tînin ziman.⁵²² Baba Tahir di helbesteke xwe de xwe bi humayê ve şibandiye û wiha gotiye:

Humayûnum ser kûhum weten bî

Seyrê 'alem kerem her ca çemen bî

Ne xûn dîrum ne mûn dîrum ne saman

Demê murden per û balum kefen bî

Teyrê huma me, serê çiyê weten e

Seyra alemê dikim, her cih çemen e

⁵²¹ Yıldırım, *b.n.*, r. 69.

⁵²² H. Dilek Batıslam, Divan Şiirinin Mitolojik Kuşları: Hümâ, Anka ve Simurg, *Türk Kültürü İncelemeleri Dergisi*, j. I, İstanbul, 2002, r. 193.

Ne xaniyê min heye ne mal û milk

*Dema ez mirim per û bask kefen e*⁵²³

2.4.2. Sembolên Felsefî û Tesewifî

Dil

Bêguman Baba Tahir ehlê dil e. Mustafa Nihat derbareyê dil dibêje: “*Dil, bi Kabeyê ve yeksan e, heta ji Kabeyê girîngtir e. Lewra Kabe çêkirina mirov e, dil jî çêkirina Xwedê ye.*”⁵²⁴ Belê him dil him jî Kabe mala Xwedê ne. Lê dil ji aliyê ciyê Xwedê ve ji Kabeyê pîroztir e. Ji ber ku dil li gorî Kabeyê nêzîktirê mirov e. Dil him ji aliyê Xwedê ve hatiye afirandin û him jî cî û warê Xwedê ye. Lê mirov Kabeyê çêkirine û wekî mala Xwedê diyar kirine.

Mirov eşqa xwe di dilê xwe de dijî û dilbera xwe di dilê xwe de dihevine. Baba Tahir gihîştîye asteke wisa ku dilê xwe û dilbera xwe di nav hev de dîtiye û wiha hatiye ziman:

Eger dil dilber e dilber çi nûm e?

Weger dilber dil e ez çi nûm e?

Dil û dilber be hem amête dêrûm

*Nezûnum dil keh e dilber ku dûm e*⁵²⁵

Eger dil dilber be, ma dilber kî ye

Eger dilber dil be, navê dil çi ye

Ez dil û dilber tevlihev dibînim

*Nizanim ku dil kî û dilber kî ye*⁵²⁶

⁵²³ Yıldırım, *b.n.*, r. 317.

⁵²⁴ Karataş, *b.n.*, r. 218.

⁵²⁵ Adak, *b.n.*, r. 116.

⁵²⁶ Kara, *b.n.*, r.13.

Helbestvan di dubeytiyeke xwe de astengiyên li ser rêya dil wiha tîne ziman:

Dila rahî te pir xar û xesek bê

Guzergahî te ber ewcî felek bê

Ger ez destêt ber ayû post ez ten

Be refken take barit kemterek bê⁵²⁷

Dilo riya te b'asteng û kevir e

Ji ser çerxa felekê dibuhure

Ku ji te tê, çerm ji goşt bidirîne

Da ku barê te, hê siviktir bibe⁵²⁸

Dil dixwaze bigihîje dildarê. Lê rêya dil gelek dijwar e. Rêyeke wisa ne ku bi kevir û kuçikan ve tijû ye. Ev kevir û kuçik asteng dibin û nahêlin dil bigihîje armanca xwe. Her wiha astengiyek jî laşê wî ye. Laşê wî mîna kevir û kuçikan bendê pêyê wî ye. Dil li ser çerxa felekê dizivire lê bendê pêyê wî nahêle ku ew xwe biqetîne û xwe bihêsanî bigihîne dildarê.

Helbestvan di dubeytiyeke xwe de wiha dibêje:

Dilit ey sengdil ber ma nesûce

'Eceb nebuwe eger xara nesûce

Bisûcem ta bisûcûnem dilit ra

Der ateş çupî ter تنها nesûce⁵²⁹

⁵²⁷ Xeznedar, *b.n.*, r. 215

⁵²⁸ Kara, *b.n.*, r. 95.

⁵²⁹ Xeznedar, *b.n.*, r. 216.

Dilkevir dilê te bi me nasoje

Em şaş nabin heke kevir nesoje

Disojim da ku dilê te bisojim

Nav agir tenê dara ter nasoje

Ew, dilê dilberê dişibîne wekî kevirê û dilberê wekî dilkevir dinavîne. Dilê dilberê mîna kevir e ku nasoje. Dilê dilberê bêrihm û bêhest e. Heke xwedî rihm û hest bûya, wê demê ji ber sofîna aşiq ew ê jî bisoja. Lê helbestvan dixwaze dilê dilberê bi wî bişewite. Em dibînin ku bi vê helwestê dilê wî û yê dilberê yek in. Dilê dilberê di nav dilê helbestvan de ye ku bi sofîna dilê wî dê dilê dilberê jî bişewite. Ew bi hêvî ye ku dilê dilberê dê bi sofîna dilê wî bişewite.

Baba Tahir ji ber dilê xwe şaş û matmayî ye. Dil, çi ye û çawa ye. Hewl dide lê têngahîje û vê rewşa xwe wiha tîne ziman:

Dilî dêrum ke behbûdeş nemî bû

Neşîhet mîkerom sûdeş nemî bû

Be badeş mîdehem neş mîbered bad

Be ateş nehem dûdeş nemî bû⁵³⁰

Dilê min nizane rehetî çi ye

Nesîhet lê dikim ne xema wî ye

Ez davêm ber bayê, lê ba wî nabe

Davêm agir, nizane şewat çi ye⁵³¹

⁵³⁰ *b.n.*, r. 216.

⁵³¹ *Kara, b.n.*, r. 71.

Helbestvan li ser rêyekê ye, lê hêj baş ji rastî û çawaniya dil têngihîştîye. Ji bo têngihîştina dil, her tim di nav hewldanekê de ye. Di dubeytiyê de dilê wî natebite. Dilê wî her tim lebat e. Her wiha xweser e. Dil ne tê şîret û avêtinê, ne jî tê şewitandinê.

Helbestvan di dibeytiyeke xwe de feryada xwe wiha tîne ziman:

Zî dest dîde û dil her du feryad!

Ke her çi dîde bîned dil kuned yad

Besazem xencerî nîşeş zi pûlad

Zenem ber dîde ta dil gerded azad

Dil û çav: Feryad ji destê her duyan

Çav çi bibînin dil jî bi bîr tîne wan

Ez xencerekê çêbikim serî ji pola be

Di çavan re bikim dil xelas bibe ji wan⁵³²

Helbestvan derbarê dil û çavan wiha agahî dide:

Belaye dil, belaye dil bela ye

Kuneh çeşmûn kirûn dil mubtela ye

Eger çeşmûn newînin rûyî zîba

Çi zunû dil ke xwubûn der kuca ye⁵³³

Bela ye dil, belaye dil, bela ye

⁵³² Yıldırım, *b.n.*, r. 115.

⁵³³ Xeznedar, *b.n.*, r. 22.

Çav guneh dike, dikşîne belayê dil

Eger çavan nekirana çavnêrî

*Çi zanibû ku cihê rindan kuca ye dil*⁵³⁴

Helbestvan di vê helbestê de derbarê têkiliya çav û dil agahî dide. Çav ji bo dil arîşe derdixîne. Hêlîna dildariyê dil e, lê xweşikî û bedewbûn bi rêya çavan di dil de peyda dibe.

Di tevî çîrok û qewlikan de bêguman beşa herî bi kelecana, dema nêhêrîna hezker bi hezkiriya xwe ye. Çirka ku hezker rûyê yarê dibîne, wê gavê guherîneke mezin di derûniya wî de diqewume. Ew dem dema pîroz e ku agir bi dilê evîndar dikeve, aqil û sebra wî pê digire û tîr ji kevanekê derdikeve. Nêrîn e ku tîr ji kevanekê derdixîne û ew tîra ku ji kevanekê derdikeve di dilê hezker de cih dibe, paşê dibe eşq di dilê hezker de şax dide û geş dibe. Ew nêrina ewil e, ku tova eşqê diavêje dilê hezker û ew tov rîçal digire. Di eşqên çîrokî ên wekî Ramîn û Weys, Husrev û Şîrîn, Leyla û Mecnûn, Mem û Zîn de çavên hezker li rûyê yarê dikeve, wê gavê tîr ji kevanekê derdikeve û li singa hezker dikeve. Daxwaziya nêrînê wekî hêzeke Îlahî, bêvîn derdikeve holê û wê gavê çav dinêrin û eşq diqewime. Piştî şerê dil û çavan dest pê dike. Dil ji çavan re dibêje: We min bi vî derdê giran ve aland. We kêfa xwe kir, min jî eşq kirî. Her çî qas we nêrînên xwe zêde kirin, derdê min ew qas pir bûn. Hûn serkeft bûn, ez jî têk çûm. Hûn bûn fermanîdar, ez jî bûm dîl.⁵³⁵

Di çarîna jor de Baba Tahir ji ber êşa dil dike ku çavan tune bike ku ji êşê dil rizgar bike. Ji ber ku Baba Tahir li ku dinêre dilberê dibîne. Li derya û sehayê dinêre dilberê dibîne. Li her ku dinêre ji balebejna dilberê nîşaneyek dibîne, dilê wî jan dide û êşa dilê wî gur dibe. Dixwaze ku bi kêreke serî ji pola, çavan derxe û dil ji êş û xeman azad bike.

Helbestvan bi daxwaza rizgarbûna xwe ya ji dilê xwe, eşqa dilê xwe ya bihêz nîşan dike. Ew eşqeke bêsekin dijî û her tim dinale. Ew qas dinale ku nalîn ji ber wî dinalin. Ew vê rewşa xwe wiha tîne ziman:

⁵³⁴ Yıldırım, *b.n.*, r. 301.

⁵³⁵ İskender Pala, *Kitab-ı Aşk*, weş. Alfa, İstanbul, 2005, r. 12-14.

Xwudawenda mû bêzar um ez î n dil

Şew û rozan der azarum ez î n dil

Zi bes nalîdem ez nalîdenem teng

Zi mû bestan ke bêzarum ez î n dil

Xwedêyo ez bêzar im ji ber vî dilî

Bi şev û roj bi ezar im ji ber vî dilî

Ji ber nalînên min nalîn dinalin

Bistîn ji min, tengezar im ji ber vî dilî⁵³⁶

Dilê Baba Tahir bi xwîn e, ku rondikên wî ji wir tîn û bi xwîn tîn. Ew di vê dubeytiyê de sedemê rondikên xwe ên xwînîn wiha vedibêje:

Dilê nazik mîsalê şîşem bî

Eger ahî keşem endîşem bî:

Sirişkum ger bûd xwûnîn ‘eceb ney

Mû an dar em ke der xwûn rîşem bî

Dilekî min ê pir nazik wek şûşê heye

Ger “ax” bikişînim min endîşe heye:

Rondikên min ger bibin xwîn ne ecêb e

Ez ew dar im ku ji xwînê min rîşe heye⁵³⁷

⁵³⁶ Yıldırım, *b.n.*, r. 149.

⁵³⁷ *b.n.*, r. 335.

Ji ber eşqê dilê helbestvan ew qas hestiyar e, mîna şûşeyan lê hatiye. Ji ber nazikiya dilê xwe ditirse ku ax bikişîne. Helbestvan dibêjin, çavkaniya rondikan dil e. Yanê rondik ji dil dikele û hildiçe. Ji ber vê ye ku rengê rondikan wekî xwînê sor in. Lê Baba Tahir diyar dike ku rondik ji ber ku rîşe û rehên wan di nav xwînê de ne, ji ber vê ew sor in.

Ew di helbesta xwe de xwe dişibîne laleya dîl û ji destê dil, li xwe dike kirasê nîl. Derdê xwe yê ku heta dema Îsrafil dom bike, wiha tîne ziman:

Dila poşem zi destut cameyê nîl

Nehem daxê xemut çûn laleyê ber dîl

Dem ez mîhrut zenem hemçûn demê şubh

Ez în dem ta demê Şûrê Îsrafil

Dilo! Ji destê te li xwe kim kirasê nîl

Kul û derdê te dikişînim wek laleya dîl

Seherê ji evîna te ez demekê lêdim

Ji vê demê heta bigihîje dema Îsrafil⁵³⁸

Dil di jiyana wî de mîna şêrek an jî pilingeke kovî ye. Di navbera wî û dilê wî de her tim şer û ceng e. Ew dixwaze bigihîje dil û ji rastiya dil haydar bibe. Lewre dil di jiyana wî de hêza herî xurt e. Helbestvan rewşa xwe ya bi dilê xwe, wiha eşkere dike:

Meger şêr û pileng î, ey dil ey dil

Be mû dayîm be ceng î, ey dil ey dil

Eger destum resed, Xwûnut berîcem

⁵³⁸b.n., r. 150.

Biwînem ta çi reng î, ey dil ey dil

Meger tu şêr î yan piling î ey dil

Bi min re her tim bi ceng î ey dil

Bigihîjim te ez dê xwîna te birêjim

*Û ez dê bibînim tu çi reng î ey dil*⁵³⁹

Dil, di helebestên wî de lehengekî sereke ye. Ew di gelek helbestên xwe de behsa dil dike. Dil cî û mala eşqê ye. Her wiha xaniyê dilberê ye. Eşq, di wir de diqewime û helbest di wir de peyda dibin. Dil cihê hestan e û ciyekî pêroz e. Ew ji her tiştî nêzîktirîn e, ji bo her mirovî. Dil giyan û hebûna mirov e. Dil sewraxt nabe û natebite. Helbestvan li ber dil neçar e û dixwaze xwîna wî birêje û rengê wî yê rast bibîne. Helbestvan dixwaze xwe ji dil xelas bike û rizgar bike, lê belê ev ne pêkan e. Di helbestê de helbestvan bihêzbûna dilê xwe nîşan dike.

Di helbestên Baba Tahir de diyar e, ku ew bi çav û dilê xwe nikare. Dilê wî gelek serkêş û bihêz e, hundirê wî dişewitîne ku ew di nav helbestên xwe de ji ber wan hawar dike. Di helbestên Baba Tahir de hest ret nabin û bi timî têr nabin. Ji ber vê ye dilê wî bilebat e û bêsekin e. Heta dawiyê lebata dil ret nabe.

Hebûn / Ontolojî

Ontolojî, felsefeya ku rastiya hebûnê rave dike ye. Li gorî baweriyên esmanî her tişt bi daxwaza Xwedê ji tunebûnê çêbûne.

Di dubeytiyên Baba Tahir de ramanên wî yên derbarê hebûnê bi du awayî derdikevin pêşberî me. Di helbestên wî de ravekirina hebûnê him li gorî Qur'anê û him jî li gorî baweriyaya Yarsanê ne. Ew, di vê dubeytiya xwe ya jêr de hebûnê li gorî agahiya Qur'anê wiha rave dike:

⁵³⁹b.n., r. 154.

Şew taret bewînim xahiş ez pey

Şude kewn û mekan ez xilqetey hey

Heqîqet bişnew ez Tahir ke gerdîd

Be yek “kun” xilqetî kewn û mekan tey

Şeva te ya tarî bibînim ev tika ji te ye

Hebûna heyîn û cihan girêdayî bi te ye

Tu vê rastiya han ji Tahir bibihîze:

Afirîna her tiştî bi “bibe! yek ji te ye”⁵⁴⁰

Li gorî dubeytiyê heyîn, cihan û her tişt bi fermana Xwedê ya “bibe” peyda bûne. Di derbarê vê fermanê de di sûreyê Beqere ayeta 117’an de agahî wiha ye: “ *بَدِيعُ السَّمَاوَاتِ وَالْأَرْضِ وَإِذَا قَضَىٰ أَمْرًا فَإِنَّمَا يَقُولُ لَهُ كُنْ فَيَكُونُ*. *Ew e aferînerê erd û asîmanan. Dema ku Ew bivê tişteki biafirîne, tenê jê re dibêje: “Çêbibe!” Vêca ew jî çêdibe”* (2/117).⁵⁴¹ Baba Tahir di dubeytiya xwe de diyar dike ku her tişt bi fermana “bibe” (كُنْ) çêbûye.

Wî di dubeytiyê xwe ya din de hebûnê li gorî baweriya Yarsanê wiha rave kiriye:

Yakem dur dî henî derya nebî, yar

Yakem xwur dî gehan peyda nebî, yar

Men ez an rûz be damanê te jed dest

*De gerdûnet perûpayî nebî, yar*⁵⁴²

⁵⁴⁰ *b.n.*, r. 90-91.

⁵⁴¹ *Qur’ana Pîroz û Meala Wê ya Kurdî, b.n.*, r. 17.

⁵⁴² Yıldırım, *b.n.*, r. 91.

Yekem min durê dît zerya nebû yar

Yekem min tavê dît, cîhan nebû yar

Min ew roj girtiye pêşa te bi dest

Li gerdunê tu zindiyek nebûn yar

Di vê dubeytiyê de diyar dibe ku beriya her tiştî Xwedê hebû. Dur beriya zeryayê, tav jî beriya cîhanê hatine afirandin. Ew diyar dike, ku ji berî hebûna zerya û cîhanê ew hebûye û hingav xwe bi Xwedê ve girêdaye. Ji wê roja ezel girtiye pêşa afirîner û bernedaye heta vê rojê. Têgeh û agahiyên vê helbestê di baweriya Yarsanê de tînin.

Di baweriya Yarsanê de beriya her tiştî “Ya” hebû û bi daxwaza “Ya” pêşiyê “dur” çêbû. Dema ku ew dura sipî ji aliyê “Ya” ve hat afirandin ne erd hebû ne jî esman, ne heyv hebû ne jî tav, ne jî ferîşte hebûn. Her wiha gotin jî tunebû, tenê mîna erşê li ser avê durek hebû.⁵⁴³

Di baweriya Yarsanê de berê tu tiştek tune bû. Puxteya Îlahî di şiklê “Ya” de bû û di nav durekî de bû. Dur di nav qalikekî zeryayê de û qalikê zeryayê jî di nav zeryaya ezelî de bû. Li gorî kozmolojiya Yarsanê ji aliyê “Ya” pêşiyê dinyaya manevî paşê jî ya madî hate afirandin. “Ya” di pêngava yekem de ferîşteya yekem ya bi navê “Cebraîl” ji puxteya xwe afirand. Paşê ji ber daxwaza Cebraîl ji puxteya xwe ferîşteyên din Mikaîl, Îsrafil, Azraîl, Ruçiyar, Aywat û Marmûz afirandin. Mikaîl ji nefesa “Ya” hate afirandin, Îsrafil ji devê “Ya” derket û Azraîl jî ji hêrsa “Ya” hate afirandin. Ruçiyar û Aywat ji ronahiya (nûra) çavên “Ya” hatine afirandin. Ferîşteya heftem ya mê ya bi navê Marmûz ji xwêdana “Ya” hate afirandin. Bi Cebraîl ev heft ferîşte bi navê “Heften” yanê heft beden an jî heft ferîşte hatine naskirin. Wê gavê bi

⁵⁴³*b.n.*, r. 90-91.

daxwaza Heften “Puxtêya Îlahî” di nav durê de wekî “Havenkar” derkete holê.⁵⁴⁴

Bi daxwazên Heften afirandinên din pêk hatin. Ev afirandin jî ji durê ku dur Hevenkar bixwe bû peyda bûn. Beriyê dur şewitî, keliya û encamê de made ji rih veqetiya. Ji duyê ku derkete holê esman hatin afirandin û esman bûn neh rêgeh û heft çerx. Ji tîrêjên agir û alavan, stêrk û bircên esmanî hatin afirandin. Ji agirên ku pêketin, hilm bilind bûn û ewrên esmanan ji wan çê bûn. Ji madeya ku ji durê derket dinya hat afirandin. Havenkar carek din li durê nihêrî, dur pê ket şewitî û keliya. Di tê de cewherê derket û ji wî cewherê puxte peyda bû. Ji wî cewherî parçe veqetiyên û ji wan parçeyan heyînên biçirûsk hatin afirandin. Ji duyê dura ku şewitî îblîs, şeytan, cin, û puxtêyên xerab hatin afirandin. Di hin çavkaniyên Yarsan de agahiyên cuda hebin jî pêvajoya afirandinê bi timî heşt roj dikişîne. Pêşiyê Cebraîl, rojtira paşîn ferîştêyên din (Heften), şeş rojên din her du alem bi her tiştên di nav wan de ne, hatine afirandin. Di Newroza roja nehem de tebeqeya herî pîroz çêbû. Ku li ser vê tebeqeyê textê ku Havenkar li ser rûdinê heye.⁵⁴⁵

Heften ji nû ve ji Havenkar daxwaz kirin ku mîrovek biafirîne ku ev daxwaza wan ji aliyê Havenkar hate pejirandin. Havenkar xweliya zer ji Mikail xwast ku bîne, bi wî xweliyê Adem biafirîne. Lê xweliya zer nexwast were, lewre zarokên Adem paşê dê bibûna gunehkar. Dîsa jî ji aliyê Îsrafil hate anîn. Paşê bi daxwaza Havenkar, Azraîl xweliya reş anî. Havenkar, xweliya zer û reş tevlihev kir û ji sûretê xwe bedena Adem şekiland. Paşê Adem bû xwediyê xwezaya dualî (dualîst). Paşê xweliya zer û ya reş ji zarokên Adem ji hevdu qetiyên. Bi vî awayî tecelîkirina (hulûl) ferîşteyan di bedenên mirovên ji xweliya zer hatibûn afirandin de hat pêkankirin. Yarsan têkiliya rihê mirov bi puxtêya Îlahî ve dipejirîne. Heften daxwaz kirin ku Havenkar di bedena Adem de xuya bike. Lê belê ji ber ku puxtêya Îlahî mîna agir bû, laşê madî dê bişewitiya. Hat pejirandin ku rih bikeve laşê Adem, lê rih vîna nepejirand. Paşê

⁵⁴⁴ M. Reza Hamzeh'ee, *Yarsan (Ehl-i Hak) Bir Kürt Cemaati Üzerine Sosyolojik Tarihsel ve Dini-Tarihsel Bir İnceleme*, (Wer.: Ergin Öpengin), weş. Avesta, İstanbul, 2009, r. 127-129.

⁵⁴⁵ Hamzeh'ee, *b.n.*, r. 128-130.

Heften kete dilê Adem û muzîkeke razdar lêxist. Rih bi vê muzîkê kete transê û kete laşê Adem. Piştî Heften ji dilê Adem derket û rih di wir de mehkûm ma. Bi vî awayî Adem zîndî bû û ji parxanekî Adem yên çepê Hewa / Hava hate afirandin. Di hin metnên Yarsan de dewsa navên Adem û Hewa mêr û jina yekem bi navê “Maşyeh” û “Maşyaneh” tên navandin. Li gorî çîrokên Yarsan ên derbarê hebûn û afirandinê, heyînên baş û xerab hemû ji yek çavkaniyê ne, yanê ji Havenkar bixwe peyda bûne.⁵⁴⁶

Helbestvan di vê dubeytiya xwe de derbarê afirandina xwe agahiyek din dide:

Mi ra ne ser ne saman aferîdend

Perîşan em, perîşan aferîdend

Perîşanxaîran reftend der xak

Mi ra ez xakê îşan aferîdend

Xwedê ez ne ser ne maldar afirandim

Perîşan im, wî ez perîşan afirandim

Dilperîşan hemî tev de ketin bin axê

Ez ji axa wan dilperîşanan afirandim⁵⁴⁷

Helbestvan di vê dubeytiyê de diyar dike ku Xwedê çawa dil kiriye bi wî awayî wî afirandiye. Her wiha wî ji xweliya dilperîşanan afirandiye ku ew mirovan mirovên evîndarên Xwedê ne.

Di dubeytiyên Baba Tahir de derbarê hebûn û afirandinê, agahiyên hebûn û afirandina baweriyên Îslam û Yarsanê tên dîtin.

⁵⁴⁶ *b.n.*, r. 130-131.

⁵⁴⁷ Yıldırım, *b.n.*, r. 130.

Yekitiya Baweriyān

Li gorî vê ramanê bawerî hemû yek in, lewre çavkaniya baweriyān Xwedê ye. Arifên ku baweriyān hemû yek dibînin, xwedî nêrîneke berfireh in. Li gorî wan armanca tevî baweriyān û ya hebûnê Xwedê ye. Her tişt ji Xwedê û bi daxwaziya Xwedê peyda bûne û dê dîsa bi Xwedê ve bizivirin.

Nêrîna ku armanca tevî baweriyān Xwedê ye, şer û dewên di navbera mirovan de hene ditemirîne û ji holê radike. Ev raman wekî ramana Êbn ‘Erebî tê zanîn lê Baba Tahirê ku beriya wî jiyaye vê ramanê wiha aniye ziman:⁵⁴⁸

Xwoşa anûn ke ez pa ser nedûnend

Miyanî şu'le xişk û ter nedûnend

Kenişt û Ke'be û butxane û dêr

Serayî xalî ez dilber nedûnend

Bijî yên ku serî ji pê cuda nakin

Wekî şewatê hişk û ter cuda nakin

Hewra û Ke'be û pûtxane û dêr:

*Bi serayeke bê dilber bawer nakin*⁵⁴⁹

Eger mestanî mestîm ez te eymûn

Weger bê pa û destîm ez te eymûn

Eger Gewrîm û Tersav û Musulmûn

*Be her millet ke hestîm ez te eymûn*⁵⁵⁰

⁵⁴⁸b.n., r. 88.

⁵⁴⁹b.n., r. 119.

Eger mestanê mest im, îman ji te

Eger bê pê û dest im, îman ji te

Eger Zerdeştî, Diyan û Misilman

Ji kîjan miletî bin jî îman ji te

Çawa ku armanca hemû baweriyên Xwedê ye, di heman demê de armanca Baba Tahir jî Xwedê ye. Ew diyar dike ku ji kîjan baweriyê û miletî bin jî îman ji Xwedê ye û armanca Xwedê ye. Ji ber ku hemû bawerî û bawermend jî heman Xwedayê hezdikin, ew cudatî naxe di navbera bawerî û bawermendên cuda. Ew li perestgehên Zerdeşt, Mûsewî, Xirîstiyên û Misilmanan dinêre, di hemûyan de jî heman Xwedayê dibîne. Bi vî awayî baweriyên yek dibîne.

Her tişt di destê kirdigar de ye. Ew tiştên ku hatiye çêkirin wêne û parçeyek ji Kirdigar in. Ji ber ku her tişt ji Kirdigar in, em nikarin ku tiştêk ji Kirdigar cihê bibînin.⁵⁵¹ Ji ber vê yekê helbestvan bi awayekî teqezî dibêje:

Xurem anan ke ez ten can nedanend

Zi canan can, zi can canan nedanend

Be derdeş xwû keren salan û mahan

Be derdê xîştên dermanî nedanend

Bijîn ew kesên ku rih ji bedenê naqetînin

Can ji dilberê, dilberê ji can venaqetînin

Bi mehan û salan hînê derdkişandinê dibin

Ji bo derdên xwe tu dermanekî nabînin⁵⁵²

⁵⁵⁰ Xeznedar, *b.n.*, r. 211.

⁵⁵¹ *b.n.*, r. 211.

Ramana yekitiya baweriyân ji aliyê sofîyên mîna Mansûrê Hellac (kd. 921), Baba Tahir (kd. 1010), Îbn ‘Erebî (kd. 1240) û hin sofîyên din hatiye parastin. Li gorî van sofîyan bawerî ji aliyê bingehê ve hemû yek in. Sedemê çavkaniya cudatiya baweriyân ev e ku hemû li ser heman rastiyê xwediyê nêrînên cuda ne. Hemû endamên baweriyân heman tiştî dixwazin. Ji ber vê yekê hemû li ser heq in. Cudatiya wan ji navê wan û ji şêweyê wan in. Baba Tahir cudatî nedaniye navbera baweriyên Zerduştî, Mûsewî, Xiristiyânî û Îsalmiyetê. Li gorî wî bawerî bi giştî Xwedayî ne. Mansûrê Hellac gotinên Hz. Mûsa û yê Fîravûn wekî gotinên heq pejirandiye û vê ramana xwe bi mijara qederê ve rave kiriye. Li gorî Hellac, mirov ne li ser baweriyên ku daxwaz kirine hatine afirandin, ji aliyê Xwedê ve ji bo mirov kîjan bawerî hatiye kifş kirin, mirov li ser wê baweriyê afirîye.⁵⁵³

Tobe

Wateya vê peyvê vegeerîn e. Tobe, vegeerîna ji gunehan e. Tobe heman demê de hişyarbûnek e. Bi kurtasî di mirov de destpêka şoreşa rihî ye û di vê şoreşê de merhaleya herî girîng e.⁵⁵⁴ Tobe, yekem ji meqam û menzîlên tesewifê ye, her wiha ji bo rêwiyên Xwedê meqamê destpêkê ye. Tobe şiyarbûnek e û têkoşîna bi nefsê bi tobeyê dest pê dike.⁵⁵⁵

Di Qur’anê de wiha tê gotin: “*Û da ku hûn ji Xwedayê xwe daxwaza lêborîna (gunehên) xwe bikin, paşê bi bal wî ve tobe bikin.*” (Sûreyê Hûd 11/3).⁵⁵⁶

Tobe, ji gunehan vegeerîn û ber bi Xwedê ve beralîbûn e. Li gorî hemû dînên semawî mirov him aliyê başiyê û him jî aliyê nebaşiyê ve beralî dibe. Hz. Adem xeletî kiriye lê pey re tobe kiriye û ji aliyê Xwedayê rehîm ve hatiye bexişandin. Tobe vegeerîneke menewî ye. Bi vê vegeerînê rêyek kifş dibe û gunehkar berê xwe bi timî dide Xwedê. Sofî di derbarê gunehan de derveyî

⁵⁵² Yıldırım, *b.n.*, r. 117.

⁵⁵³ Süleyman Uludağ, “Hallac-ı Mansur”, *DİA*, weş. TDV., İstanbul, 1997, XV, r. 380.

⁵⁵⁴ Osman Türer, *Ana Hatlarıyla Tasavvuf Tarihi*, ç. 2, weş. Ataç, 2013, İstanbul, r. 53.

⁵⁵⁵ Süleyman Uludağ, “Tövbe”, *DİA*, weş. TDV., İstanbul, 2012, XXXXI, r. 285.

⁵⁵⁶ *Qur’ana Pîroz û Meala Wê ya Kurdî*, *b.n.*, r. 220.

gunehên şerî difikirin. Di berhemên tesewifî de derbarê cureyên tobeyê gelek şîrove û nirxandin hene.⁵⁵⁷

Arifên ehlê rastiye di nav halekî wisa de dijîn ku di vî halî de xêncî Xwedê û teceliyên Xwedê hîç tiştek nabînin. Di vê helwestê de bixwe di halê fenayê de ne û hebûna wan li holê tune ye. Li cem wan, xwe wekî hebûnê dîtî guneh e.⁵⁵⁸

Baba Tahir di hin helbestên xwe de tobeyê tîne ziman. Em dubeytiya jêr dikarin wekî mînak bidin:

Kûder ne cihê te ye, ey yar eywah

Ku ez birêvim biçim wir, bo penah

Her der cihê te ye, ez korê batin

Min xelet got xelet, estexfirullah⁵⁵⁹

Di vê dubeytiya jor de Baba Tahir pêşiyê dikeve di nav helwesteke bi guman û şikê de. Lê digere, lê derek nabîne ku li wir Xwedê tunebe. Li her derî û her cihê Xwedê dibîne. Her wiha dizane ku Xwedê ne tenê li derekî ye ku ew li her derî ye. Şîyar dibe liserxwe ve tê û poşman dibe. Pey re tobe dike û bexişandina xwe dixwaze.

Feqîr

Feqîr, peyvekî Erebi ye. Ev pey ji peyva “feqr”ê tê. Pirjimariya vê peyvê “fiqare” ye. Ew kesên ku di nav tengasiya madî û menewî de ne re feqîr tê gotin. Feqîr ew kesê ku piştî xwe daye tiştên dinê yê badihewa û ketiye li pey rastiye ye. Kesê feqîr li pey rastiya hebûna xwe ye.⁵⁶⁰ Ji aliyê wateya îstilahî ve feqr, mirov ji hebûna xwe ya mewhûm xwe xelazbike û xwe bigihîne fenafîlahê ye. Mutesewif feqrê wekî madî û menewî kirine du beşa û li ser

⁵⁵⁷ Bekir Topaloğlu, “Tövbe”, *DİA*, weş. TDV., İstanbul, 2012, XXXXI, r. 279-280.

⁵⁵⁸ Süleyman Uludağ, “Tövbe”, *DİA*, weş. TDV., İstanbul, 2012, XXXXI, r. 285.

⁵⁵⁹ Kara, *b.n.*, r. 85.

⁵⁶⁰ D. B. Macdonald, “Fakir”, *İslam Ansiklopedisi*, weş. MEB, Eskişehir, 1997, IV, r. 449.

feqrê gelek rawestiyane. Her wiha hin sofî feqrê wekî meqamê herî bilind pejirandine. Xwedîbûna mal û milk ji bo feqra ku mutesewifan nîşan kiriye re ne asteng e. Feqra ku sofîyan nîşan dane ne ya dinyayî ye, ya menewî ye.⁵⁶¹

Ji kesên mitesewif re fuqara jî tê gotin. Lewre ew xwe ji mal û milkan rizgar kirine, yanê di hundirê xwe de hezkirina mal û milk nehîştine. Ew di tunebûnê de gilî û gazince nakin, dema ku tiştek bidestxin wê tiştê bi kesên din re parvedikin û bi vî awayî dewsa nefsa xwe kesên din çêtir dibînin.⁵⁶²

Baba Tahir di dubeytiya jêr de feqîrbûna xwe tîne ziman. Wekî feqîr jiyanekî zor û zehmet dikişîne. Her wiha ji vê jiyanê gilî û gazince nake. Her çi qas di nav dijwariyeke giran de be û bargiran be jî dîsa jî vê rewşê ji bo xwe kêr dibîne, xwe layiqê xwediyê xwe nabîne. Ew li hemberê xwediyê xwe, xwe di nav şermeke giran de dibîne, fedî dike û wiha pê de diçe:

Mû ke çûn uştur em qani' be xar em

Xurakum xar û xerwarî be bar em

Ez in xercê qelîl û barê sengîn

Henuz ez rûyê malik şermisar em

Ez mîna deveyê me, qayil im bi dirîkan

Xwarina min dirîk, wek kerê bin baran

Ez digel vê bexşîşa hindik û barê giran

*Li ber xwediyê xwe şerma min pir giran*⁵⁶³

Feqr ew e ku meriv tu hebûnê an jî tiştêkî ji xwe nizanibe û her tiştî ji Xwedê bizanibe ye. Di heman demê de mirov, xwe, hal û emelên xwe ji

⁵⁶¹ İsa Çelik, "Tasavufî Bir Terim Olarak Fakr", *Ekev Akademik Dergisi*, b. III, j: 191, Payîz 2001, r. 2.

⁵⁶² Cebecioğlu, *b.n.*, r. 204.

⁵⁶³ Yıldırım, *b.n.*, r. 172.

Xwedê bizanibe ye. Mirovê feqîr xwe bi mal û milkên dinê girênade, xwe ji nefsê rizgar dike û dizane ku her tişt ji Xwedê ne û bi dilê Xwedê ne.⁵⁶⁴ Sofî jiyana Feqîriyê wekî şeref û serbilindî pajirandine. Bi fikra erd, mal û milk ên Xwedê ne tevgeriyane û ji xeynî Xwedê hewcedariya tu kesî nekirine.⁵⁶⁵

Peyva feqr û feqîr di Qur'anê de wiha derbas dibe: “*Gelî mirovan! hûn feqîrên hewceyî Xwedê ne û yê xenîy yê hemîd her ew e.*” (Sûreyê Fatir, 35/15).⁵⁶⁶ Pêxember feqr û feqîrbûnê pesandine. Sofî bi giştî feqrê pesandine û gotine: Kesê ku hezkirina mal û milkên dinê ji dilê xwe derxistiye feqîr e. Li ser vê mijarê gelek bawerî yên mîna Hîndû, Manî, Xirîstiyân wd. rawestiyane û her wiha ramana “bilindbûna rih bi feqîrbûnê ye” parastine. Sofiyên yekem feqra ku xizaniyê nîşan dike û feqra ku tê wateya hewcadariya bi Xwedê, gihandine hevdu û vê helwestê wekî armanc û şêweyê jiyana xwe pejirandine. Li gorî wan feqr (derwêşî) rêya ku diçe Xwedê ye, feqîr jî (derwêş) rêwiye vê rêyê ye.⁵⁶⁷

Baba Tahir di dubeytiyeke xwe de derbarê rewşên feqîr û dewlemendên ku di goristanê de ne agahî dide. Ew diyar dike ku di gorê de li ser wan xêncî kefenek tu tişt tune, her wiha bi vê helwestê ji aliyê madî ve wekheviya her duyan wiha tîne ziman:

Be gûristan guzer kerdem kem û bîş

Bedîdem halê dewlemend û derwîş

Ne derwîşî be xakî bêkefen mand

Ne dewlemend bird ez yek kefen bîş

⁵⁶⁴ Selçuk Eraydın, *Tasavvuf ve Tarikatlar*, ç. 4, weş. İfav, Stenbol, 1994, r. 182-183.

⁵⁶⁵ Kadir Özköse, “Zühd ve Sufilerin Zühde Yükledikleri Anlam: Tasavvufta Dünyevileşmeye Tepkisel Yaklaşım”, *Cumhuriyet Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi*, VI/1, Sivas, 2002, r. 183.

⁵⁶⁶ *Qur'ana Pîroz û Meala Wê ya Kurdî*, b.n., r. 435.

⁵⁶⁷ Süleyman Uludağ, “Baba Tahir”, *DİA.*, weş. TDV., İstanbul, 2012, IV, r. 132-133.

Di ber goristanê re buhurîm kê m zêde

Min halê dewlemend û feqîran dît tê de

Ne derwîş bê kefen ketibûn bin axê

Ne dewlemend biribû ji kefenek pê de⁵⁶⁸

Ew diyar dike ku derwêşê feqîr ê bê mal û milk di gorê de bê kefen nemaye, lê ew dewlemendê xwedî mal û milk di gorê de bê mal û milk bi yek kefenî maye. Dewlemendiya mal û milk ya dinê ne dewlemendiya rast e dewlemendên rast feqîr û derwêş in.

Raz

Cihê razê di dil de ye. Ji raza sofîyan, kesên ji rêzê nikarin fê m bikin. Divê raza eşqê were veşartin ku aşiq vê eşqa xwe baş bi rê ve biherin. Her wiha eşq gencîneyeke gelek bi nirx e ku divê veşartî be. Eşkerekirina eşqê ji bo aşiq xeter e. Mirovên ku ji eşqa Yezdanî fê m bikin gelek kê m in ku divê ev eşq neyê eşkerekirin. Ev kesên ku nikarin vê helwestê fê mbikin, ew her tişt bi suretên tiştan dinirxînin, nikarin li ser wateyên wan ên derûnî hû r bibin û fê m bikin. Ji ber vê yekê eşq ji aliyê pî r û arifan ve hatiye veşartin. Lê belê ev eşqa di dil û hinavên van arifan de hin caran cih nebû ye, arif mecbû r mane eşqên xwe bi rê ya remzan wekî helbest vegotine.

Pî rê Hemedanî di nav eşqeke payebilind de bilind bû ye û eşqa wî derketiye lûtkeyê. Neçar maye ji dilbera xwe re ya dilê xwe gotiye, lê vê gotinê bi nîşan û sembolan bi awayekî xweşik aniye ziman. Ew di vê dubeytiya xwe ya jê r de derbarê vê mijarê bi şê weyeke watedar wiha hatiye ziman:

Zenem ez behrê yarî gê c û wê c î

Şewanum aw ez çê şman berê c î

Her ke razê dileş waçe be merdum

⁵⁶⁸ Yıldırım, b.n., r. 389.

Ya ez dîwanegî bû ya ez gécî

Serê min ji ber yarê gêj û mêj e

Bi şevan av ji çavên min dirêje

Kî ku razên dilê xwe bibêje xelkê

*Ew ya mirovekî dîn e yan gêj e*⁵⁶⁹

Tê dîtin ku Babayê Hemedanî hişyar e ku ew diyar dike, aşîqê Xwedê divê razên xwe li ber her kesî eşkere nekin. Her wiha Mansûrê Hellac vê raza xwe eşkere kir û got “Enel Heq.” Bayezidê Bîstamî jî wiha gotiye: “Di bin kincê (cube) min de xêncî Xwedê tiştê tune.” Ev gotinên wehdetê wicûdê ji kesên ku zimanê sofîyan nizanin re kufîr û xerab in. Hellac van gotinên xwe di helwesta serxweşiya eşqê de gotiye, lê ev gotinên wî bûye hinceta kuştina wî. Hin sofî û arifên ku razên xwe eşkere kirine bi vî awayî hatine nefkîrin û kuştin. Sofî di halê sekrê de van gotinan gotine û hatiye diyarkirin ku ev gotinên ku di halê sekrê de ji aliyê sofîyan ve hatine gotin tên veşartin û nayên eşkerekirin.⁵⁷⁰

Baba Tahir di dubeytiyeke xwe ya din de derbarê vê mijarê agahiyek wiha dide:

Durrê eşkum be daman rîte ewla

Xwûnê dilum ez çeşman rîte ewla

Be kes herfî zi cewrut wa newacem

Ke herfê cewrê pinhan rîte ewla

⁵⁶⁹ Yıldırım, *b.n.*, r. 356.

⁵⁷⁰ “Tasavvufa Varlık-Sufizm ve İnsan”, [<http://sufizmveinsan.com/konuk/varlik.html>], Gihîn:18 Cotmeh 2015

Rondik biherikin mîna duran çêtir e

Xwîna dilê min bê ji çavan çêtir e

Ez zilma ku te kiriye nabêjim kesî

Lewra eger sir nebin ‘eyan çêtir e⁵⁷¹

Ew bal dikişîne li ser raza eşqê. Bi kesên nezan û nekemilî re hewcetiya parvekirina razê nabîne. Ew ji mirina xwe û kuştina xwe natirse. Her wiha mirin ji bo wî rizgarbûna ji xem û derdan e, mirin gihîştin e. Ji ber van yekan ew wêrebûn û hezkirina xwe ya ji mirinê wîha tîne ziman:

Xemê derdê dilê mû bêhîsab e

Xwuda zûnê ke murxê dil kebab e

Benazim dest û bazûy tû cellad

Eger qetlum kerî wellahî sewab e

Xema derd di dilê min de bêhesab e

Xwedê dizane çûka dilê min kebab e

Ramûsim dest û bazûyên te cellad!

Eger tu min bikujî wellahî sewab e⁵⁷²

Gihîştin / Wesil

Ev peyv, peyvekî Erebi ye û wateya wê gihîştin e. Muhyîdînê ‘Erebî ji bo gihîştinê dibêje: “Bi destxistina tiştê ku wînda bibû û ya nedihate dîtin e.” Hz. Pexember di şeva Mî’racê de bi qasî “Ke’be Kavseyn” gihîştinê bi dest

⁵⁷¹ Yıldırım, *b.n.*, r. 355.

⁵⁷² *b.n.*, r. 276.

xistiye.⁵⁷³ Ev peyv di helbestên dîwanê de wekî wîsal, wesil, wusl tê bikaranîn û ev peyv hemwate ne. Di helbestên dîwanê de armanca aşiq bi evîna xwe ve xwegihandin e. Di tesewifê de jî armanc, xwegihandina Xwedê ye û di hebûna Xwedê de bi yekitiyê ve gihîştin e. Hinceta nalîn û girîna aşiq ji bo gihîştinê ye. Ew ji evîna xwe dûr û cuda ye. Dawiya cudatîyê gihîştin e. Aşiq bi ponijandina gihîştinê tengasiyên cudatîyê dikişîne. Ji bo gihîştinê her tim daxwazî û lavayî ji yara xwe dike. Gava ku dawiya van daxwazî û lavayîyan gihîştin peyda nabe wê gavê aşiq berxwe dikeve, xemgîn dibe û dilê aşiq her diçe disoje, lê belê dilê aşiq her çi qas bisoje jî, ji armanca gihîştinê dûr nakeve.⁵⁷⁴

Baba Tahir mîna helbestvanên aşiq bi hêviya gihîştinê her tim dişewite disoje û wiha dibêje:

Dilum bê weslê tû şadî mebînad

Be xeyr ez mîhnet azadî mebînad

Xerab abad dilê bê meqdemê tû

Îlahî hergiz azadî mebînad

Dilê min bê wesla te şad nabe

Ji bilî derdan bi tişteki azad nabe

Dilê ku tu teşrîf nekî xerab e

*Ya Rebî ew dil tu car azad nabe*⁵⁷⁵

Tenê mîhnetkeşî dîrum Xudaya

⁵⁷³ Cebecioğlu, *b.n.*, r. 703.

⁵⁷⁴ Turan, *b.n.*, r. 634-635.

⁵⁷⁵ Yıldırım, *b.n.*, r. 129.

Dilê hesretkeşî dîrum Xudaya

Zi şoqê mesken û dadê xerîbî

Be sîne ateşî dîrum Xudaya

Laşekî min ê derdkêş heye Xwedêyo

Dilekî min ê hesretkêş heye Xwedêyo

Ji ber xerîbiyê bêrîkirina yar û war

Sîngêkî min ê agirkêş heye Xwedêyo⁵⁷⁶

Bûd derdê mû dermûnum ez dûst

Bûd weşlê mû û hicrûnum ez dûst

Eger qesabum ez ten wakirû pûst

Cuda hergiz negerde cûnum ez dûst

Ji yarê ye hem derdê min hem derman

Ji wê ye hem gihaştina min hem hîcran

Eger qesab postê min cuda bike ji laş

Dîsa jî dê veneqete ji yara xwe ev can⁵⁷⁷

Sedemê xema wî xerîbî û cudamayîna wî ya ji yarê ye. Ew xema xwe ya ji yarê bi awayekî xweşik û xwerû wiha tîne ziman:

⁵⁷⁶b.n., r. 100.

⁵⁷⁷b.n., r. 113.

Misilmanan se derd amed be yekbar

Xerîbî û esîrî û xemê yar

Xerîbî û esîrî sehl ayû

Xemmê yar muşkil e ta çûn şûdikar

Misilman! Sê derdê min derketin holê

Yek xerîbî, yek esîrî, yek jî derdê yarê

Xerîbî û esîrî jo bo min hêsan bûn

Lê derdekî bêderman e derdê yarê⁵⁷⁸

Derdê eşqê ji aliyê gelek arif û helbestvanan bi awayekî cihêreng hatiye ziman, lê belê derdê wan yek in.

Di vê dinê de û heta roja mahşerê gihîştin ne pêkan e. Mirov her çi qas diçe xwe pêre nagihîne. Ev helwest dişibe mîna mirov û sîha wî. Mirov her diçe sîha wî li pey e. Lê belê sîh dike nake nikare bigihîje mirov. Baba Tahir derbarê vê mijarê helwesta xwe wiha bilêv dike:

Dila poşem zi destut cameyê nîl

Nehem daxê xemut çûn laleyê ber dîl

Dem ez mîhrut zenem hemçûn demê subh

Ez în dem ta demê Şûrê Îsrafil

Dilo! Ji destê te li xwe kim kirasê nîl

Kul û derdê te dikişînim wek laleya dîl

⁵⁷⁸b.n., r. 133.

Seherê ji evîna te ez demekê lêdim

Ji vê demê heta bigihîje dema Îsrafil⁵⁷⁹

Dilê wî her tim bi dilberê re ye. Her tim xemgîn e, lê carek rûyê dilberê bibîne têra şad bûna wî ye. Baba Tahirê xemgîn, mezinahiya derdê dilê xwe wiha tîne ziman:

Bê te yek dem dilim xûrrem nemûne

Weger rûyî te wînem xem nemûne

Eger derdî dilim qîsmet nemûyen

Dilî bê derd der 'alem nemûne⁵⁸⁰

Bê te yek dem dilê min kêfxweş nîne

Eger rûyê te bibînim xem namîne

Eger derdê dilê min bê parvekirin

Li dinyayê hîç dilekî bêderd namîne⁵⁸¹

Li cem Helbestvan derd mîna dûrbûnê ye, nagihîje dawiyê. Derdê dil ji ber dûrbûna yar ew qas dijwar e, ku heke di nav mirovan de were parvekirin têra hemû dilên mirovan dike. Yanê derdê dilê wî ew qas pir e, hemû dilên mirovan bi derdê wî tijû dibe. Derdê wî di cîhanê de were belavkirin dilên bêderd namînin.⁵⁸²

Xwîn

⁵⁷⁹ *b.n.*, r. 150.

⁵⁸⁰ Xeznedar, *b.n.*, r. 219.

⁵⁸¹ Yıldırım, *b.n.*, r. 264.

⁵⁸² *b.n.*, r. 219.

Xwîn di tesewifê de ji Hellac vir ve wekî têgeh û sembolek hatiye bikaranîn. Di tesewifê de bi têgeha xwînê hatiye diyarkirin ku hember dijawariyên tesewifê heke bivê, mirov ji can û jiyana xwe jî diçe.⁵⁸³

Molla Camî wiha gotiye:

Kuh kûn ez kellehâ

Baħr kûn ez hûn-i mâ⁵⁸⁴

Ji seriyana çiya, ji xwîna me behr çêbûn.

Yûnis wiha gotiye:

Uykudan gözüm uyandı

Uyandı kana boyandı

Yandı şol yüreğim yandı

Niçün ağlarsın bülbül hey⁵⁸⁵

Ji xewê çavên min şiyar bûn

Şiyar bûn di nav xwînê de man

Şewitî dilê min ê xemgîn

Tu çima digirî bilbilo

Baba Tahir ji yekem sofîyan e ku xwînê wekî têgeh û sembolek di gelek dubeytiyên xwe de bi kar aniye. Di dubeytiyên wî de tê dîtin ku rêya wî û rondikên çavên wî, cegera wî û dilê wî her tim bixwîn in. Ew di dubeytiyeke xwe de wiha gotiye:

⁵⁸³Cebecioğlu, *b.n.*, r. 346.

⁵⁸⁴*b.n.*, r. 346.

⁵⁸⁵*b.n.*, r. 347.

Dil ez derdê xemut zîr û zeber bî

Dû çeşmanum pur ez xwûnê ceger bî

Her an yarê 'ezîzeş nazewer bî

Dileş pur xuşşe canêş pur şerer bî

Dil ji ber derdê te zêr û zeber e

Çavên min tijî xwîna ceger e

Kî ku yara wî ya ezîz nazenîn be

Dilê wî bi xem, canê wî azer e⁵⁸⁶

Ew ê ku serdanpê di nav xwînê de maye di dubeytiyeke xwe ya din de wiha dibêje:

خوونەم ئەز خوردو دەر خووناوه کیتیم

یا ئەز ئین بەند دەر ئیزناوه کیتیم

⁵⁸⁷ ئەز خووبی باره دەر وه لاوه کیتیم

یا درهزین شوومه گیتی ئون نه یایا

Min dixwast ez li Îznayê bûma. Min xwîn xwariye û di nav xwînê de dijîm. Di vê cîhanê de parçek cî ji bo min tune. Diyar e ez di xwe de nemame.

Mirin û Axiret

Mirin dijî jiyane ye û bidawibûna jiyane nîşan dike. Di çand û heyamên cuda de derbarê mirinê ramanên cihê hatine gotin. Di derbarê mirinê de di felsefe û baweriyan de gelek niqaşî hatine kirin û gotinên cuda hatine parastin. Li gel baweriya ku mirin wekî derbasbûnek e, beden an jî rih bi awayên

⁵⁸⁶Yıldırım, *b.n.*, r. 376.

⁵⁸⁷*b.n.*, r. 200.

cihêreng jiyana xwe didomînin, ji mirin dawîbûna teqez e jî hatiye bawerkirin.⁵⁸⁸

Di nav vê gerdûnê de ya ku bi qasî em dizanin hebûna ku ji mirina xwe haydar e bêguman mirov e. Mirov bi têgihîştin û hêza hişê xwe dizane ku mirin heye û rojek bixwe jî dê bimire. Ji ber vê yekê mirovatî ji mêj ve li ser mirinê ponijîye û derbarê mirinê ramanên cuda aniye ziman.

Schopenhauer dibêje ku “mirin nebûya mirov nedikarî felsefê bikira”. Albert Camus diyar dike ku “heke tenê pîrseke felsefê hebe, ew jî mirin e”. Di serdemên “arkaîk” de hatiye diyar kirin ku mirin ji aliyê Şeytan û Xwedayên ku ji serkeftiyên mirovan dexesî dikirin, wekî ceza ji mirovan re hatiye dayîn. Di baweriyên yek Xwedayî de tê diyarkirin ku mirin ji aliyê Xwedê ve ji ber guneha yekem ya ku Adem kiriye, ji mirovatîyê re hatiye dayîn.⁵⁸⁹

Di dîroka felsefeyê de gelek feylesof li ser tîrsa mirinê ya ku li ser mirovan heye rawestiyane û hewl dane ku vê tîrsê, kêmkirin an jî bi giştî rakin. Hin feylesof jî li pey nemirinê geriyane. Her wiha di destaneke mirovatîyê ya herî kevn ya bi navê Gilgamêş de mijara mirinê heye ku di vê destanê de mirov tevgeriyane ku mirinê têk bibin, lê serkeft nebûne. Feylesof hewl dane ku pîrsên mîna; “Wateya mirinê çi ye?”, “Mirin çima heye?”, “Mirov mirinê çawa hîn dibe?”, “Mirin bûyereke xwezayî ye yan ne xwezayî ye?”, “Şert û mercên derûnî û civakî yên ku tîrsa mirinê zêde dikin û kêmkirin kîjan in?” Voltaire diyar dike ku di nav zindiyan de yên ku ji mirina xwe haydar in tenê mirov in, ku mirov vê agahiyê bi ceribandîna hîn dibin.⁵⁹⁰

Sedemê tîrsa mirovan ji mirinê; ji ber ku dê destkevtiyên xwe ên madî û manewî wînda bikin, ne diyarbûna piştê mirinê, ji ber bawerîya ku rih piştî mirinê zindî dimîne û dê cezayên kirinên xwe yên dinê bikişîne ne. Hin feylesof diyar kirine ku xwe rizgarkirina ji tîrsa mirinê bi hêviya “nemiriyê” bi dest dikeve. Li gorî Epîkûros bawerîya ku mirov ji ber ku dema mirinê û piştê

⁵⁸⁸ Salime Leyla Gürkan, “Mirin”, *DİA*, weş. TDV., İstanbul, 2012, XXXIV, r. 32.

⁵⁸⁹ Sarp Erk Ulaş, *Felsefe Sözlüğü*, weş. Bilim ve Sanat, Ankara, 2002, r. 1090-1091.

⁵⁹⁰ *b.n.*, r. 1091.

mirinê dê êşeke giran bikişîne bi giştî şaş e. Divê mirov ji vê tirsê xwe rizgar bike da ku mirin ji bo mirov windakirina hiş e. Ji ber vê yekê mirin mîna xewra çûyînê ye. Tîn bi giştî ji atomên fizîkî pêk tên. Dema ku ev timiya fizîkî bi mirinê parçe dibe, ew dem nayê jiyîn. Hiş jî wê demê hebûna xwe winda dike û êşeke ku mirov bijî tune. Epîkûros ramana xwe ya derbarê mirinê bi vî gotina xwe ya ku malê dîroka felsefeyê bûye wiha tîne ziman: “Mirin ne ji bo kesên zindî, ne jî ji bo yên mirî ne, tişteke ku jê were tirsîn e; Lewre ji bo kesên zindî mirin tune, jixwe ji bo kesên mirî jî jiyana tune.” Lê belê feylesof li ser vê ramana Epîkûros rawestiyane û ji ber ku tîn nemir e, ramana Epîkûros bi giştî nepejirandine. Feylesof berevajî Epîkûros gotine ku tirs mirinê ne ji ber êşa ku mirov bikişîne ye, ev tirs ji ber ku mirov bi timî hişê xwe dê winda bike tê. Ramangêrê bi navê Mîguel de Únamûno li piştî mirinê ne ji hebûna dogehê, ji hîçbûnê tirs xwe ya mezin aniye ziman. Feylesofên Stoa diyar kirine ku ji bo pêşî li tirs mirinê were birîn divê her kes di hemû jiyana xwe de mirinê bifikire û hîç ji hişê xwe dernexe. Seneca jiyane wekî mîhrîcanekê dîtîye. Gava ku dem hat bi awayekî aramî ji vê mîhrîcanê veqetîn pêk tê. Her wiha gotiye ku jiyana lîstîkek e û di vê lîstîkê de divê mirov him xwe him jî Xwedayê xwe kêfxweş bike. Lê ev raman ji ber ku mirov xwe hînê mirinê bike ye hatiye dîtin û Seneca û Feylesofên Stoa hatine rexnekirin û di bin vê ramanê de ramana Platon hatiye dîtin. Feylesofê navdar ê serdema navîn Augustînus ji ber gunehên ku mirov kiriye, mirinê ji bo mirovan cezayekî watedar dîtîye. Ew diyar kiriye ku mirov tenê ji agahdarbûna bexişandina Xwedayî dikare xwe ji tirs mirinê rizgar bike. Feylesofên serdema navîn ên din tirs mirinê wekî di xwezayê de pergaleke Xwedayî dîtine. Spînoza gotiye: “Mirovê azad her tiştî ji mirinê bêtir difikire, zanetî ew e ku ne li ser mirinê, li ser jiyane ponijîn e.” Ev jî tê wateya ji bo ku pêşî li tirs mirinê were girtin divê raman li ser jiyane ve were beralîkirin. Hin feylosofan jî diyar kirine ku neponijîna li ser mirinê jixwe di xwezaya mirov de heye û bi vê gotinê ramana Spînoza piştrast kirine. La Rochefoucauld diyar kiriye ku çawa mirov nikare bi çavên xwe li tavê binêre bi heman awayî nikare li ser mirinê raweste û ji mirinê têbigihîje. Ramangêrên heyîparêz (egzîstansiyalîst) ji bo çaresariya tirs mirinê gotine ku divê mirov

rasterast bi mirinê re rûbirû bimîne. Leonardo da Vîncî aniyê ziman ku çawa bi derbaskirineke rojê xweş mirov xeweke xweş dike, bi heman awayî bi jiyîna jiyaneke bextewar jo bo mirov dê mirineke şad pêk were. Xwedazanistiya Xirîstiyani diyar kiriye ku bextewariya vê dinê ji bo mirova bi timî ne pêkan e û bi vê gotinê ramana Leonardo da Vîncî rexne kirine. Her wiha bi nêrîneke din ya ku ji bo bidestxistina bextewariyê divê li hemberî tirsê mirinê serkeftiyek bidest bikeve ku bextewarî pêk were, ramana Leonardo hatiye rexnekirin. Schopenhauerê revîna ji tirsê mirinê bêwate dîtiye û gotiye ku mirov ev trajediya ku li pêşiya wî ye divê bipejirîne û bextewariya ku tê behskirin ji bo mirov ne pêkan e. Ew gotiye ku, revîna ji tirsê mirinê em dayînin aliyekî, divê mirov daxwaziya mirinê bike. Nîtzsche diyar kiriye ku “mîrovê bilind” ji dafika mirinê haydar e. Mîrovê bilind, mirinê wekî bidawîbûna jiyaneke dibîne û bi awayekî wêrek, şadî û bi rûmet pêşwaziya mirinê dike. Mîna gelek heyîparêzên din Heîdegger û Sartre ramana “ji mirinê haydarbûn wateya jiyaneke mezintir dike” parastine. Tirsê mirinê hêzek di mirov de peyda dike û mirov hewl dide ku tiştên ku di dinê de were kirin, beriya mirinê pêk bîne. Freûd diyar kiriye ku ji mirinê haydarbûn nebe, jiyaneke mîna çîrokeke Platonî dê biqewime, yan jî jiyaneke mîna lîstikeke bê bidestxistina tiştêkî dê bêçêj bibe. Heîdegger diyar kiriye ku mirin helwesteke wisa ye, ku tu kes nikare dewsa kesî mirinê pêkbîne. Ji ber ku her kesê mirinê dê tena serê xwe pêk bîne, helwesteke takekesî ye ji bo mirov.⁵⁹¹

Di kevneşopîya kevn ya Grekan de bi mirinê rih diçe diyarê xwe yê bi navê Hedes, li wir jiyana xwe didomîne. Di çand û felsefeyên kevn de (Orfîzm, Gnostîsîzm, Hermetîzm û Neo-Platonîzm) baweriya li piştî mirinê ji bo mirovan jiyaneke xweştir heye hatiye pejirandin. Bi vî awayî hatiye daxwaz kirin ku rih xwe ji bin nîrê laş rizgar bike û bigihîje alema bilind û bextewariya bê dawî. Di baweriyên Hîndû de rih ji gelek bûyîn û mirinan derbas dibe (tenasuh), da ku xwe bi rihê saf a mutleq ve (nîrwana) bigihîne. Di baweriya Zerdeşt de şerê kozmîk di navbera başî û xerabiyê de diqewime. Li gorî vê baweriyê li piştî mirinê mirovên qenc dê bi Ahûra Mazda ve bijîn, yê ne baş jî

⁵⁹¹ Ulaş, *b.n.*, r. 1091-1096.

dê di mala derew de bijîn. Mîna Zerdeştîyan, Parsiyên ku di Hîndistanê dijiyan bawerî bi mirovên baş dê biçin bihûştê, yên ne baş dê biçin dojhê û yên ku tobe kirine jî dê di dawîya pira Chînvatê cezayên xwe bikişnin û biçin bihûştê dianîn. Mezopotamya, Babil û Îsraîla kevn bawerî bi jiyana piştî mirinê nedianîn. Di Sûmeran de laş gava ku bi ayînan dihate çalkirin av û xwarin bi wan re dihatin danîn. Ji bo ku rih aram û nemir be, wan vê ayînê mehane kirine û kirin û ayînen Sûmeran derbasê Samiyan bûye. Di Sûmeriyan de baweriya ku rih bi Xwedayên piçûk ve vediguhere û ew li ser kesên zindî xwediyê bandora baş û xerab bûn hebû.⁵⁹²

Li gorî baweriyên mîna Mûsewîfî, Xirîstîyanî û Îslamê, mirin dayina Xwedê ye. Xêncî Xwedê her kes dê bimirin. Di her sê baweriyên de jî baweriya jiyana piştî mirinê heye û her wiha ji ber cezayên ku dê li piştî mirinê were jiyîn tirsê mirinê jî di mirovên van baweriyên de peyda dibe. Di her sê baweriyên de mirin û axiret bi agahiyên cuda hatine ravekirin.

Li gorî Îslamiyê armanca hatina mirov ya li dinê ne mirin e, jiyana e. Xwedê ji rihê xwe pif kiriye û Adem afirandiye. Ji nifşa Adem re jiyaneke ebedî daye. Lê belê ev jiyana ji du beşan pêk tê. Ya yekem, jiyana mîna cihekî perwerde û azmûnê ye. Ya duyem, jiyana girêdayî encama yekem teşe digire û ev beşa jiyana ebedî ye. Mirin her du beşên jiyana digihîne hevdu û mirovan bi jiyana ebedî ve digihîne. Hemû bawerî û pergalên mirovatiyê hewl didin ku jiyana mirov ya birêz biparêzin, her wiha yên ku zîyanê bidin jiyana mirov a birêz bi ceza bikin.⁵⁹³

Gazalî diyar dike ku tunebûn tune ye. Bi mirinê rih ji laş diqete û ji halekî derbasê halekî din dibe. Her wiha rih ji jiyana demborî derbasê jiyana mayînde ya axiretê dibe. Mirin ne dawîbûnek e. Li gorî ayet û hedîsan mirin guherînek e û rihê ji laş derdikeve yan di ezap de yan jî di xweşiyê de bêdawî dimîne. Di Qur'anê de tê diyarkirin ku: *“Her zindî dê mirinê tehm bike û em ê we bi şer û xêrê îmtîhan bikin û hûn ê dawiyê her li me bêne vegerandin.*

⁵⁹² Salime Leyla Gürkan, “Mirin”, *DİA*, weş. TDV., İstanbul, 2012, XXXIV, r. 33.

⁵⁹³ Salime Leyla Gürkan, “Mirin”, *DİA*, weş. TDV., İstanbul, 2012, XXXIV, r. 34.

(*Sûreyê Enbiya 21/35*).⁵⁹⁴ Hz. Muhammed wiha gotiye: “Ji we kî ji Xwedê fedî dike, mirinê tu şev li ber çavên xwe dûr nexwe û wisa razê, qotekî heram nexwe. Ji zînayê bireve. Zimanê xwe, çavên xwe û guhên xwe ji heramê biparêze. Mirinê û li piştî mirinê rizîna xwe bifikire. Bi zînetî dinê nexape.”⁵⁹⁵

Mirin di dubeytiyên Baba Tahir de mijar û daxwaziyek e xurt e. Mirin wî ber bi xwe ve dikişîne, lewre gihîştin e. Ew di dubeytiyên xwe de daxwaziya gor û mirinê dike. Di dubeytiyên wî de diyar dibe ku ew mirin, gor û jiyana axretê pir girîng dibîne. Ji ber vê yekê bi fanîbûna dinê naxape û axretê ji bîr nake. Ew mijara mirinê di dubeytiyên xwe de wiha rave dike:

Be gûristan guzer kerdem kem û bîş

Bedîdem halê dewlemend û derwîş

Ne derwîşî be xakî bêkefen mand

Ne dewlemend bûrd ez yek kefen bîş

Di ber gorîstane re buhurîm kê m zêde

Min halê dewlemend û feqîran dît tê de

Ne feqîr bê kefen ketibûn bin axê

*Ne dewlemend biribû ji kefenek pê de*⁵⁹⁶

Xwoşa an rozî ke qebrum mîgîre teng

Be balîn serum xişt û gil û seng

Du pa der qiblê û can der buyaban

⁵⁹⁴ *Qur'ana Pîroz û Meala Wê ya Kurdî, b.n., r. 323.*

⁵⁹⁵ *Imam-ı Gazali, Ölüm ve Ötesi, (Amd.: Abdullah Aydın-Selma Aydın), weş. Sena, İstanbul, 2001, r. 9-13.*

⁵⁹⁶ *Yıldırım, b.n., r. 85-86.*

Tenum ba mar û mûran mîkere ceng

Çi xweş e roja ku min têkin mezel

Li ser min bicivin giya û ax û pel

Du ling ber bi qibleyê, can li çolê

Laş bi mar û mûran re bike ceng⁵⁹⁷

Way an rozî ke der gorum keren teng

Werîjen ber serum xak û xis û seng

Ne pay an ke ez maran gerîzem

Ne dest an ke ba mûran kunem ceng

Xwezî bi wê rojê ku bikevim gora teng

Bavêjin ser serê min giya û ax û seng

Ne pê hebin ku ez ji maran birevim

Ne dest hebin bi mûran re bikim ceng⁵⁹⁸

Ew di gelek dubeytiyên xwe de bêwatebûna dinê bi gotinên curbicur aniye ziman û berê xwe daye cîhana bêdawî. Her wiha hestên xwe yên derbarê gihîştina bi afirîner di gelek çarînen xwe de aniye ziman. Em dikarin derbarê vê mijarê, çarîneke wî wekî mînak bidin:

Be gûristan guzer kerdem sebaî

⁵⁹⁷b.n., r. 147.

⁵⁹⁸b.n., r. 148.

Şinîdem nale û fixan û ahî

Şinîdem kelleyî ba xak mîguft:

Ke în dunya nemîerzed be kahî⁵⁹⁹

Derbasbûm li ber goristan sibehek

Bihîstim hawar gazîn û nalînek

Bihîstim seriyek, axê re digot:

Ev dinya ne bi qîymeta bi kahek

Baba Tahir bi giştî hestên xwe yên derbarê mirinê berevajî hin arifan bi awayekî şadî û xweşhalî neanîye ziman, berevajî wan, mirinê bi hestên xwe ên xemwarî aniye ziman. Wî dixwast mirov kar û barê xwe ên vê dinê yên badilhewa berdîn û terka vê dînê ya ku bidawî ye bikin. Ew derbarê rastiya mirinê, jîyanê wiha rave kiriye:

Yekî berzrîgirî nalûn der în deşt

Be çeşmê xwûnfeşan alale mîkeşt

Hemî keşt û hemî guft ey Xwudaya!

Ke bayed keştên û hîştên der în deşt

Cotyarek li vê çolê dikir nalenale

Wî bi hêstirên xwînî diçandin lale

Hem diçand hem digo: “Xwedêyo!

Kî van biçîne divê wan li vir bihêle⁶⁰⁰

⁵⁹⁹b.n., r. 292.

Her kes û her tişt gava ku roja wî hat dê bimire. Helbestvan gotinên xwe ên li ser bêçarebûna li hemberî mirinê û ji nişkê ve hatina mirinê wiha tîne ziman:

Cure bazî bûdem reftem bê nexçîr

Siyadestî zede ber balê mû tîr

Bûre xafil meçer der çeşmesaran

Her an xafil çere xafil xwere tîr

Ez bazek bûm derketim çûm nêçîrê

Çavreşek li baskê min da derba tîrê

Bêxeber meçêre li kenarên çêrgehan

Kî bêxeber biçêre dê bixwe derba tîrê⁶⁰¹

Meriv bibe bazek derkeve nêçîrê jî, dê ji nişkava ji nêçîrvanekî din derba tîrê bixwe û bibe nêçîr. Yan jî ji her tiştî bêagah di xwezeya xwe de bijî û biçêre jî, rojek ji nişkava dê bixwe derba tîrê. Ji ber vê yekê divê her kes ji derba tîrê haydar be. Ji mirinê haydar be û li gorî wî derkeve nêçîrê yan jî bijî. Karê xwe li gorî derba tîrê bike, ji derba tîrê revîn tune ku her kes dê rojek bixwe derba tîrê.

Ew di dubeytiya xwe de derbarê hatin û çûyîna mirovan ya vê cîhanê wiha dibêje:

Xurem kûhan xurem kûhan xurem deşt

Xurem anan ke în alaleyan keşt

Wesî sind wesî şind wesî yend

⁶⁰⁰b.n., r. 112.

⁶⁰¹b.n., r. 137.

Hemen kûh û heman hamûn heman deşt

Çiya şad in, çiya şad in, deşt jî şad in

Şad in kesên ku ev laleyên han çandin

Gelek hatin, gelek hene, gelek dê bèn

*Çiya û çol û deşt her tim heman in*⁶⁰²

2.5. KESAYETIYA WÎ YA WÊJEYÎ

Zimanê Kurdî bi giştî li ser sê diyalektan tê dabeşkirin: Kurdiya Kurmancî, Kurdiya Goranî-Kurdiya Zazakî û Kurdiya Lorî.⁶⁰³ Her wiha her diyalekt jî xwedî devok û wêjeya xwe ne.

Baba Tahir bi berhemên xwe, di Wêjeya Kurdiya piştî Îslamê de, di binbeşa wêjeya Kurdî ya Lorî de cih digire. Wêjeya Klasîk a Kurdî bi zaravayê Kurmancî xurtir e û di sedsala 16'an de dest pê dike. Taybetiyên Wêjeya Klasîk a Kurdî di berhemên Baba Tahir de tînin. Bi vî awayî taybetiyên Wêjeya Klasîk a Kurdî di nav zaravayên Kurdî de pêşiyê di zaravayê Lorî de tînin.

Di nav beşên wêjeya Kurdî de wêjeya Kurdiya Lorî û ya Goranî kevintir in. Piştî wêjeya Kurdiya Kurmancî û Soranî, herî dawî jî ya Zazakî tînin. Wêjeya Kurdiya Lorî û Goranî derdora sedsala heştan-nehân dest pê kirine. Di wêjeya Kurdî ya Lorî de wêjevanê herî girîng Baba Tahir e.⁶⁰⁴ Kurdiya Lorî ji aliyê devokan ve dibe şeş beş: Feylî, Kirmanşanî, Bextiyarî, Lekî, Kelhûrî û Mamesanî.⁶⁰⁵

⁶⁰² *b.n.*, r. 110.

⁶⁰³ *b.n.*, r. 101.

⁶⁰⁴ Adak, *b.n.*, r. 102.

⁶⁰⁵ *b.n.*, r. 102.

Feqî Huseyn Sağniç di pirtûka xwe ya “Dîroka Wêjeya Kurdî” de diyar dike ku hozanê Kurd yê pêşîn heta helbestnûsên Îranî yê herî pêşîn Baba Tahir e ku ew wekî bavê wêjeya nivîskî ya Kurdî tê pejirandin.⁶⁰⁶

Baba Tahirê rêberê helbestvanên rojhilata navîn, yekem ji helbestvanê rojhilatê ye. Ew di nav xwezayê de jiyaye û zimanzanê Lekî / Goranî (Kurdî) û Farisiyê bûye. Ev taybetiyên wî, berhemên wî ji bo gelê Kurd û Farisan payebilind kirin. Kêşa taybet ya helbestên wî, mîrateya şêweyê helbesta Kurdî ya Kurdistana başûr û navîn ya beriya Îslamê ye. Her wiha îlahiyên pêxemberê Êzdiyan jî bi heman şêweyê helbestên Baba Tahir hatine nivîsandin.⁶⁰⁷

Navenda wêjeya Kurdiya Lorî Hemedan e. Hemedan ji aliyê arif û derwêşan, medrese û terîqetan ve navendeke girîng bûye. Ev bajar berê navenda Loristanê bûye, lê niha ev her du herêm ji hev qetiyane.⁶⁰⁸ Bêguman Hemedana ku xwedî çandê kevnar e û di serdema Baba Tahir de navendeke helbestvan û irfanê ye, bandor li ser Baba Tahir kiriye.

Ji ber ku di sedsalên 17 û 19’an de di hin tezkîreyan de gelek kêmbûnê dubeytiyên Baba Tahir cih girtine, ew nehatiye nasîn. Ji mêjûya 1885’an şûnde bi hin lêkolînan hejmara dubeytiyên wî zêde bûne û hin xezelên wî hatine dîtin. Bi van geşedanên Baba Tahir bêtir hatiye nasîn.⁶⁰⁹ Baba Tahir wekî helbestvanekî ku bi zimanê deverî nivîsandiye tê naskirin. Ew di heman demê de mutesewif e û helbestên tesewifî nivîsandiye. Wî xwe wekî qelender daye nasîn, jiyaneke derwêşî jiyaye û her demê xwe di nav xemgîniyê de borandiye. Bedewî û xweşikiyên dinê tu car wî bextewar nekirine. Dermanê wî yê ku agirê dilê wî û xema wî ji holê rake fena⁶¹⁰ ye. Gotinên wî ên tesewifî di nav

⁶⁰⁶ Feqî Huseyn Sağniç, *Dîroka Wêjeya Kurdî*, weş. Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2002, r. 70.

⁶⁰⁷ Izady, *b.n.*, r. 311.

⁶⁰⁸ Adak, *b.n.*, r. 102.

⁶⁰⁹ Tahsin Yazıcı, “Baba Tâhir-i Uryân”, *Türkiye Diyanet Vakfı İslam Ansiklopedisi*, I-XXXXIV, weş. Türkiye Diyanet Vakfı Yayın Matbaacılık ve Ticaret İşletmesi, İstanbul, 1991, IV, r. 371.

⁶¹⁰ **Fena**: Di hebûna xwe de windabûn û di Xwedê de peydabûn e. “Fena”, [<https://tr.wikipedia.org/wiki/Fena>], Gihîn: 5 Cotmeh 2015

mutesewifan de pêwendiyêke mezin dîtiye. Li ser gotinên wî ên tesewifî gelek şîrove hatine nivîsandin.

Dubeytiyên Baba Tahir bi evîn û wecdê⁶¹¹ ve hatine nivîsandin. Helbestên xwe bi evîneke Xwedayî, şêweyêke bibandor û efsunî aniye ziman. Di helbestên wî de xweşikî, bedewî, kirpandin, aheng û birêkûpêkbûn hene. Peyvên wî wekî moriyên tizbîyan bi hunerî hatine rêzkirin, hevokên wî bi nîzam û ahengên xweşik hatine sazkirin, wateyên wan dewlemend û xurt in. Wî di helbestên xwe de zêdetir şibandin (teşbîh) bi kar aniye. Bi şêweyê xwe yê taybet û cuda mohra xwe di serdema xwe xistîye. Her wiha helbestên wî ji hiş û hestên wî ne, lê xweşikiya helbestên wî ji evîna wî tê. Evîn e ku helbestan pê daye gotin. Bedewbûn û xweşikbûna evîna wî gotinên bêhempa bi wî daye gotin. Her wiha ew, bi vî awayî ji salên hezarî heta roja me ya îro hatiye.

Helbestên Baba Tahir bêtir li ser eşqê ne. Di helbestên wî de diyar dibe ku hestên wî paqij, gotin û şibandinên wî nerm û nazik in. Hesta xemê ku di berhemên wî de tê hîskirin di heman demê de biçêj e. Ew demên dûr û dirêj li çiyayê Elwendê derbas kiriye, kevir belgiyê wî erd jî doşeka wî bûne. Ji ber ku di nav xwezayê de jiyaye, sembolên xwezayê di helbestên xwe de gelek bi kar aniye. Di heman demê de di helbestên wî de sembolên felsefî û tesewifî jî hene. Helbestên wî ji dubeytî, xezel û bendan pêk tên. Ew bi berhemên xwe bingeha wêjeya Îranê ya nivîskî ye. Ew di wêjeya Kurdî de wekî yekem helbestvanê Kurd tê pejirandin.

⁶¹¹ **Wecd:** Di bin bandora hestekî manevî û rihî de jixwe çûyîn û bêhiş mayina merivan e. Ji ber bedewiyekê jixwe derbasbûn e. “Vecd”, [<https://tr.wikipedia.org/wiki/Vecd>], Gihîn: 5 Cotmeh 2015

3. FELSEFEYA EŞQA WÎ

3.1. EŞQ

Eşq, ji felsefeya Yewnan ya serdema yekem vir ve ji aliyê feylesofan bi gelek wateyên cuda ve hatiye pênasekirin û ravekirin. Ji aliyê hin kesan ve eşq, wekî helwestekî pîroz hatiye nirxandin, wekî peyveke sertac hatiye pejirandin û ji ber pirozbûna eşqê raveya eşqê ji aliyê van feylesofan nehatiye kirin. Hin kes ramana “bêyî eşqê nabe” parastine. Hin kes jî eşqê wekî nexweşiyekî dîtine û gotine ku divê aşiq wekî nexweşekî were dermankirin.⁶¹²

Eşq hesteke bihêz e ku gava diqewime meriv nikare pêşiya wê bigire. Eşq hesteke yekalî ye, aşiq bê berjewendî xwe ber bi eşqê ve berdide û maşûq di dilê xwe de berz dike. Di heman demê de aşiq xwe feda dike. Li gorî hin kesan eşq, daxwaziya başî û xweşiya yê din (Xwedê, dildar) in. Hin kes jî gotine ku eşq, têkiliyeke bihember e. Li gorî hin kesan jî di eşqê de têkiliyeke hemberî tune. Eşq di navbera serdeman û çandan de bi awayên cuda hatiye ravekirin. Li gorî hin feylesofan eşq dewlemendî û hêza jiyana mirovan e. Li gorî hin feylesofên din jî eşq, ji bo jiyana bi rûmet astengî ye. Feylesofên rojavayê hewl dane ku neyînîyên eşqê ji holê rakin û hêz û xweşikiya eşqê belav bikin. Xêncî raveyên eşqê, cureyên eşqê jî wiha ne: Eşqa erotîk, ya romantîk, ya platonîk, ya welat, ya xwezayê, ya mirovatiyê û eşqa Xwedê.⁶¹³ Lê Îbn ‘Erebî dibêje ku ji bo mirovan du cure eşq hene. Ya yekem evîna xwezyî ye ku ev cureyê evînê him di mirov de û him jî di heywanan de heye. Ya duyem evîna rûhanî ye ku ev cureyê evînê mirovan ji evîna heywanî vediqetîne. Li gorî Îbn ‘Erebî bi giştî sê cureyên evînê hene; Evîna Îlahî, Evîna Rûhanî û Evîna Tabîî ne û ew diyar dike ku xêncî van cureyên eşqê cureyeke din ya eşqê tune.⁶¹⁴

⁶¹² Ulaş, *b.n.*, r. 119-120.

⁶¹³ *b.n.*, r. 120.

⁶¹⁴ İbn Arabî, *İlâhî Aşk*, ç. 16, (Wer.: Mahmut Kanık), weş. İnsan, İstanbul, 2013, r. 43.

Di felsefeya Îslamê de derbarê felsefeya eşqê, ramana tesewifê derdikeve pêş. Bingeha felsefeya Îslamê eşq e. Di tesewifê de bi ramana wehdetê wicûdê (yekitiya heyînê, yanêyekbûna afirîner û yên hatine afirîn) afirandina gerdûnê bi hedîsa kenzî mexfî (gencîneya veşartî) ve hatiye rave kirin. Li gorî vê hedîsê, Xwedê gencîneyeke veşartî bû ji bo ku raza xwe eşkere bike, were zanîn û bedewbûna xwe têr û tijî temaşa bike, gerdûn afirand. Li gorî tesewifê sedemê hebûna gerdûnê “zanîn” û “evîn” e. Gerdûn jî wekî awêneyekê bedewbûna Xwedê nîşan dike. Ewên ku aşiqê bedewiyê dibin, di heman demê de aşiqê şewqa Xwedê ya gerdûnê dibin. Li gorî muteswifan eşqa mecazî ji bo eşqa rast pirek e ku rêwiyên eşqa rastiyê ji wir derbas dibin. Eşqa mecazî hezkirina tenê ji bedewbûneke Xwedê ye. Ev hezkirin jî ji bo baweriya yekbûna Xwedê cerebe ye û beriya eşqa Xwedayî amadehiya pêş e. Ev eşqa mecazî bi domana demê re dikemile û xwe digihîne pîleya eşqa rast. Yanê digihîje eşqa Xwedê. Ji ber vê yekê li gorî tesewifê baweriya Îslamê baweriya eşqê ye.⁶¹⁵

Eşq sedema afirandina alemê ye û sedema bingehîn ya hebûna helbestê ye jî. Wekî eşqa mecazî û eşqa rastî (heqîqî) behsa du eşqan tên kirin. Ji eşqa dinyayî re eşqa mecazî tê gotin. Eşqa ji bo hebûneke bilind e û ji ya daxwaziya ku xwe gihandina çavkaniya resen / esil re jî eşqa rastî tê gotin. Mutesewifên mezin carinan eşqa beşerî û ya Xwedayî di nav hev de dîtine û ya duyan ji bo bidestxistina ya yekem wekî amûrek dîtine. Mutesewif eşqa beşerî wekî parçeyek ji eşqa Xwedayî nirxandine û li ser vê mijarê rawestiyane. Di tevî wêjeya neteweyan de, bi taybet helbestên wan de eşq heye. Her wiha bingeha helbestê û cewhera helbestê eşq e. Eşq, çî qas têkilê helbestê be, ew helbest ew qas dibiriqe. Eşq him bingeha wêjeya dîwanê û him jî ya tesewifê ye.⁶¹⁶

Dikare were gotin ku meriv ji bedewê xwe digihîne bedewiyê. Wekî mînak gotina; “ji leylayê gihîştina bi mewlayê”, di nav gel de bibelav e. Her wiha ji bo gihîştina bedewiya mutleq, hin caran Leyla ne hewce ye. “*Di helbestê de ziman, çêj, raman her tişt kevn dibe, tenê eşq kevn nabe û her tim*

⁶¹⁵ Ulaş, *b.n.*, r. 120.

⁶¹⁶ Karataş, *b.n.*, r. 65-66.

nû ye.” Ev hevoka biwate ya Yahya Kemal e û wî di helbestê de nirxa eşqê bi awayekî delal aniye ziman.⁶¹⁷

Karê aşiq bi eşqê re ye, ne bi dilbera xwe re ye. Sedemê hebûn û jiyana aşiq, eşq e. Aşiq bê eşqê mirî ye. Agirê eşqê pir bişewat e, ne li gorî her kesî ye. Eşq, aşiq dişewitîne û ji holê radike, tenê eşq jê dimîne. Eşq, ji bo kesê zehmetkêş e. Eşq, çi qas were ravekirin jî ne têrê ye. Ji ber vê yekê em dor bidin Baba Tahirê pîrê eşqê, ew ê ku bi agirê eşqê şewitî ye:

Her an kes aşiq est ez cûn netersed

Aşiq ez kunde û zindan netersed

Dilê aşiqî bûd gurgê gurisne

*Ke gurg ez heyheyê çopan netersed*⁶¹⁸

Kesê aşiq ji çûna can natirse

Aşiq ji zincir û zindan natirse

Dilê aşiq weku gurê birçî ye

*Ku ew ji heyheyên şivan natirse*⁶¹⁹

3.1.1. Eşq di Tesewifê de

Puxteya rêya ku dibe Xwedê eşq e û tesewif jî rêya eşqê ye. Bi peyvan ravekirina eşqê zor dijwar e. Ev mîna ji mirovekî ku hîç hingiv nedîtiye û nexweriye re behsa çêja hingivê bikî ku ev morov dîsa jî nikare ji hingivê têbigihîje.⁶²⁰

⁶¹⁷ *b.n.*, r. 66.

⁶¹⁸ Yıldırım, *b.n.*, r. 116.

⁶¹⁹ Kara, *b.n.*, r. 18.

⁶²⁰ Robert Frager, *Aşkır Asıl Şarap*, ç. 3, (Wer.: Ömer Çolakoğlu), weş. Gelenek, İstanbul, 2012, r. 31.

Sedemê afirandina gerdûnê eşq e. Gelek bawerî û efsane diyar dikin ku afirandin bi eşqê dest pê dike. Bingeha rastiya eşqa tesewifê, hedîsa pîroz ya ku: *“Ez gencîneyeke veşartî bûm, bi daxwaza ku werîm zanîn min alemê afirand”* e. Di naveroka vê hedîsê de eşq heye. Felsefeya wehdetê wicûdê dixwaze ku, bi rêya eşqê Xwedê bizanibe û binase. Mirovê kamil ji bo gihîştina heq, beriya her tiştî divê ji masivayê derbas bibe û ji qeyda girêdayîbûnê xwe rizgar bike. Ev jî hakimbûyina li ser nefsê û kuştina “ene”yê (ego) pêdivî dike. Sofî tenê wê demê digihîje fenafîlahê û evîna xwe. Lewre eşq taybetiyeke zatê Xwedê ye. Remza teceliyê û raza Xwedê di vê eşqê de veşartî ye.⁶²¹

Eşq bingeha hebûnê ye, ku mijara tesewifê jî rastiya hebûnê ye. Di bingeha eşqê de bedewî heye. Yanê Xwedê ji bo ku ji xwe re bike awêne mirov afirandiye. Mirov “ahsenî teqwîm”e, Xwedê “husnî mûtleq”e. Nexwe di bingeha eşqê bedewî heye. Çavkaniya bedewiyê, bedewiya Xwedê ya bêhempa ye. Di vê helwestê de xêncî Xwedê ji tu kesî nayê hezkirin, her wiha xencî Xwedê ji kesî re îbadet nayê kirin. Ji Xwedê hezkirin ji hebûna mirov dest pê dike. Sedemê têkîlbûna bedewiyê ev e. Ev têkilî eşqê peyda dike. Eşqa ku ji bo Xwedê tê hiskirin, ji madeyê ber bi aliyê menayê ve, ji cîsimê ber bi aliyê rih ve beralî dibe. Di vê berbialbûnê de kelecânî, coşî, wecd û êş cêwî dibin. Salik di vê heyamê de, ji parçeyê ber bi timê; ji xwe ber bi hakimê mûtleq ve pêş ve diçe û bi vê pêşveçûnê kelecana nêzîkbûnê ya ku zêdedibe hîsdike. Di dawiya vê rêyê de eşq bi maşûq ve vediguhere. Dema ku hesiya ku fanîbûn di qada “bakî” de heliya vîna wî wînda dibe. Êdî aşîq peywira xwe aniye cih, hebûna fanî di teceliya heqîqetê de ji holê rabûye. Ev e “bi Heqê ve Heq bûyîn.” Reviyên heqîqatê xencî eşqê bi tu tiştî ve mijûl nabin.⁶²²

3.1.2. Eşq di Wejeya Dîwanê de

Di wêjeya dîwanê de li ser her cureyên eşqê hatiye rawestan. Him li ser eşqa madî, him jî li ser ya manevî berhem hatine nivîsîn. Eşq di navbera aşîq û maşûq de diqewime. Lê belê di wêjeyê de eşq bêtir bi aşîq ve têkildar e.

⁶²¹ Turan, *b.n.*, r. 530.

⁶²² *b.n.*, r. 530-531.

Aşiq ew kes e ku êş û jana eşqê dikişîne, dilê wî diperite û her tim perîşan e, lê maşuq ji bo aşiq tişteke nake, ku haya maşuq ji bayê felekê tune. Eşq di dilê aşiq de gelek pir e, lê di dilê maşuq de xuya nake, carinan jî gelek kêr e. Aşiq her tim xemgîn e û birîndar e, birîna aşiq hîç cara pak nabe û her tim bixwîn e. Gava ku eşq diqewime aşiq xwe di nav deryayê de dibîne lê di vê deryayê de reşayî xuya nake.⁶²³

3.2. EŞQA WÎ YA RÛT Û TAZÎ

Eşq, êşeke taybet e ya ku xwediye çêjeke bilind e. Tenê yên ku eşqê di dilê xwe de dihewinin vê êşe dizanin. Ew kesên ku vê êşe di dilê xwe de dihewinin, di her tiştî de Xwedê dibînin û her tişt wan bi Xwedê ve digihînin. Dizanin ku xêncî Xwedê tu mewcûd tune. Aşiq di pêvajoya ji têgihîştina rastiyê, noqî zeryaya Heq dibin û di Heq de ret (tune) dibin.⁶²⁴

Di helbestên Baba Tahir de eşqa rastî bi awayekî eşkere tê dîtin. Lê di helbesteke wî de ku ev helbest di kovara Hêrama Kurdistanê de di nivîsa Hekîm Mele Salih de⁶²⁵ heye, derbarê eşqa Baba Tahir ya mecazî nîşaneyek heye. Hin nivîskarên ku vê helbestê wekî ya Baba Tahir napejirînin jî hene. Ev helbest wiha ye:

Mu derwêş im Lek im îcaz dîrim

Mu dosê çu Xoşîn hewraz dîrim

Mu maşûqê bi namî Fatime Lor

*Sînew ber qametê pir naz dîrim*⁶²⁶

Ez derwêş im, Lek im, xwedî îcaz im. Dostê çu Xoşîn, xwediye razê hevpar im. Ez maşûqê ya bi navê Fatime Lor, xwediye sîneya ber qameta pir naz im.

⁶²³ *b.n.*, r. 532.

⁶²⁴ Frager, *b.n.*, r. 31.

⁶²⁵ Şiwan, *b.n.*, r. 28.

⁶²⁶ *b.n.*, r. 28.

Di dubeytiya jor de ew xwe wekî derwêş, Lek, xwedî îcaz, dostê Şa Xoşîn dide nasîn. Her wiha xwe wekî aşiqê Fatime Lor û wê jî wekî meşûqa xwe dide nasîn. Di vê dubeytiyê de, di gotina ku “ez aşiqê Fatime Lor im” de eşqa mecazî xuya dike. Lê dema ku em li ser eşqa Baba Tahir ya ku di çarînên wî de eşkere ne radiwestin, em dibînin ku di çarînên wî de eşqa mecazî nayê dîtin. Heke li gorî felsefeya eşqa wî, em vê dubeytiyê şrove bikin, em dikarin bibêjin Fatime Lor bedewiyek ji Xwedê ye. Lê bedewiya tim û bêhempa Xwedê ye ku ew maşûqê Baba Tahir e. Her wiha ev dubeytî dibe ku yek ji dubeytiyên Baba Tahir ên ku hatine guhertinê be jî, dibe ku gotin bi giştî yên Baba Tahir bin jî. Dîsa jî do gotegotên derbarê eşqa Baba Tahir û Fatime Lor de zelaliyek tune. Her wiha hin lêkolîner eşqa mecazî napejirînin û dibêjin ku xêncî eşqa Xwedê tu eşq tune ku eşqa ji bo mirovekî were hîskirin jî eşqa Xwedê ye, lewre mirov parçeyek ji Xwedê ye. Heke em eşqa mecazî li ber çavan bigirin em dikarin bêjin xêncî vê dubeytiyê me bêhna eşqa mecazî di dubeytiyeke din de nedîtin. Eşqa Xwedayî di seranserî dubeytiyên wî de tê dîtin.

Gava ku çarînên Baba Tahir tên xwendin, agirê eşqa wî ya natemire xwe eşkere dike. Vê eşqa xwe bi hestên xweşik tîne ziman. Ji ber kurahî û dilsoziya çarînên Baba Tahir xwendevanên wî di derûniya xwe de eşqên xwe bi hestên dilsoz hîsdikin. Baba Tahir xwe di nav agirê eşqa dilbera xwe de ditiye û di nav vî agirê de her tim şewitiye. Eşq ew kiriye dîwane û wî ji her tiştê dinê dest kişandiye, ji bo gihîştinê, şev û roj bi şewata dildariya xwe bêsekin nalî ye. Dinya û tiştên dinê li ber çavên wî reş bûne, her tişt ji hiş û dilê xwe dur xistiye û berê xwe daye yarê xwe. Di her tiştî de dilberê xwe ditiye û her derê ku berê xwe dayê ji bejn û bala dilberê xwe nîşaneyek ditiye. Gilî û gazind ji cudatiya xwe kiriye. Di dubeytiyên wî de derd û keser hene û ew ji jiyana xwe kêfxeşî û bextewariyê durxistine. Bi hêviya gihîştinê, çavên wî her tim rê kişandine. Ji eşqa agirê dilê xwe çêj hildaye. Baba Tahir ew aşiqe ku bi eşqa xwe, rih û jiyana xwe ji qirêjiyan şuştîye, eşqê ew çî qas şewitandiye, ew ew qas nêzikî dilbera xwe bûye. Eşqa wî ne mîna eşqên ji rêzê ye ku agirê wî bitemire, berevajî vê yekê evîndariyeke xurt e, ku agir û alava wî gur e. Ew

ketiye rêya tesewifê, li berxwe daye ku ji zor û astengiyan derbas bibe. Ji ber êş û jana eşqa dilê xwe çarîn ristine, lê ev êş û jan hîç netemiriye. Ev agirê ku tê de şewitiye, li gorî felsefeya wî dê heta gihîştina bi dilbera xwe dom bike.

Heke helbestvanek bê êş û jan be, evîndariyeke ne ji dil be û agirê dil wî her tim neşewitine, helbestên wî bêçêj in. Baba Tahir tevî hestên xwe ên evîndariyê ên xurt, dubeytiyên xwe saz kirine. Demek tê ew ji xwe derbasdibe, eşqa dilê wî dirije ser rûpelan û dubeytî saz dibin. Ev agirê ku ret nabe, ji cudatiya wî ya ji yara wî ye. Ev cudatî her ku diçe agirê dilê wî bêtir gur dike. Her ew e ku bi vê evîndariya xwa ya pak û dilsoz, bi hestên xwe ên xweşik, bi awayekî hunerî helbestan vedibêje. Di çarînên wî de bîlêvkirineke bêhempa û hunerî tê dîtin. Ew girîngiya ku dide eşqê di dubeytiyên xwe de wiha tîne ziman:

Her ke derdî nedare murde ewla

Dilê bê derdê 'îşq efsurde ewla

Seher bilbil zene awa be gulbun:

Ke her ke 'îşq nedared murde ewla

Kî ku derdê wî tune bimire çêtir e

Dilê bê derdê îşq pûç bibe çêtir e

Seherê bilbil di gulistanê de digot:

“Her kesê ku bê îşq e bimire çêtir e”⁶²⁷

Li gorî Baba Tahir eşq e ku meriva dikemilîne û digihîne rastiyê. Ew nirx nade dilên ku ji derdê eşqê dur in û di rêya evînê de naşewitin. Ew bixwe

⁶²⁷ b.n., r. 227.

xwediyê dilekî bişewat û bi derd û kul e. Ew, derbarê dilên ku bê evîn in wiha dibêje:

Dilê bê 'îşq re efsurden ewla

Her ke derdî nedare murden ewla

Tenê ke nîst sabit der rehê 'îşq

Zerre zerre be ateş sûten ewla

Dilê bê evîn bila biçilmise çêtir e

Kesê ne xemgîn bila bimire çêtir e

Laşê ku ne sabit e di riya evînê de

Bila ew zerre zerre bikizire çêtir e⁶²⁸

Hin kes hene ku di rêya evînê de têk çûne û ji vê rêya pîroz derketine. Helbestvan ji wan kesên ku li hemberî barê giran ê eşqa rast li ber xwe nedane re, kizirîn xwestiye. Li gorî wî, mirovên bê eşq jiyanêke bêwate dijîn. Lewre li gorî helbestvan eşq bingeha bidestxistina rastiye ye.

Di helbestên wî ên evînî de tişta herî balkêş şewat û şewitandin e, ku helbestvan, şewat û şewitandinê derdixe pêş. Her wiha helbestvan agir bixwe ye û ew ji ber evînê, her tim dişewite û dişewitîne. Ew aşîqekî wisane ku di nav eşqê de winda bûye û çavên wî ji xêncî dilberê hîç tiştek nedîtiye. Xwe bi agirê eşqê ve şewitandiye û di dawiyêde bûye agirekî xwerû. Paşê ew serdanpê bûye eşq û gihîştîye eşqa rast. Ew xwe di yara xwe de tune kiriye û bi vê helwestê winda bûye. Ew heye, lê ya pêş çavan, ya girîng û ya heye ne ew e, yarê wî ye. Bêguman ev eşqa wî eşqeke rast e. Ew eşqa xwe ya rast û şewata dilê xwe ya bêsinor û bêcih wiha tîne ziman:

⁶²⁸b.n., r. 342.

Mûem an azerîn murxê ke der hal

Bisûcim 'alem ez ber hem zenem bal

Musewîr ger keşe neqşim be dîwar

Bêsûcim xune ez te 'sîrî tîmsal⁶²⁹

Ez teyrekî wisa me ku agirîn im

Per li hev xim cîhanê dişewitînim

Eger wênekêş min neqşî dîwêr bike

Bi wêneya xwe alemê dişewitînim⁶³⁰

Baweriya helbestvan li ser rastiyê ye. Evîndarekî wisa ye ku gihîştîye meqamê şewitîne. Di nav meşûqa xwe de gihîştîye meqamê helyanê. Agirê eşqa wî ew qas germ e ku tevî cîhanê dişewitîne. Ne ku tenê cendekê wî bişewitîne, heke wêneya wî jî li ser dîwar were neqîşkirin, wêne dibe agir û alava wî xanî dişewitîne.⁶³¹ Heke wênekêşek rabe wî neqşê dîwêr bike ew ê alemê bişewitîne ku ew di tu tiştî de cih nabe, bê cî û bê war e, her wiha bêsinor e. Ew eşqa ku di wî de peyda bûye wiha tîne ziman:

Nigarîna dil û canum te dêrî

Heme peyda û penhanim te dêrî

Nezûnim mû ke î n derd ez kî dêrom

Hemê zûnûm ke dermanim te dêrî⁶³²

⁶²⁹ Xeznedar, *b.n.*, r. 205

⁶³⁰ Yıldırım, *b.n.*, r. 157.

⁶³¹ Xeznedar, *b.n.*, r. 206.

⁶³² *b.n.*, r. 207.

Delala min dil û canê min tu yî

Hemû raz û eyanê min tu yî

Nizanim min ev derd ji kê girt

Hew dizanim dermanê min tu yî⁶³³

Ew tişta ku li cem helbestvan veşartîye û eşkere nake ew e ku nizane çima li pey meşûqê digere. Ew nizane ku derdê dildariyê ji ku girtiye. Lê teqez e ku ew rêya ku di tê de diçe, wekî rêya rast dibîne. Armanca wî ya dawiyê di nav meşûqê de helîyane. Heke eşq derd be derman jî li cem meşûqê ye. Ew li hemberê eşqê, bêvînbûna xwe wiha tîne ziman:

Nezûnem rût û 'uryanum kî kerde

Xwudim cellad û bî cûnum kî kerde

Bide xencer ke ta sîne kunem çak

Bebînem 'işq ber cûnum çi kerde

Nizanim kê ez kirime tazî û uryan

Cellad ez im, kê ez kirime bê can?

Xencerekê bidin sîng biçirînim

Da bibînim îşqê çi kiriye bi can⁶³⁴

Ew derdê dilê xwe di vê dubeytiyê de wiha tîne ziman:

Be kes derdê dilê mû watenî ne

Ke seng ez asman endatenîne

⁶³³ Yıldırım, *b.n.*, r. 216.

⁶³⁴ *b.n.*, r. 188.

Be mû acen ke terkê yarê xwud ke

Kesî est yarum ke terkeş watenî ne

Derdê dilê min tişteki gotinê nîne

Kevirê asîmanan ê avêtinê nîne

Ji min re dibêjin yara xwe terk bike

Terkkirina yarê îmkana gotinê nîne⁶³⁵

Aşiq her çi qas xemgîn dibe lê dest ji eşqê bernade, ji ber ku eşqa wî çi qas payebilind be aşiq jî ew qas xemgîntir e. Ew diyar dike ku ji derdê wî tenê yên mîna wî dikarin têbigihîjin. Kesên dilsotî tenê dikarin wî fêhm bikin ku ew wiha dibêje:

Newayî nale xem endûte zunû

'Eyarî zerrî xaliş pote zunû

Bûre sûte dilûn dil hem binalîm

Ke halî sûtedit dilsûte zunû⁶³⁶

Dengê nalînê nalînvana dizane

Eyarê zêra saf bote dizane

Dilsotîno werin em tev binalin

Sûtedit halê dilsotî dizane

⁶³⁵ *b.n.*, r. 281.

⁶³⁶ Xeznedar, *b.n.*, r. 213.

Xeznedar derbarê vê dubeytiya Baba Tahir diyar dike ku gelek gel û kesên cîhanê vê dubeytiyê dizanin û heman demê de wekî gotinên xwe dipejirînin. Yanê bi heman wete û heman gotina vê dubeytiya Baba Tahir, di neteweyên din de jî helbest hene. Hin helbestvanên neteweyên cihê bi vî rengê helbesta Baba Tahir ya jor helbest nivîsandine û wekî malê xwe nîşan kirine. Ew netewe vê wate û gotina Baba Tahir wekî wate û gotina xwe pejirandine. Lê berhemek yekem car ji aliyê kî ve hatibe hilberandin û pêşkeşkirin, ew berhem ya wî ye. Gava ku em li ser vê gotin û wateya helbestê lêkolîn dikin, em dibînin ku di dîrokê de yekem car di helbesta xwe de Baba Tahir bi vê wate û gotinê helbest nivîsandiye. Jixwe Baba Tahir beriya wan kesên ku gotine ev wate û gotin ya me ye, jiyaye. Dîroka mêjûya jiyana wan helbestvanan wan derew derdixîne û nîşan dike ku helbest, gotin û wate ya Baba Tahir e.⁶³⁷ Cîhan Okuyucu diyar dike ku ew kesên ku bernavên helbestvanan di helbestên wan de diguherînin û helbesta wan dikin malê xwe, dizên adî ne. Hin kes ji ber ku nikarin bi kêş û wateyê xweş helbestekî saz bikin, wateya helbestên helbestvanên beriya xwe jiyane didizin ku ev kes dizê wateyê ne. Hin kes hene bi peyvên cuda bi wateya helbestekî din helbestek dinivîsîn ku ev rê jî ne rast e. Hin kes jî hene ji wateya helbestekî wateyên nû derdixînin, dikare were gotin ku ev kes hilberîner in. Çavuşoğlu diyar dike ku ev hemû helbestvan in, lê hinekî wan zêr, hinek zîv hinekî din jî sifir / mis (paxir) in.⁶³⁸ Yê ku ji helbestên Baba Tahir sûd wergirtine û bi wate û şeweyê wî helbest nivîsîne hene. Baba Tahir bi şeweyê helbesta xwe helbestvanekî serbixwe ye. Ew helebestvanekî zêrîn e, ku him şeweyê hunera wî û him jî wateya helbestên wî balkêş in, ne ji rêzê ne û bi timî malê wî ne.

Gihîştin e dermanê wî, ku ew rêya şadiya dilê xwe wiha tîne ziman:

Dilum dilum bê weşlê tû şadî mebînad

Be xeyr ez miñnet azadî mebînad

Xerab abad dilê bê meqdemê tû

⁶³⁷ *b.n.*, r. 215.

⁶³⁸ Okuyucu, *b.n.*, r. 71-72.

Îlahî hergiz azadî mebînad

Dilê min bê wesla te şad nabe

Ji bilî derdan bi tişteki azad nabe

Dilê ku tu teşrîf nekî xerab e

Ya Rebî ew dil tu car azad nabe⁶³⁹

Ew wekî aşiq rewşa xwe ya di nav gel de wiha rave dike:

Dila weng im, dila weng im, dila weng

Zi destum şîşeyê namûsî ber seng

Heme wajen be mû: Bênam û neng î

Kesê ke aşiq e çîş nam çîş neng!

Dilo jar im, dilo jar im, dilo jar

Şûşeya namûsê ji dest ket xwar

Her kes dibêje ku tu bênav û bêar î

Kesê aşiq çî bike bi nav û bi ar!⁶⁴⁰

Ji ber evîna xwe ya dilsoz, gelek peyvên xweşik ji dilberê xwe re dibêje. Di helbestên wî de dilberê wî nazdar û bi bejn û bal e. Ew delal e, xwediyê du keziyên reş û dirêj in. Çavên dilberê wî bêkil in û bixwezayî kilkêş in. Helbestvan dîmena dilberê xwe wiha tîne ziman:

Tû ke nazinde bala dilruba yî

⁶³⁹ Yıldırım, *b.n.*, r. 129.

⁶⁴⁰ *b.n.*, r. 145.

Tu ke bê surme çeşman surmesa yî

Tû ke mişkîn dû gîsû der qefa yî

Be mû wacî ke sergerdan çira yî?

Tu ku yareke nazenîn î û dilêş î

Çav bê kil in, bi xwezayî kilkêş î

Tu ku te du gêsû berdane pişt mil

Ji min re dibêjî: “Çima tu gêj î?”⁶⁴¹

Dilberê wî di dilê wî de ew qas bedew û xweşik e ku ew van gotinên xweşik ji dilberê xwe re rêz dike. Bêguman di cîhanê de tişt û kesên bedew û xweşik hene lê bedewtirîn û xweşiktirîn her Xwedê ye. Lewre ew xwediyê cemaleke bêhempa ye. Bedewiyeke dinê gelek mirovan sermest û gêj dike, lê bedewiya tam gelo dê çi li wan bike. Baba Tahir e ku aşiqê bedewiya tam e. Ji ber vê ye ku her tim sermest û gêj e. Her wiha ew bixwe jî, parçek ji bedewiya tam e.

Ew serdanpê aşiq e û halê xwe yê ber eşqê wiha tîne ziman:

Mû ke ser der biyabûnem şew û roz

Sirîşk ez dîde barûnem şew û roz

Ne teb dîrum ne cayum mîkuned derd

Hemî dûnum ke nalûnem şew û roz

Ez ê ku li çolê digirim şev û roj

⁶⁴¹ b.n., r. 308.

Ez hêstiran dibarînim şev û roj

Ne nexweş im, ne ketime tayê lê

*Hew dizanim ku dinalim şev û roj*⁶⁴²

Ew dilberê xwe, ne bi milkê dinê ne jî bi yê axiretê dide û armanca hebûna xwe wiha tîne ziman:

Hezaran mulkê dunya ger bedarem

Hezaran mulkê 'uqba ger bedarem

Bûre tû dilberum ta bat û wajem

Ke bê rûyê tû an ra ger bedarem

Eger milkê min ê dinê hebe bi hezaran

Eger milkê min ê axretê hebe bi hezaran

Dilbera min were ez ji te re bibêjim ku

*Bê rûyê te qet naxwazim wan milkan*⁶⁴³

Di vê dubeytiya jêr de diyar e ku kes bi halê wî nizane. Mirovên nas û nenas ji ber têngihîştina xwe dikin ku bi peyvên xwe ên xerab dilê wî bişkênin. Ew, berxwedikeve û berê xwe dide yarê, bang li yara xwe dike û wiha dibêje:

Ya ke ej mihretum dem mîjed ey yar!

Xwîş û bîganegan sengum zed ey yar!

Curmum în e ke ez te dûst darem

⁶⁴²b.n., r. 138.

⁶⁴³b.n., r. 112.

*Ne xwînum kerd û nem rahî jed ey yar!*⁶⁴⁴

Gava behs ji eşqa te dikim ey yar!

Nas û nenas singa min didin ey yar!

Sucê min ev e ku ji te hezdikim

Ne xwîn rêtim ne jî rê birim ey yar!

Mirovên nas û nenas ji eşqa wî fêm nakin û di ser wî de tîn. Nas û nenas kor in ku nikarin eşqa rast bibînin. Ew cureyekî eşqê dijî lê ev eşq ne eşq e ku mirovên derdora wî jê fêm bikin û têbigihîjin. Ji ber vê helwestê ew ji gel dûrdikeve. Tiştên ku gel giring dibîne û li pey dikeve bo wî badilhewa ne. Her wiha tiştên ku ew girîng dibîne û li pey dikeve, gel jê fêmnake. Gel wî suçdar dike. Lê ji bilî hezkirinê tu kirinê wî tune ku dibêje; Ez mîna we ne xwînê dirêjim û ne jî rêya kesî dibirim. Heke evîndarî suc be, ev e sucê min ku ez evîndar im.

Di vê dubeytiya jêr de ew daxwaziyên xwe ên bi gihîştina yarê tîne ziman. Dixwaze yarê bibîne. Li ser rêya ku diçe yarê ye, ku ji vê rêyê tu guman nake. Ji yêr ku yarê dibînin kêfxweş e û vê helwesta xwe wiha tîne ziman:

Xwoşa anan ke her şaman tû wî nend

Suxen wa te keren, wa te neşî nend

Gerem desres nebî ayem te wî nem

Beşum anan bewî nem ke te wî nend

Çi bextewar in yêr ku her şev te dibînin

⁶⁴⁴b.n., r. 44.

Bi te re rûdinin û bi te re suhbet dikin

Eger ji destê min nayê ku ez te bibînim

*Ez biçim bibînim kesên ku te dibînin*⁶⁴⁵

Baba Tahir wan kesên ku gihîştine dilberê, wek kesên bextîyar dibîne û ji vê gihîştina wan bixwe jî kêfxweş dibe. Diyar e ku ew bixwe hêj negihîştîye yara xwe, lê ew di wê rêyê de ye û ji xwe bawer e ku dê bigihîje yara xwe. Bi kesên ku gihîştine yarê kêfxweş dibe û li ser wan ji xwe re rêyek dibîne ku dê here wan kesan bibîne û bêhna yarê ji wan bêhn bike. Her wiha ji bo Baba Tahir ew kesên ku yarê dîtine, kesên ku divê werin dîtin in. Ew ji bêhna yarê dihesê û wiha dibêje:

Nesîmî kez bunî an kakul ayû

Mera xwoştir zi boyî sunbul ayû

Be şev gîrem xeyaleş ra der axûş

*Seher ez besterum bûyî gul ayû*⁶⁴⁶

Bêhna nêsîmê ku ji kakulên te tê

Ji min re bêhna sinbilan xweştir tê

Ku şev tê ez xeyala te hemêz dikim

*Sibehan ji nivîna min bêhna gulê tê*⁶⁴⁷

Evîna helbestvan ne mîna evîna mirovên din in. Meşuqa wî jî ne mîna meşuqên aşiqên din in. Li cem wî aşiq du cure ne. Aşiqên beşerî û yên rastiye. Di rêya eşqa rast a mutleq de gihîştin pir bi zehmet e. Lê belê di eşqa din de hêsan e. Di rêya eşqa rast de hin kes hene ku dest ji rê berdane û ji rê

⁶⁴⁵ *b.n.*, r. 120.

⁶⁴⁶ Xeznedar, *b.n.*, r. 209.

⁶⁴⁷ Yıldırım, *b.n.*, r. 245.

veqetiyane. Lê hin kes hene ku mîna Baba Tahir ji vê rêyê derneketine. Ew ji ber eşqê ketiye halekî wisa, nikare di doşeka nerm de razê û serî dayne ser balifekî nerm. Cî û nivînên wî erd û kevir in. Ew cudatiya xwe ya ji xwedîdostên din wiha tîne ziman:

Dilim zi derdî te dayîm xemîne

Be balîn xiştem û bistir zemîne

Hemîn cor mûm ke mû te dost dêrum

Ne her kes dost dare heleş îne⁶⁴⁸

Dilêm ji derdê te her dem xemîn e

Balîfêm kevir, doşekam zemîn e

Sûcem ev e ku min ji te hez kirye

Lê her xwedî dost halê wî wa nîne⁶⁴⁹

Bêguman di navbera dilberê wî û dilberên mirovên xwedî eşqa mecazî de cudatî gelek mezin e. Meşuqa Baba Tahir gelek jê dur e. Ew dûrî astengî derdixe ku rêya wî ya diçe yarê xelas nabe. Heta ku temenê wî ret bibe, yanê heta ber mirinê ew nagihîje dilbera xwe. Ew vê helwesta xwe bi vê dubeytiyê wiha tîne ziman:

Bê te eşkim zê mujgan ter ayû

Bê te nexlî omêdim bî ber ayû

Bê te der kuncî tenhayî şev û roç

Neşînim take 'umrim ber ser ayû⁶⁵⁰

⁶⁴⁸ Xeznedar, b.n., r. 209.

⁶⁴⁹ Kara, b.n., r. 77.

Bê te ji çavan histêran dirijînim

Bê tej'dara umrê xwe ber nastînim

Bê te ez li quncika tenêtiyê

Her rûdinim, ta ez umr biqedînim⁶⁵¹

Baba Tahir di cîhanê de negihîşt bi tişta ku li du bû. Ji ber ku heke bigihîşt, sêhra wî betal, efsane û razên wî dê eşkere bibûna. Ew hêviya dawîbûna temenê xwe bû. Ew xwe di vê cîhanê de tenê didît. Dixwast ku jiyana wî ya dinê ret bibe û gihîştin pêk were.

Ew bang li dilşewitan dike û dibêje werin em biçin gulşenê û li wir bi hev re binalin. Lê heke bilbilê şeyda dest ji eşqê û nalînê ber de jî em dest ji eşqê bernedin, em dîsa binalin û wî wiha gazî sûtédilan kiriye:

Bûre sûtédilûn hûn ta binalîm

Zi hîcrî an gulî re'na binalîm

Bişîm ba bilbilê şeyda be gulşen

Eger bilbil nenale ma binalîm⁶⁵²

Dilşewitîno werin em pev re binalin

Duriya ew gula re'na binalin

Bi bilbilê Şeyda re em biçin gulşenê

Eger bilbil nenale jî em binalin⁶⁵³

⁶⁵⁰ Xeznedar, *b.n.*, r. 209

⁶⁵¹ Kara, *b.n.*, r. 93.

⁶⁵² Xeznedar, *b.n.*, r. 212.

⁶⁵³ Yıldırım, *b.n.*, r. 169.

Baba Tahir xwe ji dildaran cuda nake. Her komek xwediyê armanc û rewîştaxwe ne. Ev koman ji derdê hevdu haydar in. Ji ber vê yekê bo yek armancê hewldidin. Ev armanc jî gihîştina bi cewhera mezin e.⁶⁵⁴

Baba Tahir ji bo evdalbûn û hestên dilê xwe derbixwe û nîşan bike wêneyeke resen xêz dike û ev wêne wêneya yarê wî ye. Xerabiya dewranê ew qas pir e ku her dem birîna wî tijî xoy dike. Gava ku birînek tê xoy kirin, êş û jana wê mêriv diperîtîne. Dûya axkirina wî û dengê nalîna wî digihîje esmana ku derek ji asimana durtir tune. Rondika dibarîne ku ew qas dûr diçe digihîje masiya ku ji masiya dûrtir tune.⁶⁵⁵ Baba Tahir wiha tê ziman:

Zi şor engêzî bî çerx û felek bê

Ke dayê m çêşmî zexmim pir nimek bê

Dema dem dûdî ahem ta semawat

Tenim nalan û eşkim ta semek bê⁶⁵⁶

Ji ber xerabiya çerx û felekan

Tijî dibe xoy li çavên birînan

Carna dû ji axim diçe esmana

Dinalim, rondik digihîn masiyan

Çerx û felek ji bo wî xerabiyan dikan û astengiyan derdixînin, nahêlin ku ew xwe bi yarê ve bigihîne. Ew di vê helbestê de behsa sînoran dike ku him li aliyê jor (asîman) û him li aliyê jêr ve axîn û girînên wî gihîştine sînor.

Ew di helbesteke xwe de dibaje: Ey yar! te bi hezaran dil jê biriye. Te bi hezaran cerg tijî xwîn kiriye, min bi hezaran birîn hejmartiye, ji van zêdetir in

⁶⁵⁴ Xeznedar, *b.n.*, r. 212.

⁶⁵⁵ *b.n.*, r. 221.

⁶⁵⁶ *b.n.*, r. 221.

ew ê ku min nehejmartiye. Helbestvan pey wêne û wateyan digere. Ew hewl dide ku her kes pê bihese yara wî yara tevî kesan e. Dixwaze bêje gelek kes girêdayê yara wî ne. Gelek caran jimartiye û li ber jimartine ketiye tengasiyê û dest ji jimartinê berdaye. Ew diyar dike ku ew ê ku min nehejmartine gelek zêdetir in ji yê ku min hejmartine. Helbestvan dixwaze bê zanîn ku ne ku tenê mirovên dinyayê girêdayê yarê ne, her wiha hemû tiştên din bi yarê ve girêdayî ne.

Di helbesta xwe de ew kesên ku evîndarên yara wî ye dipesîne û hezkirina xwe ji wan kesan re wiha tîne ziman:

Xwoşa anan ke sewdayê tû dîrund

Ke serî peyweste payê tû dîrund

Be dil dîrum temennay kesanî

Ke ender dil temenayê tû dîrund

Xwezî bi kesên ku evîndarê te ne

Serên wan di bin lingên te de ne

Ji dil hez dikim ji wan kesên ku

*Di dilên xwe de hezkiriyên te ne*⁶⁵⁷

Baba Tahir di vê helbesta jor de xweziya xwe bi wan kesan tîne, yên ku bi eşqa rast dijîn. Ên ku mîna wî gihîştine eşqa rast û ji rastiya hebûnê têgihîştine dipesîne û hezkirina xwe ji wan re pêşkeş dike. Ew mirovekî taybet e ku di rêya eşqa rast de serê xwe daniye bin lingên yarê û bi tevî hebûna xwe, bê şik û guman xwe radestî yarê kiriye. Di hestên kesên ku eşqa mecazî dijîn de dexesiya neparvekirina yarê heye. Kesên xwediyê eşqa mecezî yara xwe bi kesî re parvenakin û naxwazin keseke din aşiqê yara wî be û dexesiyê dikin. Lê

⁶⁵⁷ Yıldırım, *b.n.*, r. 123.

em di vê helbestê de dibînin ku eşqa ku Baba Tahir dijî ne eşqa mecazî ye. Lewre ew hezdike ku tevên mirovên cîhanê aşiqê yara wî bin. Her tim dilê hemû kesan de yara wî hebe. Di helbestê de diyar dibe ku eşqa ku ew dijî eşqa rastî ye û ew serdanpê di nav eşqeke rast û dilsoz de ye.

Di dilistana Baba Tahir de eşqeke bêhempa heye. Ew tîne ziman ku ev eşq ji berê ber de / ji mêj ve di dilê wî de peyda ye.

Baba Tahir di dubeytiya xwe de bêvînbûna xwe tîne ziman. Dibêje ku evîndarbûna min li deşt, çiya û çolan ketina min ne li destê min de ne. Diyar e ku ew, ji ber eşqa xwe û ji halê cezbeya xwe dergedîwan bûye. Her wiha ew ji vê helwesta xwe gilî û gazince nake. Di heman demê de ji vê rewşa xwe kêfxeş e. Rewşa dilistana xwe û bêvînbûna xwe wiha êşkere dike:

Bewacî ke çira tû bêqerar î

Meger perwerdeyê badê behar î

Çira gerdî be kûh û deşt û sehra

Be canê tû nedarem îxtiyarî

Tu dibêjî ku “çima tu bêqerar î?

Yan tu perwerdeyê bayê behar î?

Çima li çiya, deşt û çolan digerî?

Sond bi canê te min nîne viyanî⁶⁵⁸

Di vê dubeytiya wî de em dibînin ku ew xwe ber bi dilbera xwe ve berdeya. Ew, di bin vîna evîna xwe de ye û ji vê helwesta xwe kêfxweş e. Her tişt bi vîna hezkiriya wî ye, nexwe ew ji her tiştî kêfxweş e.

⁶⁵⁸b.n., r. 346.

Baba Tahir di vê dubeytiya xwe ya jêr de, teslîmbûna xwe ya bi canana xwe, her wiha teslîmbûna bi riza xwe ye, bi gotineke xweşik û xwerû aniye ziman. Her çî ku canan hilbijartiyê ew bi wî qayil e û bi riza xwe ji dilbera xwe razî ye. Vê helwesta xwe wiha tîne ziman:

Yekî derd û yekî derman hilbijart

Yekî wesl û yekî hîcran hilbijart

Ez ji derman û derd û wesl û hîcran

Dibijêrim her çî canan hilbijart⁶⁵⁹

Baba Tahir di dubeytiya xwe ya jêr de, hewcetiya xwe ya bi Xwedê û kesan tîne ziman. Dibêje ku heke Xwedê yarê kesekî be, hewcetiya wî bi kesên din re tune. Her wiha kesê bêkesan bêguman Xwedê ye. Ji ber bêkesbûna xwe wiha gazî Xwedê dike:

Xwudawenda be firyadê dilum res!

Kesê bêkes tû yî mû mande bêkes

Heme goyend Tahir kesî nedare

Xwuda yarê men e, çî hacetî kes!

Xwedêyo bigihîje! Feryada dilê min e!

Tu yî kesê bêkesan, min tu kes nîne

Her kes dibêje ku “Tahir bêkes e”

Kes çî hewce ye? Xwedê dostê min e⁶⁶⁰

⁶⁵⁹ Kara, *b.n.*, r. 133.

⁶⁶⁰ Yıldırım, *b.n.*, r. 141.

Ew, ji ber eşqa xwe ya dilsoz û jiyana xwe ya xwerû di cîhanê de xerîb û tenê ye. Li ber çavên her kesî ew bêkes e. Lê belê li gorî Baba Tahir ew bixwe nebêkes e. Keseke wî heye ku ew kesê hemû mirovan e. Her wiha di vê dubeytiyê de, dostaniya beşerî û ya Xwedayî derdikeve der. Dostê Baba Tahir yê rast û yê herî nêzik bê guman Xwedê ye. Wî xwe bi dostaniya beşerî ve girê nedaye. Dibêje Xwedê yarê min be min tu hewcetiya dosteke din nîne.

Baba Tahir mirovê ronahiyê ye. Bi jiyana xwe qelender e. Dilistana wî wekî zeryayan fireh e ku xwediyê hezkirineke bêtixûb e. Li gorî wî her tişt ji Xwedê ne, nexwe ji hemû heyînan hezkirin ji Xwedê hezkirin e. Her wiha gotin, kirin û jiyana wî lihevhatî ye. Evîn û eşqa wî xwerû ye. Bedeneke wî yê zehmetkêş, dilekî wî yê hesretkêş heye.

Baba, gaziya xwe wiha ji Xwedê dike:

Îlahî wa kiyaşem wa kiyaşem?

Mû ke bê dest û pa yem wa kiyaşem?

Heme ez der berûnend wa tû ayem

Tû ger ez der berûnî wa kiyaşem

Îlahî! Biçim cem kê biçim cem kê?

Ezê ku bê dest û pê me biçim cem kê?

Hemû kes min biqewrînîn têm cem te

Eger tu jî biqewrînî biçim cem kê⁶⁶¹

Cî û warê wî, stargeha wî, welat û mala wî Xwedê ye. Ew, bê dest û pê ye ku dest û pêyên wî, hemû hêza wî Xwedê ye. Xêncî Xwedê tu tiştêkî wî tune. Di vê cîhanê û cîhana din de, di dil û hişê wî de xêncî Xwedê tu tişt tune.

⁶⁶¹ b.n., r. 159.

Ew qas xwe bi Xwedê ve girêdaye ku heznake ji aliyê Xwedê ve were qewirandin. Ew bi rih û canê xwe, xwe sipariye Xwedê û xwe bi timî radestê Xwedê kiriye.

Mirov xwediyê hebûna dualî ye ku ev hebûn ji zewaca laş û nefiseke bimirin û rihekî nemir pêk tînin. Rih di rastiye de bêriya welatê xwe yê rast dike. Mewlana vê ger û helwestê bi sembola “Qamûşa (ney) ku ji welatê xwe hatiye qetandin” rave kiriye. Jiyan rêwîtiya ber bi ez a Xwedayî ye.⁶⁶² Eşqa ku di dilê Baba Tahir de peyda ye, girêdayî van helwestane ku ew eşqeke Xwedayî jiyaye û hewl daye ku zewaca rih û laşê wî ya vê dinê bi dawî be û xwe bi welatê xwe yê rast ve bigihîne.

⁶⁶² Okuyucu, *b.n.*, r. 61.

4. BANDORA BAWERÎ DI BERHEMÊN WÎ DE

Di berhemên Baba Tahir de felsefeya tesewifê bi taybet ramana wehdetê wicûdê hene. Baba Tahir di dîrokê de wekî pêşengê ramana wehdetê wicûdê derdikeve pêş. Ew, tovê ramana wehdetê wicûdê bi dubeytiyên xwe ên xweşik, bi gotinên xwe ên kurt û têrwate, diavêje axa tesewifê. Bi vê pêşengiyê ew di dîroka tesewifê de cihê xwe yê taybet digire.

Di berhemên Baba Tahir de baweriya wî bi awayekî zelal xuya nake. Ji ber vê yekê lêkolînerên ku li ser berhemên wî rawestiyane derbarê baweriya wî nêrînên cuda anîne ziman. Li gorî hin lokolîneran ew Yarsan e, li gorî hinên din ew Misilman e. Lêkolînerên ku wî wekî Misilman pejirandine jî bi du nêrînan nêzîkî baweriya wî bûne. Ji wan hin lêkolîner wî wekî Sûnî hinên din jî wî wekî Şîî pejirandine. Tiştê ku derbarê Baba Tahir bi eşkere tê zanîn ew e ku wî eşqeke Xwedayî jiyaye û ji vê eşqê bawer kiriye.

Di berhemên Baba Tahir de nîşaneyên ayetên Qur'anê hene ku wî wekî Misilman didin xuyakirin. Jixwe berhema wî ya el-Kelîmatu'l Qîşar bi giştî derbarê tesewifê ye. Di heman demê de di dubeytiyên wî de nîşaneyên baweriya Yarsanê hene ku wî wekî Yarsan nîşan dîkin. Di du heb dubeytiyên wî de behsa heşt û çaran hatine kirin ku heşt û çar dîkin duwazdeh û ew jî wekî nîşaneyê Şîîtiyê xuya dike. Her wiha lêkolîner diyar kirine ku dubeytiyên hin helbestvanên Îranî jî tev li dubeytiyên Baba Tahir bûne ku ev rewş jî pîrsa; Gelo ev dubeytiyên ku tev li dubeytiyên wî bûne, nîşaneyên baweriyên dihindurînin? Dibe ku ev dubeytiyên ku tev li dubeytiyên wî bûne ne derbarê baweriyê bin jî. Lê heke derbarê beweriyekî bin, wê gavê têgihîştina ji baweriya Baba Tahir diwartir dibe. Bi van agahiyan derbarê baweriya Baba Tahir pîrsên wiha derdikevin der: Gelo Baba Tahir Misilman e yan Yarsan e? Heke Misilman be gelo ew Sunî ye yan Şîî ye?

Her wiha Ömer Uluçay di pirtûka xwe ya bi navê “Ehl-i Hak Baba Tahir Uryan Zerdûşt” de têkiliya Baba Tahir bi Zerdûştiyê datîne. Ew diyar dike ku Zerdûştî ezmûnên kemalatê dihundurîne. Li hemberî êşê sebr nîşandan, li hemberî zehmetiyên tabkirin, ji her hezar salî carek hatina pêşengek di

Zerdûştîyê de hene. Ev taybetiyên Zerdûştîyê di gotin û kirinên Baba Tahir de diyar e ku ew di berfê de radize, di ava cemed de dimîne û ew di helbesteke xwe diyar kiriye ku di serê hezar salî de hatiye, ku hezar salî carek rêberêk tê di vê baweriyê de. Baweriya ku nû hatiye ya beriya xwe înkâr nekiriye li ser çanda baweriya beriya xwe, xwe ava kiriye. Baweriyên bandor li hevdu kirine û di wan de guherîn peyda bûne.⁶⁶³

Baweriya Baba Tahir li ser du beşan damezirîye. Ev beş; “ez” û “tu” ne. “Ez” Baba Tahir e ku ew sembola hejarî, feqîrî û nûnerê hemû derwêşan e, ku ew derwêş li pey rastiyê ne. Ew li ser rêya “ez”ê ye. Bikeve li ser rêya “tu”yê, wê gavê bawerî bidawî dibe. Tu, xwe di nav yar, çavreş, dil, dilber, cîwanî û bedewiyê de nîşan dide. Her wiha “ez” ew e û “tu” yarê wî ye. Ew hewl dide ku bigihîje rastiyê û tevî jiyana wî bi vî awayî didome. Hiç caran li pey gihîştina “tu”yê naqete.⁶⁶⁴ Ew di dubeytiyeke xwe de wiha dibêje:

Gulistan cihê te ye nazenînim

Ez li kulxan, li ser xwelyê rûdinim

Çi li kulxan, çi li gulşen, çi sehra

*Li ku binêrim, tenê te dibînim*⁶⁶⁵

Helbestvan di vê dubeytiyê de derbarê “ez û tu” agahî dide. Di destpêka helbestê de “ez û tu” ji hevdu cuda ne. “Ez” li kulxanê li ser xwelyê runiştîye, lê “tu” li gulistanê ye. Di dawîya helbestê de helbestvan li kulxanê jî li gulistanê jî “tu”yê dibîne. Her wiha helbestvan li kulxanê, sehayê û gulşenê xêncî “tu”yê tiştêk nabîne.

Di cîhanê de zanist û zanistkar li pey rastiyê ne û dikin nakin rastiyê bidest naxin. Rastiyê nizanin û nabînin. Nizanin çawa ne û li ku derê ye. Lê Baba Tahir rastî dîtiye, dizane û her wiha di hestên xwe de dijî. Ew li rastiyê nagere, lewre dîtiye, dibêje ku beriya madeyê û her tiştî ez hebûm, min rastî

⁶⁶³ Uluçay, *b.n.*, r. 27-30.

⁶⁶⁴ Xeznedar, *b.n.*, r. 203.

⁶⁶⁵ Kara, *b.n.*, r. 55.

dizanî û bi wî re bûm. Niha jî armanca min ev e ku ji nû ve bigihîjime rastiye. Di gotin û jiyana Baba Tahir de diyar e ku wî rastiye bi rêya eşq û cezbeye bidestxistiye.

4.1. TESEWÎF

Ji bo ku Baba Tahir baştir were nasîn divê tesewif jî were zanîn. Lewre ew di çarçoveya tesewifê de xwedî felsefeyekê ye. Him dubeytiyên wî him berhema wî ya el-Kelîmatu'l Qîşar tesewifê dihundurînin.

Peyva tesewifê, ji koka “şaf” ê pêkhatiye û wateya peyvê ‘hirî’ ye. Her wiha tê wateya lixwekirina cil û bergên bi hirî. Xêncî van xwedayina jiyana sofîtiyê ye.⁶⁶⁶ Tesewif ew ilma ku, ji dinê qetandina dil û bi Xwedê ve girêdanê, bi îbadetan safkirina rihê, xastekên nefîsê di bin kontrolê de girtinê, daxwaziya bi Xwedê ve gihîştinê, ji bo gihîştina bi mirovê kamil mertebe, rê û rêzikan û razên tewhîdê rave dike ye. Tesewif rastiya ku “bingeha îmanê tewhîd e” diparêze û vê rastiye hîn dike. Bi baweriya tesewifê û jiyana sofîzmê, di derûniya mirovan de moral û hêzbûn peyda dibin. Mijara tesewifê mirov, rihê mirov, rewîşt û derûniya mirov in.⁶⁶⁷

Li gorî mutesewifan rêya tesewifê ew e ku mirov piştî xwe bide bedewî û zînetî dinê, dilê xwe ji mal, milk û meqamên dinê veqetîne, xwe ji gel cuda bike û ber bi Xwedê ve beralî bibe. Berevajî kesên ku ber bi malê dinê ve beralî bûne, ew kesên ku xwe dane îbadetê re sofîye û mitesewif hatiye gotin. Ev peyv ji peyva “sûf”ê tê. Lewre wan kesan dest ji cil û bergên bedew berdane û sûf li xwe kirine û li hember ên din bûne muxalîf.⁶⁶⁸

Li gorî bingeha tesewifê Xwedê bi wateya” heyîna ji berê ber de” qedîm, gerdûn jî bi wateya “çêbûna paşê” hedîs in. Ji ber ku afirînerê her tiştî Xwedê ye, divê “tum”îya heyînê were gotin. Bi çarçovaya vê ramanê fikir xwe gihaye wehdetê wicûdê (yekitiya heyînê). Ji ber ku her yekî heyînê gerdûnê eksê Xwedê ne, meriv zanîna wan û her wiha ya Xwedê tenê bi xwevegerîna

⁶⁶⁶ Louis Massignon, “Tasavvuf”, *İslam Ansiklopedisi*, weş. MEB, Eskişehir, 1997, XII, r. 26.

⁶⁶⁷ Türer, *b.n.*, r. 23-24.

⁶⁶⁸ *b.n.*, r. 30.

hundirê xwe ve bi dest dixê. Di wehdetê wicûdê de li gorî hîndariya fenayê (tunebûyîn) divê armanca mirov bi Xwedê ve yekbûn be û xwe di heyîna Xwedê de helandin be. Di dawiya vê pêvajoyê de mirov bi evîndariya Xwedê, bi ji xwe derbasbûnê ve rastiya ku dijî bi çavên cuda dibîne. Di çerçoveya wehdetê wicûdê de bi nêrîna ramangêrên tesewifê heyîn bi timî xuyabûna heyînekê ye, yanê xuyabûna Xwedê ye. Van ramangêran ji bo ku hebûn û heyînê rave bikin serî li têgehên feyz, hulûl, sudûr û urûcê xistine. Ramangêrên tesewifê di heman demê de ji aliyê hin kesan ve hatine rexne û sûcdarkirin ku wan bi vê ramana xwe ve pir Xwedayî derxistine holê.⁶⁶⁹

Di Îslamiyetê de di derbarê tesewifê de çawa û di kîjan demê de destpêkiriye gengeşî hene. Di serdema xelîfeyên Îslamê de hin cudatî derketine holê. Di mijara qederê, mijara piştgiriya Hz. Elî û xelîfebûna Hz. Elî de niqaş derketine. Hin komên ku hulûl û tenasûhê dipejirandin, pişt re dê Şîtiyê derxistina holê. Dînê Îslamê di nav gelên Zerdûşt, Budîst, Xiristiyan, Musewî, Manîheîst û wd. de belav bûye. Bi belavbûnê, dînê Îslamê wekî xwe nemaye, hin fikir û sepandinên cuda derketine holê. Ji komên ku li ser Qûr'anê hûr bûne, bi ramana di Qûr'anê de em daketin alema hundir û ji derûniya Qûr'anê têgihîştin, “batinitî” derkete holê. Her wiha di van deman de sofîti derkete holê. Piştî Sofî Ebû Hîşamê Kûfeyî di sedsala IX'an de Sofiyên Xorosanê û yên Iraqê wekî du komên serbixwe derketin holê. Di piştî sedsala X'an de felsefa Yewnanan li ser tesewifê bibandor bû. Faxruddîn Razî, Farabî, Îbn Sîna paşê Kuşeyrî û Gazalî wekî mutesewif li ser tesewifê rawestiyan û tesewif pêş de çû. Piştî re terîqet derketine holê. Tekke li hev zêde bûn û derwêşitî di nav civakê de belav bû. Ji hikumdarên heta bendeyan her kes nêzikî tesewifê bû û ji tesewifê çêj girtin. Piştî Muhyîddînê Erebi ramana tesewifê bêtir xurt bû di nav gelên misilmanan de bêtir belav bû. Di van deman de li ser axa Îranê “wêjeya dîwanê” za û belav bû. Di vê wêjeya navborî de tesewif cihê xwe yê xurt girt. Ramana tesewifê di helbestên nivîskaran de ji aliyê mutesewifan ve bi pîvana arûzê û bi ahengî hate ristîn. Sofî anîne ziman ku Xwedê ji ber ku xwe bibîne û bide nîşandan alem afirandiye. Mirov çawa ku ji ber ku xwe bibîne li awêneyê

⁶⁶⁹ Ulaş, *b.n.*, r. 1397.

dinhêre her weha Xwedê jî ji bo temaşaya bedewbûna xwe, alem û mirovên ku di alemê de nirxtir in afirandiye. Xwedê vê helwesta navborî bi hedîsa pîroz “Ez gencîneya veşartî bûm. Min xwest Ez bêm zanîn û Min alem afirand” bi me daye haydarkirin. Tesewif ji bo ku mirov bigihîje Xwedê, ji tevî mertebeyan derbasbûyînê rave dike. Li gorî tesewifê wicûda mutlaq û husna mutlaq Xwedê ye. Armanc, xwe gihandina Xwedê ye. Bingeha tesewifê eşqa Xwedayî ye. Di vê rêyê de tiştê yekem ku divê were kirin, tunekirina nefsê ye. Rêya tunekirina nefsê tesewif e. Ji bo vî jî deh heb bingeh hene. Ji vê re “ûsûl-î aşare” tê gotin. Ev bi rêzê ve; tobe, zuhd, tewekul, qenaet, uzlet, zikir, ji Xwedê hezkirin, berbi Xwedê ve beralîbûn, sebr, mûraqebe û riza ne. Ev jî ji heft mertebeyên nefsê (etwar-i seba ên nefsê) pêktên. Di dawiya dawiyê de meqama wehdetê bidest dikeve û fenafillah (tunebûna di Xwedê de) diqewime. Ev jî bi beqabîllahê (her tim bi Xwedê ve bûyîn) ve didome. Êdî tesewif, peywira xwe bi cih tîne.⁶⁷⁰

4.1.1. Tesewif û Mirov

Mirov ji aliyekî ve fanî ye, ji aliyê din ve ebedî ye. Îbn Erebi diyar dike ku: “*Mirov him nûnerê Heq e, him jî yê gel e. Aliyê mirov ê derve gel e, aliyê wî yê hundir Heq e. Nexwe hundirê mirov (aliyê ku nayê dîtin) Xwedayê mirov e.*” (Fusûs,18)⁶⁷¹

Cudabûn ji bo mirov helwesteke gelek girîng e. Jiyana mirov li ser çîrokeke cudabûnê ye. Sofiyê mezin Bayazidê Bîstamî (kd. 261/874) wiha dibêje: “*Ji ber ku di hundirê mirov de ronahiya bêdawiyê dişixule, behsa bêdawiyê dike.*” Her wiha Nietzsche wiha dibêje: “*Ez di hemû bajaran de xerîb im, min li tu derî welat nedît.*” Mirov awêneya Xwedê ye û Xwedê mirov bi awayekî taybet afirandiye. Mirov dilê alemê ye. Mirov li ser sûretê Xwedê hatiye afirandin. Îbn Erebi diyar dike: “*Welatê ku jê re laşê mirov tê gotin sitargeha Xwedê ye.*” (Fûtûhat) Îbn Erebi diyar dike ku: *Ji ber ku tu sûretê*

⁶⁷⁰ Îskeder Pala, *Divan Edebiyatı*, ç. 4, weş. L&M, Stenbol, 2002, r. 36-39.

⁶⁷¹ İbn Arabî, *Fusûs el-Hikem*, (Wer.: N. Gencosman), İstanbul, 1952, vgz. Yaşar Nuri Öztürk, *Mevlana Celâleddin Rûmî ve İnsan*, ç. 6, weş. Yeni Boyut, İstanbul, 2000, r. 47.

Heq î, Heq jî rihê te ye, tu mîna wekî sûretekî Heq î ku li ser bedenekî xuya dikî; Ew jî mîna rihê ku sûretê bedena te bi rê ve dibe ye.” (Fusûs)⁶⁷²

Mirov başî û xerabiyê, bedewî û nexweşikiyê, xêr û şerê di hundirê xwe de dihundirîne. Mirov xwediyê hestên berz û niçên bênirx in. Mirov bi kirinên xwe ji ajalan nimiztir û ji ferîşteyan bilindir e.⁶⁷³ Di dinê de di derbarê Xwedê de delîlê herî girîng mirov e ku hemû razên Xwedê di mirov de veşartî ne. Ji ber vê helwestê ji bo naskirina Xwedê naskirina mirov wekî merc hatiye pejirandin. Mirov di nav heyînên ku hatine afirandin de yê herî girîng e ku mirov tune be wateya hebûnê jî tune ye.⁶⁷⁴

Tesewif, di nav hemû heyînan de mirov wekî yê herî berz dîtiye, bala xwe bi timî daye mirov û li ser mirov hûr bûye. Ji ber ku mirov rihek ji afirîner dihidurîne, tesewif hewl daye ku mirov derxe asta herî berz. Di heman demê de di tesewifê de her tiştên ku afirîner can û rih dayê, yên zindî û yên bêcan, binirx û berz in. Sofî nirx dane her tiştên ku hatine wicûd. Li gorî baweriya wan, her tişt di xwe de rihê Xwedayî dihundirînin. Ew bi devê xwe av ji ajalan re anîne, birînên ajalan derman kirine û ji wan re hêlînan çêkirine. Dema ku kevirek li erdê dîtine, bi piyên xwe lênedane, bi destên xwe rakirine û danîne cihekî. Mitesewif ji bo arambûna deruniya mirovên civaka xwe seyr û silûkê pêşniyar kirine ku ev rê destpêka guherîne ye. Bi vî awayî rêya pijîn û şewitînê li ber mirovan vekirine. Sofî, rêya xwe bi Xwedê ve girêdan û bi Xwedê re jiyanê hînê mirovan kirine. Mîna jiyana Baba Tahirê Uryan, bê şert û merc ji Xwedê hezkirinê û bêyî daxwaza bihûştê û tirsê dogehê, rastiya tenê ji dil ve ji Xwedê hezkirinê hînê mirovan kirine. Wan xwestine ku mirov di nav berjewendiyên xwe de nexeniqin, ne ji bo çûyîna bihûştê ne jî ji tirsê dogehê ji Xwedê re îbadetê bikin. Hewl dane ku mirov bi fenayê xwe bişûn û ji nefîsê

⁶⁷²*b.n.*, r. 49.

⁶⁷³*b.n.*, r. 46-47.

⁶⁷⁴ Mahmut Erol Kılıç, *Sufî ve Şiir*, weş. İnsan, İstanbul, vgz. Turan, *b.n.*, r. 47.

xwe rizgar bikin. Wan, rê û rêbaza jiyana ku her tim bi Xwedê re ye, hînê mirovan dane û bawer kirine ku mirov dê bi vî awayî azad bibin.⁶⁷⁵

Sofi ramana; “Ê ku xwe dizane Xwedayê xwe dizane” diparêzin. Ji ber ku mirov xwe bizanibe û rastiya sedemê hebûna xwe bizanibe, Xwedayê xwe jî dizane. Mirovê ku Xwedayê xwe bizane, dizane ku her tişt ji Xwedê peyda bûne û dîsa dê vegerin Xwedê. Ev mirov hemû heyînan di nav yekitiyeke berz de (wehdetê de) difikire. Îbn Erebi bi gotina xwe ya: “*Hîç tiştek ji ya bêtixûb ne azad û ne jî dûr e*” vê ramanê rave dike. Tesewif rêya herî rast e ku mirov bi zanîna rast ve digihîne. Ew ne mezheb e, lewre ew rastiya mutleq e. Terîqet jî rêya ku digihîne rastiya mutleq e. Mutesewif di seyr û silûkê de her ku pêş ve diçe pêwistiya girêdayîbûna baweriyê baştir fêmdike. Him jî vê pêwistiyê ji ulemayên zahirê bêtir û bi awayekî derûnîtir fêmdike. Ji ber ku ulemayên zahirê tenê ji aliyê dirûv ve baweriyê dibînin û ji aliyê hundir û ya veşartî ve baweriyê nabînin û najîn. Lê belê sofî ji aliyê rihê baweriyê ve baweriyê dibînin û bi vî awayî jî dijîn. Tesewif ji alema metafîzîkê bidestxistina zanîne ye. Di kevneşopiya Îslamê de çavkaniya herî girîng ya ku helbestê geş dike tesewif e. Dikare were gotin ji bo helbestê felsefeya herî baş tesewif e. Li gorî sofîyên helbestvan helbest amûrek e, ne armanc e. Sofîyên mitesewif bi hêza ku ji hestên wan peyda bûye helbestên giranbiha nivîsîne.⁶⁷⁶

Baba Tahir, wekî mirovek ji aliyê jiyana û ramana xwe ve bi tesewifê re têkil e û ew wekî mutesewifek derdikeve pêşberî me. Wî puxtaya mirov û afirîner heman dîtiye û mirov parçeyek ji afirîner dîtiye. Di berhemên xwe de yekitiya heyînan aniye ziman. Her wiha di berhemên xwe de peyv û mertebeyên metafîzîk û tesewifî ên mîna: wehdet, rind, pîr, eşq, aşiq, gihîştin, cudatî, hal, rind, xerabat, qelender, tobe, raz û wd. bikar anîne. Ew ji aliyê raman û şeweyê jiyana xwe ve lihevhatî ye. Yanê çawa ponijiye wisa jî jiyaye.

⁶⁷⁵ Ali Tenik, *Tarihsel Süreçte Kürt Coğrafyasında Tasavvuf ve Tarikatlar*, weş. Nûbihar, İstanbul, 2015, r. 9-10.

⁶⁷⁶ Turan, *b.n.*, r. 672.

4.1.2. Baba Tahir û Tesewif

Baba Tahir di heman demê de mutesewif e ku ev peyv peyveke Erebi ye û ji kesên ehlê tesewif re tê gotin. Evdîlqadir Geylanî yê ku di rêya tesewifê de binav û deng e dibêje; mutesewif ew kes e ku ji her guman û bendan xwe rizgar kiriye, tenê berê xwe daye Xwedê, bendetiya her tiştî û her kesî terikandiye û tenê ji bo Xwedê îbadetê dike.⁶⁷⁷

Helbest, di cîhana Îslamê de ji sedsala nehem vir ve wekî amûreke vegotinê di tesewifê de hatiye bikaranîn. Ji ber vê yekê gelek sofiyên Erebi, Fers, Tirk û Kurd ji bo bilêvkirina ramanên xwe yên tesewifî helbest bi kar anîne.⁶⁷⁸

Helbestên dînî bingeha helbesta sofitiyê ye. Lê di helbesta dînî de mîna helbasta sofitî helandin û dest ji her tiştî şûstin tune. Di helbesta dînî de pêsnên Xwedê, pêxember û yên welîyan hene. Her wiha dia, îbadet û ji nefse gazincekirin hene. Di helbestên Baba Tahir de zêdetir daxwazî ji Xwedê heye.⁶⁷⁹ Ev daxwazî û lawayî di hin helbestên wî de gelek bişewat in. Lê mijarên ku di helbestên dînî de hene di helbestên wî de gelek kêr in û hin mijar jî hîç cih nagirin.

Mutesewifî û helbestên tesewifî divê ji hev werin cudakirin. “Hin helbestvan hene ne mutesewif in lê belê ji bo ku tenê helbestên xwe ji aliyê bilêvkirinê xurtir bikin têgeh, biwêj û mecazên tesewifî di helbestên xwe de bi kar anîne. Mutesewif ew kes in ku ew û berhemên wan girêdayî hevdu ne. Xwe banandine di nav helbestên xwe de. Di navbera jîyan, raman, bawerî û helbestên wan de aheng hene.⁶⁸⁰ *“Helbestvanên mutesewif, rêya ku girtine eşkere û pênase dikin û di heman demê de helbestên wan jî ji rêya ku girtine dernakevin.”*⁶⁸¹ Baba Tahir jîyana xwe bi tesewifê re borandiye. Guh nedaye

⁶⁷⁷ “Mutasavvîf”, [https://tr.m.wikipedia.org], Gihîn: 30 Gulan 2015

⁶⁷⁸ Bnr.: Fuat Köprülü, *İlk Mutasavvîflar*, ç. 3, weş. Türk Tarih Kurumu Basimevi, Ankara, 1976.

⁶⁷⁹ Şiwan, *b.n.*, r. 33.

⁶⁸⁰ İsmail Ünver, “Yunus Emre Üzerine”, *Türklük Bilimi Araştırmaları Dergisi*, j. 19, bihar 2006, r. 490.

⁶⁸¹ *b.n.*, r. 491.

çêj û kêfa dinê û pey mal, milk, kinc û diravan neketiye. Hin gotinên tesewifî yên Baba Tahirê mutesewif wiha ne:

Ew kesên ku nezaniyê ew kuştine, hiç nejîne û zinde nemane.

Kesên zikrê ew kuştine, hiç nemirine û namirin jî.

Ji destê cahiliyê, bilez bireve, çawa tu ji destê dijminên har û cinawiran birevî.

Cahilî, rewşek pir neqenc û bed e.

Nezanîn kêmasiyek e, nehînbûn kêmasiyeke dubare ye.⁶⁸²

Baba Tahir wekî pêşengê ramana wehdetê wicudê ye û yekem kesê ku ramana wehdetê wicûd di helbestên xwe de bi kar aniye ew e. Wî bi berhemên xwe tovê ramana wehdetê wicûdê reşand li ser axa tesewifê. Bi vî awayî ew kesayetekî mutesewif e û berhemên wî jî berhemên tesewifî ne. Berhemên wî nola awênêkî jiyar, raman û baweriya wî radixin ber çavan. Baba Tahir ji rêya xwe tu car şaş nabûye, di rêya tesewifê de çûye û kemiliye. Hunera wî di helbestên wî de diyar e.

Baba Tahirê mutesewif ji aliyê derwêş û sofîyan ve hatiye hezkirin, gotinên wî wekî gotinên pîroz hatine pejirandin û jiberkirin. Li ser berhemên wî gelek lêkolîn û şîrove hatine kirin. Ew ne tenê ji aliyê gelê Kurd ve ji aliyê tevî kesên Xwedêhez ve hatiye hezkirin. Helbestên sofîzmê her wiha yên Baba Tahir ji aliyê evîndarên derveyî sofîzm û tesewifê jî tên hezkirin û xwendin.

Baba Tahir xwe di wêjeya tasawifê de bi peyvên ku xwedî cihekî taybet in, ên mîna “rind”, “qelender” û “derwêş” dide nasîn. Wekî mînak, ew di helbesta xwe ya jêr de wiha dibêje:

Mû an rindûm ke namim bî qelender

Ne xan dîrum ne man dîrum ne lenger

⁶⁸² Sağniç, b.n., r. 72.

Çû roz aye begerdem girdê koyet

Çû şew aye be xiştan wanehem ser

Ez ew rind im ku navê min qelender

Ne xan û malên min hene ne lenger

Dema dibe roj li dora mala te digirim

*Dema dibe şev kevir datînim bin ser*⁶⁸³

Em wateyên her sê peyvên navborî binêrin da ku wî baştir binasin.

Qelender, ew kesên ku têkiliya xwe ji dinê birîne û ber bi Xwedê ve beralîbûne ne. Ev peyv ji endamên terîqeta Qelenderiyê re tê gotin.⁶⁸⁴ Qelender ew sofîyên ku dinê û nirxên dinyayî hez nakin in. Ew, bawerî û kevneşopiya pergala civaka ku tê de jiyane nepejirandine û bertekên xwe bi cil û bergên xwe, bi helwest û tevgerên xwe di jiyane rojane de nîşan dane. Bi serxweşiya paqijiya dil ji sînoren şerîetê derbasbûne û ji xêncî ferzan rojî û nimêjê kêr kirine. Ew li pey berhevkirin û pirkirina dirav, kinc, xwerin û vexwarinan neketine. Ew cil û bergên dîndar, abid û zahidan xwe nekirine, tevgerên wan ji xwe re wekî mînak negirtine. Dilên wan ên paqij û yên ku her tim bi Xwedê re ne, têra wan kirine. Wisa tê bawerkirin ku qelenderîtî wekî bizavekî muxalif ya civakî ji aliyê hin sofîyên ku nîva duyem ya sedsala X û nîva pêşîn ya sedsala XI'an derketiye der. Ev sofîyan ên mîna Ebû Ehmedê Çiştî, Baba Tahirê Uryan, Baba Hemşa û Ebû Seîdê Ebul Xeyr in. Ji van sofîyan Baba Tahir, Baba Baba Ce'fer û Seyîd Hemşa li gel hev li durê bajêr di çiyayekî de jiyaneke xwerû jiyane. Di dirokê de yekem car Baba Tahir ji xwe re gotiye qelender û xwe wekî mirovekî qelender pênase kiriye.⁶⁸⁵

⁶⁸³ Yıldırım, *b.n.*, r. 136.

⁶⁸⁴ Cebecioğlu, *b.n.*, r. 343.

⁶⁸⁵ Nihat Azamat, "Kalenderiyye", *DÎA*, weş. TDV., İstanbul, 2001, XXIV, r. 253.

Rind, yên ku bi hîç awayî xwe bi kevneşopiyên dînî ve girênedane re tê gotin. Ew kesên karên dinê xweş dibînin, tuj-şîrîn, şabûn-xemgînî û başî-xerabiyê heman dibînin re tê gotin. Xemgînî û şadî ji bo rindan heman in. Ji bo rindan dinya kêrê keşkekî nayê. Helbestvanekî ku di jiyana xwe de hîç şerav venexariye lê behsa meyxañê, saqî, qedeh û şeravê bike, bêguman ew jiyaneke rindane tîne ziman.⁶⁸⁶

Peyva derwêş di Avestayê de bi awayên “drigoş”, “deryoş” û drigû” hatine bikaranîn. Di Kurdiya niha de wekî derwêş, di Farisî û Tirkiya niha de wekî dervîş tê bikaranîn. Ev peyva Îranî, derbasî zimanê Erebiyê bûye û di zimanê Erebi de bi awayê pirjimar wekî *deravîş*⁶⁸⁷ tê bikaranîn. Ji ber ku rayeka peyvê “der”e, ev peyv ji aliyê wateyê ve wekî “kesên ku li ber deriyane” ve hatiye şîrovekirin. Derwêş murîdên ku bi terîqetekî an jî bi şêxekî ve girêdayîne re tê gotin. Her wiha kesên ku jiyaneke sofitiyê dijîn re jî tê gotin. Sofî gelek nîrx nîşanê derwêşiyê kirine. Derwêşî bi parêziya bi rêk û pêk ve dest pê dike. Di vê parêziyê de xwarin, vexwarin, axaftin û razan kêmtir in. Li hemberî vê îbadet, zikir û tefekur gelek in û armanc terbiya nefsê ye. Bi vî awayî ji aliyê rih ve kemilîbûn bi dest dikeve. Derwêş jiyaneke gerok dijîn û xwe hîne her cure zehmetî û astengiyan dikin. Di rastiyê de gera wan, ji alema madî ber bi alema rihê ye. Ew bi pîranî girîngî nadin cil û bergên xwe, kincên kevn li xwe dikin. Sedemê vê helwestê jî ji bo ku hundirê wan bedew be divê dirûvê wan ê derve xweşik xuya neke ye. Mewlana van derwêşan wekî “siltanên li bin xirkeyan” dinavîne. Di rêya Xwedê de nefspîçûkî û xizaniyê ji xwe re esas digirin. Bi keramet û qenaetkar in. Ji bo derwêşên heq qotek nan û cil û bergêk têrê ye.⁶⁸⁸

Baba Tahir di helbesteke xwe de wiha dibêje:

Ez an kuncê lebut bûsî be mû de

Bego: Rahê Xwuda dadem be derwêş

⁶⁸⁶ Pala, *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, r. 377.

⁶⁸⁷ Cebecioğlu, *b.n.*, r. 61.

⁶⁸⁸ “Dervîş”, Tahsin Yazıcı, *DİA*, weş. TDV., İstanbul, 1994, IX, r. 189-190.

Li ser wî levê xwe maçek bi de min

*Bêje: Min vî ji bo Xwedê da derwêş*⁶⁸⁹

Di vê helbestê de ew derwêşiya xwe tîne ziman û paçkirin jî di tesewifê de sembola gihîştinê ye.

4.1.3. Baba Tahir, Tesewif û Wêjeya Kurdî

Ji ber ku tesewif felsefeyeke xurt û balkêş e, di wêjeya Kurdî de jî xwedî cihekî taybet e. Tesewif di nav çavkaniyên wêjeya Kurdî de çavkaniya herî xurt e ji bo Wêjeya Klasîk a Kurdî. Hevîrê berhemên Wêjeya Klasîk a Kurdî bi tesewifê hatiye çêkirin ji aliyê arif û wêjevanên Kurd ve. Her wiha pirtûkên tesewifî ên Kurdî ji aliyê Kurd û neteweyên din gelek nîrx dîtine û di nav wêjeya Kurdî de wekî berhemên sereke cihê xwe girtine.

*“Tesewifa ku wek felsefeyeke Îslamê tê pênasekirin di seranserê serdema klasîk de li ser şair û berhemên wan fikra herî kartêker bû û bi her awayî xwe nifûzî nav deqên klasîk ên Kurdî kir.”*⁶⁹⁰

*Tesewif bi tena serê xwe belkî bi qasî çavkaniyên dînî hemûyan di edebiyata Kurdî ya klasîk de cih girtiye û jê re bûye çavkaniyeke girîng. Her çî qas di destpêkê de tesewif di çarçoveya esasên dînî de derketibe meydanê jî, piştî wekî bizaveke nûjen hinek esasên nû ku di zahirê şerîetê de cihê wan tinebûn ketine nava wê û bi vî awayî ji aliyê “ehlê şerîe”tê ve hatiye redkirin.*⁶⁹¹

Di nav Kurdan de bi nêrînên xwe ên tesewifî mitesewifên hêja ên ku bandor li ser nişên li pey xwe hatine kirine derketine. Ev mitesewifan bi raman û şîroveyan xwe nêrînên cuda anîne li qada tesewifê, ku raman û şîroveyan mitesewifên Kurd ne tenê li nav Kurdan di heman demê de li derveyî erdnîgariya Kurdan jî li ser kesên ehlê tesewifê kelecana û peywendî pêk anîne. Bi raman û şîroveyan wan ên ku li ser Xwedê, heyîn, mirov, eşq, merîfet û wd.

⁶⁸⁹ Yıldırım, *b.n.*, r. 24.

⁶⁹⁰ Hêzil, *b.n.*, r. 69.

⁶⁹¹ Adak, *b.n.*, r. 35.

hatine kirin, ekolên nû û nêrînên tesewifî ên nû derketine holê. Raman û şîroveyên van mitesewifan ji erdnîgariya Kurdan derketine û belavê erdnîgariyên cuda bûne, her wiha li wan deran bandor ser mirovan kirine. Ji wan mitesewifan em dikarin Baba Tahirê Uryan (kd. 1010), Eliyê Herîrî (kd. 1078), Tacu'l Arifîn Ebû Wefayê Kurdî (kd. 1107), Şêx Ehmedê Cizîrî (kd. 1664), Feqiyê Teyran (kd. 1660) û Ehmedê Xanî (kd. 1707) wekî mînak bidin. Ev mitesewifan di heman demê de zimanê Kurdî pêşve birine û Wêjeya Kurdî dewlemend kirine.⁶⁹² Her çî qas di hin lêkolînan de hatibe diyarkirin ku zimanê Kurdî di sedsala XV'an de derbasê qada wêjeyê bûye,⁶⁹³ ya rastî ew e ku zimanê Kurdî di sedsala XI'an de bi Baba Tahirê Uryan ve derbasê zimanê wêjeyê bûye.⁶⁹⁴ Baba Tahir bi berhemên xwe wekî xîmê Wêjeya Klasîk a Kurdî xuya dike. Di heman demê de berhemên wî di nav sofîzma Îslamê de xwedî cihêkî taybet in. Berhema wî ya el-Kelîmatu'l Qîşar berhemeke tesewifî ye. Di vê berhemê de bi gotinên wî ên puxtedar, aliyê wî yê tesewifî derdikeve pêş, her wiha ramanên softî û arifbûna wî xuya dike. Berhem ji aliyê mutasawifên Kurd û ên ne Kurd ve peywendiyê xurt dîtiye. Gelek şîrove li ser vê berhemê hatine kirin.

*Çi tesewifa zuhdî çî ya felsefî be, gelek têgehên tesewifî di edebiyata Kurdî ya klasîk de cih digirin. Bi taybetî tesewifa terîqetan gelek bandor li edebiyata Kurdî kiriye ku bi navê edebiyata tekkeyê şaxekî edebî yê serbixwe saz bûye. Ev edebiyat zehfîr li ser bîngeha medhiyeyên pîr û şêxên tekkeyan ava bûye.*⁶⁹⁵

Di serdema Baba Tahir de sofîzma Îslamî neketiye nav wêjeyê. Sofîzm wekî bîrdoziyeke sist hebûye. Lê dîsa di serdema wî de di nav sofîzmê de wêjeya irfanî hildibe û dest pê dike. Wêjeya irfanî xwe bi remzan ve girêdaye ku arifan hestên xwe bi remzan ve anîne ziman. Her wiha bawerî û felsefeya sofîzmê di remzan de veşartî mane. Ev şewaz ji aliyê sofîyan ve wekî rêbazeke

⁶⁹² Uzun, Destpêka Edebiyata Kurdî, *b.n.*, r. 19-21.

⁶⁹³ Amir Hassanpour, *Kürdistanda Milliyetçilik ve Dil 1918-1985*, (Wer.: İbrahim Bingöl, Cemil Gündoğan, weş Avesta, İstanbul, 2005, r. 165.

⁶⁹⁴ Ali Tenik, "Kürtlerde Tasavvuf ve Tarikatlar", Adnan Demircan, *Kürtler*, ç. 2, weş. Nida, İstanbul, 2015, r. 336.

⁶⁹⁵ *b.n.*, r. 36.

baştir hatiye pejirandin ku bi vî awayî sofî hestên xwe bi aramî bi peyrewên xwe ve gihandine.⁶⁹⁶

Sofizim wekî serhildan, nûkirin û guherînek e. Ev nûbûn çawa ku di nav neteweyên ne Ereb de qewimî, di heman demê de, di serdema Baba Tahir de di nav neteweya Kurdan de jî qewimî. Her wiha bandor li wêjeya Kurdî kir û di wêjeya Kurdî de guherîn pêk hat. Ji serê Îslamê heta heyama Baba Tahir tiştê baş û xurt ji wêjeya sofizma Îslamê negihîştîye destê me, ji bilî Mensûrê Hellac. Em dikarin Baba Tahir damezirînerê “Helbesta Sofizimê” bibînin û bipejirînin. Baba Tahir ne tenê damezirînerê Helbesta Sofizmê ya Kurdî ye her wiha damezirînerê beşeke Sofizma Îslamî û ya Kozmosî ye jî.⁶⁹⁷

Di wêjeya tesewifî ya rojhilatê de di navbera şêwe, naverok û ramanê ve têkiliyeke xurt heye. Di navbera Baba Tahir, Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî ên ku Kurdî nivîsîne, Îbn Erebî, Îbn Farîd ên ku Erebî nivîsîne, Celaledînê Rûmî, Camî û Nizamiyê ku Farisî nivîsîne û Yûnis Emreyê ku Tirkî nivîsiye de têkiliyên balkêş hene ku van wêjevanên mîstîk bandor li hev kirine.⁶⁹⁸ Ev bandor ji ber ku hemû ji heman çavkaniyê sûd wergirtine û ji berhemên hevdu bandor girtine tê. Di berhemên hemû mitesewifên navborî de mijara herî girîng eşq e ku hemûyan jî eşqê bi şêweyê bêhempa di berhemên xwe de ristine.

Baba Tahir bi zimanê hal helbestan nivîsiye û bi vê şêweyê xwe bandor li helbest û ramanên tesewifî yên Eliyê Herîrî, Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran û Ehmedê Xanî kiriye. Ew bi gotinên xwe ramana di her tiştên gerdûnê de Xwedê tecelî kiriye aniye ziman. Li gorî wî, heyîn bi timî di heyîna mutleq de yanê di afirîner de digihîjin hevdu. Ji ber ku her tişt rihek ji afirîner dihindirînin û bi teceliya afirîner derketine der, tenê yek hebûn heye ku ew jî afirîner e. Ji ber van hincetan ji her tiştî hezkirin, ji Xwedê hezkirin e.⁶⁹⁹

⁶⁹⁶ Xeznedar, *b.n.*, r. 202.

⁶⁹⁷ *b.n.*, r. 202.

⁶⁹⁸ İzzeddin Mustafa Resûl, *Bir Şair Düşünür ve Mutasavvıf olarak Ehmedê Xanî ve “Mem û Zîn”*, (Wer.: Kadri Yıldırım), weş. Avesta, İstanbul, 2007, r. 385.

⁶⁹⁹ Tenik, *b.n.*, r. 185.

Baba Tahir çawa bi berhemên xwe ve di wêjeya Kurdî de cihê xwe yê taybet girtibe di heman demê de di nav sofîzma Îslamî de xwediyê cihêkî taybet e.

4.2. WEHDETÊ WICÛD

Peyva “wehdet”ê peyveke Erebi ye. Tê wateya parçenebûn û yekbûna tiştêkî. Her weha ev peyv di Erebi de wekî dijberê peyva pîrbûnê tê bikaranîn. wehdet yekbûna rastî ye ku nayê parçekirin û qetkîrin. Wehdet wekî dijberê pîrjimarê (kesretê) tê bikaranîn.⁷⁰⁰

Peyva “wicûd”ê jî peyveke Erebi ye. Wateya peyvê, heyîn e. Tiştên ku bi hiş tîn zanîn in. Her wiha wateyên wicûd û mewcûdê ji hev cuda ne. Wicûd heyîna yek û kit e, bêguman ew jî Xwedê ye ku bêguherîn e. Mewcûd jî tevî mexluqat û mevcûdat in ku di xwezaya xwe de diguherin û ji hev zêde dibin. Wicûd yek e û mewcûdat jî ji teceliya Xwedê pêk tînin.⁷⁰¹

“Wehdetê wicûd” tê wateya “yekitiya heyînan”. Têgihîştina ji xêncî Xwedê hîç tiştek tune ye. Li gorî vê ramanê hebûna rast yek e, ev hebûn jî Xwedê ye, xêncî heq û teceliya Xwedê hîç tiştek tune ye. Alem xwenîşandan û teceliya Xwedê ye. Rastî di yekitiya hebûnê de ye. Yekbûna hebûnê bi dîtîna na bi têgihîştîna bi dest dikeve. Salikê ku bi zewqê wehdetê wicûdê bidest dixê û bi jiyîna pê tîdigihîje, dizane ku her tişt ji Yek e û ji rûçikê Xwedê ne. Li gorî wehdetê wicûdê alem xeyal e, tenê Xwedê heye, alem sîh e û Xwedê bixwe ye, her wiha Xwedê ji alemê wêdatir e.⁷⁰² Bingeha tevî alemên ku tê dîtîna û tê fikirîna hebûna veşartî ye ku ew ne bi hestan ne jî bi hiş dikare bê fêmkirin. Gerdûn sîheke demborî ya hebûna rast e.⁷⁰³

⁷⁰⁰ Ali Durusoy, “Vahdet”, *DÎA*, weş. TDV., İstanbul, 2012, XXXXIII, r. 430.

⁷⁰¹ Ali Durusoy, “Vücûd”, *DÎA*, weş. TDV., İstanbul, 2012, XXXXIII, r. 137-138.

⁷⁰² Cebecioğlu, *b.n.*, r. 683.

⁷⁰³ Turan, *b.n.*, r. 729.

Li gorî ramana wehdetê wicûdê, xêncî Xwedê tu heyîn tune ye, heyîn bi timî ji Xwedê tèn û bêyî Xwedê nikarin hebin. Sofî, tevî wicûdan yek dipejirînîn û dibêjin, di wicûdê de bes Xwedê heye.⁷⁰⁴

Di nav civaka misilmanan de bi taybet di serdema Emewiyan de çêj û kêfxweşiyek dihate jiyîn. Rêvebirên Emewiyan di nav dewlemendiyekê de jiyaneke bizewq dijyan. Hemberê vê jiyana çêj û kêfxweşiyê tevgera bi navê “zuhd” derkete holê. Ji endamên vê tevgerê re “sofî” dihate gotin. Sofî xwe ji çêj û kêfxweşiyên dinê dur xistin û xwe di nav civaka ku nirx didan tiştên madî derxistin.⁷⁰⁵ Li gorî van sofîyan armanca mirov ya li dinê ne mal û milkên dinê ên bedîhewa ne. Armanca mirov Xwedê ye. Di nav van sofîyan de wekî ramaneke tesewifê ramana wehdetê wicûdê derkete der û ev raman hate parastin.

*Bi Bayezîdê Bistamî (k.d.874), Mensûrê Hellac (k.d. 921), Baba Tahir (k.d.1010), Şihabbedînê Sohrewerdî (k.d.1190) û Muhyedînê Erebi (k.d.1239) ramana wehdetê wicûdê renegekî felsefî û teorîk da tesewifê. Piştî sedsala XIIan gelek terîqetên wekî Qadiriyye, Rûfa'iyye, Suhrewerdiyye, Xelwetiyye, Mewlewiyye, Neqşebendiyye û wd. hatin damezirandin.*⁷⁰⁶

Bi kurtasî wehdetê wicûd ew raman e ku li gorî wê, di rastiyê de ji xêncî Xwedê hîç heyînek tune.

4.2.1. Baba Tahir û Wehdetê Wicûd

Wehdetê wicûd bi Îbn Erebi tê zanîn lê belê sofîyên ku beriya Îbn Erebi bi ramana wehdetê wicûdê ve hemhal bûne û vê ramanê di berhemên xwe de anîne ziman hene. Ji van sofîyan yek jî Baba Tahir e ku nêzî 230 sal beriya koçdawiya Îbn ‘Erebi çûye ber dilovaniya Xwedê. Beriya Îbn ‘Erebi di berhemên xwe de ramana wehdetê wicûdê aniye ziman û li ser vê ramanê hûr bûye. Baba Tahir tovê ramana wehdetê wicûdê reşandiye li ser axa tesewifê.

⁷⁰⁴ Abdulqadir Gok, *Veşîna Felsefeyê*, weş. Ronahî, Amed, 2011, r. 96.

⁷⁰⁵ Adak, *b.n.*, r. 35.

⁷⁰⁶ *b.n.*, r. 35-36.

Piştî wî ev tov bi destê mutesewifan şîn bûye, şax daye û geş bûye. Wehdetê wicûd ne serdema Baba Tahir ne jî serdema Îbn Erebi wekî têgeh hatiye bikaranîn. Ramana wehdetê wicûdê ku bi Mensûrê Hellac, Baba Tahir û hin mutesewifên din bi dest kiriye, pişt re pêşve çûye û bi Îbn Erebi gihîştîye lûtkeyê. Piştî Erebi ev raman bi navê “wehdetê wicûd” ji aliyê Sedredînê Konewî ve hatiye binavkirin. Di dîrokê de ramana wehdetê wicûdê yekem car di helbestê de ji aliyê Baba Tahir bi awayekî hunerane hatiye ristin.

Baba Tahir di dubeytiya xwe ya jêr de xwe wekî mînakek ji behrê û nuqtetek ji herfê dibîne û wiha pê de diçe:

Mu an behr um ki der zerf amedestum

Mu an nuqte kî der herf amedestum

Be her elfî elif qeddî ber ayû

Elif qeddum kî der elf amedestum

Ez ew behr im ku di zerfê de hatime

Ez ew nuqte me ku di nava herfekê de hatime

Serê her hezar salî qamet elifek tê

*Ez ew qamet elif im ku di serê hezar salî de hatime*⁷⁰⁷

Ew di vê dubeytiya xwe de dibêje ku ez behreke mezin im, di tasikekê de hatime ku xwe nîşan bidim. Tasikek av an jî dilopek ji behrê parçek an jî mînakek in. Ez ew nuqte me ku di herfekê de hatime. Nuqte mîna tasikeke av e, herf jî mîna behrê ye. Nuqte parçek an jî mînakek ji herfê ye. Ger mebesta wî ji herfê, bîsmîllahî rahmanî rahîm (بِسْمِ اللَّهِ الرَّحْمَنِ الرَّحِيمِ) be û xwe wekî nuqtaya herfa “ب” nîşan dike be, wê gavê ew dibe ji Xwedê parçeyek, an jî nimûneyek. Ji her elifekî (ا) elifbejneke derdikeve bejna min elif e ku ji elifê

⁷⁰⁷ b.n., r. 109.

hatime. Elifa yekem sembola “yek”ê ye û wateya wî Xwedê ye. Elifa duyem jî bejna wî ye ku ew jî ji wêneya “yek”ê ye.⁷⁰⁸

Ew xwe wekî “elîf”ê nîşan dide ku navê Xwedê di Qur’anê de (الله) bi tîpa elîfê (ل) dest pê dike. Bi vî awayî ew dibêje nîşaneyê hebûna Xwedê ez im. Her wiha dibêje ku tecelî û gotina Xwedê ez im.

Bi van gotinan ew ramana xwe ya derbarê rastiya hebûnê û heyînan rave dike. Her wiha mînak li ser xwe dide û dibêje ez nimûneyek ji Xwedê me. Yanê Xwedê hertişt e û xwe di qalibê min de nîşan daye. Ew bejn û bala xwe dişibîne elîfê û dibêje ez ji elifa Xwedê hatime. Em di vê ramana wî de ramana wehdetê wicûdê dibînin.

Ew dibêje ku serê her hezar salî qamet elîfek tê. Ev gotin bi baweriya Zerdûştiyê ve têkildar e. Di baweriya Zerduştî de her hezar sal dema ji nû ve bûyîn e. Zerdeşt, yekemê hezar saliyê ye. Baweriya hezar salî bi Zerdûştiyê dest pê kiriye û di baweriyên Îranî yê din de jî ev têgeh heye. Li gorî baweriyê, Zerdeşt di heman demê de şoreşger e, şoreşê dike û mirovatîyê ji tengasiyê rizgar dike. Her wiha Zerdeşt rizgarker e û li gorî baweriyê di serê hezar saliyê de rizgarkarek tê. Baweriya hezar saliyê, di baweriya Yarsan de jî heye ku li gorî vê baweriyê puxteya Xwedê (Ya) di laşê mirov de xuya dike. Ev mirovên ku Xwedê di wan de tecelî kiriye kesên pîroz in ku yek ji wan Baba Tahir e. Baba Tahir bi gotina xwe ya jor xwe wekî rizgarkerek dide nasîn ku ew ê rêya mirovan ronî bike û wan ji tengasiyê rizgar bike.⁷⁰⁹

Baba Tahir îlhama xwe, ji tesewifa zuhdî, ya ku tenê li ser ramana ji tîrsa ezeb û xezaba Xwedê ye hilnedaye. Ew îlhama xwe ji tesewifa li ser eşqa Xwedê û cezbeyê hildaye. Ji ber vê yekê ew xwediyê xweşbînî û evîndariyeke fireh e. Baba Tahir wekî helbestvanekî ji bo ku hestên xwe bîne ziman helbest nivîsiye, helbest nivîsîn piştî ramanên wî ên tesewifî û soffîbûna wî ketiye jiyana wî. Meriv ji bo Baba Tahir nikare bibêje helbestvan, ji helbestvaniyê zêdetir ji bo wî; binavkirina helbestvanê tesewifê yan jî helbestvanê soffî rastir

⁷⁰⁸ Xeznedar, *b.n.*, r. 186.

⁷⁰⁹ Hamzeh’ee, *b.n.*, r. 226-227.

e. Ji ber ku ew mîna sofîyên wekî xwe helbestên xwe ji bo eşqa xwe ya Xwedayî, cezbeya xwe ya mîstîk, ramanên xwe yên sofitî bilêv bike wekî amûr bi kar aniye.

Baba Tahir di dubeytiyeke xwe de pesn li kesên ku can û cananê di nav hev de dibînin re dike. Pesn li kesên ku xwedî derd in lê bê derman in, her wiha aşiq in û dest ji eşqa xwe bernadin re dike û helbestvan wiha dibêje:

Xurem anan ke ez ten can nedanend

Zi canan can, zi can canan nedanend

Be derdeş xwû keren salan û mahan

Be derdê xîştên dermanî nedanend

Bijîn ew kesên ku rih ji bedenê naqetînin

Can ji dilberê, dilberê ji can venaqetînin

Bi mehan û salan hînî derdkişandinê dibin

Ji bo derdên xwe tu dermanekî nabînin⁷¹⁰

Di vê dubeytiyê de xuya dike ku Baba Tahir can û cananê yek dibîne. Her wiha can parçeyeke ji cananê ye. Ev helwest ramana wî eşkere dike.

Li gorî wî wicud bi timî ew e û timî mewcûdat teceliyê rengdêrên (sifetên) Yezdan in. Hişk jî ji Yezdan e ter jî. Her ku heye hewra, pûtxane û dêr li wî derî ew heye, her wiha hîç serayek tune bêyî Yezdan. Di dubeytiya xwe de wiha tê ziman:

Xwoşa anûn ke ez pa ser nedûnend

Miyanî şu'le xişk û ter nedûnend

⁷¹⁰ Yıldırım, *b.n.*, r. 117.

Kenîşt û Ke‘be û butxane û dêr

Serayî xalî ez dilber nedûnend

Bijî yê n ku serî ji pê cuda nakin

Wekî şewatê hişk û ter cuda nakin

Hewra û Ke‘be û pûtxane û dêr:

*Bi serayeke bê dilber bawer nakin*⁷¹¹

Ji bo salik xêncî gihîştinê nirxa tu tiştî nîne. Ew digihîjin asteke wisa ku tu tiştî ji tiştên din cuda nabînin. Arif, başî û xerabiyê, bihuşt û dojhê, agir û avê ji hev û din cuda nakin û van ji hevdu cihê nabînin. Baba Tahir jî gihîştîye vê meqamê ku hişk ji ter cuda nabîne. Di Hewra, Ke‘be û Pûtxaneyê de dilbera xwe dibîne. Ne serayek ne jî dereke din bêyî dilberê wî ye ku ew di her derî de dilberê xwe dibîne.

Salik piştî derbasbûna meqam û halên cihêreng digihîje asteke wisa ku çavên dilê salik bi nûra heq tijî dibe. Di her tiştî de dibîne ku yarê tecelî kiriye. Paşê digihîje asta bilind ku êdî aşîq her çi binêre di wî de kemal û cemala yarê dibîne. Baba Tahir di vê helbesta xwe ya jêr de vê helwestê bi dubeytiyeke xweşik wiha tîne ziman:

Be derya bingirim derya tu wînum

Be şehra bingirim şehra tu wînum

Be herca bingirim kûh û der û deşt

*Merge an dem ke zîbayî tu wînum*⁷¹²

⁷¹¹ *b.n.*, r. 119.

⁷¹² Xeznedar, *b.n.*, r. 210.

Ez li çolê dinêrim te dibînim

Ez li behrê dinêrim te dibînim

Çiya, der, deşt: Li ku binêrim

*Nîşanekê ji balabejna te dibînim*⁷¹³

Hebestvanê sofî, di vê çarînê de ramana wehdetê wicûdê ku ev ramana metafîzîk, bipergal û ji aliyê fêmkirinê ve dijwar e, bi Kurdiyeye hêsan û bi awayekî di hiş de mayînde, bi şêweyeye herikbar pêşkeş dike. Ew di nav piraniyê de yekitiyê dibîne.

Dilber, di her derî û her cihê ye û ew her tişt e. Hebûna min (Baba Tahir) parçeyek ji hebûna te (dilber) ye. Ez û tu ji hevdu naqetin. Her çi qas wekî du cewheran xwe nîşan dikin jî, lê di rastiyê de yek cewher in.⁷¹⁴

Bêguman ji bo salik meqamê herî bilind meqamê eşqê ye. Di dilê Baba Tahir de nûra yeqîn peyda bûye, êdî gihîştîye vî meqamê herî bilind, xwe, eşqa xwe û meşûqa xwe tevlihev dibîne. Vê helwesta xwe wiha tîne ziman:

Eger dil dilber e dilber çi nûm e?

Weger dilber dil e ez çi nûm e?

Dil û dilber be hem amête dêrûm

*Nezûnum dil keh e dilber ku dûm e*⁷¹⁵

Eger dil dilber be, ma dilber kî ye

Eger dilber dil be, navê dil çi ye

Ez dil û dilber tevlihev dibînim

⁷¹³ Yıldırım, *b.n.*, r. 171.

⁷¹⁴ Xeznedar, *b.n.*, r. 211.

⁷¹⁵ Adak, *b.n.*, r. 116.

*Nizanim ku dil kî û dilber kî ye*⁷¹⁶

Di nav her tiştî de wêneya cewhera mezin heye. Ev cewhera mezintirîn ya her kesî û her tiştî ye. Ji ber vê yekê ji vê cewherê qetiyên û cihêbûn ne pêkan e.⁷¹⁷ Li gorî helbestvan dil û dilber yek in. Heke bi çavan em lê binêrin wekî du tişt in. Ev du tişt bûn ji me re guman peyda dike, lê em ji aliyê ramana wehdetê wicûdê ve lê binêrin ji hev ne cuda ne û ji hev cihê nabin. Ew ji dilberê re lavayî dike ku dixwaze bizane ku ew kî ye. Heke ji dilberê cuda be wê gavê ew ji kî ye. Bêguman ew parçek ji dilberê ye, her wiha dil, dilber bixwe ye ku dil hewl dide ku bigihîje welatê xwe, yanê bigihîje dilberê her wiha bigihîje xwe.

Ew aşîqekî wisa ye ku li ku binêre dilberê wî li ber çavên wî ye. Dilberê wî wisa ye ku ne tenê di gulîstanê de, di heman demê de, di xwelfî, gulşen û çolê de xwe nîşanê wî dike. Li gorî wî hemû cîhan ji dilberê pêk tê. Vê helwesta xwe wiha tîne ziman:

Gulistan cihê te ye nazenînim

Ez li kulxan, li ser xwelyê rûdînim

Çi li kulxan, çi li gulşen, çi sehra

*Li ku binêrim, tenê te dibînim*⁷¹⁸

Di vê dubeytiya wî de ramana wehdetê wicûdê heye. Her wiha ew gihîştîye qonaxeke wisa çavên dilê wî vebûne. Ew dilberê bi hêsanî di her derî de dibîne, jixwe tiştên ku dibîne parçe û nîşaneyên dilberê ne. Ew, di dubeytiyeke xwe de ji kêleka lêvan maçek dixweze û wiha dibêje:

Şew tarest û gurgan mîzenend mêş

Du zulfûnut hemayîl kun bûre pêş

⁷¹⁶ Kara, *b.n.*, r. 13.

⁷¹⁷ Xeznedar, *b.n.*, r. 211.

⁷¹⁸ Kara, *b.n.*, r. 55.

Ez an kuncê lebut bûsî be mû de

Bego: Rahê Xwuda dadem be derwêş⁷¹⁹

Şev tarî ye, gur dibin ser mîhê êriş

Du zilfên xwe bialîne were pêş

Ji kêleka lêva xwe maçek bide min

Bêje ku min ji bo Xwedê da derwêş

Di vê dubeytiya xwe de ew daxwaziya gihîştinê dike. Di tesewifê de maç kirin gihîştinê simbolîze dike. Ev meqamê fenafillahê ye ku ew dixwaze bigihîje bi wî meqamî û ret bibe. Her wiha dawiya vê daxwazê pêk were ew ê şa bibe. Ew li ser rûyê erdê digere, di her tiştî û her derî de dilberê dibîne. Nabe, dikeve zeryayê ku cewher derbixe, di wan cewherên di bin avê de jî dilberê dibîne û wiha tê ziman:

Çi wacem, her çi wacem wa teşan bî

Suxen ez bîş û ez kem wa teşan bî

Be derya mû şudem gewher berarem

Her an gewher ke didem wa teşan bî

Çi bibêjim, her çi bibêjim ji te ne

Hindik pir ez her çi bibêjim ji te ne

Ez ketim deryayê ku cewher derxim

Hemû cewherên ku min dîtî ji te ne⁷²⁰

⁷¹⁹ Yıldırım, *b.n.*, r. 143.

Di vê dubeytiya wî ya jor de ramana wî ya yekitiya heyînan derdikeve holê. Li ku dinêre di her tiştî de dilberê dibîne nexwe ew ji her tiştî hezdike, lewre her tişt mînamek ji dilberê ye. Ji ber vê yekê hezkirinek fireh di dilê wî de heye. Li gorî wî afirîner çavkanî û yekemê her tiştî ye. Di her heyînî de û di her gotin û tevgera mirov de nîşaneyên afirîner hene. Baba Tahir xwediyê dil û rehekî ku di her tiştî de nîşaneyên afirîner dibîne ye. Li gorî wî her tişt di Xwedê de digihîjin hevdu, ji Xwedê ronî / nûr û rihek di hundirîn, ango her tişt bi teceliya Xwedê derketine qada heyînê, nexwe heyîna ku heye tenê Xwedê ye.

Li gorî sofîyan, Xwedê di hemû mewcûdat û mexlûqetan de tecelî kiriye. Li her cihê ew heye her cih ew e. Sifetê Xwedê di her tiştî de tecelî kiriye. Her wiha gelek sofî anîne ziman ku Xwedê ji me neziktirî me ye. Lê belê ew çav di me de tune ye ku em cemala Xwedê bibînin û ew guh tune ku em dengê Xwedê bibîzin. Di vê çarîna jêr de Baba Tahir li ser şopa yara xwe ye û wiha dibêje:

Kuca bî cayê tû ey yarê dilxwah!

Ke ta mûseperem an cayige rah

Heme ca cayê tû mû kûrê baîin

Ėxelet watem xelet, estexfirullah

Ey yara dilxwazî, ma heye bê te derek?

Ku ez birevim wê derê wek penaberek

Tu li her derê yî, ez kor im nabînim

Min şaş got, Xwedêyo bibexşîn carek⁷²¹

⁷²⁰ b.n., r. 377.

⁷²¹ b.n., r. 279.

Sofiyê dildar li ser şopa yarê ye. Cihêkî bêyî yarê digere ku bibîne lê nabîne. Ew dizane ku yara wî li her derî ye, hîs dike lê dibêje ez kor im nikarim cemala te bibînim. Ew çavên ku cemala yarê bibîne di xwe de nabîne û xwe kor dihesibîne. Paşê dest ji gera cihê beyî yarê berdide, berê xwe dide yara xwe û tobe dike. Tobe dike ku tobe destpêka seyr û silukê ye û her wiha destpêka rêya tesewifê ye.

Baba Tahir xwezî bi kesên ku dest ji kar û barê dinê berdane û Xwedê wekî yar pejirandine dike. Ev helwest yan jî ev jiyana wekî têgeh bi peyva “zuhd”ê tê rave kirin. Baba Tahir di dubeytiya xwe ya jêr de jiyana ku her tim bi Xwedê ve tê borandin pesin dike:

Xwoşa anan ke Ellah yareşan bî

Ke hemd û “qul huwella” kareşan bî

Xwoşa anan ke dayîm der nemazend

Bihîştê cawîdan bazareşan bî

Xwezî bi kesên ku Xwedê yarê wan e

Ku hemd û “qul huwella” karê wan e

Xwezî bi kesên ku dayîm nimêj dikin

Bazara wan kesan bihuşta cawîdan e⁷²²

Ew diyar dike ku kesên ku her tim bi Xwedê re ne û daxwaziyên Xwedê tînin cih, cihê wan bihuşta xweşik e. Jiyana dinê û ya axiretê bi hev ve girêdayî ne. Li gorî kirinên dinê jiyana axiretê dê diyar be. Heke mirov li dinê girêdayî Xwedê be ew ê bi bihuşta xweşik ve bê xelatkirin. Ew, di helbesta xwe de jiyana bêyî dilberê wiha rave dike:

⁷²²b.n., r. 299.

Bê te gulşen çî zindan e bi çeşmum

Gulistan azeristan e bi çeşmum

Bê te aram û 'umr û zindeganî

Heme xab û perîşan e bi çeşmum

Bi çavê min gulşen bê te zîndan e

Bi çavê min gulistan bê te agiristan e

Bê te hizûr û temen û zindeganî

Bi çavê min tev de xewna perîşan e⁷²³

Di dinê de gulşen û gulistan hene lê hebûna wan çêj nadin wî. Xweşikiyên dinê wî kêfxweş nakin. Heke dilber nebe ne jiyan ne jî xweşikiyên jiyanê wî şad dikin. Em, çêj û xweşikiyên dinê bidin wî ew ê wan biqewirîne û dê dîsa dilberê bixwaze. Ew, hizûr û jiyana dinê wekî xewneke perîşan dibîne. Nirx nade hizûr û jiyana dinê. Jiyana dinê bêyî dilberê êş û jan in ji bo wî. Ew jiyana xwe ya dinê di nav xemginiyeke mezin de diborîne.

Em dema ku kerê dibînin û li ser piştê kerê barê kerê dibînin têdigihîjin ku ker heyînek e û zindî ye lê bar tişteke din e û ne zindî ye. Lê sofîyê me di vê dubeytiyê de ker û barê kerê ji hevdu cuda nabîne û yekitiya heyînan wiha tîne ziman:

Xwoşa anan ke her ez ber nedanend

Ne herfî waniwîsend ne bixwanend

Çû mecnûn rû nehed ender biyaban

Der î n kûhha rewend ahû çeranend

⁷²³b.n., r. 181.

Xwezî bi kesên ku ker ji bar nas nakin

Ne karin herfekê binivîsin ne bixwînin

Mîna Mecnûn berê xwe didin çolê û

*Li van çiyayan bi xezalan re diçêrin*⁷²⁴

Di vê dubeytiyê de ew ramana wehdetê wicûdê tîne ziman. Ên ku ker û bar wekî hev dibînin, ji hevdu cuda nabînin ji rastiyê fêhm kirine. Êdî ne hewce ye ku ew kesan bixwînin û binivîsin. Her wiha ker zindî ye û heyînek e, bar jî heyî e. Vê gavê li gorî ramana yekitiya heyînan ker û bar ne ji hevdu cuda ne. Her du jî yek in. Xwezî ew kesên ku mîna Mecnûn ji bo Leylayê ketine li çolan. Her wiha ew kesên ku xêncî dilberê tiştêk nafikirin. Ji bo Mecnûn xwendin û nivîsandin ne hewce ye, lewre ew aşiq e ku ji bo mirovekî ev bes e. Eşq mirovan digihîne rastiyê ku ew di hin dubeytiyan de dilê ku bi eşqê ve tijî ye dipesîne û dilê bê eşq jî bê wate dibîne.

Di dubeytiyên jor ên Baba Tahir ên ku me wekî mînak pêşkeş kirin de ramana Baba Tahir a wehetê wicûdê bi awayekî zelal tê dîtin. Ew di dubeytiyên xwe de bi şeweya xwe ya taybet, ramana wehdetê wicûdê, bi hestên eşqê aniye ziman.

4.2.2. Berawirdkirina Baba Tahir bi Sofiyên Din re

Baba Tahir girêdayê felsefeya sofitiya rasteqîn e. Di helbestên xwe de gunehên xwe mukir tê û bexişandinê dixwaze. Dermanê xwe di fenayê de dibîne. Ew jiyaneke derwêşî û qelenderî ya serseriyane jiyaye. Bê cî û bê war maye, kevir kiriye belgiyê xwe û li erdê razaye. Jiyana wî di nav êş û xemginiyê de boriye. Her tim bi dilê xwe yê serhildêr re di nav şer de bûye.⁷²⁵

Baba Tahir berê xwe daye bedewî û xweşikiyên dinê û di wan de bedewî û tîkûziya Xwedê dîtiye. Evîndariyeke xurt di dilê vî arifî de heye. Wî

⁷²⁴ *b.n.*, r. 122.

⁷²⁵ V. Minorsky, "Baba Tâhir 'Uryan", *İslâm Ansiklopedisi*, b. II, ç. 5, weş. M.E.B., Eskişehir, 1997, r. 168.

her gav û her tim Xwedê temaşa kiriye û daxwaziya Xwedê kiriye. Di dil û hişê wî de her kes, her tişt û her der ayetên Xwedê ne. Çawa ku Feqiyê Teyran di helbesteke xwe de ji avê re dibêje: “*Bê rahet û bê sekne yî, Yan aşiqê baxwê xwe yî, Yan şubhetê qelbê me yî, Ji işqa kê natebitî*”⁷²⁶ Her kes û her tişt bi hewldaneke bê sekin ber bi Xwedê ve diçin. Her wiha Baba Tahir jî mîna ku dil natebite û her tim diavêje, ew jî wisa ji ber eşqa Xwedê bê tebat e. Li gorî wî bêtî Xwedê wateya tu tiştî tune û her tiş badilhewa ne. Lê di helwesta bi Xwedê ve bûyîne de, agiristan gulistan e, mirî zindî ne. Xwedê bingeha her tiştî ye, ew her tişt e û her tişt ew e.

Li gorî wehdetê wicûdê alem bi timî ew e û heyîn bi timî mewcudiyet in. Her wiha alem bi timî nîşaneyê rastiyeke ye. Baba Tahir xwediyê ramana yekitiyê ye. Ev ramana wehdetê wicûdê tevî bedena wî û ramana wî bi awayekî dilsoz diyarde û eşkere ye.

Ramana wehdetê wicûdê di tevger, irfan û berhemên wî de mîna hin sofiyên din xuya ne. Lê belê cudatiyeke girîng di navbera reng û bêhna ramana wehdetê wicûdê ya ku Baba Tahir tîne ziman û ya sofiyên din tînin ziman de heye.

Ji ber ramana wehdetê wicûdê, perîşanî, dîwaneyî, heyranî, derbêderî, dilbestî, bengînî, dilsotî, jixweçûyîn, jiyaneke pîrxemgînî di derûniya Baba Tahir de xuya dikin û ev taybetî, wî ji sofiyên din cuda dikin. Helbestvan û mutesewifên misilman ên ku li ser ramana wehdetê wicûdê ne, dema ku ramanên xwe ên yekitiya hebûnê bilêvkirine di xwe de dildarî, şadî, dilçoşî û cergebezeke taybet a rih nîşan dane. Nûraniyek di tevî raman û manewiyata wan de bi awayekî eşkere tê dîtin. Lê belê xem, derbêderî, dîwaneyî, jixwederbasbûn ne hakimê raman û derûniya sofiyên din in. Ji xweşikî û bedewiya rih û xwezayê çêj û têrbûneke menewî hildane. Ji wan mîna Hafiz,

⁷²⁶ Seîd Dêreşî, *Dîwana Feqiyê Teyran*, weş. Lîs, Ankara, 2011, r. 61.

Iraqî, Sedî eşqa mecazî di gotinên wan de xuya ye, reng û bêhna eşqa wan carinan giran û bişid in.⁷²⁷

Şemsê Tebrîzî yê xwediyê ramana wehdetê wicûdê di helbesteke xwe de wiha dibêje:

از جنبش این دریا هر موج که برخیزد بر وادی جان آید، بر ساحل دل ریزد

دل را همه جان سازد، جان را همه دل، آنگه جان و دل و جانان را با یکدیگر آمیزد⁷²⁸

Ji cerbezeya vê zeryayê her pêlek ku radibe

Ber bi deşta can ve tê, ber peravê dil dirije

Dil bitimî can dike, can bitimî dil

Hingav can û dil bi canan re tevlihev dike

Camî jî ramana xwe di vê helbesta xwe de wiha diyar dike:

خوبان هزار و از همه مقصود من یکی است صدپاره گرکنند به تیغ، سخن یکی است

خوش جمعیت انجمن نیکوان ولی ماهی کزوست رونق این انجمن یکی است

جامی در این چمن دهن از گفتگو ببند آنجا نوای بلبل و صوت زغن یکی است⁷²⁹

Bi hezaran baş hebe tevî armanca min yek e

Min bikin sed parçe dîsa gotina min yek e

Berhevbûna başa civîneke xweş e

Lê masî jî ji wî ye ev civak yek e

⁷²⁷ Husêyn Nevîn, "Wehdetê Wicûd û Baba Tahir", *Mecelê Kîhan Ferhengî*, j. 216, Cotmeh 1383, r. 28-32.

⁷²⁸ Şemsê Tebrîzî, *Kolliyâtî Dîwan*, ç. 9, weş. Emîrkebîr, h.1362, s. 367, vgz. Nevîn, *b.n.*, r. 30.

⁷²⁹ Edward Browne, *Ez S'edî ta Camî*, (Wer.: 'Elî Esxer), weş. Danişgahê Têhran, h. 1872, r. 785, vgz. Nevîn, *b.n.*, r. 31.

Camî di vê hêşînahiyê de ji axaftinê re bêdeng be

Li wir awaza bilbil û dengê qirikê yek e

Lê belê di helbestên Baba Tahir de bi taybet cerbeze, şabûn, liserxwebûn, zindîbûn nayê dîtîn. Di timî helbestên wî de ên siya wehdetê wicûdê li ser in, derd, xem, jixweçûyîn, dîwanetî hene. Dîwanebûna wî bi awazeke pîrxemgîn ji berxweketina cudabûna wî tê bihîstin. Ev awaza pîrxemgîn ji cudabûna wî ya ji yara ezêlî ye. Xema dilê wî gilî û gazinceyên wî hemû ji cudabûna wî ne.⁷³⁰

Dema ku em dikevin derûniya Baba Tahir rê û rêzikên ariftiyê û meyxaneyê dibinîn. Ew dibêje:

تو که نابرده ای ره در خرابیات

تو که ناخوانده ای علم سہاوات

بیاران کی رسی، ہیہات! ہیہات⁷³¹

تو که سود و زیان خود ندانی

Tu ku nexwandiya ilmê asîmanan

Tu ku neçûyî ber bi meyxaneyan

Tu ku sûd û ziyana xwe nizanî

Kengav bigîjî yarê, heyhat! heyhat

Baba Tahir eşqê wekî pêlekanekî dibîne, da ku li ser wê ji rêya zehmetkêş derbasbibe û xwe bigihîne yarê. Armanca wî bi yara xwe ve gihîştin e. ‘Aynu’l-Quzzat-ê Hemedanî di derbarê eşqê de dibêje: Ji bo eşqa bikemal divê maşûq bê jibîrkirin. Ji ber ku karê aşiq bi eşqê re ye ne bi maşûq re. Armanca aşiq eşq e, tevî jiyana wî eşq e û ji bo aşiq bê eşq mirin divê. Aşiq wisa ye ku her çi qas ji eşqê derd û xem bikişîne jî ne dibe bendeyê gihîştinê ne

⁷³⁰ Husêyn Nevîn, *b.n.*, r. 31-32

⁷³¹ *b.n.*, r. 31-32

jî ji cudatîyê xem dikişîne. Her wiha ne ji gihîştinê şa dibe, ne jî ji cudatîyê berxwe dikeve.⁷³²

Baba Tahir jî di derbarê eşqa dilê xwe de lavayî ji dilbera xwe dike û helwesta xwe wiha tîne ziman:

الهی آتش عشقم به جان زن شرر زان شعله ها بر استخوان زن

چو شمع بر فروز از آتش عشق بر آن آتش دلم پروانه سان زن⁷³³

Îlahî agirê eşqa min li can xe

Wisa lêxe alava wî li hestîyan xe

Mîna mûmê min bişewitîne bi eşqê

Dilêm mîna perwanê li dor xe

Baba Tahir gotinê xwe yê di derbarê eşqa xwe ya bengînî de wiha didomîne:

به سر غیرته سودایی ندیرم به دل جز ته تمنایی ندیرم

خدا دونه که در بازار محنت به جز خون هیچ کالایی ندیرم⁷³⁴

Di serî de xêncî te eşqek nîne

Di dil de xêncî te daxwazî nîne

Xwedê zane di bazara evînê de

Ji xencî xwîn hîç tiştêkî min nîne

⁷³²b.n., r. 32

⁷³³b.n., r. 32.

⁷³⁴b.n., r. 32.

Eşqa Baba Tahir Mîna eşqa Mecnûn e û ew dîwane û wekî dîna ne. Di navbera wî û navbera kar û barê dinê de tu têkilî tune. Jiyana xwe bi hezkirineke bengînî û awayekî xwerû borandiye. Mecnûn çawa ku xwe li çola xistiye, ew jî demên dûr û dirêj li çiyayê Elwendê, ji xirecira dinê dûr û bi mijûlbûna eşqa xwe derbas kiriye. Çawa ku Eflatûn gotiye eşq mîna dînbûnê ye, bi heman awayî eşqê Baba Tahir dîn kiriye lê ew dînekî wisa ye ku eşqa xwe bi dubeytiyan bi ahengeke xweş û awayekî hunerane vegotiye. Dînekî xwedî keramet û mirovhez e. Ev hezkirina berfireh ji evîndarbûna wî ya bihêz tê. Her wiha ev rûbaiyên xweşik û delal ji eşqeke dilsoz û ji aşiqekî pak tê. Eşq bingeha jiyana Baba Tahir e û ev eşqa, eşqeke ne ji rêzê ye ku Baba Tahir dest jê bernade. Di heman demê de eşq bingeha mirina wî ye ku wî dikişîne ber bi mirinê ve. Mirin di hudirê Baba Tahir de helwesteke gelek xurt e. Hin feylesof mirinxwazî wekî dînbûnê dîtine, lê mirin ji bo wî gihîştin e. Bi mirinê ve gihîştineke bi timî bidest dikeve. Ew dixwaze ku bi mirinê di dilberê xwe de ret (fena) bibe.

Him Baba Tahir him jî Mensûrê Hellac, Yûnis Emre û Mewlana di derbarê darbest (tabût), gor û mirinê de hestên xwe ên bextewarî û şabûnê nîşan kirine. Her wiha Hellac darbestê wekî textekî ku wî nêzikî Xwedê dike dibîne. Mewlana gotiye ku Xwedê min ji eşqê, ji şerava eşqê afirandiye, di fermana min de bêdawîbûn nivîsar e, mirin pêpezê min bike jî disa jî ez heman eşq im.⁷³⁵ Baba Tahir jî wiha gotiye:

به آتش گر بسوزند استخونم

به خنجر گرد درآرن دیدگونم

⁷³⁶نگیرم دل زیار مهربونم

اگر برناخنونم نی بکوبن

Bi xencer eger derxîne çavê min

Bi agir bisotîne hestiyê min

⁷³⁵b.n., r. 32

⁷³⁶b.n., r. 32-33.

Eger di neynûkêm de mîx bikute

*Yar nikare j'xwe dûr bike dilê min*⁷³⁷

Li gorî Hellac, hebûna rast yek e. Pîrbûn eksên ji yekî ne û bi timî yek in. Ev yek jî Xwedê ye. Gerdûn û mirov jî di hundirê yekî de ne. Ji ber vê gotina “Enel Heq” gotineke rast e. Mirin ne rast e, guherîneke ku di mirinê de jiyana û di jiyana de mirin heye.⁷³⁸ Baba Tahir di derbarê mirinê de ramanên xwe wiha tîne ziman:

Way an rozî ke der gorum keren teng

Werîjen ber serum xak û xis û seng

Ne pay an ke ez maran gerîzem

Ne dest an ke ba mûran kunem ceng

Xwezî bi wê rojê ku bikevim gora teng

Bavêjin ser serê min giya û ax û seng

Ne pê hebin ku ez ji maran birevim

*Ne dest hebin bi mûran re bikim ceng*⁷³⁹

Lê belê di navbera Baba Tahir û Mensûrê Hellac de cudatîyek heye. Hellac di gotina xwe de dibêje “Enel Heq” û bi vê gotinê, xwe ret dike. Ew dibêje “Ez Xwedê me” ku bi vê gotinê di navbera wî û Baba Tahir de cudatî xuya dibe. Di gotinên Baba Tahir de Xwedê jî heye, di heman demê de Baba Tahir jî heye. Baba Tahir xwe ret nekiriye. Baba Tahir di her derî û her tiştî de nîşaneyek ji balabejna Xwedê dîtiye. Di heman demê de Baba Tahir dil û dilber tevhihev dîtiye. Lê belê dil bi timî ji holê ranekiriye û ne bi timî dil bûye dilber

⁷³⁷ Kara, *b.n.*, r. 137.

⁷³⁸ Süleyman Uludağ, “Hâllac-ı Mansûr”, *DİA*, weş. TDV., İstanbul, 1997, XV, r. 377-378.

⁷³⁹ Yıldırım, *b.n.*, r. 148.

û ne jî dilber bûye dil. Di dubeytiyên wî de her du jî hene û her wiha dil gelek nêzikê dilberê ye, lê hewl dide ku bigihîje dilberê û bi vî awayî xwe ret bike.

Di dubeytiyên Baba Tahir de yanê di gotinên wî de eşqeke kûr û bişewat heye. Her wiha eşqeke arifanî û bengînî heye. Di derûniya wî de bayê cudabûne bi têkilê xem û kesera wî tê. Hemû hestên xweş ên vê dinê berdide, bi helwesteke xemginî û bi eşqeke dilşewat berê xwe dide alemeke ku nasnake û alemeke bêdawî. Wekî gerokekî di derûniya xwe de rastiya mirovbûna xwe, rastiya mirovatî û gerdûnê, rastiya cîhana nayê zanîn û ya hefrû digere. Di dawiyê de tevî mirovatiyê vedixwîne ber bi qudreta Xwedayî ya bê çavkanî û bêdawî. Hebûnê bi giştî bi awayekî yek dibîne. Cîhana derve û bedewiyên xwezayê ji cemalet û celala maşûqa xwe ya bêdawî dibîne.

Baba Tahir gava ku bedewî û xweşikiyê temaşe dike yara wî tê bîra wî û aram dibe. Gul li gulşenê, ken û şa di lêvan de peyda dibe û ew wiha dibêje:

واته گلخن به چشمم گلشن آيو

بی ته گلشن به چشمم گلخن آيو

⁷⁴⁰ که با ته مرده را جان برتن آيو

گلم ته گلبنم تو گلشنم ته

Bê te gulşen ber çavên min kulxan e

Bi te kulxan ber çavên min gulşen e

Gulam tu, gulcanem tu, gulşenam tu

Ku bi te jî mirî dibe bi can e

Rûyê meşûq gav bi gav di her tiştî de diyar dike lê her tişt di rastiye de yek e ku ev rastî bi rûyên cûrbicûr xuya dike. Derbarê ramana “her tişt di rastiye de yek e” Baba Tahir wiha dibêje:

⁷⁴⁰ Nevîn, *b.n.*, r. 30-32.

میان شعله خشک و تر نزنند

خوشا آنان که از پا سرزنند

سرای خالی از دلبر نزنند⁷⁴¹

کنشت و کعبه و بتخانه و دیر

Bijîn yên ku pê ji ser cuda nakin

Li nav agir hişk ji ter cuda nakin

Kinîşt û Ke'be û pûtxane û dêr

Beyî dilberê tu qesr qebûl nakin

Li gorî Melayê Cizîrî her tişt di rastiyê de yek e. Pîranî, duyîtî (dubendî) tune. Mela tiştên ku hemû mewcud in wekî Xwedê dibîne. Gerdûn bi giştî bi raza wehdetê ve dorpeçkiriye. Mela di helbesteke xwe de wiha dibêje:

Mela her wî bibîn her wî eger her wî dinasî tu

Huwe 'l-me 'bûd huwe 'l-meşhûdu bel la xeyre fi 'd-dareyn⁷⁴²

Mela her tim wî bibîne, heke tu wî dinasî

Ew e me'bûd ew e meşhûd, tune di her du cîhanê de xêncî wî mewcûd

Baba Tahir her çî qas ji ber evîndariya xwe di nav êş û janê de be û di nav agirekî de bişewite jî dîsa ew hemberî dilbera xwe dilnizmiya xwe nîşan dike. Her wiha hemberî dilbera xwe hestên neyînî nîşan naxe.

Em heman helwestê di helbestên Melayê Cizîrî de jî dibînin. Mela jî ji ber evîndariya xwe berxwe nakeve û hemberî yara xwe hestên neyînî nîşan nake. Baba Tahir aşîqekî wisa ye ku dikare ji bo dilbera xwe xwîna xwe birîjine yan jî di nav agirekî gur de xwe bişewitîne. Her wiha dikare bi mijangên xwe binê pêyê seyê dilberê paqij bike ku ew vê helwesta xwe wiha tîne ziman:

⁷⁴¹ *b.n.*, r. 30-32.

⁷⁴² Mela Ahmedê Cizîrî, *Dîwan*, (Wer.: Osman Tunç), weş. Nûbihar, İstanbul, 2009, r. 378-379, vgz. Doru, *b.n.*, r. 159.

Zi 'iştut ateşî der bûte dîrum

Der an ateş dil û can sûte dîrum

Segit ger pa nehed ber çeşmum ey dûst

Be mijgan xakê raheş rûte dîrum

Ji evîna te agirekî di sîngê min de

Dil û can dişewitin di wî agirî de

Dosto, ger seyê te pêl çavên min bike

Mijangên min ji maliştinê re amade⁷⁴³

Baba Tahir ji ber eşqa yara xwe bi dil û can di nav agir de dişewite. Ji ber eşqa xwe dilnizmiyê dike û rêz nîşanê seyê yarê dike. Heke seyê yarê bi pêyê xwe pêpezê çavên wî bike ew ê bi mijangên xwe dê paqij bike. Ew ji ber eşqê mest bûye.

Melayê Cizîrî xwe wekî xweliya li bin pê yarê dibîne û xwe rêza seyan de dihesibîne û helwesta xwe wiha tîne ziman:

Xakê payên te di rêza sek û tûlan xwe dinasîn

Me ne sûc û ne gunah û ne xeta ev çi 'îtab e⁷⁴⁴

Di vê helbestê de ew dibêje: Yarê, em xaliya bin piyên te ne, em xwe di rêza seyan de dipejirînin. Suc, guneh û xetayên me tune, nexwe ev çi êş e?

Mela dibêje me hemberî te serî ranekir, her tim li ber te, me xwe xar kir û te çi ferman kir me qebûl kir. Nexwe ev çi eş û jan e bi me didî?

⁷⁴³ Yıldırım, *b.n.*, r. 202.

⁷⁴⁴ Turan, *b.n.*, r. 593.

Baba Tahir aşiqê dilbereke nazik e û ew nazikbûna dilberê wiha tîne ziman: Tu bedew î, wek gul î, yasemîn î, rondikên çavên min ên girîn dibînî, ditirsim ku hilma hundirê min li dilê te bikeve, tu nazik î rihê te ji germê bihele bibe av. Mewlewiye Kurd jî nazikiya dilberê wiha tîne ziman: Tu ew qas nazik î bi bayê bawêşên, dêmên te gevez dibin mîna xwînê.⁷⁴⁵

Ji aliyê bingehê ve ramana Baba Tahir ya wehdetê wicûdê bi sofiyên din ve hevpar in. Lê bêhn û rengê ramana wehdetê wicûdê ya Baba Tahir ji hin hêlan ve ji sofiyên din cuda ye. Baba Tahir ji aliyê eşqa bengînî, dilsotinî, dîn û dîwaneyî ve rengê ramana wî ji sofiyên din cuda ye. Ew mîna sofiyên din di jiyane de hîç caran ji xweşikî û bedewiya rih û xwezayê çêj û têrbûneke menewî hilnedaye û jiyana wî bi giştî di nav xemginiyê de boriye.

4.3. YARSAN (EHLÊ HEQ)

Di derbarê peyva “yarsan”ê de du nêrîn hene. Ya yekem peyv ji “yarê san” tê. Yar, dost û murîd in, san jî San Sehaq e. San Sehaq bi navê din Siltan Îshaq e. Baweriya Yarsanê ji aliyê wî ve hatiye birêkûpêkirin. Li gorî vê nêrînê wateya “yarsan” dibe ew kesên ku dost û murîdên Siltan Îshaq in. Li gorî nêrîna duyem payva “yarsan” ji peyva “yaristan”ê hatiye. Yanê ew cihê ku yar û yaran li wir pir in.⁷⁴⁶

Peyva “yar” di zimanên Kurdî û Farisî de peyveke hevpar e. Bawermendên vê baweriyê peyva “yar”ê ji bo Xwedê wekî dilber û alîkar nîşan bikin bikar tînin. Rêhevalên Xwedê jî bi peyva “yar”ê tên bîranîn. Bi vî awayî bawermendên vê baweriyê bi peyva “yar”ê xwe wekî rêhevalên Xwedê binav dikin. Li gorî vê baweriyê teceliya yekem ya rastiya Xwedê “Ya” ye. Dibe ku “ya” bi peyva “yar”ê ve têkildar be. Bawermendên vê baweriyê di dia û ayînên xwe de dibêjin ku: “Yekem û dawî Yar e”. Endamên vê baweriyê navê Yarsanê bêtir dipejirînin. Ji ber ku ev nava navekî kevntir e.⁷⁴⁷

⁷⁴⁵ Karwan Osman, *Çarînekanî Baba Tahirê Hemedanî*, Xaneqîn, 2009, r. 17.

⁷⁴⁶ Adak, *b.n.*, r. 118.

⁷⁴⁷ Hamzeh’ee, *b.n.*, r. 72-74.

Ji wan re “Ehlê Heq” jî tê gotin ku ev têgeh ji bo mirovên Xwedê tê bikaranîn.⁷⁴⁸ Ehlê Heq navê koma Yarsanan e. Ev nav cara yekem ji aliyê Comte Gobineau ve ji lokolîneran re hatiye pêşniyar kirin ku ji wê demê pê ve ji vê komê re Ehlê Heq tê gotin. Endamên vê komê jî di têkiliyên xwe ên derve û di nivîsên xwe de vî navî bikar tînin. Lê di nav xwe de peyvên Yarsan an jî San bikar tînin.⁷⁴⁹

Ferîşteyên (avatar) vê baweriyê yê nêzikê vê dema me yê bi navê Nuralî Îlahî û bavê wî Nîmetulah Ceyhunabadî li ser pergala mîstîk ya vê baweriyê mane û pirtûkên bi navê “Şahnameya Heqîqet” û “Burhan” nivîsandine ku ev pirtûk, pirtûkên baweriya Yarsanê ên pîroz in. Di van pirtûkan de diyar dibe ku ev bawerî ne baweriya Şîî-Îslamê ye, ev baweriyeye serbixwe ye. Di van pirtûkan û gotinên van pîrên Yarsan de diyar dibe ku wan xwe ji misilmanên cînarê xwe parastine û heta sedsala 20’an jî misilman endamên baweriya Yarsan perçiqandine û li çarmixê dane.⁷⁵⁰

Navenda Yarsanan a kevn û dîrokî Kirmanşah û Loristan in. Xêncî van li bajarên mîna; Senendec, Îlam, Hemedan, Zencan, Gilan, Têhran, Tewrêz, Kerkuk, Silêmaniye, Helepçe, Xaneqîn û di çend bajarên din jî Yarsan hene ku ji wan re Kakaî tê gotin.⁷⁵¹ Yarsan bi zaravayên Hewramî, Soranî, Kelhurî, Lorî û Lekî diaxivin. Sê terîqetên wan ên ji hev cuda hene. Yarsan ji aliyê rejîma Îranê ve wekî Şîî tîr pejirandin, lê Yarsan bertek nîşanê vê helwesta rejîma Têhranê dikin. Di derbarê vê mijarê de parêzerên mafên mirovan ên dinyayê rexne li rejîma Komara Îslamiya Îranê dikin. Gelek ronakbîr Yarsan û Êzidiyan mîna hev dibînin.⁷⁵²

Felsefeya baweriya Yarsan bîaqilane ye. Di heman demê de ji hezar salî carek ferîşteyek tê û ji sed salî carek jî nûjenvanek tê. Bi tenasuh, yekitiya dijberiyar, yekbûna afirîner, mirovê kamil, îbadeta bi tembûrê, hêza yekitî û

⁷⁴⁸ Cebecioğlu, *b.n.*, r. 186.

⁷⁴⁹ Hamzeh’ee, *b.n.*, r. 72.

⁷⁵⁰ Izady, *b.n.* r. 265.

⁷⁵¹ Doğan Kaplan, “Ehl-i Haklar (Yaresanilik) ve Kürtler”, Demircan, *b.n.*, r. 265.

⁷⁵² “Yarsan”, [https://ku.wikipedia.org/w/index.php?title=Yarsan&variant=ku-latn], Gihîn: 23 Reşemî 2014.

hezkirinê, bi fikr û zikrê gihîştina bi Xwedê ve bawerî tînin. Ronahî, tav û agir pîroz in. Îbadetên xwe bi Kurdî dikin. Di vê baweriyê de wekhevî girîng e.⁷⁵³

Yarsan baweriyeke serbixwe ye. Ji hêmanên bîngehîn ên vê baweriyê tê fêmkirin ku ev bawerî naşibe baweriyên sereke ên herêmê. Di vî baweriyê de baweriya Xwedê, teceliya Îlahî, bendetiya bi ferîşteyan, dualîzm û tenasuh⁷⁵⁴ (renkarnasyon) hêmanên sereke ne. Her wiha perestgeha vê baweriyê heye. Gelek hêmanên vê baweriyê di baweriyên din de jî tên dîtin. Gava ku hêmanên vê baweriyê tên lêkolîn kirin tê dîtin ku bingeha hêmanên vê baweriyê bi hêmanên baweriyên Îranê ên berî Îslamê ve têkildar in. Di heman demê de gelek hêmanên vê baweriyê jî bi hêmanên tevgerên baweriyên piştî Îslamê ve hevpar in.⁷⁵⁵

Baweriya Yarsan, xwediyê zanînen gelek dewlemend ên kozmogoniya dînî ne. Li gorî vê baweriyê dinya ji aliyê Rihê Gerdunî ve (Xawandagar / Hawandagar / Xwedê) ya ku dema ku di nav durekî de bû, hatiye afirandin û ev dewr ji heft dewrên jiyana dinê ya yekem e. Li pey vê dewrê, şeş dewrên din pêk hatine. Rihê Gerdunî di her dewrekî de di şeş ferîşteyan (avatar) nû de hatiye jiyane. Bi vî awayî her dewrekê jiyana gerdunê gihîştîye heftan.⁷⁵⁶

Li gorî Yarsanê rih di gera peresaniyê (evolûtîon) ya dinê de pêşiyê bi ketina tiştên bêcan dest bi gera xwe dike. Dema ku ev ceribandina rih bidawî dibe, di gîha (nebat) û ajalan de dijî. Dawiyê de rih dikeve laşê mirov. Ji ber vê sedemê mirov xwediyê çar taybetiyan in. Ev; heyber, gîha, ajal û mirov in.⁷⁵⁷

Tenasuh hêmaneke sereke ya vê baweriyê ye. Ji nû ve bûyîn e. Li gorî tenasuha vê baweriyê di pêvajoya tenasuhê de mirov 1001 car ji koçkirina rih (renkarnasyonê) derbas dibe û 1000 car ji nû ve bûyîn pêk tê. Ji nû ve bûyîna dawiyê dê roja qiyametê pêk were. Ev roj, roja ji hev veqetandina mirovên

⁷⁵³ Uluçay, *b.n.*, r. 51.

⁷⁵⁴ Tenâsüh: Koçkirina rih, ji laşekî bi laşekî din ve ye. Baweriya nemiriyê ye, ("Tenâsüh", Ali İhsan Yitik, *DİA*, weş. TDV, İstanbul, 2011, XXXX, r. 441)

⁷⁵⁵ Hamzeh'ee, *b.n.*, r. 319-321.

⁷⁵⁶ Izady, *b.n.*, r. 266.

⁷⁵⁷ *b.n.*, r. 267.

bawermend ji gunehkaran in. Roja qiyametê rihê rast, bi jiyîna li cem Xwedê ve dê were xelat kirin. Kesên gunehkar dê careke din bi dinê ve werin vegerandin ku cîhan dojeh e. Agirê dojehê di dilê mirovan de ye. Rihê mirovên gunehkar dê di laşê kîjan ajalê de ji nû ve peyda bibin girêdayî giraniya gunehan in. Her wiha koçkirinên rihên kesên gunehkar bi awayên cuda jî dê biqewime. Wekî encam mirov di vê dinê de çi kiribe dê cezayê kirinên xwe bikişîne. Xêncî van di vê baweriyê de mîna roj û şev mirovên baş û xerab di der û dora dinê dizivirin. Ji van her du komên mirovan, hin caran mirovên baş û hin caran jî yên xerab serkeft û xwedî bandor dibin. Di roja qiyametê de gava ku rih dê werin darizandin, hemberî kirinekî baş dê sed guneh werin bexişandin.⁷⁵⁸

Ji bo rihên bawermend ji nû ve bûyîna 1001 ya dawiyê ye. Êdî ew rihê bawermend tê xelat kirin û xelata wî jî jiyanekê ebedî ya li cem Xwedê ye. Di baweriya Yarsanê de du heb bihuşt hene. Ya yekem bihušta dinyewî ye ku çêjên dinê di tê de tîn jiyîn û ya duyem bihušta ebedî ye ku bi çêjên tesewîfî ve hatiye ravekirin. Kesên ku li pey bihušta fanî ne dê tune bibin. Lê bihušta ebedî li cem Xwedê jiyanekê bêdawî ye ku di tê de mirin tune ye.⁷⁵⁹

Di Yarsanê de ji ber ku baweriya renkarnasyonê heye, endamên Yarsan şîn nagirin ku ew, bawerî bi vegeftina rihan dînin. Rahîbên vê baweriyê hewl didin bizanin ku pitik bi rihên kî hatine dinê.⁷⁶⁰

Di baweriya Yarsan de gihîştina mirov ya bi asta herî jor di destê mirov de ye. Di dawiya gera peresaniyê de jinek û mêrek dê xwediyê rizgariyê bibin, ber bi bihušta bilind dê bilind bibin, dê bigihîjin Rihê Gerdûnî û bibin hebûna bêhempa û kamil.⁷⁶¹

Yarsan jî mîna Mazdayan ji du cîhanan bawer dikin. Yek ya madî ye ya din jî ya manewî ye. Yanê bihuşt û dojehê wekî ya manewî û ya xaricî dabeş

⁷⁵⁸ Hamzeh'ee, *b.n.*, r. 199-200.

⁷⁵⁹ *b.n.*, r. 200.

⁷⁶⁰ Izady, *b.n.*, r. 268.

⁷⁶¹ *b.n.*, r. 268.

dikin. Bihušta xaricî li esmanan e û ya manewî jî li cihê ku teceliyên Xwedê peyda dibin de ye. Dojeha manewî cihê ku xerabî di tê de ye yanê di dil de ye û ya xaricî ji heşt tebeqan pêk tê.⁷⁶²

Yarsan bawerî bi teceliya Xwedê tînin. Li gorî vê baweriyê ev tecelî li pey hev diqewimin. Yezdanê “Ya” di berê ber de di nav durekî de, di bin zeryayê de bû. Paşê wekî havenkar derkete holê û rihekî taybet ku xwe di tê de nîşan da afirand. Di metnên Yarsan de tê pejirandin ku ‘Elî teceliya puxteya Xwedê ye. Derbarê Şa Xoşîn hatiye gotin ku ew teofanî ye, navê diya wî Celaleh e. Celaleh bi parçeyeke ronahiyeke piçûk ku ketiye devê wê bizar (ducanî) maye û jê Şa Xoşîn çêbûye. Puxteya Xwedê di mirovekî de mêvan be, yanê Xwedê wekî mêvan di serdana mirovekî de be, ew mirov wekî “Zat-mehman” tê binavkirin.⁷⁶³

Mirovek yan ji bo demekê yan jî di hemû temenê xwe de dikare bibe “zat-mehman”. Ev kesê “zat-mehman” di heman demê de xwediyê puxteya xwe ye jî. Ragihîna puxteya Xwedê dê bi sê helwestan encam bigire. Ya yekem; xuyakirina mirovekî di mirovekî din de, mîna çawa ferîşteyek di hundirê ferîştaya din de bi cih be, cewhera ew kesê ku serdanê pêk tîne bilindtir e, lê ronîbûna her duyan di asteke wekhevî de ye. Ya duyem; ew kesê ku serdanê pêk tîne xwediyê cewhereke mezintir û ronahiyeke bilindtir e. Ya sêyem cewhera ku serdanê pêk tîne û yê ku tê serdankirin wekhev in. Puxteya Xwedê dema ku ji mirovekî biqete wê gavê tenê puxteya wî mirovî di holê de dimîne. Xêncî van di vê baweriyê de hin têgehên din jî hene ku ji van em du mînakên bidin: Ew kesên ku ji aliyê padîşah ve were serdan kirin re “Şah-mehman” yê ku ji aliyê Xwedê ve were serdankirin re jî “Xwedê mehman” tê gotin.⁷⁶⁴

Derbarê teceliya Xwedê di çîrokekê de derbarê Sultan Sehaq agahî hene. Çar ferîşte ji bo teceliyê amade ne û hêviya teceliyê sekinîne. Di dawiyê de bazekî payebilind ê spî tê li ser darikekî rûdinê. Pey re keçika xama (bêmêr)

⁷⁶² Hamzeh’ee, *b.n.*, r. 200-201.

⁷⁶³ *b.n.*, r. 151-152.

⁷⁶⁴ *b.n.*, r. 152.

ya bi navê xanima Dayerak damana xwe ya ku li ser bazê cih kiribû radike û li pêşiya xwe zarokê dibîne. Ev zarok Sultan Sehaq e. Xêncî van di pirtûkeke kevn ya Yarsan a bi navê “Doureh-ye damyarî” de renkarnasyona Cebraîl û pîr Benyamînê ku nûnerê Ademê ruhanî ye, wekî çîrokekê cih digire. Pîr Benyamîn wekî nêçîrvanekî li pey nêçîra bazê payebilind ê nemir e, bi sedsalan cîhanê digere. Ev bazê navborî ê torin û nemir Hevenkar bixwe ye. Di nivîsên Yarsan de teofaniyê sêyem ê bi navê Şa Xoşîn di çemê Gamasiyab de li ber çavan winda dibe. Demek şûn de Benyamîn û rêhevalên wî heta ku baz xuya bike ji gelek azmûnan derbas dibin. Ev helwest nola di nivîseke din de mînaka Cebraîl dixuyê ku ev pêvajoya paqîjbûn û ronîbûnê ye. Heta ku Cebraîl ji bo teceliya Îlahî amade bû gelek dem derbas bû. Lê hê jî hewcedarê rêberiyê bû ku Xwedayê ku wekî kurikekî bedew derketibû li pêşiya Cebraîl vê rêberiyê pêşkeşî Cebraîl kir. Em di efsaneyên Mazdaîzmê de jî rast li efsaneyek mîna vê efsaneyê tên. Li wê efsaneyê de jî Urmazd, wekî xortekî mîna tavê dibirîqî û xortekî panzdeh salî derkete hemberê Mart-e ahrav. Mart-e ahrav mirovekî paqij, biexlaq, adil û bêkêmasî bû. Her wiha ji bo gihîştina vê astê diviyabû ku mîna ferîşteyên Yarsan ber bi êşan ve bihata sekinandinê.⁷⁶⁵

Hêmanên baweriya Yarsan bi hêmanên baweriyên Îranê re têkildar in. Teceliya Îlahî li Îranê cara yekem di pirtûka pîroz ya Zerdeştîyan ya bi navê Avestayê de derdikeve pêşberî me. Xwedê di Avesteyê yasna 48.10'an de wekî “di hundirê mirov de mirov” xuya dibe. Bi awayekî din Xwedê wekî mirovê bêkêmasî (mirovê îdeal) yan jî wekî armanca (îdeal) mirovan cihê xwe digire. Her wiha di Avestayê de derbarê Xwedayê Mazda di suretên cuda de xwe nîşan dike agahî hene. Dîsa di Avestayê de di derbarê “Far-e Yazdan” (ronahiya Yazdan) de agahî hene ku ev ronahî dikeve di hundirê mirov de ku ev ronahiya Yazdanî di dînê Îslamê de têgeheke wekî “Nûra Muhamedî” derdikeve pêşberî me.⁷⁶⁶

Yarsan baweriyeke yek Xwedayî ye lê yek Xwedatiya baweriya Yarsan ji her sê baweriyên yek Xwedayî cuda ye. Li gorî baweriya Yarsan Xwedê yek

⁷⁶⁵*b.n.*, r. 153-154.

⁷⁶⁶*b.n.*, r. 154-155.

e, lê Xwedê mîna mirov derdikeve holê. Heta niha heft teceliyên Xwedê yên mezin û gelek yên piçûk pêk hatine. Xwedê xwe wekî mirov nîşan dide, yanê puxteya Xwedê xwe di mirov de nîşan dide. Di her teceliyê de komek ferîşteyên cuda peywira xwe bi cih tînin. Hin ferîşteyên Zerdûştî di baweriya Yarsan de tînin. Çawa ku Xwedê di mirov de xuya dike û di drûvê mirov de tê cîhanê, ferîşte jî di hev de tecelî dikin. Heft ferîşteyên Xwedê mîna wezîran in.⁷⁶⁷

Dîroka cîhanê ji heft dewran pêk tînin ku ev dewran jî, ji sê heyaman pêk tînin. Mîna Zerdûştîyan di baweriya Yarsan de dîroka cîhanê ji sê heyaman pêk tînin:

- a) Heyama mêj (heyama ezelî, alem-e alast)
- b) Heyama Şerîatê (Heyama Îslamê)
- c) Heyama Heqîqetê (Ev heyam bi damezirandina baweriya Yarsanê dest pê dike û heta roja qiyametê didome)⁷⁶⁸

Heyama mêj bi Havenkar dest pê dike. ‘Elî û Şa Xoşîn di heyama Şerîatê de ne. Heyama sêyem bi çar teceliyên sereke yên Sehaq dest pê dike. Di van her sê heyaman de ferîşteyên ku li cem Xwedê ne ev in:

- a) “*Heften*” (*Heft Beden*). Ev ferîşte gavek pêşîya teceliya Îlahî tê dîtin:

1. *Heyama Havendegar, Cebrail, Mikail, Îsrafil, Azraîl.*
2. *Heyama ‘Elî, Muhammed, Selman, Qamber, Nusayr, Fatemeh.*
3. *Heyama Xoşîn, Baba Bozorg, Baba Faqih, B. Hesên, **Baba Taher.***
4. *Heyama Sehaq, Benyamîn, Davud, Pîr Musî, Razbar.*
5. *Heyama Qermezî Kaka, Mîreh Kaka, Ereb Kaka, Rehman, Zarbanû.*

⁷⁶⁷b.n., r. 162.

⁷⁶⁸b.n., r. 162.

6. *Heyama Muhammed-beg Ka-Merican K.Malakcan Qarapust Şahsavar*

7. *Şah Ataş, Ş. Jamshîd, Ş. Almas, Ş. Abdal, Perî Xanom*

b) “*Heftawaneh*” (Koça Heftawane), *ferîşteyên koma duyem ên Yarsan in. Di dîroka cîhanê de renkarnasyonên Heftawaneh ên sê heyama wiha nin:*

I.	II.	III.
<i>Şantiye</i>	<i>Muhammed</i>	<i>Ehmed</i>
<i>Taha</i>	<i>Hamzeh</i>	<i>Bolvefa</i>
<i>Yasîn</i>	<i>Ebu Taleb</i>	<i>Îsî</i>
<i>Mahla (Mohla?)</i>	<i>Omreh</i>	<i>Mîr</i>
<i>Tasîm</i>	<i>Meqdad</i>	<i>Mostafa</i>
<i>Hamîm</i>	<i>Ebazer</i>	<i>Şahab</i>
<i>Parî</i>	<i>Betul</i>	<i>Hebîb Şah</i>

*Bi her awayî ferîşteya heftem mê ye.*⁷⁶⁹

Xêncî van komên ferîşteyan ên mîna “Heft-Serdar”, “Qavaltâ” “Çehel-ten”, Heftad-o-do-ten” hene.⁷⁷⁰

Di dewra yekem de her çar ferîşteyên pêşiyê ferîşteyên baweriyên Mûsewî-Xiristiyân û Îslamê ne. Dewra duyan bi ferîşteyê bi navê ‘Elî dest pê dîke û xêncî Nusayr ji kesên navdar ên Îslamê pêk tînin. Nusayr, pêşiyê wekî Îsa hatiye nîrxandin paşê wekî Theophobus ê ku ferîşteyekî payenimiz ve hatiye nîrxandin. Dewra sêyan bi Şa Xoşîn dest pê dîke. Dewra çarem bi Siltan Îshak ve dîst pê dîke û bi kesên Mûsewî ên bi navê Musa, Dawud û Benyamîn didome.⁷⁷¹

Navê ferîşteyên baweriyê û guherîna taybetiyên ferîşteyan bi bûyerên ku di Kurdistanê de di nav jiyana netewa Kurdan de diqewimin ve têkildar in.

⁷⁶⁹ *b.n.*, r. 163-164.

⁷⁷⁰ *b.n.*, r. 164.

⁷⁷¹ Izady, *b.n.*, r. 266.

Wekî mînak: Tevgera ku di bakur û rojavayê Kurdistanê ya bi navê Mîthraî de (bz. sedsala 2 û pz. sedsala 3); Bandora kevneşopiya Yahudî-Xirîstîyan (bz. Sedsala 1 û pz. sedsala 7) bi temamê Kurdistanê; Li Kurdistanê (pz. sedsala 7) bi hatina Îslamiyetê; di Kurdistanê (pz. sedsala 12-15) de bi hatina dagirkirina Tirkan û di sedsala 17 û 19'an de koçerbûna Kurdan.⁷⁷²

Navên ferîşteyên baweriyê ên dewra pêncan nîşaneyên di serdema navîn tevgerên şoreşî ên bawerîya Yezdanî de qewimîne. Di vê heyamê de şoreşger bi rengên sor derketine pêş.⁷⁷³

Yarsan, li pişt heyama yekem ya ku Rihê Gerdûnî xwe wekî Xwedê da xuyakirin, heyama çarem ya ku ferîşteyê Sehaq di tê ye, heyama herî girîng dibînin. Elewî, heyama duyem ya ku 'Elî di tê de ye girîngtir dibînin. Êzdî jî girîngî didin heyama Şêx Adî û ferîşteyên wî, lê derbarê heyamên wan de zelalî tune.⁷⁷⁴

Ji bo bawerîya Yarsan, Hawandegar, 'Elî û Sehaq di nav heftên mezin de yên girîngtir in. Ferîşteyên baweriyê di heyama xwe de xwediyê cih û astên xwe yên taybet in. Her ferîşte xwe di heyama pişt xwe de di heman ferîşteya asta xwe de didomîne. Yanê Hawandegar di heyama duyan de di 'Elî de, 'Elî di heyama sêyan de di Şa Xoşîn de, Ew jî di heyama çarem de di Siltan Sehaq de xuya dike. Di her heyamê de ferîşteyeke jin ya Rihê Gerdûnî heye. Hebûna ferîşteya jin, girîngiya jinê ya di nav civaka Kurdan de nîşan dike.⁷⁷⁵

Di nav van ferîşteyên Yarsan de ferîşteya Razbar heye ku ev nav wekî peyveke Kurdî xuya dike. Her du Ferîşteyên dawî ên bi navê "Ruçiyar" û "Ayvat" hene ku ya yekem wekî peyvekî Kurdî-Farisî xuya dike lê peyva duyem nayê zanîn. Di dewra duyem de navên dîrokî derdikevin pêşiya me. Em teceliya Îlahî ya bi navê 'Elî b. Abî Taleb (kd. 661) dibînin. Gava ku 'Elî hate şehîdkirin hezkiriyên wî ji xwe re gotin Şîat. Ji aliyê baweriyê ve cudatiya wan

⁷⁷²b.n., r. 266.

⁷⁷³b.n., r. 266.

⁷⁷⁴b.n., r. 266.

⁷⁷⁵b.n., r. 267.

bi yên din ve tune bû. Bi taybet li Iraqê Şîfî di nav kesên ku Ereban nebûn de belav bû. Ji wê demê pê ve Şîfî di nav cîhana Îslamê de bû muxalefeta herî mezin. Ew kesên ku li hemberê zilma Ereban man ên ku ne Ereban bûn piştgirî dan vê tevgerê. Her wiha xêncî zilma Ereban a ku li ser netewên ne Ereban diqewimî di nav civakê de çîncî cuda ên aboriyê çêbûn. Şîa bû berdevkê kesên bê îmtiyaz. Dema ku piştî Hesên, Huseyn jî ji aliyê Emewîyan ve hatin kuştin, êdî Şîfî bû tevgerê şoreşger. Huseyn di bawerîya Yarsan de ferîşteyê ku hatiye şehîdkirin temsîl dike.⁷⁷⁶

Di nav Ferîşteyên Yarsan de Selman jî heye ku ew rêhevalê Muhemmed e. Navê wî ê rast Mahbe (Mayeh) b. Bûzehmeşan b. Murselan b. Yehbûzan e. Ew li Rahurmuzê tê dinê. Di atêşgedeya Zerdûştan de karê ku agirê pîroz netemire dikir. Tê gotin ku Selman rahîbekî Zerdûşt e û ji bo bigihîje rastiye çûye Erebanê.⁷⁷⁷ Tê Musûl û Nisêbîn û Amûriyê. Têkiliya wî bi Xiristiyanan re çêdibe. Ber bi Erebanê diçe, tê girtin û dibe bende. Demê şûnde hevnasîna wî û Hz. Muhemmed çê dibe û ew ji bendetiye azad dibe.⁷⁷⁸

Selman bi taybet rîza kesên muxalîf bidest xist û wekî damezirînerêkî sofîtiyê tê pejirandin. Her wiha mîna Nusayriyan ji aliyê gelek komên bawerîyê ve nirxêke bilind didin wî. Li cem terîqeta Haksar a derwêşên Yarsan, Selman wekî yekem sofîyê tesewîfê tê pejirandin. Ferîşteyê çarem yê Yarsan “Nusayr” e ku navê wê ferîşteyê ji aliyê Nusayriyan hatiye pejirandin. Di hin dabeşên ferîşteyên Yarsan de navê Selman pêşîya Muhemmed tê ku ev jî nirxa wî ya bilindtir nîşan dike.⁷⁷⁹

Baba Tahir, yek ji ferîşteyên Yarsanê ye. Di nivîsên Yarsanê de hevdiîna Şah Xoşîn û Baba Tahir heye. Şah Xoşîn gazî rêhevalên xwe dike û nehêd rêhevalên wî li cem wî berhev dibin. Şah Xoşîn diçe li çiyayê Elwendê. Rojek Baba Tahir Şah Xoşîn û rêhevalên wî gazî xwarinê dike. Lê tenê tasek avgoşt (abgoşt) û sê ker nanê wî hebûye. Xaniyê Baba Tahir jî teng bûye. Şah

⁷⁷⁶ Hamzeh'ee, *b.n.*, r. 165-167.

⁷⁷⁷ *b.n.*, r. 167.

⁷⁷⁸ “Selman”, [<https://tr.m.wikipedia.org/wiki/Selman>], Gihîn: 07 Gelawêj 2015.

⁷⁷⁹ Hamzeh'ee, *b.n.*, r. 167-168.

Xoşîn kerametek nîşan dide û xanî wisa mezin dibe ku hemû kes di tê de cih dibin û her kes xwarinê dixwin û têr dibin. Şa Xoşîn di vê baweriyê de mirovekî girîng e. Puxteya Xwedê di wî de tecelî kiriye û ew xwediyê gelek keramet e.⁷⁸⁰

Di nivîsên Yarsan de di derbarê puxteya Xwedê de çawa di Şa Xoşîn de tecelî kiriye agahî heye. Li gorî vê agahiyê, rojek tîrêjekî tavê di devê Celale Xanim de dikeve hundirê wê û ew bizar (ducanî) dimîne. Demek şûn de her kes wê sucdar dikin ku ew xama û bêmêr e û bizarbûna wê napejirînin. Rojek Kaka Redaî, Qazî û Hodadad tên ji ber ku ew ji aliyê puxteya Xwedê ve bizar maye wê pîroz dikin. Celale diçe vê helwestê ji bavê xwe re dibêje. Dema ku Şa Xoşîn tê dinê her kesê ku wê sucdar dikirin ji xwe şerm dikin.⁷⁸¹ Şa Xoşîn li gorî Serencamê di sala 1015'an de li Loristanê ji dayik bûye. Ew mirovekî efsanewî ye û zarokatiya xwe li Loristanê derbas kiriye. Ji bo xwendinê çûye Hemedanê. Li gorî gotinan wî rojek gava ku li ser lutkeya çiyayê Yafteyê li Xuremabada Loristanê gazî Xwedê kiriye û ji Xwedê re lavayî kiriye nûra Xwedê ketiye laşê wî û bi vê nûrê ew bûye pîrê Yarsan. Ew di 1074'an de li Kîrmanşahê çûye ber dilovaniya Xwedê.⁷⁸²

Siltan Sehaq di baweriya Yarsan de xwedî cihekî payebilind e. Sehaq di navbera ss.11-13'an de di bajarê pîroz ê bi navê Berzencî de hatiye dinê ku ev bajar li başûrê bajarê Silêymaniyê ye. Di roja me ya îroyîn de ev bajar navenda terîqeta sofî ya bi navê Qedîrî ye. Her wiha Şêx Mehmûdê ku li piştî Şerê Yekem ê Cîhanê 12 salan hemberî Kiraliya Brîtanyayê şer kiribû û dawiya vî şerî, xwe wekî Kiralê Kurdistanê dabû zanîn, xwe di 12 bavan de ji nîfşê birayekî Siltan Sehaq diyar kiribû. Li gorî Yarsanan Sehaq ji jinekî xama / bêmêr hatiye dinê û ji ferîşteyên sereke yê Rihê Gerdûnî ye. Têkiliya navê Sehaq bi navê Îshaq (Isaac) datînin lê ev nav ji navê Kiralê Medan ê bi navê Dahaq tê.⁷⁸³

⁷⁸⁰ *b.n.*, r. 371-372.

⁷⁸¹ *b.n.*, r. 370.

⁷⁸² Adak, *b.n.*, r. 124.

⁷⁸³ Izady, *b.n.*, r. 267.

Di baweriya Yarsanê de dualîzm heye. Di navbera başî û xerabiyê de şer heye. Xerabî wekî “Hêzên Tariyê” tên binavkirin. Osman, Rehman û Muawiye wekî hêzên tariyê hatine binavkirin. Başî jî ew kesên ku xwediyê puxteya Îlahî ne. Dualîzma Yarsanê di Mazdaîzim û Zervanîzimê de jî heye.⁷⁸⁴

Navbera baweriyên Yarsan û Êzdîtiyê de têkilî gelek xurt in. Him di baweriya Yarsan û him jî ya Êzdîtiyê de navê Şeytan “Melekê Tawûs” e. Têgehên rihê xerab di her du baweriyên de bi piranî mîna hev in. Navê Îlahê her duyan jî Xwedê ye. Di her duyan de jî di rêberiya ferîşteya Lasîfarûs de heft ferîşteyên ku Kurdî diaxifin hene. Di her du baweriyên de jî çar ferîşteyên baweriyên Xirîstiyânî û Îslamî ên bi navên Cebraîl, Mikaîl, Azraîl û Îsrafil bi heman navan hene. Xêncî van ferîşteyên bi navê Çilmîr û Çiltên hene. Kesên pîroz ên Îlahî ji dayikekî xama / bêmêr ji dayik bûne. Ji bilî van gelek têkilî di navbera her du baweriyên de hene.⁷⁸⁵

Di baweriya Yarsanê de ji aliyê bingeha rihan ve mirov hatine veqetandin. Bi vî awayî çar cure mirov hene. Yên yekem: Rihên rizgarker ên pêxember û ezîzan (Nas) in. Yên duyem: Rihên mirovên baş ên ronî (Şebh-e Nas) ne. Yên sêyem: Rihên ku rastiyê nabînin ên tarî (Nasnas) ne. Ev cure mirov jiyaneke badilhewa û madî dijîn. Yên çarem: Rihên mirovên zalim ên agirîn in. Di baweriya Mazdaî de têgehên mîna van têgehên jor hene.⁷⁸⁶

Di Yarsanê de mîna Yezdanîtiyê pirtûkên pîroz ji yekî zêdetir in. Pirtûkên girîng Serencam, Hazana û gotinên Siltan Sehaq û peyrewên wî ne. Pirtûkên vê baweriyê bi piranî bi Goranî hatine nivîsin lê bi zaravayên Lorî, Hewramî û zimanên cuda jî henin. Pirtûka ku wekî ya Behlulê Mahî yê razbar (Behlulê Medî) tê zanîn ya bi navê “Dawraî Bahlul” a ku bi şiklên ayetan û bi zaravayê Goraniya kevn hatiye nivîsîn girîng e. Pirtûka Nîmatullah Ceyhunabadî Mukrî ya bi navê “Şahnameya Heqîqet” û ya Nuralî Îlahî ya bi

⁷⁸⁴ Hamzeh'ee, *b.n.*, r. 187-188.

⁷⁸⁵ *b.n.*, r. 189.

⁷⁸⁶ *b.n.*, r. 193.

navê “Burhan” di demên nêzîk de bi Farisî hatine nivîsîn, hin beşên wan bi Goranî, ayetên pirtûkan jî bi Erebi hatine nivîsîn.⁷⁸⁷

Di mêrên Yarsan de taybetiya balkêş cawbirê li simbêlên xwe naxin. Rihê xwe kurt dikin, lê simbêlê wan dirêj in. Di Îslamê de dirêjkirina simbêl tune lê Şiiyan ev kevneşopî ji Elewiyan girtine. Kiralên Safewiyan jî rihên xwe kurt kirine lê simbilên wan dirêj in. Ji ber ku di Îslamê de dirêjkirina simbêlan hatiye qedexekirin Şiiyan ev kevneşopî berdane lê ev taybetî di Yezdaniyê de hê jî dewam dike.⁷⁸⁸

Di roja me ya îroyîn de ji sedî dehê Kurdan Yarsan in û piraniya wan li başûrê Kurdistanê dijîn. Helbestvanê bi nav û deng ê serdema navîn Baba Tahirê Uryan û helbestvanê ss. 19’an ê bi navê Edîb el-Mamalîk Yarsan in.⁷⁸⁹

4.3.1. Baba Tahir û Yarsan

Di baweriya Yarsan de Baba Tahir di dewreya sêyem de ferîşteyek e ku ji vê dewreyê re dibêjin dewreya Baba Xoşîn. Gobineau, di pirtûka bi navê “Sê Sal Li Asyayê” de, di çapa Parîsê de sala 1859’an û rûpela 344’an de dibêje: Helbestên Baba Tahir bi zaravaya Lorî ye. Li cem Yarsanan xwîşka wî ya bi navê Bîbî Fatemê keseke pîroz e.⁷⁹⁰

Baba Tahir ji aliyê Yarsanan ve wekî pîrekî tê pejirandin. Lê zaravayê ku di helbestên xwe de bi kar aniye ne zaravayê pîrên Yarsan e. Baba Tahir zaravayê Lorî pîrên Yarsan zaravayê Goranî bi kar anîne. Her wiha bandora Kurdiya Goranî jî li ser Baba Tahir heye. Baba Tahir di nav Yarsanan de wekî kesekî pîroz tê pejirandin û Yarsan dubeytiyên wî li dora pirtûka xwe ya pîroz a bi navê “Serencam”ê nivîsandine. Di nav sirûda heştem ya pirtûka Yarsan de Baba Tahir wekî ferîşteyekî Yarsanê wiha hatiye nasandin.⁷⁹¹

Rewacî her dîn ser-helqeyî şahan

⁷⁸⁷ Izady, *b.n.*, r. 268.

⁷⁸⁸ *b.n.*, r. 269.

⁷⁸⁹ *b.n.*, r. 269.

⁷⁹⁰ Azkaîfî, *b.n.*, r. 122-123.

⁷⁹¹ Adak, *b.n.*, r. 110.

Cemşîdî Cem ben şon berî rahan

Îrecî Yehya Siyaweşî key

Huseyn şehîd ne Kerbelayî tey

Elî Qelender Tahir Qelender

Henî çîş wa çûm pûrî Eskender⁷⁹²

Tu serdarê hemû dîn û serhelqeyê şahan î. Tu Cemşîdê Cem î, rênîşaner û şûncihgir î. Tu Îrecî Yehya Siyaweşî Key î. Tu li seraya Kerbelayê Huseynê Şehîd î. ‘Elî Qelender⁷⁹³ û Tahir Qelender. Ez çi kesî din jî bêjim tu zêdetir î, kurê Eskender î.

Hin lêkolînerê Yarsanê ji vê helbestê derdixin ku ‘Elî Qelender û Tahir Qelender (Baba Tahir) ji mezintirîn kesên Yarsanê ne û rihên wan yek in (Li gorî prensîba reenkarnasyonê rihê Baba Tahir ketiye bedena ‘Elî Qelender). Lewra serdana Şa Xweşîn bo Baba Tahir hatiye hesabandin.⁷⁹⁴

Di pirtûka pîroz ya Yarsanê de Baba Tahir wekî ferîşteyekî baweriyê hatiye nîşan kirin. Serancam ji bo Yarsaniya Baba Tahir belgeyek e. Yarsan bawerdikin ku Baba Tahir yek ji yarên heyama Şa Xwoşîn e. Lê hin belge û nîşane hene ku derbarê baweriya Baba Tahir agahiyên cuda didin.

Li gorî hin lêkolînerên Îranî Baba Tahir Misilmanekî Şîî ye û li ser baweriya duwazdeh Îmaman e. Ew ji ber du dubeytiyên Baba Tahir ên jêr vê angaşê tînin ziman. Dubeytiyek wiha ye:

Ez an roçî ke ma ra aferîdî

Be xeyrez me’siyet er ma çi dîdî

Xwuda wend! be heqqî heşt û çawrit

⁷⁹² *b.n.*, r. 111.

⁷⁹³ Elî Qelender: Pêşivanekî Yarsanê ye. Li gorî Serancamê ew di sala 1434’an de ji dayik bûye. Di sala 1484’an de li Bexdayê ji aliyê hinek kesan ve hatiye kuştin. (Adak, *b.n.*, r. 133)

⁷⁹⁴ Adak, *b.n.*, r. 111.

*Zi mû biguzer şitir dîdî ne dîdî*⁷⁹⁵

Ji wê roja ku te em afirandine

Ji bilî gunehan te tişt nedîtine

Xwedawenda bi heqê heşt û çaran

*Gunahim bibexşîne xwe li ser nebe*⁷⁹⁶

Dubeytiya din ya derbarê heşt û çaran jî wiha ye:

Şew tarit bewînem tar tarû

Girifte zûlmetêş her burc û barû

Xwudaya roşnayî ber dilim de

Ke ta wînem cemalê heşt û çarî

Şeva te ya tarî dibînim tartarî

Girtiye tarîtiyê her birc û hesarî

Xwedêyo! Ronahiyê berde dilê min

*Da ku bibînim cemalê heşt û çarî*⁷⁹⁷

Duwazdeh Îmam: Di hin rêyên tesewifê de kesên ku warîsên Hz. Pêxember tên pejirandin in. Ev kes bi giştî ji nesla Hz. Pêxember in û navên wan; 1- Hazret-î 'Elî (r.), 2- Hz. Hesên(r.), 3- Hz. Huseyn (r.), 4- 'Elî Zeynelabîdîn, 5- Muhammed Baqir, 6- Ca'ferê Sadiq, 7- Mûsa Kazim, 8- 'Elî

⁷⁹⁵ Xeznedar, b.n., r. 212.

⁷⁹⁶ Yıldırım, b.n., r. 293.

⁷⁹⁷ b.n., r. 255.

*Rıza, 9- Muhammed Teqyûdîn, 10- ‘Elî Nakî, 11- Hesenê Eskerî, 12- Mehdî.*⁷⁹⁸

Di heman demê de Hz. ‘Elî û Huseyn di baweriya Yarsan de kesên pîroz in û ferîştayên ku puxteya Xwedê di wan de tecelî kirine ne. Me cihê ‘Elî û Huseyn ên ku di baweriya Yarsanê de di mijara “Yarsan” de diyar kiribû. Hevpariya Şîî û Yarsanan ew e ku her du jî muxalifên Emewî û Ebasiyan bûn.

Îbrahîm Ehmed Şiwan diyar dike ku heşt û çar ne tenê tê wateya duwazdeh îmama. Dibe ku Baba Tahir derbarê dergehên bihûştê agahî dide ku di bihûştê de heşt dergeh hene. Dibe ku ew derbarê heşt ferîştayên ku di Qur’anê de henin ku roja dawiyê erşê Xwedê hildigirin agahî dide. Di Qur’anê de derbarê heşt ferîştayan agahiyek wiha ye: “وَيَحْمِلُ عَرْشَ رَبِّكَ فَوْقَهُمْ يَوْمَئِذٍ ثَمَانِيَةٌ”. Dibe ku mebesta behskirina çaran, çar xelîfeyên raşidîn yan jî çar mezhebên Îslamê bin, her wiha çar alî (rojhilat, rojava, başûr û bakur) û çar demsalên salê bin jî. Dibe ku mebest duwazdeh mehên salê bin jî ku duwazdeh meh yek sal e ew jî demê tîne ziman. Di baweriya Îslamê de dem pîroz e ku Xwedê li ser demê sond (qesem) xwendiyê.⁷⁹⁹

Duwazdeh Îmamên ku Şîî kifş kirine di heman demê de ew li cem Sûniyên Misilman jî pîroz û rêzdar in. Ji aliyê lokolîneran hatiye diyar kirin ku hin helbestên helbestvanên Îranî tev li dubeytiyên Baba Tahir bûne ku yek ji wan helbestvanan Pûr Ferûdûn e.⁸⁰⁰ Îhtîmal heye ku ev her du dubeytiyên ku di wan de behsa heşt û çaran hatine kirin, ji helbestên ku tev li dubeytiyên Baba Tahir bin jî. Ji ber ku di nav berhemên wî de xêncî van her du dubeytiyan nîşaneyekê ku Şîîtiyê bibîr bîne tune. Lê dema ku em helbestvanên Şîîparêz ên ku derbarê dînî helbest nivîsandine dinêrin, em dibînin ku ew bi awayekî eşkere hêmanên Şîîtiyê di nav helbestên xwe de bikar anîne û bi awayekî eşkere alîgiriya xwe ya bi Şîîtiyê anîne ziman. Lê taybetiyê helbestnûsên Şîî di berhemên Baba Tahir de nayên dîtin.

⁷⁹⁸ Cebecioğlu, *b.n.*, r. 495.

⁷⁹⁹ Şiwan, *b.n.*, r. 26-27.

⁸⁰⁰ *b.n.*, r. 25.

Şiwan bi çend belgeyên din diyar dike ku Baba Tahir ne Şiî ye dibe ku Sûnî ye. Ev belgeyan ev in:

- 1- *Baba Tahir mamê Baba 'Elî ye ku ew jî bavê Şêx 'Îsayê Berzencî ye û Berzencî jî hemû Sûnî ne.*
- 2- *Di dubeytiyên Baba Tahir de derbarê xelîfeyên bi navê Ebûbekir Omer û Osman gotinên nebaş tune ne ku Baba Tahir di helbestên xwe de mîna Mele Perîşan methê 'Elî, Hesên û Huseyîn jî nekiriye ku Mele Perîşan di gotinên xwe de 'Elî, Hesên û Huseyîn berz kiriye.*
- 3- *Piraniya Sûniyan li ser terîqeta sofîzmê ne. Di demên kevn de navdarên Îranê jî Sûnî ne, ne Şiî ne.*
- 4- *Helbestvanên Şiî di demên kevn de tenê helbestên dînî nivîsîne û helbestên dildarî nenivîsîne. Heke Baba Tahir Şiî bûya divê dubeytiyên wî jî mîna helbestvanên Şiî yên kevn bûna ku helbestên Baba Tahir him helbestên dildarî ne him jî di derbarê sofîtiyê de ne.⁸⁰¹*

Çawa ku Xeznedar diyar dike ku ji bo Baba Tahir were naskirin divê baweriya Yarsan were zanîn, Şiwan jî diyar dike ku ji bo Baba Tahir were naskirin divê Îslam were zanîn. Şiwan dibêje, dibe ku Baba Tahirê Kurd Misilmanekî Sûnî be. Ew dibêje, di berhemên Baba Tahir de nîşaneyên Qur'anê hene. Ji ber nîşaneyên Qur'anê, ên ku di berhemên Baba Tahir de hene, ew têkiliya Baba Tahir bi Îslamê ve dadîne.

Şiwan diyar dike ku heke Yarsan beşekî Îslamê be pirsgirêka Baba Tahir ji aliyê baweriyê ve tune ye, lê heke baweriya Yarsanê baweriyêke serbixwe be wê gavê têkiliya Baba Tahir û dubeytiyên wî bi baweriya Yarsanê re tune. Ew dibêje ku di navbera el-Kelîmatu'l Qîşar û Yarsanê de tu têkilî tune. el-Kelîmatu'l Qîşar bi taybet bi sofîzma Îslamî ve têkil e. Dema em dubeytiyên Baba Tahir dinêrin, em dibînin ku ew nîşaneyên ayetên Qur'anê dihundirînin. Mînaka yekem:⁸⁰²

Mu ez qalûbela teşwîş dîrem

⁸⁰¹b.n., r. 27.

⁸⁰²b.n., r. 26.

Guneh ez berg û barûn biş dîrem

Eger la teqnetû destim negired

*Mu ez ya weyleta endîş dîrem*⁸⁰³

Di vê dubeytiya wî de peyvên, “qalûbela”, “la teqnetû” û “ya weyleta” derbas dibin. Ev peyvên jî amaje ne ku di dubeytiyê de darberê sê ayetan agahî hene. Ev agahiyan ev in:

1- Qalû Bela, “أَلَسْتُ بِرَبِّكُمْ قَالُوا بَلَىٰ” (E‘raf, 7/172)⁸⁰⁴

2- La Teqnetû, “قُلْ يَا عِبَادِيَ الَّذِينَ أَسْرَفُوا عَلَىٰ أَنفُسِهِمْ لَا تَقْنَطُوا مِن رَّحْمَةِ اللَّهِ” (Zumer, 39/53)⁸⁰⁵

3- Ya Weyleta, “يَا وَيْلَتَىٰ لَيْتَنِي لَمْ أَتَّخِذْ فُلَانًا خَلِيلًا” (Fûrqan, 25/28)⁸⁰⁶

Helbesta jor di pirtûkeke din de bi awayekî cuda derdikeve pêşberî me. Rêzên yekem û duyem heman in, lê rêzên sêyem û çarem cuda ne. Em nizanin ku di van her du helbestan de kîjan resen e. Di ya jêr de peyvên “la teqnetû” û “ya weyleta” tune. Helbest wiha ye:

موو ئەز قالوو بە لا تەشویش دێروم گوناه ئەز بەرگی داروون بیش دێروم

چوو فەردا نوومه خوونون نوومه خوونن موودەرکەف نوومه سەردە بیش دێروم⁸⁰⁷

Ez ditirsim ji roja Qalûbela

Gunehê min pir in ji belgên dara

Sibê her kesê pirtûka xwe bixwîne

⁸⁰³b.n., r. 25.

⁸⁰⁴ *Qur'ana Piroz û Meala Wê ya Kurdî, b.n., r. 172.*

⁸⁰⁵b.n., r. 463.

⁸⁰⁶b.n., r. 361.

⁸⁰⁷ Xeznedar, b.n., r. 205.

Giran e pirtûka min ji ber guneha

Gunehên wî gelek pir in. Ji hemû belgên li ser daran zêdetir in. Ew jî di roja qiyametê de mîna her kesekî din lînûska wî bi wî re ye. Ji ber giraniya lînûska wî ya li ser milê wî ye, ew yekalî bûye. Her wiha li gel giraniya lînûska wî, ew dîsa jî li pey rastiye ye, ku ew evîndarê rastiye ye. Di helbestê de tê dîtin ku gumanek di dilê wî de heye ku guneh bibin asteng û ew xwe negihîne rastiye.

Nîşaneyên din ên ku di helbestên Baba Tahir de hene, yên derbarê Sûnîtiya wî ev in:

Dila xafil zisû bihanî çî hasil

Mûtî î nefsu şeytanî çî hasil

Buwe diqedrî tu efzûn ez melayik

*Tu qedrî xud nemeydanî çî hasil*⁸⁰⁸

Di vê dubeytiyê de nîşaneyên ayetên Qur'anê hene. Ev nîşanyan di Qur'nê de wiha derbas dibin:

- 1- Di nîvebeyta yekem de: “وَهُمْ عَنِ الْآخِرَةِ هُمْ غَافِلُونَ” (Rûm, 30/7)⁸⁰⁹
- 2- Di nîvebeyta duyem de: “إِنَّ النَّفْسَ لَأَمَّارَةٌ بِالسُّوءِ” (Yûsuf, 12/53)⁸¹⁰
- 3- Di nîvebeyta sêyem de: “وَإِذْ قُلْنَا لِلْمَلَائِكَةِ اسْجُدُوا لِآدَمَ” (Ta-ha, 20/116)⁸¹¹
- 4- Di nîvebeyta çarem de: “وَلَقَدْ كَرَّمْنَا بَنِي آدَمَ” (Îsra, 17/70)⁸¹²

Baba Tahir di dubeytiyeke xwe de wiha dibêje: “Misilmanan sê derd amed bi yekbar, Xerîbî û esîrî û xemî yar.”⁸¹³

⁸⁰⁸ Şiwan, *b.n.*, r. 25.

⁸⁰⁹ *Qur'ana Pîroz û Meala Wê ya Kurdî, b.n.*, r. 404.

⁸¹⁰ *b.n.*, r. 241.

⁸¹¹ *b.n.*, r. 319.

⁸¹² *b.n.*, r. 288.

⁸¹³ Şiwan, *b.n.*, r. 26.

Di dubeytiyeke xwe ya din de jî wiha dibêje: “Min im Tahîr ke der xwû na binoşî, Mihemed ra kemîne çakîrestim.”⁸¹⁴

Di dubeytiyên wî de navên Misilman û Muhemmed hene ku ev jî nîşaneyên Îslamê ne. Bi van nîşaneyên jorîn Şiwan dibêje ku ez wisa bawer dikim ku têkiliya dubeytiyên Baba Tahir bi Îslamê re hene ku ji bo têgihiştina dubeytiyên wî divê Îslamiyet û Qur'an werin zanîn. Navê Muhemmed di heman demê de di nav ferîşteyên baweriya Yarsanê de derbas dibe. Lê Yarsan ne beşekê Îslamê ye, ew baweriyeke serbixwe ye.

Qedem ‘Elî Seramî di gotara xwe ya bi navê “Baba Tahir û ‘Îrfan” de tîne ziman ku Baba Tahir di nav pirtûkan de ji sofîyên tesewifê ên serdama xwe de nehatiye nîşan kirin, dibe ku ew ji terîqetê cuda be ku ev terîqet di nav terîqetên Xorasanê de tune be. Lewre di heyama wî de gelek terîqetên sofîyan hebûne. Him di helbestên wî de him jî pirtûka wî ya el-Kelîmatu’l Qîşar de nîşaneyên wî ên baweriya Yarsanê tune ne. Carina di derbarê yekitiya Xwedê û wehdetê de dubeytî nivîsandiye û di hin dubeytiyên xwe de jî hin caran ji ayetên Qûr’anê sûd wergirtiye. Di dubeytiya xwe ya jêr de ji sûreyê Beqereyê sûd wergirtiye û derbarê afirandina cîhanê û fermana “bibe” (kun) wiha gotiye:⁸¹⁵

Şew taret bewînim xahiş ez pey

Şude kewn û mekan ez xilqetê hey

Heqîqet bişnew ez Tahir ke gerdîd

Be yek “kun” xilqetî kewn û mekan tey

Şeva te ya tarî bibînim ev tika ji te ye

Hebûna heyîn û cihan girêdayî bi te ye

⁸¹⁴b.n., r. 26.

⁸¹⁵ Seramî, b.n., r. 6.

Tu vê rastiya han ji Tahir bibihîze.

Afirîna her tiştî bi “bibe!” yek ji te ye⁸¹⁶

Di sûreyê Beqere, ayeta 117’an de, di derbarê bûyîna cîhanê de agahî wiha ye: “ *بَدِيعُ السَّمَاوَاتِ وَالْأَرْضِ وَإِذَا قَضَىٰ أَمْرًا فَإِنَّمَا يَقُولُ لَهُ كُنْ فَيَكُونُ*. *Ew e aferînerê erd û asîmanan. Dema ku Ew bivê tişteki biafirîne, tenê jê re dibêje: “Çêbibe!” Vêca ew jî çêdibe.*” (2/117)⁸¹⁷ Baba Tahir jî ji ber vê ayetê di dibeytiya xwe de diyar dike ku: Çavkanî û bûyîna her tiştî Xwedê ye. Ew yek e û afirînerê her tiştî ye, bi emrê xwe yê “bibe” her çi dilbike çêdibe.

Qedem ‘Elî Seramî di derbarê Yarsaniya Baba Tahir de tîne ziman ku li Kurdistana Iraqê li bajarê Silêmaniyê derbarê Baba Tahir kongrek çêbûye, di vê kongreyê de axaftvanekî lêkolîner di derbarê Baba Tahir de gotiye, ku Baba Tahirê ku ji pîrên Ehlê Heq tê hesabandin ne Baba Tahirê Hemedanî ye. Ew dibê ku Baba Tahirê dawî yê Hemedanî be û gora wî di herêma Kakeyan li Kurdistana Iraqê de ye û Kakeî komeke ji Ehlê Heq in. Zimanê diya wî Goranî ye û ne Lorî ye. Her wiha Baba Tahirê ku em li ser radiwestin zimanê wî Lorî ye ku ev helwest jî diyar dike ku Baba Tahir ne Yarsan e. Baba Tahirê ku di pirtûka serencamê de cih girtiye gora wî li Kurdistana Iraqê ye.⁸¹⁸

Mîna Seramî lêkolînerên ku Baba Tahir wekî Yarsan napejirînin hene. Seramî vê angaştê xwe bi hin agahiyan dike ku piştrast bike. Ew, têkiliya Baba Tahir bi Qur’ana pîroz dadîne û li ser vê têkiliyê wî wekî kesekî derveyî Yarsanê nîşan dide. Baweriya Yarsanê Hz. Muhemmed û Elî wekî ferîşteyekî Yarsanê ku puxteya Xwedê di wan de tecelî kiriye dide nasîn. Seramî diyar kiriye û gotiye ku di berhemên wî de di derbarê baweriya Yarsanê de tişteke tune, lê Xeznedar, berevajî Şiwan û Seramî têkiliya Baba Tahir û dubeytiyên wî bi Yarsanê re dadîne û derbarê vê têkiliyê ji dubeytiyan mînanan dide.

⁸¹⁶ Yıldırım, *b.n.*, r. 378.

⁸¹⁷ *Qur’ana Pîroz û Meala Wê ya Kurdî*, *b.n.*, r. 17.

⁸¹⁸ Seramî, *b.n.*, r. 6.

Baba Tahir li gel ramana xwe ya wehdetê wicûdê ramana yekitiya baweriyên jî parastiye. Li gorî me Baba Tahir li cem baweriya Îslamê bi baweriya Yarsanê ve jî têkil bûye ku li ber çavên Baba Tahir armanc û çavkaniya hemû baweriyên Xwedê ye, nexwe bawerî hemû yek in. Bi vî awayî Baba Tahir behsa ayetên Qûr'anê û yên baweriyên din bike jî ji bo wî ne nakokî ye. Di helbest û bûyerên Yarsanan de û di pirtûka pîroz ya baweriya Yarsan de her wiha di nav ferîştîyên Yarsan de navê Baba Tahir heye. Di heman demê de di hin helbestên Baba Tahir ên ku Xeznedar li ser rawestiye de ku me di vê xebeta xwe de wekî mînak daye, nîşaneyên baweriya Yarsanê tên dîtin. Yarsan di helbest, gotin û bûyerên xwe de li gel navê Baba Tahir navê bajarê Hemedanê jî anîne ziman ku heke bi gotina Seramî bûya diviyabû ku Yarsan di helbest, gotin û bûyerên ku derbarê Baba Tahir de anîne ziman navê herêm û bajarên Kurdîstana Iraqê bianîna ziman, lê Yarsan li gel navê Baba Tahir navê bajarê Hemedanê anîne ziman ku em jî li ser wî baweriyê ne ku Baba Tahirê Hemedanî ji Hemedanê ye. Her wiha niha jî dergevanê gora Baba Tahir ya ku li Hemedanê ye Yarsan in ku ji mêj ve ye li Îranê kesên Yarsan ji gora Baba Tahir re dergevanîyê dîkin.

Di dema Baba Tahir de erdnîgariya ku Baba Tahir di tê dîjiya de baweriya Yarsan bibandor bû. Zaravayê baweriya Yarsan her çî qas “Goranî / Hewramî” be jî Baba Tahir helbest û malikên xwe bi zaravayê Lorî nivîsandîye. Ramanên mîna renkarnasyon û enkarnasyon a ku di Yarsaniyê de hene di helbestên Baba Tahir ên ku gihiştine roja me ya îro de nayên dîtin.⁸¹⁹

Ehlê Heq, di nav Îslamiyê de komeke batînî ye û li Îran, Iraq û Tirkiyê piştewanê wê hene. Ev bawerî, ji jiyana kevneşopî û baweriyêke bi nîrx, ji hêmanên baweriyên Batînî-Zerdûştî û Îslamî pêk hatiye. Ji komên Şîî cuda ye. Yarsan û Êzdîtî nêzî hev in. Lewre ev her du bawerî, ji heman çavkaniyê ne. Mîna komên batînî yên din; bawerî bi sudûra Îlahî, aligirbûyina heq (Ehlê Heq), di mirov de tecelîbûna Heq, sudûrbûna bi heft gihanekan, tecelîbûna zatî û hebûna ferîştîyên zatî re anîne. Baba Tahir bi dereceya sêyan ve ferîştîyekî

⁸¹⁹ Yıldırım, *b.n.*, r. 26.

sudûrê ye. Di vê baweriyê de baweriya dualîst, lebatbûna jiyânê, têkoşîn û guherîna dijberan hene. Di vê baweriyê de mirov û tevger ji alîkî ne: Mirov û tevger, yan baş in, yan jî xirab in. Yan şeytanî, yan jî rehmanî ne. Mirov xwediyê mafê hîlbijartina bi hişê xwe ye. Di encama vê hîlbijartinê de mirov yan alîgirê başiyê û yan jî yê xerabiyê ye. Nexwe xwedî zanînbûn esas û girîng e ku mirov baştir tevbigere. Wekî encam, li hemberî derewê rastî, li hemberî batil jî dê Heq serkeft bin. Lê ji bo vê têkoşîn şert e. Baba Tahir, endamê koma Yarsan e. Her wiha bi raman û bandora xwe kaniya nêrîna Îslamî-batinî û sofîzmê ye. Uryan hevdemê Karmatiyan e, ku ew serdema Xîlafeta Ebasiyan de xwedî bandor bûne. Wê demê daiyên Îsmailî di nav tevgerêke dînî-civakî de bûne. Navê “Baba” di nav nêrîn û tevgerên Îsmailî de Daî-Ekber e. Şêxê ku daiyên din perwerde / birêxistin dike ye. Baba Tahir xwedî keramet e. Baweriya Ehlê Heq, mutesewifê mezin ên mîna Mewlana û Hacî Bektaşê Welî jî wekî bawermend û pêşengê Ehlê Heq dide nîşandan.⁸²⁰

Baweriya Yarsan, di nav hin Kurdan de, bi taybet di nav Loran û kesên niştecihên bajarên çiyayîyan de (wîlayetên cobal) belav e. Baba Tahir, Baba Ce‘fer û Baba Hemşad di pirtûkên berê ên tesewifê de bê nav û nîşan in. Di nav sofîyên tesewifê ên wê serdemê ji wan re cih nehatiye dayîn ku sedemê vê helwestê jî ev sofî bi terîqeteke veşartî ve têkildar in.⁸²¹

Tê gotin ku Şa Xoşên çûye Hemedanê, bûye mêvanê Baba Tahir. Li ser vê mêvandariya Şa Xoşên Baba Tahir dubeytiyek nivîsiye. Lê belê rastiyeke heye ku Şa Xoşên pênc sal piştî mirina Baba Tahir ji dayik bûye. Dibe ku ev wekî efsaneyekî ji aliye gel ve hatibe gotin. Lê di efsaneyan de rastî jî heye ku divê ev jî neyê ji bîr kirin.⁸²² Li ser vê mêvandariyê Baba Tahir wiha gotiye:

Her kes Şaheş to yî haleş hemîn e

Serîneş xişt û balîneş zemîn e

Curmum înest ke te dost darum

⁸²⁰ Tahsin Yazıcı, “Baba Tahir”, *DÎA*, weş. TDV., İstanbul, 1991, IV, r. 371.

⁸²¹ Zerrînkûb, *b.n.*, r. 169.

⁸²² Xeznedar, *b.n.*, r. 188.

*Her kes dosteş to yî haleş çonîn e*⁸²³

Çi kesê tu şahê wî bî halê wî hemîn e

Balgiyê wî kerpîç doşekê wî zemîn e

Gunahê min ew e ku ji te hez dikim

Ew ê ku tu dostê wî yî halê wî hemîn e

Helbestvanekî Yarsan bi navê Farîx di helbesteke xwe de navê ‘Elî Qelender û Tahir Qelender aniye ziman ku her dû mezinên baweriya Yarsanê ne. Her wiha di helbestê de tê dîtîn ku di aliyê manewî de rihê Baba Tahir û ‘Elî Qelender heman in, yanê yek in. Ev mezinê Yarsanê yê bi navê ‘Elî Qelender behsa Şa Xoşên dike û dibêje ku Şa Xoşên bi nehsed kesî ve çûye Hemedanê serdana Baba Tahir. Li ser vî mêvandariya Şa Xoşên bi çûyîna wî ya bi Hemedanê, bi mêvandariya wî ya ‘Elî Qelender ev helbest hatiye nivîsîn.⁸²⁴

Şam bî ve mîhman, şam bî ve mîhman

Alî nan Alî şam bî ve mîhman

Çenî nohsed baş qelenderan

*Baba Tahir bîm, mêrdî Hemedan*⁸²⁵

Şa bûye mêvan, Şa bûye mêvan

Ez im ku mirovê mezin Şa bûye mêvan

Nehsed kes ji qelenderan bûne mêvan

⁸²³*b.n.*, r. 188.

⁸²⁴*b.n.*, r. 188.

⁸²⁵*b.n.*, r. 189.

Ez Baba Tahir im xelkê Hemedan

Pîrê Qubadî Dêwane ku yekî peyrewên baweriya Yaresanê ye, li ser mêvandariya Şa Xoşên ya bi mala Baba Tahir wiha gotiye:

Ew yaney Tahîr ew yaney Tahîr

Baregayî şam ew yaney Tahîr

Bûkan we kerem Qedîm Qahîr

*Negerd hûrî zat şen hazîr*⁸²⁶

Mala Tahir mala Tahir

Bûye wargeha Şa Mala Tahir

Serkaniya kerem, kevn û jêhatî

Agahdar e ji her kar û fikir

Li ser hevdişina Baba Tahir û Şa Xoşên lêkolînek ji aliyê lêkolerê Rûs ê bi navê V. Îvanov hatiye kirin ku di wir de tê gotin ku axaftinek di navbera Baba Tahir, Şa Xoşên û Fatmelere heye. Bi vê axaftina xweşik mirov dihele. Bi taybet ev jin xwediyê baweriyeke pak û pîroz e û li gel Baba Tahir e. Cewhera mê bûye kuncikeke ji sêkûçika Şa Xoşên, Baba Tahir û Fatmelere, axaftina wan bi helbestên Kurdî û Farisî bûye.⁸²⁷

Çavkaniyeke herî mezin li ser dîroka baweriya Yarsan heye ku navê çavkaniyê “Şanameya Heqîqet” e û ji aliyê Nîmetûlah Mukrî ve hatiye nivîsîn. Di vê çavkaniyê de nivîskar, Baba Tahir ji hemû kesên Yaresaniyan mezintir daye nasandin û navê mijarê jî “Mezinên Ehlê Heq” e. Ji ber van agahiyan divê gava ku em helbestên Baba Tahir bixwînin hişê me here li ser baweriya Yarsaniyê. Baweriya Yarsanê, wêjeya Kurdî kiriye berçavk û li sofîzma klasîk

⁸²⁶b.n., r. 190.

⁸²⁷b.n., r. 189.

û teoriya Îslamî nihêriye ku ev beşek ji sofizma kozmosî ne. Di kirinê de (piratîkê de) Baba Tahir xwe wekî derwêşekî serdema xwe nîşan dide.⁸²⁸

Piştî ku Îslam di nav Kurdan de belav bûye, baweriya Yarsanê bûye baweriyeke sofizmê. Di heman demê de Baba Tahir di heyama sofizmê de jiyaye ku sofizm bandor li wî û helbestên wî kiriye. Gel, ji wî, baweriya wî û helebestên wî hezkirine û helbestên wî jiber kirine. Gel wî wekî mirovekî pîroz pejirandine. Wî di her tiştî de rindiyê û bedewiyê dîtiye û van dîtinan di helebestên xwe de jî aniye ziman. Rindperest jî, ji dubeytiyên wî hezkirine ku xwe di nav dubeytiyên wî de dîtine.⁸²⁹

Baba Tahir di dubeytiyeke xwe de behsa giyan, yar û rih dike. Her wiha behsa rojeke taybet dike ku wê gavê di gerdûnê de ne hebûneke bipê ne jî yeke bibask hebûye. Wê roja yekem wiha vedibêje:

Yakem dur dî henî derya nebî, yar

Yakem xwur dî gehan peyda nebî, yar

Men ez an roz be damanê te jed dest

*De gerdûnet perûpayî nebî, yar*⁸³⁰

Yekem min durê dît zerya nebû yar

Yekem min tavê dît giyan nebû yar

Min ew roj girtiye pêşa te bi dest

Li gerdûnê tu zindiyek nebû yar

Ew di vê dubeytiyê de, xwe wekî ji roja yekem nîşan dike ku ji wê roja yekem vir ve pêşa Yarê ve girtiye û hîç bernedaye. Ew bixwe rih e ku beriya

⁸²⁸ *b.n.*, r. 189-190.

⁸²⁹ *b.n.*, r. 193.

⁸³⁰ Yıldırım, *b.n.*, r. 44.

made û cîsimê hebûye. Diyar dike ku ew hêj ku neketiye di nav laşekî de, xwe bi yarê ve girêdaye. Her wiha diyar dike ku hingav dur, roj û yar hebûye lê cîhan hêj tunebûye.

Li gorî ramana wî Yar û rih gelek ji pêş çêbûna cîhanê hebûne. Di pirtûka pîroz ya Yarsan de ya bi navê Serencamê de hatiye gotin ku beriya her tiştî “hîç” hebûye. Cîhan zerya bûye û durek li ser behrê ziviriye. Xwedê durê ji holê rakiriye û bî vê kirinê dû rabûye û asîman çêbûye. Îja stêrk bilind kiriye. Paşê hinek yar afirandiye ku ew yar di nav “Şa”yan de diyar kiriye. Îcar, ji ronahiya xwe heyv û tav, şev û roj çêkiriye.⁸³¹

Ew di vê dubeytiya xarê de nemayînbûna xwe eşkere dike û di derbarê vê de helwesta xwe wiha tîne ziman:

خوونەم ئەز خوردو دەر خووناوه کیتیم

یا ئەز ئین بەند دەر ئیزناوه کیتیم

⁸³² ئەز خووی باره دەر وهلاوه کیتیم

یا درهزین شوومه گیتی ئون نه یا یا

Ew dibêje ku; Min dixwast ez li Îznayê bûma. Min xwîn xwariye û di nav xwînê de dijîm. Di vê cîhanê de parçek cî ji bo min tune. Diyar e, ez di xwe de nemame.

Îzna nave navçeyeke Hemedanê ye.⁸³³ Diyar e ku Baba Tahir ne li Îznayê ye û ji wir dûr e. Her wiha hesreta Îznayê dikêşe ku dixwaze li wir be. Îzna wekî remz dewsa cihê ku dixwaze here li wir bi kar aniye ku ew dera ku dixwaze here li wir Yara wî ye. Her wiha Îzna cihê gihîştina wî ya bi Yarê ye.

Ew di vê dubeytiya xwe ya xarê de li ser mijara bûyîna cîhanê û fermana “bibe” (kun) rawestiyaye û ramana xwe ya di derbarê bûyînê de wiha aniye ziman:

Şew taret bewînim xahiş ez pey

⁸³¹ Xeznedar, *b.n.*, r. 197.

⁸³² *b.n.*, r. 200.

⁸³³ *b.n.*, r. 200.

Şude kewn û mekan ez xilqetet hey

Heqîqet bişnew ez Tahir ke gerdîd

Be yek “kun” xilqetî kewn û mekan tey

Şeva te ya tarî bibînim ev tika ji te ye

Hebûna heyîn û cihan girêdayî bi te ye

Tu vê rastiya han ji Tahir bibihîze.

Afirîna her tiştî bi “bibe!” yek ji te ye⁸³⁴

Me‘rûf Xeznedar di pirtûka xwe ya bi navê Mêjûy Edebê Kurdî de diyar dike ku Baba Tahir di van her du helbestên jor de baweriya Yarsanê eşkere dike. Ew dibêje ku bêguman baweriya Yarsanê û baweriyên asîmanî bi taybet baweriya Îslamê derbarê bûyînê heman tiştê dibêjin.⁸³⁵

Di gelek dubeytiyên Baba Tahir de peyva “baz” heye û Baba Tahir di dubeytiyên xwe de xwe wekî baz nîşan dide. Ew di vê dubeytiyê de baz e û Yezdan ew tûj kiriye. Ew bazbûn û cihana xwe ya bêserî wiha tine ziman:

Mû an espîde baz em sine sûhan

Çiragahî mû bî ser beşnî kûhan

Heme tîxî be sûhan mîkerem tîz

Mû an tîxem ke Yezdan kerde sûhan

Ez ew bazê spî yê dilşewitî me

Warên min ew çiyayên bêserî ne

⁸³⁴ Yıldırım, *b.n.*, r. 378.

⁸³⁵ Xeznedar, *b.n.*, r. 200.

Tevê şûrên xwe tuj dikim bi hesan

*Ez ew şûr im Yezdan ez tûj kirime*⁸³⁶

Di vê dubeytiya wî de baweriya Yarsanê diyar dibe. Ew xwe wekî “bazê spî” dide nasîn. Mîna rêberên Yarsanê û yên sofizma Îslamê tevdigere ku rêberên baweriya Yarsan û yên sofizma Îslamê xwe wekî “bazê spî” binavdikin. Kirdigar “şahbaz” e û wateya wî şahê bazan e. Di nav pirtûka pîroz ya Yarsan ya bi navê Serencamê de, baz arifekî kamil e û ew di asta pîr de ye. Her wiha di wir de tê diyar kirin ku baz berhev dibin, li hev dicivin, dihelin û dibin yek. Bi yekbûna wan, şahbaz peyda dibe. Girêdayî vê mijarê dibêjin bernaveke Şêx Evdilqadir Geylanî (kd. m. 1164) “bazê spî” bûye.⁸³⁷

Di berhemên Baba Tahir ên ku gihîştine roje me de tê dîtin ku wî bi awayekî eşkere baweriya xwe, pirtûka pîroz ya ku jê bawer dike neaniye ziman. Ji ber vê rewşê lêkolîner ji berhem û ji baweriyên ku navê wî di tê de derbas dibe derketine rê û derbarê baweriya wî angaştên xwe pêşkeş kirine û wî ji baweriyên cuda dane nasîn. Ew ji aliyê lêkolînerên cuda wekî Yarsan, Misilman, Misilmanê Şîî û Misilmanê Sunî hatiye nasandin. Navê Baba Tahir di baweriya Yarsan de bi awayekî payeberz derbas dibe lê di nav sofîyên Misilman ên serdema wî de derbas nabe. Di vê mijarê de derbarê baweriya Baba Tahir me cih da sê lêkolînerên xwedî nêrînên cuda. Her çî qas baweriya Yarsan baweriyeke serbixwe be jî hevpariyên vê baweriyê bi baweriya Îslamê re jî hene. Balkêşiya ku me di baweriya Yarsanê de dît ev e ku di gel navên vê baweriyê ên taybet navên ku di baweriya Îslamê de girîng in ên mîna Elî û Muhammed jî di vê baweriyê de payeberz in û li gel hev in. Lê di aliyê hin taybetiyan de jî baweriyên Îslam û ya Yarsan ji hevdu cuda ne. Ji berhemên Baba Tahir, têkiliyên wî, şêweyê jiyana wî, cihê wî yê di baweriya Yarsanê de, erdnîgariya ku di tê de jiyaye û ji serdema wî tê fêmkirin ku têkiliya Baba Tahir bi Yarsanê re hebûye. Di heman demê de berhema Baba Tahir el-Kelîmatu'l Qîşar têkiliya Baba Tahir ya bi Îslamê re heye radixe li ber çavan.

⁸³⁶ Yıldırım, *b.n.*, r. 239.

⁸³⁷ Xeznedar, *b.n.*, r. 201.

Wekî encam berhemên Baba Tahir, taybetiyên sofizma Îslamê û cewherên
baweriya Yarsanê dihundurînin.



ENCAM

Me di vê xebata xwe de li ser Baba Tahir lêkolîneke berfireh kir. Derbarê wî kêma agahî gihîştine roje me. Ji bo teza xwe em çûn Îranê, me li bajarê Têhranê hin çavkanî berhev kirin. Em li bajarê Hemedanê, çiyayê Elwendê geriyar û çûne gora wî. Me di teza xwe de ji aliyê bidestxistina çavkaniyan dijarî kişand û ji bo agahiyên derbarê wî ji zimanên Farisî, Îngîlîzî, Erebi, Tirkî û ji zaravayê Soranî werger kirin. Em li ser jiyar, berhem, huner, eşq, raman û baweriya wî hurbûn. Di encama lêkolînên xwe de em têgihîştin ku Baba Tahir xwediyê huner û barhemên payebilind in. Lê ew her çî qas hêja be jî bi têra xwe nehatiye nasîn. Me di vê xebata xwe de hewl da ku bi her aliyar ve wî binasin û bidîn nasîn.

Baba Tahir di navbera salên 937-1010'an de li hawirdora Loristan û Hemedanê jiyaye. Kevntir pirtûka ku behsa Baba Tahir dike ya bi navê "Rahetu's-Şudûr we Ayetu's-Surûr Der Tarîxê A'li Selcûq"e. Ev pirtûk di sala 599/1202'yan de ji aliyê Rawendî (Mihmedê Kurê 'Elî Silêmanê Rawendî) ve hatiye nivîsandin. Helbestên Baba Tahir di sedsala 19'an şûn de bal kişandine û lêkolînerên mîna; Clement Huart, Heron Allen, L. Leszcynski, K. Hadank, E.G. Browne, Edward-Brenton, Elizabeth Curtis, Minorsky û wd. li ser wî lêkolîn kirine.

Ew yekem helbestvanê Îranê ye. Ew bingeha wêjeya Farisan e. Ew wekî yekem helbestvanê Kurd tê pejarandin. Herçî qas pêla wêjeya klasîk di cîhanê de li pişt wî bi sedsalan şûnde dest pê kiribe jî, berhemên wî taybetiyên wêjeya klasîk dihundirînin. Ji ber vê yekê ew bingeha wêjeya klasîk ya Kurd û Farisan e. Helbestên Baba Tahir ên resen negihîştine roja me û piştî koçdawiya wî bi sedsalan şûnde ji deverên cuda hatine berhevkarin. Ji ber vê rewşê helbestên wî bi resenên xwe nemane û guherîn li ser wan de hatine. Helbestên wî ên di demên kevn de hatine nivîsîn ku ew ne zêde ne, nêzî zimanê Kurdî ne, lê yên di demê nêzîk de hatine berhevkarin nêzî zimanê Farisî ne. Ev rewş jî pirsgirêka zimanê helbestên wî derxistiye der. Perwîz Natil Xanlerî diyar dike ku dubeytiyên Baba Tahir ên ku niha li dest in ne tenê bi kêşeyekî hatine ristin.

Kêşa dubeytiyan guheriye û zelalkirina kêşa dubeytiyan dijar e. Heke dubeytiyên wî resen bûna diyarkirina zarava û kêşa wan dê hêsan bûna. Mînuyî diyar kiriye ku kesên helbestên Baba Tahir nivîsandine, hin caran li gorî çêjgirtin û fêmkirina gelê xwe helbestan guherandine û hin caran jî ji ber kêmasiya nivîsîna zanistî hin guherîn li ser dubeytiyan pêk anîne. Hin kes helbest li gorî zimanên helbestên helbestvanên serdema xwe saz kirine û di vê sazkirina helbestan de her peyvên ku bipirsgrêk dîtine, wan peyvan guherandine. Li gorî baweriya lêkolîneran, zimanê helbestên wî bi zaravayê Lorî ye. Zimanê helbestên wî wekî Fehlewiyat jî hatiye navandin. Kevintir helbestên wî ji aliyê Bahauddîn Qûmî ve di sala 848/1444'an de hatine nivîsîn. Ev jî diyar dike ku helbestên wî yên ku herî kevn ên hatine nivîsîn û gihîştine destê me 434 sal li pişt mirina Baba Tahir hatine nivîsîn. Ev rewş jî pirsgrêka reseniya helbestan derxistiye der. Dibe ku beriya Qûmî helbestên wî hatibin nivîsîn lê belge û agahiyeke wisa niha li dest tune. Di vê destnivîsa Qûmî de 8 dubeytî û 2 bendên Baba Tahir hene û ev helbestan bêtir nêzî Kurdiya Lorî ne. Me gelek berhem û lêkolînên derbarê Baba Tahir hatine nivîsîn yên Tirkîyê û yên Îranê, yên kevn û yên nû nihêrîn, me dît ku di hemûyan de hatiye diyarkirin ku destnivîsa Qûmî ya ku helbestên Baba Tahir di tê de ne, di muzeya Mewlana ya Qonyayê bi jimara 2546 ve hatiye tomarkirin. Me ji muzeyê destnivîsa bi jimara 2546'an girt û li ser wê lêgerîn kirin, mixabin me di destnivîsa vê jimarê de helbestên Baba Tahir nedîtin. Em lê geriyan û me di jimara 2530'yan de di destnivîsa Qûmî de helbestên Baba Tahir dîtin û resenê wan di pêveka teza xwe de pêşkeş kirin. Di sala 1844'an de Mihemed Şahê Qacar ferman kiriye ku dubeytiyên Baba Tahir werin berhevkerin. Di encama vê fermanê de li gund û bajaran 175 dubeytiyên Baba Tahir hatine berhevkerin. Bi lêgerîn û lêkolînan hejmara dubeytiyan zêde bûne. Baba Tahir helbestên xwe bi cureyekî kêşa arûzê nivîsandiye. Lêkolîner diyar kirine ku şeweyê helbestên wî, mîna şeweyê helbesta Kurdan ya kevneşopî ya beriya Îslamê ye. Huner û çêja dubeytiyên wî bilind in. Wî di dubeytiyan de him zimanê deverî û him jî zimanê wêjeyî bi kar aniye. Wî di dubeytiyên xwe de eşq û sofitiyê di nav hev de helandiye. Gotinên wî ên ku di berhema el-Kelîmatu'l Qîşar de

hatine berhevkin, li ser tesewifê ne. Berhema wî ya tesewifi di nav sofîyan de xwedî cihekî girîng e. Hin mitesewif û lokolîner gotinên wî şîrove kirine. Şîroveyên ku li ser berhema wî ya tesewifi hatine kirin, bi taybet bi zimanê Erebi ne, lê şîroveyên bi zimanê Farisî jî hene. Dubeytiyên wî bi timî nehatine guherandin, lê Zerrînkûb diyar kiriye ku gotinên wî ên tesewifi bi giştî bi Erebi ve hatine guherandin. Zerrînkûb dibêje; ji ber ku di serdema wî de zimanê tesewifê bi Erebi bûye, gotinên wî bi Erebi ve hatine werger kirin da ku sofî ji wan sûd wergirin. Zerrînkûb diyar kiriye ku resenê gotinên wî ên tesewifi bi zimanê Fehlewiyatê ye, heke bi gotina Zerrînkûb be resenê gotinên wî ên tesewifi negihîştine roja me yan jî hêj nehatine dîtin. Divê meriv xwediyê ilma tesewifê be ku gotinên wî fêm bike. Gotinên wî ên tesewifi li ser ilm, wecd, merîfet, îlham, hiş, nefis, zikir û îxlasê ne. Ev berhem wî wekî sofîyekî lêkolîner û ravekarê rastiyê dide nasîn. Ew yekem ji ramangêrên wehdetê wicûdê ye. Tova wehdetê wicûdê reşandiye li ser axa tesewifê û peyrewên wî vê ramanê bi berhemên xwe xemilandine û xurt kirine. Ew di helbestên xwe de li ser heyîn û Xwedê hûrbûye, di van mijaran de bandor li mitesewifên pey xwe hatine kiriye û ev jî bandorên girîng li kemîliya ramana tesewifi ya miteswifan kiriye. Bandora wî li ser helbestvan û mitesewifên Faris, Tirk, Ereb û Kurd, ên mîna Omer Xeyyam, Îbn ‘Erebî, Yûnis Emre, Mewlana, Eliyê Herîrî, Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Ehmedê Xanî çêbûye.

Baba Tahir eşqeke dilsoz jiyaye û di nav wî eşqê de şewitiye. Çiyayê Elwendê sitargeha wî ye. Demên dur û dirêj li wir borandiye û ew der e cihê ku nêziktirînê yara xwe bûye. Li wir ji dilberê re helbestan rêzkiriye û ew her tim nalî ye. Ew di heyama xwe de mirovekî arif, navdar û xwedî keramet bûye. Her tim laşê wî derdkêş, dilê wî hesretkêş, ji ber xerîbiyê, bêriya yar û war kiriye û ji ber vê singa wî agirêkêş bûye. Ew her demê xwe di nav êş û xemginiyê de borandiye û dermanê wî gihîştin û fena ne. Ew li her ku nêhêriye ji balabejna yarê nîşaneyek dîtiye. Her wiha gotiye ku ez dil û dilberê tevlihev dibînim ku ev gotinên wî ên di dubeytiyên wî de derbas dibin, eşqa wî ya Xwedayî û ramana wî ya wehdetê wicûdê radixin li ber çavan. Baba Tahir çawa ponijiye û çî hîs kiriye wisa jî jiyaye. Hiş û dil di nav hev de helandiye. Ew helbestvanê

tesewifê ye. Xwe wekî rind û derwêş daye nasîn. Di dîrokê de cara yekem wî ji xwe re gotiye qelender.

Derbarê neteweya wî, zimanê helbestên wî û baweriya wî nêrînên cuda hatine gotin. Em di vê xebatê de li ser pirsên: Baba Tahir Kurd e yan Faris e? Zimanê helbestên wî Kurdî ye yan Farisî ye? Baweriya wî Îslam e yan Yarsan e? Heke baweriya wî Îslam be, ew Sunî ye yan Şîî ye? rawestiyan. Derbarê neteweya wî di berhemên wî û çavkaniyan de hin agahî hene. Ew di dubeytiyeke xwe de gotiye: “Ez Lek im”, di dubeytiyeke xwe ya din de gotiye: “Zimanê min Pehlewî ye”, di gotineke xwe de jî gotiye “ez êvarê Kurd bûm.” Di helbestên wî de gelek peyvên zaravayên Kurdî hene. Her wiha herêma ku jiyana xwe borandiye herêmeke Kurdan a dîrokî ye. Wekî ku tê zanîn Lek Kurd in. Pehlewî bingeha zimanê Îranê ye, zimanê Medan e û berdewama zimanê Avestayê ye ku ev agahiyan wî wekî Kurd nîşan dikin. Jixwe ew di gotina xwe de xwe wekî Kurd pênase kiriye. Her wiha Kurdên Goran li dubeytiyên wî xwedî derketine û wî wekî mirovekî pîroz ê baweriya xwe pejirandine, her wiha helbestên wî li dora pirtûka xwe ya qedîm û pîroz ya bi navê Serencamê nivîsandine. Xêncî van bi raya lêkolînerên biyanî, Baba Tahir ne Faris e û zimanê helbestên wî jî ne Farisî ye. Li gorî hemû lêkolînerên Kurd, hin yên Faris û biyanî zimanê helbestên wî bi Kurdiya Lorî ye. Di helbestên Baba Tahir de him taybetiyên Yarsanê û him jî yên Îslamê tên dîtîn. Em wisa bawer dikin ku têkiliya Baba Tahir bi Yarsanê re heye. Yarsan baweriyeke Kurdan e û dişibe baweriya Êzdîtiyê. Berhema Baba Tahir ya el-Kelîmatu’l Qîşar li ser sofîzma Îslamê ye. Ev berhem têkiliya wî ya bi Îslamê heye, radixe li ber çavan. Baba Tahir xwedî ramana “yekitiya baweriyân” e, ku ew, baweriyân ji hev venaqetîne. Her wiha ew di helbesteke xwe de diyar dike ku di pûtixanê, dêrê, kenîştê de Xwedê heye û bawerî hemû ji Xwedê ne, her wiha mirov jî hemû ji aliyê Xwedê ve hatine afirîn. Ji ber van yekan ew cudatî naxe di navbera baweriyân û cihê baweriyân ên pîroz. Wî nirx nedaye mal û milkên dinê ku ew dewlemendekî feqîr bûye. Ew xwediyê hezkirineke berfireh e, aşîqê dilbera kamil e, rêviyê rêya tesewifê ye û di cîhanê de bendewarê gihîştinê bûye.

ÇAVKANÎ

Pirtûk:

ADAK, Abdurrahman, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, weş. Nûbihar, İstanbul, 2013.

AYVAZOĞLU, Beşir, *Aşk Estetiği*, ç. 3, weş. Ötüken, Stenbol 1995.

AZKAÎ, Perviz, *Baba Tahir-Name*, weş. Tus, Têhran, 1995.

BAHAUDÎNÊ Qûmî, *Pirtûka Destnivîsî*, Qonya Mevlana (Etnografya) Müzesi, 848 / 1444.

Çarîneyên Omer Xeyyam, (Wer.: Perwîz Cîhanî), weş. Nûbihar, İstanbul, 2015.

DEMİRCAN, Adnan, *Kürtler*, ç. 2, weş. Nida, İstanbul, 2015.

DÊREŞÎ, Seîd, *Dîwana Feqiyê Teyran*, weş. Lîs, Ankara, 2011.

DORU, M. Nesim, *Melayê Cizîrî Felsefî Ve Tasavvufî Görüşleri*, weş. Nûbihar, Stenbol, 2012.

DURRE, Abdurrahman, *Şerha Dîwana Ehmedê Xanî Felsefe û Jiyana Wî*, weş. Avesta, Stenbol, 2002.

ELİOT, T. S., *Edebiyat Üzerine Düşünceler*, (Wer.: Sevim Kantarcıoğlu), weş. Kültür Bakanlığı Yayınları, Ankara, 1990.

ERAYDIN, Selçuk, *Tasavvuf ve Tarikatlar*, ç. 4, weş. İfav, İstanbul, 1994.

ERGÜVEN, Abdullah Rıza, *Bütün Yönleriyle Yunus Emre*, weş. Berfin,

İstanbul, 2001.

FRAGER, Robert, *Aşkır Asıl Şarap*, ç. 3, (Wer.: Ömer Çolakoğlu), weş.

Gelenek, İstanbul, 2012.

GOK, Abdulqadîr, *Vejinâ Felsefeyê*, weş. Ronahî, Amed, 2011.

GÖLPINARLI, Abdülbâki, *Hayyam ve Rubâîleri*, weş. İnkılâp, İstanbul.

GUNABADÎ, Hacî Mele Siltan Mihemed Siltan ‘Elîşah, *Şerhê Farisî ber*

Kelîmatu’l Qişar Baba Tahir Uryan, ç. 2, weş. Kitabxaneyî Salih

Hesîniyê Emîr Selîmanî, Azer 63.

HAMZEH’EE, M. Reza, *Yaresan (Ehl-i Hak) Bir Kürt Cemaati Üzerine*

Sosyolojik Tarihsel ve Dini-Tarihsel Bir İnceleme, (Wer.: Ergin

Öpengin), weş. Avesta, İstanbul, 2009.

HASSANPOUR, Amir, *Kürdistanda Milliyetçilik ve Dil 1918-1985*, (Wer.:

İbrahim Bingöl, Cemil Gündoğan), weş Avesta, İstanbul, 2005.

HECİYÊ Cindî-EMÎNÊ Evdal, *Folkloru Kurmanca*, weş. Avesta, Stenbol,

2008.

HERON-ALLEN, Edward, *A Fool Of God: The Mystical Verse Of Baba Tahir*,

weş. The Octagon Pres, London, 1987.

HERON-ALLEN, Edward-BRENTON, Elizabeth Curtis, *The Lament Of Baba*

Tahir Being The Rubaiyat Of Baba Tahir Hemedani (Uryan), weş.

Gilbert and Rivington Ltd., London, 1902.

HÊZİL, Samî, *Kurte Wêjeya Kurdî*, weş. Sîtav, Wan, 2015.

İBN ARABÎ, *Îlâhî Aşk*, ç. 16, (Wer.: Mahmut Kanık), weş. İnsan, İstanbul, 2013.

ÎBNU'L-ESÎR, (Îzzuddîn Ebû'l Hesân-'Elî) *el-Kamîl fî't-Tarîx*, ç. el-Mektebetu't-tewfîqîyye, (Amd.: Xeyrî Seîd), I-X, Misir, 2004.

İMAM-I GAZALÎ, *Ölüm ve Ötesi*, (Amd.: Abdullah Aydın-Selma Aydın), weş. Sena, İstanbul, 2001.

KARA, Sabah, *Dubeytî Baba Tahirê Uryan*, ç. 3, weş. Nûbihar, Stenbol, 2012.

KERİM, Ali Husein, *Balkan Yarımadasında Kürtler*, weş. Evrensel, İstanbul, 2011.

KILIÇ, Mahmud Erol, *Sûfî ve Şiir, Osmanlı Tasavvuf Şiirinin Poetikası*, ç. 10, weş. İnsan, İstanbul.

KÖPRÜLÜ, Fuat, *İlk Mutasavvıflar*, ç. 3, weş. Türk Tarih Kurumu Basimevi, Ankara, 1976.

MEHMET EMİN ZEKÎ Bey, *Kürt ve Kürdistan Ünlüleri (Meşâhirê Kurd û Kürdistanê)*, ç. 3, (Wer: M. Baban-M. Yağmur-S. Kutlay), weş. Öz-Ge, Ankara, 2005.

MELAYÊ CİZÎRÎ, *Dîwan*, (Amd. Selman Dilovan), weş. Nûbihar, Stenbol, 2010.

MEVLÂNA CELÂLEDDİN Rûmî, *Mesnevî*, (Amd.: Adnan Karaismailoğlu), b. I, weş. Yeni Şafak, İstanbul, 2004.

_____, *Mesnevî-i Şerîf Şerhî*, (Werger û Şerh: Ahmed Avni Konuk), b. II, weş. Gelenek, İstanbul, 2004.

Nûbehara Biçûkan Ehmedê Xanî Külliyyatı I, (Vekolîn û Şîrove: Kadri Yıldırım), weş. Avesta, İstanbul, 2008.

MUÎNUDDÎN ÎBNU'L QASİM CUNEYDÊ Şîrazî, *Şeddu'l- 'Izar fî haţfî'l- evzar 'an zuvvarî'l-mezar*, b. 3, weş. Mohles, Têhran, şemsî 1328.

OCAK, Ahmet Yaşar, *Türk Sufiliğine Bakışlar*, weş. İletişim, İstanbul, 2004.

OKUYUCU, Cihan, *Divan Edebiyatı Estetiği*, weş. L&M, İstanbul, 2004.

OSMAN, Karwan, *Çarînekanî Baba Tahirê Hemedanî*, Xaneqîn, 2009.

ÖZÇELİK, Mustafa, *Bizim Yunus*, weş. Sistem Ofset, Ankara, 2010.

ÖZTÜRK, Yaşar Nuri, *Mevlana Celâleddin Rûmi ve İnsan*, ç. 6, weş. Yeni Boyut, İstanbul, 2000.

PALA, İskender, *Kitab-ı Aşk*, weş. Alfa, İstanbul, 2005.

_____, *Divan Edebiyatı*, ç. 4, weş. L&M, Stenbol, 2002.

QANADÊ KURDO, *Tarîxa Edebiyata Kurdî*, weş. Lîs, İstanbul, 2010.

Qur'ana Pîroz û Meala Wê ya Kurdî, weş. Serokatîya Karûbarên Diyanetê, İstanbul, 2015.

RAWENDÎ (Muhemmed Bîn 'Elî Bîn Soleyman), *Raĥetu's-Sudûr we Ayetu's-Surûr der Tarîx-ê Al-ê Selçûq*, weş. Asatîr, Têhran, h. 473.

RESÛL, İzeddin Mustafa, *Bir Şair Düşünür ve Mutasavvıf olarak Ehmedê*

Xanî ve “Mem û Zîn”, (Wer.: Kadri Yıldırım), weş. Avesta, İstanbul, 2007.

SAĞNİÇ, Feqî Huseyn, *Dîroka Wêjeya Kurdî*, weş. Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2002.

SECADÎ, ‘Elaeddîn, *Mêjûy Edebî Kurdî*, weş. Bilavkirdnewey Kurdistan, Sine, 1391.

ŞEREFXANÊ Bedlîsî, *Şerefname (Dîroka Kurdistanê)*, (Wer.: Ziya AVCI), weş. Azad, Mersin, 2014.

ŞERİATÎ, Ali, *Çöle İniş (Hubut-Kevir)*, ç. 2, (Wer.: Hicabi Kırlangıç-Derya Örs), weş. Fecr, Ankara, 2002.

_____, *Medeniyet ve Modernizm*, ç. 5, (Wer.: Ahmet Yüksek), weş. Birleşik, İstanbul, 1998.

ŞIWAN, İbrahîm Ehmed, *Edebê Kownî Kurdî*, weş. Zankoy Selehedîn, Hewlêr 2012.

TATCI, Mustafa, *Yunus Emre Divanı, Tahlil*, weş. M.E.B., İstanbul, 2005.

TENİK, Ali, *Tarihsel Süreçte Kürt Coğrafyasında Tasavvuf ve Tarikatlar*, weş. Nûbihar, İstanbul, 2015.

TİMURTAŞ, Faruk Kadri, *Yunus Emre Divanı, Tercüman 1001 Temel Eser 1*, weş. Kervan Kitapçılık, İstanbul, 1972.

TURAN, Abdulkakî, *Melayê Cizîrî Dîvani ve Şerhî*, ç. 2, weş. Nûbihar,

Stenbol.

TÜRER, Osman, *Ana Hatlarıyla Tasavvuf Tarihi*, ç. 2, weş. Ataç, İstanbul, 2013.

ULUÇAY, Ömer, *Ehl-i Hak Baba Tahir Uryan Zerdüşt*, weş. Gözde, Adana, 2010.

UZUN, Mehmet, *Destpêka Edebiyata Kurdî*, ç. 2, weş. Ithaki, Stenbol, 2010.

_____, *Antolojiya Edebiyata Kurdî*, weş. Aram, Stenbol, 2003.

ÜSTÜNER, Kaplan, *Divan Şiirinde Tasavvuf*, weş. Birleşik, Ankara, 2007.

XEZNEDAR, Me‘rûf, *Mêjûy Edebî Kurdî*, weş. Aras, 2001.

_____, *Yekemîn Rojên Edebiyatê Li Diyarbekirê, Gotarên*

Konferansa Edebiyata Rojhilata Navîn û Pirçandiyê, weş. Enstîtuya

Kurdî ya Stenbolê, 4-6 Sermawez 2003, Stenbol, 2004.

YILDIRIM, Kadri, *Baba Tahirê Uryan Hayatı Görüşleri Dîwanı*, weş. Avesta, Stenbol, 2013.

_____, *Ehmedê Xanî Mem û Zîn*, ç. 2, weş. Avesta, İstanbul, 2013.

YILMAZEL, Ali Fuat, *Uygurlık Tarihi*, weş. Anadolu Üniversitesi, Eskişehir, 2011.

ZERRÎNKÛB, ‘Ebdulhuseyn-ê, *Custucû der Tesewif-ê Îran*, ç. 5, weş.

Muesese-ê Intişarat Emîrkebîr, Têhran, h. 1376.

Kovar:

ABBARÎKÎ, Seyyêd Arman Huseynî, “Nêgahî Tazê Be-Zebanê Şê‘rê Baba Tahêrê Hemedanî”, *Kêtabê Mah Edebîyat*, j. 80, Azermah 1392.

BATÎSLAM, H. Dilek, Divan Şiirinin Mitolojik Kuşları: Hümâ, Anka ve Simurg, *Türk Kültürü İncelemeleri Dergisi*, j. I, İstanbul 2002.

ÇELİK, İsa, “Tasavufî Bir Terim Olarak Fakr”, *Ekev Akademik Dergisi*, b. III, j. 191, Payîz 2001.

KALFA, Mahir, “Klasik Eserler ve Klasik Eserlerin Eğitimsel İşlevi”, *Türkiye Sosyal Araştırma Dergisi*, j. 17, Avrêl 2011.

NEVÎN, Huseyn, “Wehdetê Wicûd û Baba Tahir”, *Mecelê Keyhan Ferhengî*, j. 216, Cotmeh 1383.

ÖZKÖSE, Kadir, “Zühd ve Sufilerin Zühde Yükledikleri Anlam: Tasavvufta Dünyevileşmeye Tepkisel Yaklaşım”, *Cumhuriyet Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi*, j. VI/1, Sivas, 2002.

YASMÎ, Reşîd, “Baba Tahirê Uryan”, *Mecelê-î Armaxan*, Têhran, j. 10/1308

ÜNVER, İsmail, *Yunus Emre Üzerine*, *Türklük Bilimi Araştırmaları Dergisi*, j. 19, Bihar: 2006.

Ferheng:

ASLANOĞLU, Osman - İSLAMOĞLU, Bedirhan - GÜRÜR, Zeki - ACAR, Hayrullah - ASLANOĞLU, Evren, *Ferhenga Pirzimanî*, ç. 3, weş. Nûbihar, İstanbul, 2014.

CEBECİOĞLU, Ethem, *Tasavvuf Terimleri ve Deyimleri Sözlüğü*, ç. 2, weş. Anka, İstanbul, 2004.

Anka, İstanbul, 2004.

FARQINÎ, Zana, *Türkçe-Kürtçe Sözlük*, weş. Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê,

2000.

KANAR, Mehmet, *Farsça Türkçe Sözlük*, ç. 3, weş. Say, İstanbul, 2011.

KARATAŞ, Turan, *Ansiklopedik Edebiyat Terimler Sözlüğü*, weş. Sütun,

Stenbol, 2011.

PALA, İskender, *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, ç. 23, weş. Kapı,

İstanbul, 2013.

_____, *Divan Şiiri Sözlüğü*, weş. Kapı, İstanbul, 2010.

ULAŞ, Sarp Erk, *Felsefe Sözlüğü*, weş. Bilim ve Sanat, Ankara, 2002.

Ansîklopedî:

ÂŞIK, Nevzat, “Bedüzzaman el-Hemedâni”, *DİA.*, weş. TDV., İstanbul, 1992.

AZAMAT, Nihat, “Kalenderiyye”, *DİA.*, weş. TDV., İstanbul, XXIV, 2001.

DURUSOY, Ali, “Wahdet”, *DİA.*, weş. TDV., İstanbul, XXXXIII, 2012.

_____, “Vücûd”, *DİA.*, weş. TDV., İstanbul, XXXXIII, 2012.

GÜRKAN, Salime Leyla, “Mirin”, *DİA.*, weş. TDV., İstanbul, XXXIV, 2012.

KIRLANGIÇ, Hicabi, “Ömer Hayyâm”, *DİA.*, weş. TDV., İstanbul, XXXIV,

2012.

“Klasik”, *Meydan Larousse Büyük Lugat ve Ansiklopedi*, weş. Sabah Gazetesi,

İstanbul, XI.

MACDONALD, D. B., “Fakir”, *İslam Ansiklopedisi*, weş. MEB, Eskişehir, IV, 1997.

MASSIGNON, Louis, “Tasavvuf”, *İslam Ansiklopedisi*, weş. MEB, Eskişehir, XII, 1997.

MİNORSKY, V., “Baba Tâhir ‘Uryan”, *İslâm Ansiklopedisi*, ç. 5, weş. M.E.B., Eskişehir, II, 1997.

TOPALOĞLU, Bekir, “Tövbe”, *DİA.*, weş. TDV., İstanbul, XXXXI, 2012.

Türkiye Diyanet Vakfı İslam Ansiklopedisi, I-XXXXIV, weş. Türkiye Diyanet Vakfı Yayın Matbaacılık ve Ticaret İşletmesi, İstanbul, 1988-2013.

ULUDAĞ, Süleyman, “Hallac-ı Mansur”, *DİA.*, weş. TDV., İstanbul, XV, 1997.

_____, “Tövbe”, *DİA.*, weş. TDV., İstanbul, XXXXI, 2012.

_____, “Baba”, *DİA.*, weş. TDV., İstanbul, IV, 1991.

_____, “Baba Tahir”, *DİA.*, weş. TDV., İstanbul, IV, 2012.

_____, “Hâllac-ı Mansûr”, *DİA.*, weş. TDV., İstanbul, XV, 1997.

ULUDAĞ, Süleyman-BAYBURTLUGİL, Nurettin, “Aynülkudât el-Hemedâni”, *DİA.*, weş. TDV., İstanbul, IV, 1991.

UNAT, Yavuz, “Ömer Hayyâm”, *DİA.*, weş. TDV., İstanbul, XXXIV, 2012.

YAZICI, Tahsin, “Derviş”, *DİA.*, weş. TDV., İstanbul, IX, 1994.

_____, “Baba Tahir”, *DİA.*, weş. TDV., İstanbul, IV, 1991.

Çavkaniyên Dijîtal:

“Baba Tahirê Hemedanî”, [<http://k-b.ir/154967.htm>], Gihîn: 25 Gulan 2015

“Dêhxoda”, [<http://parsî.wiki/dehkhodasearchresult-fa.htm>], Gihîn: 28 Gelawêj 2015

“Fena”, [<https://tr.wikipedia.org/wiki/Fena>], Gihîn: 5 Cotmeh 2015

“Ger Taş İsen Eriyesin”, [<http://www.yunusemre.net/siirler/17-Ger-Tas-Isen-Eriyesin.html>], Gihîn: 09 Gulan 2015.

“Hz. Eyyub ve Sabrı”, [<http://www.dinimizislam.com/detay.asp?Aid=3168>], Gihîn: 22 Sermawez 2015

“Hz. Yakup (as)’ın Sabrı”, [<http://www.ihya.org/kavram/kavramlar-ansiklopedisi/dt-6245.html>], Gihîn: 22 Sermawez 2015

“M. Kewê Dilxêrî, Rustemê Zal’ın Kürtlüğü Üzerine”, [<http://www.bilicanhaber.com/yazar.asp?>], Gihîn: 28 Tirmeh 2015

Mutasavvıf”, [<https://tr.m.wikipedia.org>], Gihîn: 30 Gulan 2015

“Qedem ‘Elî Seramî, Baba Tahir û ‘İrfan”, [<http://www.drsarami.com/index.php/2014>], Gihîn: 30 Berfenbar 2014.

“Selman”, [<https://tr.m.wikipedia.org/wiki/Selman>], Gihîn: 07 Gelawêj 2015

“Tasavvufta Varlık-Sufizm ve İnsan”, [<http://sufizmveinsan.com/konuk/varlik.html>], Gihîn: 18 Cotmeh 2015

“Vecd”, [<https://tr.wikipedia.org/wiki/Vecd>], Gihîn: 5 Cotmeh 2015

“Yarsan”, [<https://ku.wikipedia.org/w/index.php?title=Yarsan&variant=ku-latn>], Gihîn: 23 Reşemî 2014

“Yunus Emre ve Tasavvuf”, [<http://web.deu.edu.tr/ilyas/edebiyat/yunusvetasavvuf.htm>], Gihîn: 25 Tebax 2015.

KURTE**Baba Tahir di Wêjeya Kurdî de****(Lêkolîn)**

Di vê tezê de li ser jiyana, berhem, eşq û baweriya Baba Tahir lêkolîn hatiye kirin. Ew helbestvan, ramangêrê wehdetê wicûdê, xwediyê eşqa Xwedayî, sofîyekî ji serdema xwe û bingeha Wêjeya Klasîk ya Kurdî û Farisî ye. Li ser ziman, netew û baweriya wî nêrînên cuda hene. Ew li Hemedanê hatiye dinê û di navbera salên 930-1010'an de jiyaye. Derbarê wî gelek agahiyên kêrmeşîstîne îro.

Tez ji pênc beşan pêk tê. Beşa yekem destpêk e ku di vê beşê de derbarê Wêjeya Kurdî agahiyeyeke bi giştî hatiye dayîn. Di beşa duyem de jiyana Baba Tahir û berhemên wî bi awayekî berfireh hatine danasîn. Di vê beşê de bi gelek mijarên binbeş ve li ser Baba Tahir hatiye rawestan, zimanê wî, zimanê dubeytiyên wî û netewa wî hatine vekolîn. Di beşa sêyem de felsefeya eşqa wî hatiye ravekirin. Di vê beşê de pêşî bi sernavên cuda derbarê eşqê, agahî hatiye dayîn, paşê li ser eşqa wî hatiye rawestan. Di beşa çarem de mijara “bandora bawerî di berhemên wî de” cih digire. Di vê beşê de derbarê tesewif, wehdetê wicûd û baweriya Yarsanê agahî hatine dayîn. Têkiliya wî ya bi tesewif û wehdetê wicûdê hatine vegotin. Di bin sernavê “Baba Tahir û Yarsan”ê de niqaşiya baweriya wî hatiye kirin û têkiliya wî ya bi Yarsanê ve hatiye pêşkeşkirin. Di beşa pêncem de encam, çavkanî, kurte û pêvek cih digirin.

Bêjeyên Sereke: Wêje, helbest, eşq, bawerî, tesewif, wehdetê wicûd, yarsan.

ÖZET

Kürt Edebiyatı'nda Baba Tahir

(Araştırma)

Bu tezde Baba Tahir'in hayatı, eserleri, aşkı ve inancı üzerine araştırma yapılmıştır. O, şair, vahdeti vücut düşünürü, ilahi aşk adamı, kendi döneminin bir sufisi ve klasik Kürt ve Fars edebiyatı'nın temelidir. Onun dili, milliyeti ve inancı üzerine farklı görüşler ileri sürülmüştür. O Hemedan şehrinde dünyaya gelmiş, 930-1010 yılları arasında yaşamıştır. Onun hakkında çok az bilgi günümüze ulaşmıştır.

Tez beş bölümden oluşmaktadır. Birinci bölüm giriş bölümüdür. Bu bölümde Kürt Edebiyatı hakkında genel bilgi verilmiştir. İkinci bölümde Baba Tahir'in hayatı ve eserleri tanıtılmıştır. Bu bölümün birçok alt başlığı altında Baba Tahir üzerinde durulmuş, onun dili, eserlerinin dili ve milliyeti araştırılmıştır. Üçüncü bölümde onun aşk felsefesi anlatılmıştır. Dördüncü bölümde "inancın onun eserleri üzerindeki etkisi" konusu yer almaktadır. Bu bölümde tasavuf, vahdeti vücut ve yarsan inancı hakkında bilgiler sunulmuştur. Baba Tahir'in tasavvuf ve vahdeti vücut ile olan ilişkisi anlatılmıştır. "Baba Tahir ve Yarsan" başlığı altında onun inancı tartışılmış ve Yarsan inancı ile olan ilişkisi üzerinde durulmuştur. Beşinci bölümde sonuç, kaynaklar, özet ve ekler yer almaktadır.

Anahtar Kelimeler: Edebiyat, şiir, aşk, inanç, tasavvuf, vahdeti vücut, yarsan.

ABSTRACT**Baba Tahir in Kurdish Literature****(Research)**


In this thesis, the research on Baba (Father) Tahir's life, works, love and faith was conducted. He is a poet, a philosopher of body unity, the man of divine love, a Sufi of his own era and the basis of classical Kurdish and Persian literature. Different views have been proposed on his language, nationality and religion. He was born in the city of Hamedan and lived between the years of 930-1010. A little knowledge about him has been known nowadays.

The thesis consists of five chapters. The first part is the introduction. General information about Kurdish literature has been given in this section. Baba (Father) Tahir's life and works have been introduced in the second section. It has been focused on Baba (Father) Tahir under several sub-headings of this section, and his language, the language of his works and his nationality have been investigated. His philosophy of love has been described in the third section. The fourth section includes the issue of faith influence on his works. The knowledges about Sufism, unity of body and Yarsan belief have been presented in this section. The relationship of Baba (Father) Tahir with Sufism and the unity of the body have been described. His faith has been discussed under the headline of Baba (Father) Tahir and Yarsan and has been focused on his relationship with Yarsan faith. There are the result, resources summary and additions in the fifth chapter.

Key Words: Literature, Poem, Love, Faith, Sufism, Unity of the Body, Yarsan


PÊVEK

PÊVEK 1. Wêneyên Helbestên Wî yên Destnivîsî⁸³⁸



⁸³⁸ Bahauddîn Qumî, *Pirtûka Destnivîsî*, Qonya Mevlana Müzesi, jimara pirtûkê ya li muzeyê: 2530, h. 848 / m. 1444, r. 89-90.

من آن پریم که خواستدم قلند نه خاتم بی نه نام بی نه لنگه
 رومه روزه را ایم کرد کیتی شود رایه و او سنگی نه هم سر
 یا ازین بند دراز تاوه کتیم خویم از خورد و در خواوه کتیم
 یادین شو مکتبی ام نیا پا از خوبی باره در زور لاده کتیم
 پنج روزی سنی خرم کمان بی زین خندان برمان آسمان بی
 پنج روزی سنی ما زید و سامان چنان نام و نه در امان نشان
 الف کتر کاف و نوش مهر کرد بمشن همان کمان اول جور کرد
 انگش از آفری کردون کردان آرش ادسات و من اد اجه ادر کرد
 بشم با لوند امان موشا نم دامن از مهر کیتی با و شام نم
 نیشام توله و مویم نزار بی بی که بیلک سنی و اول نیشام
 از آن اسپیده بازم ممدانی بنه های کرم خیره و اسپه
 مده بمن و دیرند چرخ و شاهین ببام من کز بند خیره و اسپه




MEVLANA MÜZESİ
İHTİSAS KÜTÜPHANESİ

Kitap No.	2530
-----------	------

باریادگار بماند خطی سیاه
1760
50

Pirtûka Qûmî ya Muzeya Mewlanayê

Pêvek 2. Wêneyên Gora Baba Tahir



Lewheya Pêşiya Gora Baba Tahir



Tirba Gora Baba Tahir, Hemedan / Iran



Gora Baba Tahir



Dubeytiyên Baba Tahir ên Ser Dîwarên Gora Wî

